

Dr. Eskerê Boyîk

Êzîdiyatî  
Mîrzikê Zaza  
Fermanên Reş



Dengê Êzîdiyan • Oldenburg

# Eskerê Boyîk

forage m. Brem  
S. n. 2012  
Dr.

# Êzdiyatî Fermanên reş Mîrzikê Zaza

# Ji weşengeha Dengê Êzîdiyan

Çapa yekem

Navnîşan: Yezidisches Forum e.V.  
Mala Êzîdiyan Oldenburg  
Eidechsenstr. 19  
26133 Oldenburg – Deutschland  
Tel.: 49 (0) 4850555  
Fax: 49 (0) 4850557  
E-mail: info@yediden.de  
E-mail: E.Boyik@web.de

Weşengeh: DENGÊ ÊZÎDIYAN, Oldenburg

*Kopîkirin û çapkirina pirtûkê, wêneyan, têkistan, bê destûra nivîskar qedexe ye.*

*Ev pirtûka yekîtya xwe va lêkolîneke dîrokî, yan jî rojne-mevanî, yan jî cûrekî edebyetêyî xisûsî nîne. Min bi her cûreyî, serbest xwestye bîr û bawaryê xwe derheqa pêşîroj û paşîroja gelê xwe da binivîsim. Bi vê nivîsa xwe min xwestye bala xwendevana bikşînim ser hinek pirs û pirsgî-rêkan. Min hinek birîn vekirine, hinek deqên dîrokê yên reş derxistine, dane li ber çevan... Li ser dara Dîroka gelê Kurd fêkyên tel pîrin... Pêwîste em kurd telayêن dîroka xwe temkin, birînê gelê xwe bivînin, ku melhemkirna wan hevkî rehetbe...*

## *N a v e r o k*

1.	<i>Pêşgotin</i> .....	5
2.	<i>Kurtayîk li ser Êzdiyan û êzdîyatîyê</i> .....	14
3.	<i>Pêwendyên Kurdên êzdî di dewleta Rûs ra</i> .....	51
4.	<i>Berxwedana Mîrê Ridiweanê Mîrzikê Zaza</i> .....	60
5.	<i>Zargotin</i> .....	94
6.	<i>Sitiranêñ gelêrî derheqa komkujya</i> <i>Dela û şerrê li ser Erenza Şêxan</i> .....	109
7.	<i>Çiroka Keleşê Çelo</i> .....	132
8.	<i>Bîranîna Hemzoyê Xalit</i> .....	135
9.	<i>Bîranîna Eliyê Qecer</i> .....	140
10.	<i>Şerê qewalê Êzdiyan û Sofyên Misilmanan</i> <i>(Salihê Kevirbirî)</i> .....	145
11.	<i>Fermana Xalta (Aydîn Ronak)</i> .....	152
12.	<i>A. H. Layard</i> .....	158
13.	<i>Xaçatûr Abovyan</i> .....	162
14.	<i>Naveroka bûyaran</i> .....	166
15.	<i>Xaltî û hinek êlên Kurdên êzdî yêñ</i> <i>Bakûrê Kurdistanê</i> .....	193
16.	<i>Êla Sîpkan</i> .....	199
17.	<i>Êla Hesinyan</i> .....	205
18.	<i>Êla Zuquryan</i> .....	214
19.	<i>Gotarê, ku ser vî babetî çap bûne</i> .....	
20.	<i>Şêx Mîrza</i> .....	261
21.	<i>Navnîşana Serkanyan</i> .....	281

## PÊSGOTIN

Timê pirsekê rehetî ne daye min. Hê zaro bûm, şagirtê dibistanê neheqî û nerastîyên vê dewranê dilê min diêşandin û min jî nizanbû bi dilsaxyâ xwe ya zarotyê di guhê kê da bikira qûjîn: „Çima li ser xerîta cihanê navê welatê min tune? Çima zarokê dora min tev bi zimanê xwe diaxivin, dixwûnin, dinivîsin, ez jî bi zimanê wan?. Çima?“ Paşê, ez çiqas mezin bûm ew ÇIMA - an jî mezin û zêde bûn. Çirokbêjekî gundê me digot: „Teyr çiqas bilind difire, ewqas dûr divîne.“

Hêdî-hêdî dîdemên welatekî pelçiqandî, perçekirî, birîndar, gelekî bi qeyd û zîncîrên zulmê qeytkirî, dûrva, li xerîbya kalbava ya malwêran da, ji min va dîyar bû.

Kurdistan: welatê kal-bavê min. Kurdistan xewna min, xiyla min, evîna min, birîna min...

Devedevî nîv sedsal berê, dema li Başûrê welatê min vûlkanâ mezin teqya, Barzanyê mezin şemdana berxwedana azayê bilind kir, ez xwendevanê zanîngehê bûm. Rîya min bi hidûdên pola yê welatê Sovyêtê gîrtî, milê min bi qeytên gotinên „dêmokiratî“ û „biratya miletan,, ya sexte girêdayî bûn. Vê carê dilê min ji bêçaryê, ji êşa xerîbyê û dûrbûna ji welêt kire qûjîn: „Çima ez jî li welatê xwe nînim, ku bivim pêşmergê azaya wê? Kê ye sebebê vê xerîbya min?“

Paşê Kurdistan û cihanê da pir tişt qewimîn. Kurdistanâ Bakûr da dest bi şerekî qirêjî malwêraan bû. Kurdistan bi çekşîlihê dewranê yê here qetil hate hedimandin. Ji çar alya va kurd hatine pelçiqandin.Xûna kurd bi destê neyarê berê, di çemê dewrana ra dîsa herikî. Li ber çevê vê dinya neheq, li ser sîngê welatê min neyaran Helebçek na, sed Helebçe kirne birînê heta hetê...

Qesra welatê Sovyêtê jî, ku bi xwîn evdên karkir, xûdana wan ya helal hatibû avakirin, li ser çêkirçiyê xwe da hedmî...

Mêzîna cihanê xirav bû. Wî welatê „karker û gundîyan“, „alîkarê gelên bindest“ jî xêncî zirarê tu kar neda ne karkir û gundîyê xwe, ne jî miletê mîna me kurdan yê zêrandî. Ew welatê xwe piştovanê evdê zêrandî, bindest elam dikir, bi her cûreyî alî zordesta kir, ku gelê me bipelçiqînin, welatê me wêrankin. Gelê me çiqas xwe li wî welatî girt ewqas ew dagerkir, zordest û neheqa ra, dijî Kurdan bû hevalbend û hevkar.

Ew welatê gewre rizayî bû, ji hev berda, perçe-perçe bû. Li nav wê da jî her tişt li hev ket. Gur ketin li nav pêz. Milê neheq û zulmkaran vebû. Dizan, çiqas karibûn-dizîn, talançîyan-talan kirin, cerdevanan: cerd birin li ser hebûna xelqê, xwe ra birin, mîrkujan çiqas karibûn evd kuştin... Serokên gewre, yên partîya Komûnîstan, ku serok, xweyî-xudanê wê dewletê jî bûn, „Palît bûroya“ wê da pûngala xwe germ kiribûn, rûniştibûn, serokatîî wê dewletê dikirin, heta 60-70 salyê xwe axaftine xwe da bi mecbûrî tim besa biratya miletan, wekehevya evdan, qencyê û remê dikirin, postê xweyî berê yê qelp avîtin, kesayetya wan e durû, miletçî, cerdevan, olperest, merivkoj, mafyoz hate xanê...

Qesra, ku li ser derewa hatibû avakirin, gerekê hilşya, bi carkekê va hedimî... Miletçîti bû jer li wî welatê gewreyî - bêxweyî gerya, gel rabûn dijî hev. Her kes ber bi welat û gelê xwe revyan. Navberê da em kurd man. Bê pişt, bê welat, bê kes.

Di wî halê dijwer da, dewsâ Kurd tifaq û yektiya xwe xurt bikin, ku xwe ra rê bivînin bûne du tîşa û ketine qırka hev.

Her kes bi evdê bê pişt, bê tifaq dilîzin... Birek Kurdêñ êzdi ketine tora partyake Ermenya, ya desthiletdare, miletçî, nijarperest. Gotin: „Em kurd nînin. Êzdi kurd nînin.“ Hinek ji bo berjewendîyên şexsî û navê arzan ketine li nav wê lîstika qirêj, hinek jî dilê sax gîhiştine wan... Pak bû xelqê bi alikarya rewşembirêñ wure Kurd zû tê derxistin, ku li bin wê lîstikê da ci néta xirab veşartî heye û ji sedî pênc jî pey wan „êzdiyan“ neçûn... Dikaribû birakuja kurda bi destê kurda wura jî bique-

wimya...Çawa, bi dewrana, neyarê kurda ew listik kurda ra çê dikirin û dûrva bêaqilaya kurdan dikenyan...

Rîspîkî nasî, qedirbilind, ku min qedirê wî pir zanibû, alyê wan Êzdiyêñ sexte sekini. Ew kirina wî evdê helalî, cwamêr ez ecêvmayî hîştim. Dilê min êşya, min jê pirsî: „Çima?..“

Ewî got: „Dîrokê bipirse. Çemê Erez bipirse. Sala 1918-an bipirse... Kê em: êzdî qir kirin? Sala hîjda ji malbeta me ya cil neferî, ez tenê xilaz bûm... Kê neferê min qir kirin? Çima? Me xiravî ji kê ra kiribû? Yeke, Kurdistana te çê bibe jî, ji min ra tê da cî tune...“

Ez ker bûm... Gotina kalê da rastî hebû. Rastîya girane, tel.

Em sûcdar bûn. Rewşembirên kurde wî welâfî sûcdar bûn. Li nav heftê salêñ jiyanasovêtê da, wan pirsa kalê bê bersiv hîştibûn, wan birîna kalê nenhêrî bûn. Wan şihîdê fermanan ji bîr nanî bûnn... Wan rastîya dîrokê, sebebêñ fermanan şede û zîyankêşê fermanan ra ne gotibûn. Raste welatê Sovêtê da ji bo „biratya gelan“ ewqas jî cî nedidan lêkolîn û nivîsarêñ bi wî rengî, lê dîrokñas û nivîskarêñ me jî bi bêxemî tev digeryan, nediketin pey lêkolîna wan bûyaran. Wana tirê lêkolîna wan bûyaran dijî kurdîyatîye... Eger lêkolînen usa bibûna, gel rastîya dîroka xwe bizanbya, serwext bûya çîma û çawa ew bûyar pêk hatin, dijwar êzdfîkî helalî bi sidqê qenc hebûya, ku pey wê koma „êzdiyêñ“ sexte û miletçîyêñ Ermenî biçûna û qewmyeta xwe, koka xwe, kurdîtya xwe înkarkirana...

Xelq pîre-pîre bûn. Mîna qeta moryê ben lê qetyayî, belayî li nav dinê bûn....

Ji xerîbyê revya me xerîbyê. Min dît ji Kurdistanê jî rev û beze. Kurd ji mala xwe, welatê xwe direvin, ku ji qetil û zulma heçar dagerkirêñ xezev xilaz bin... Lê tenê ji dagerkiran direvin? Gelo ji bo vî halê kurda tek dagerlîrin neheq, gunekar?

Kurd ji kurdan jî direvin... Ji zulma hev jî direvin. Ji bêtifaqî û neyartîya navxuyî jî direvin. Ji dîn dijminatyê, hev temûlnekirinê jî direvin...

Xerîbyê da kurd hev şîrin dibin. Welat şîrin dibe... Xerîbî poşmanîye, poşman dibin, ku çima welatê xwe hîştine, welêt da, cîyê vala, çima neheqî li hev krine...

Vira, li nava wan da ez gelek rastyê weletê xwe hesyam: rastîyê tel, rastîyê êş, rastîyê, ku giryê mirov tînin.

Êzdiyêñ Kurdistanâ Bakûr cî û werê kal bava hîştin, revyan, Ewropayê... Gelo, reva teva seva jîyana Ewropê ya xweş bû? Na... Jîyana Ewropê çiqas xweşe, ewqas jî bi jan û êşe... Sedemên din jî hebûn... Antagonîzm, hev temûlnekirina dîn jî rola xwe ya sereke lîst... Û çiqas bi min va eyane tu partî-yakê, lîdérakî kurdan, tu kurdekî bi nav û deng heyfa xwe nanî, ku ji Kurdistanâ Bakûr rengek ji rengê wêye bi hezaran sala kêm bû...

Lê tenê Êzdî?... Na, nakokî li nav muslimanan, elewyan, kakkayan da jî hene, li nav axan, began, Şêxan, li nav eşîran, partîyan, komelan... Ew jî hê ji hev fem nakin, hev temûl nakin.

Nivîskar, sîasetmendar, rewşembîrên me, bi piranî kûrî li nav naveroka bûyaran navin, koka wan pirsgirêkan li nava dîrokê da nagerin, bûyarên dîrokî, yê mal, tifaq û yekîtya gel wêran kirine dernaxin ber çevê gelê sade, hiz dikin bi pesin bêjin: "Kurdistan baxçê gula ne. Binhîrin çiqas cudarengî, cudadengî, çiqas ol û meseb, ziman û zarav, rêça şaristanyan, heykelên dîrokî, warên pêxemberan: Mêzopotanya ,dayka şarstanyê..."

Ez dibêjim: "Xwezi ew baxçê gula tunebûya, dewse iro Kurdistanê kurda, ya yek gul, yek reng û deng hebûya, ku me kurda jî mina sêwya ustyê xwe xar nekira li destê xelqê nenihêrya. Kurdistan ne „baxçê gula ne“, lê „buxçê kula ne“ ji bo ew cudarengî, cudadengîya kurda di destê dagerkiran, neyaran

da bûye je'ra bêtifaqyê, hev qirkirinê, hev temûlnekirinê, sebe-bê vê bindestya kurda.

Em ji bo her bêbextîyên xwe dagerkira sûcdar dikin...Lê em? Me ci kirye û ci dikin ?

Her kurdekî welatparêz gerekê bersîva van pirsâ ne ku derva, lê li nav civaka kurda da bigere... We'deye rewşembîr cawa van pirsên gel bidin.

Çirokbêjekî digot: „Dijminê kurd li nav mejûyê kurd da ne. Kurd gotî ji serê xwe neyarê xwe derxe. Wî çaxî azaya Kurdistanê mîna firre ave...“

Rastî jî Kurdistan iro jî meydana qelpî û bêtifaqyê, zulmê û qetlê ye. Ceş û cerdevan, axa, beg û hizbûlaçiyê firotî, şeyîkî xweyî şexsî temamya Kurd û Kurdistanê ra naguherin. Mejûya da hê jera bêtifaqyê û dîn dijminatyê heye...“Dîndar“ hê jî hev temûl nakin. Hela hê jî, ji nav dîndarêñ her sê olêñ kurda yêñ sereke da jî, yêñ li bin defa dijmina da dilîzin kêm nînin. Çiqas jî pêşketin heye, dîsa jî payê xelqê kurdî pirê cahil û nezanin, biharî û amintîya xwe hê bi hev naynin, li pey pêşikêşê xweye dewrana, yêñ firotî fêodal diçin, kîjan a xêncî qûltyê û hêşîryê, bindestiyê wan ra tu tişt nanîne. Rastyâ xwe, dîroka xwe nizanîn, kara xwe û kara gelê xwe nizanîn...

Ev halê kurda yê iroyîn tiştekî nû, bûyarêñ niha va girêdayî nînin. Ew ji dîrokê tê. Bêtifaqyê, neyartîyê, xweyîntîyê, hev temûlnekirina dewrana Kurdistan gîhandine vê malwêranyê.

Dîroka kurda da deqêñ tenîye terî kêm nînin. Kesî ewqas zîrar ne daye kurda çiqas kurda bi xwe. Kesî xûna kurda ewqas nerêtye çiqas kurda bi xwe. Kesî rîya azayê li ber kurda negirtî... çiqas kurda bi xwe... Kurda her kesî ra xizmet kirye, wan ra tane pişt û alîkar, serê xwe li ber wan da dane, zulm û zora wan emûl kirine...Lê hev temûl ne kirine. Xelqê ra tifaq çê kirine, tifaqa xwe xirav kirine. Derewa xelkê ji xwe ra kirine heqî û iman, nanê hev heram kirine, nanê xelkê xwe ra kirine tiberk...

Derheqa wan qetlema, zulm û zorê da, ku bi dewrana gelê me anye serê hev destê mirov jî nagire binivîse. Hinek dibe gazina jî bikin, ku ez çîma wan demêن xûn, wan pelên dîroka gelê me yê reş tînim bîr. Bi texmîna min gelê kurd derheqa wan deqêن reşe dîroka xwe da bizanbe wê qenc be û pêşîrojê da wê dersa jê hilde. Ez wê bawaryê da me, ku payê gelê meyî pirê dîroka me pir kêm zanin.

Mafê tu nvîskar, dîroknivîs, zanyarî tune, eger ew rastî kara gelê xwe dixweze, bûyarêن dîrokê yê qirêj veşêre û rastyê gel ra nebêje.

Her şexsyetekî dîrokî gerekê bi emelê xwe, bi qencî û kêmasyê xwe dîrokê da cîyê xwe bigrê.

Rastî çiqas girane, ewqas jî xweşe. Di her tişti da rastî û zelalî bi sivikayî têgîhîştina xwesteka pêşîrojê ne.

Serê bavê Kurdêن musulman jî, serê bavê Kurdêن êzdi jî, yên elewî û kakayî jî, usan jî serê bavê kurmanca, sorana, zaza, gorana, lora, serê bavê hemû partî, hêz, komele û komêن kurdan, azaya wan, rizgarî û azaya welêt, qewata wan yekîtyê, hev femkirinê, hev temûlkirinê, ji hev hizkirinê da ne. Yekîtya bê qelpî, yekîtya bi ziman û ruhê kurdî, bi zanebûn, bi xemxuri, girtina qedrê bawarî, erf-edet, eyd-erefatêن hev wê wan ra rîya azayê veke. Yan xapandin, gilî-gotinêن vala, soz û gazyêن wela-tparêzyê yê sexte, tucar tu kar nedane, ne jî wê bidin.

\*\*\*

Pirsgirêka, ku di vê pirtûkê da hatye lêkolînkirin birîneke gelê Kurd ya bi dewrana ye. Birîneke kûre, ku heta roja îroyîn jî dixebite, dêše, dişewite, derman lê nayê. Şikeke bêamintîyê ya neqenc e, di hindava hev da, ji dilê evdêن Kurd dernayê. Dere-weke bê pêşire, ku li nav mejya da cî girtîye, rîya rast û qelet tev li hev kirye, nahêle Kurd ji nav gêjgerînga dîrokî derêن û rîya xweye rast bivînin.

Bi dewranan, ku karên xwe, yên reş Kurdistanê da bimeşînin, dagerkirêن civakî û ruhî, dijîtya bawaryê kirine hacet, bi wê him nehiştine tifaqa gelê Kurd çêbe, him jî Kurd rakirine dijî hev, teryê da, cahil û nezan hîştine.

Ez dijî tu hebandinê nînim, cihanê da tu bawarî ji ya din çêtir nîne û tu bawarîke xirab jî tune. Evdêne neqenc bawarî dijî hev kirine çek ji bo deshilatdaryê, text û taca, dagerkirin, hêşirkirin û bindestkirina gel û welatan, mîaserkirna berjewendyên xwe, yên şexsî. Bi zanîna min her evd gotî bi bawarî be, tiştekî bawarke, bihebîne, armanceke jîyana wî hebe. Evdê bê bawarî gura jî gurtire... Ez bawar nakim ewê bi navê musulmanyê ferman li Îzdîyan rakirine, bi êrîş çûne li ser gund û werên Îzdîyan, zarok, kal pîr, evdêne bê sûc kuştine, cî-warê wan talan, wêran kirine, şewitandine, keç-bûkêñ wan bazarên Rojhilate yên musulmanyê da firotine bawarya wan bi musulmanyê jî hebye...

Bi gorî min, bawarya evdeki gotî dijî bawarya yê din neyarîtyê çê neke. Bawarî gotî nebe sebebê qirkirin, wêrankirin, talankirina neheq e, xezev. Gelo neheqî, neqencî û xezev li nav heqya xwedênasîyê da cî digrin?

Bawarîya her gelekî gotî xizmeta qewîkirina tifaqa gel û welatê wî bike, gel di rîya rast da bive, gelekî neke qûl û qurbana gelê din. Gelekî yan civakekê neke neyarê civaka din. Bawarî gerekê bive ala edlayê, aramyê, biratyê, ji hev femkirkna gela û weletan.

Lê mixabin usa nîne. Desthilatdarêن cihanê, berê berê da, ol jî ji bo kara xwe dane kêranîn.

Dem hatye, ku gelê Kurd jî edî qencî-xiravî, dost û dijminê xwe ji hev cuda bike, usa ji ji meşa dewranê em pir şûnda mane. Li meydanêن sîyasya cihanê êdî rind têx xanê kê li ser rîya aza-ya gelê Kurd bûne asteng û kelem, rûyê kê da ne heta niha ev gela li bin nîrê neheqyê da dizêre, kê ne, ku nahêlin çira Kurda

li ser hîvê jî bişxule. Eger niha jî Kurd kare xwe yê netewî li ser her tiştî ra negrin, bikevin pey xewnerojkên derew, biratya sexte nagîhîjne tu armancî.

Ji bo dîtina rîya rast, pêwîste em paşda li dîroka xwe jî bin-hîrin. Dîrokê pir cara xayîntî me kirye... Mê jê bawar kirye, em hatine pelçiqandin, rûyê cahiltyê, bêtifaqyê, birakujyê da xêncî zirarê em negîhîstine tu meremî...

Min vê pirtûkê da, hewil daye, bi lêkolînên bûyarên dîrokî, yê destpêka sedsala 19-an, di jîyana civaka hinek êlên kurda da, restyê raxim li ber çêvîn xwendevanan. Eva ew deme, ku dewleta Osmanyê pir zeyîf dibe, mîrgehîn Kurdan yê dewîn jî ewqas xurt dibin, ku êdî deshilatdarya Osmanyê qebûl nakin û dewa serxwebûnê dikirin. Lê rûyê bêtifaqiyê, dûrnedîtina seroka da, rûyê olperestya sexte, şerîn navxweyîyî birakujyê û xiyaneta xwexatyê ya hinek serokeşîr û oldaran da nikarin qewatê xwe bikine yek û li himber qewatên Osmanyê serkevin. Kurdistan dibe meydana qir û birê. Xûna evdên kurd mîna çema dikse. Mîrgeh bi dewî têne pelçiqandin. Leşkerên Osmanyê Kurdistanê wêran dikan.

Halê Kurdên Ézdî dubare xirab dibe...Her çar alya va Ézdîyan têne hev. Di bin navê biratya bawaryê da desthilatdarên Ereb, dewleta Osmanyê û Kurdên musulman Ézdîyan elam dikan çawa kafîr, bêxwedê. Êrîşen tunekirinê dibine li ser wan. Bi îzbatyên şedê wan bûyaran, diplomatê İnglis A.H. Layard, wan êrîşa da ji çar êzdîyan sisê hatine kuştin.

Êzdîyên, ku ji qirê xilaz dibûn jî cî û werê kal bavêن xwe dihîstin, direvyan, koçber û malwêran dibûn, rîyên xilazbûnê digeryan.

Wê demê ye qelandina herd gundê Ézdîyan yê Dela, ber-xwedana Ézdîyên Xalta, şerê Erenzê bi serokatya mîrê Ridîwanê Mîrzikê Zaza, koçberya hinek êlên Ézdîyan ber bi dewleta Rûs pêk tê.


Li wê dewleta xaçparêz (Rûsa) ra helaqetyên Êzdîyan xurt dibin. Gelek meznên Êzdîyan xilazbüna êlên xwe alîkarya dewleta Rûs va girê didin. Mîrzikê Zaza jî sê nema Serlaşkerê dewleta Rûs Koms Paskêvîç ra dişîne... Dewletên Rajavayî jî destê xwe dirêjî wê heremê dikin...

Di ser bingeha belge, delîlên dîrokî, bîranînan, melûmetyên zargotinê me cedandîye ronayê bavêjine li ser bûyarêñ wê demêye tiragîk û hinek şâşyên sivik, ku dîroknivîsan nivîsara dîroka wê demê da bi nezanî berdane, rastkin.

Ji bo bûyarêñ ku bi serkêşa Mîrzikê Zaza qewimî ne bi şâşî navê Şêx Mîrzayê Anqosî va hatine girêdan, em usa jî bi sivikayî li ser berxwedana Şêx Mîrza û fermana êla Anqosya sekinîne.

Berxwedana Şêx Mîrzayê despêkê da ne seva dijîtya olê bûye. Ew pirsa girtina qedrê xîret û namûsa eşîrê bûye, dijî dewleta Osmanyê. Lê dema Şêx digrin, davêjne hebsa Dîyarbekirê, hukumdarêñ dewletê tê derdixin ku mecal Kurda ra çê dibin ji bo tifaqê dijî dewletê. Ku nehêlin tifaq li nav gel da çê bibe, hukumdarêñ dewletê bi hêsanî wê pirsgirêkê waldigerînin, diki-ne dijîtya olê... Bi wî teherî musulmanî, Kurdê musulman jî di nav da, li ber bajarê Dîyarbekirê qira 1700 konê Kurdêñ Êzdî, yên êla Anqosya tînin...

Ji bo alîkaryê, dema nivîsara vê berhemê ez razîbüna xwe didim mamosta, birayê xwe yê hêja Pîr Xidirê Silêman, Kemal Tolan, Têlîm Tolan, Sadîq Dizgûn, temamya hêjayên Mala Êzdîyan yêñ bajarê Oldênbûrgê, çîrokbej û dengbêjên hêja: Hemzoyê Xalit, Elî Qecer, Hecî Sebrî, nivîskar Salihê Kevirbirî, Emer Çelîk, hozan Aydîn Ronak, dengbêj Gêncoyê Temo, çîrokbej Hesenê Aral û Îskanê İbrahîm (Dûman). Usa jî sipasya xwe didime wan nivîskar û zanyaran, berhemên kîjaba vê lêkolînê da ji bo ronîkirina pirsgirêkan min kar anye.



## KURTAYÎK LI SER ÊZDÎYAN Û ÊZDÎYATYÊ

Êzdî pareke gelê kurdin, ku li ser bîr û bawaryên xwe, yên kevnar: êzdayatîyê mane û heta niha jî bi wan bîr û bawaryan heyîfîya xwe didomînin. Welatê wan Kurdustane.

Gor bawarya êzdînasan dîroka vî dînî ji kûraya hezarsalan tê, gelekî ji Zerdeştiyê û olêni ji pey wê ra hatî kevintire. Bawarîke Mêzopatanî, Kurdistanî ye, ji bo xêncî Kurd û Kurdistanê li nav tu gelî û tu warî ev bawarî tune. Ziman, erf-edet, rê-rism, due'a-dirozgê wê olê tev kurdewarî ne. Navê êzdîyatîyê ji peyvên Ezdî, Ezda, Ezî tê. Ezda yan Xwedê. Li nav ulmê dînê Êzdîyan da Ezî navek ji navê Xwedê ye. Têkistên Êzdîyan, yên pîroz da wa tê gotin:

*Sultan Ezî bi xwe padşa ye,  
Hezar û yek nav li xwe da ye,  
Navê mezin her Xweda ye.*

Yan

*Padşayê min hezar û yek nav e,  
Ev dinya ji bo wî sehet û gav e,*

*Dizane behra da çend keşkûl av e,  
Li deştä çend kevir di nav e,  
Ewî Hewa kire bûk, Adem kir zave.*

Ev xelkan jî mîna evdêñ olêñ din xwedêñasin û bawarya xwe ji Xwedê tînin. Ji bo wan Xwedê bawarîya here bilinde, “bê heval û bê şirîk e.“

Bi bawarya Êzdiyan Xwedê ji nûra xwe heft Milyaket xuli-qandine: Îzraîl, Cibrayîl, Mîkayîl, Dirdayîl, Simqayîl, Ezazîl, Ezrafîl. Êzdî Ezazîl rîberê xwe hesav dikin, nav dikin Tawisî Melek. Dibêjin Xwedê Tawisî Melek kirye meznê melekan. Êzdî xwe hesav dikin miletê Tawisî Melek û li pey wî diçin. Di bawarîya wan da xêr û şer ji dergehê Xwedê têñ, serkanîya wan yeke. Laşê her evdekî da du qewat hene. Aqil hêza xêrê ye, nevs ya şêr, xapandin û xiravyê ye. Ji vir jî tê xanê, ku bingeha ronayê û teryê, jîyanê û mirinê, germê û sermê, şîrnayê û telayê, remê û xezevê yeke.

Civaka Êzdiyan belayî li ser du para dibe: yeknav û dunav.

1. Yeknav Mirîdxane ye.
2. Dunav Şêxanî û Pîranîye.

Şêxanî jî sê beşin:

1. Adanî
2. Qatanî
3. Şemsanî

Gorî zanyar û oldarêñ vê olê, li berî Şîxadî ev civakan bi du beşan parkirî bûye: Pîr (oldar, rîberêñ olî) û Mirîd. Bi hed û seda Şîxadî raste bingeha vê olê ya kevn ma lê Êzdîxane bi şêweya yeknav û dunavan hat parkirin. Bi vê guhestinê wezîfe û rola hinek çînan li nav civaka Êzdiyan da hat bilindkirin

Li nav ulmê ola Êzdiyan da **kirasguherîn** bawarîke bingehîn e. Anegorî wê bawarîyê gava evd emrê Xwedê dike, laş dimire, ji bo laş ji axê çê bûye, dîsa dibe ax, lê ruh ji laş dertê, dimîne.

Gor kar, bar û e'melên wî evdî rohê wî jî ji pey mirinê ra li ber ruhberekî din da tê berdan.

Ev dîna, dînekî girtî ye. Kes nikare bive Êzdî. Evdê Êzdî gerékê ji dê û bavê Êzdî bêne dinê. Li nav vê civakê da pirsa zewacê pir berk hatîye danîn. Ji dîn û miletekî din zewac qedexe ye. Ne didin, ne jî distînin. Kê ji dînekî din zewicî, ji dînê xwe dertê, êdî Êzdî nîne. Li nav hersê parêن Êzdîyan da jî zewac nabe. Jin xwezî di nava her sê tayêن şêxan jî nave. Her weha pîr jî çend tayin, zewac di nav hinek wan taya da jî nabe.

Lêkolînên dîrokî didin zanîn, ku di dema Şîxadî û heta Şêx Hesen jî, vê derecê da, êzdîyatî ewqas hişk û berk nî bûye. Lê ji bo lîstik û êrîşen dijminan li ser Êzdîyan pir bûne, rêvabirêن wan yê olî û civakî mecbûr mane van bend û hidûdên berk bikşînine dora civaka xwe, ku bikaribin xwe biparêzin.

Qulbeta Êzdîyan Roje, sîmvol (nîşan) û ala (beyraq) wan

### Tawise.

Heft Tawisêن Êzdîyan hebûne. Her Tawsek sîmvol bûye ji bo heremek yan wîlayêteke Êzdîyan. Navê wan Tawisan evin:

1.Tawisa Êzî (Tawisa Enzelî) ji bo Ezdîxanê bû. Ew li We-latşêx dihate gerandin.

2.Tawisa Şengalê (Şingalê)

3.Tawisa Helebê

4.Tawisa Tebrêzê


5.Tawisa Xalta

6.Tawisa Moskova (seva Êzdîyêن Rûsyayê, Ermenistan û Gurcistanê)

7.Tawisa Zozana (1)

Tawisêن Êzdîyan pir kevnin, bi texmîna zanyara ew dewra bironz helandinê da hatine çêkirin.

Fermana Ferîq Wehbî paşa da (sala 1892-a) qesra mala Mîrê Êzdîxanê talan kirin, qube hilşandin, nîşanê êzdîiyatyê destê zorê birin. Li nav gelek tiştên kevnare pîroz da Tawis jî birin. Paşê çar Tawis paş da dan, sisê ji destê Êzdîya çûn. (2)



### Tawis

Nîşaneke Êzdiyan ya pîroz Xerqe ye. Xerqe libasek e (cil, wek kirasa), ku bi rîsê hirya peza sipî (qerqaş) bi destê keç û bûkêñ şêx û pîran têñ çêkirin. Ava Kanya Sipî da li Lalişa Nûranî tê morkirin. Paşê ava zergûzê da dikelînin. Rengê wê reş dibe. Xerqe şêx, pîr û feqîr xwe dikan.

Berat ji axa Lalişê ye. Ev axa, ku ji cîkî kivşkirî derdixin, ava Kanya Sipî da distirêñ û wek moryê biçûke gurover hişk dikan. Anegorî ayîna dîn ew gotî bi her êzdîkîra hebe. Dema

evdê Êzdî diçe rema Xwedê beratê didine li ser çevê wî, datînin ser lêvan, dikan guh û tesmîlî axê dikan. Hebûna beratê li cem evdê Êzdî usa jî tê wê menê, ku axa zîyareta wan, Lalişa Nûranî timê bi wan ra be.

Tok yan toq jî nîşaneke êzdîtyê ya pîroze. Jêra dibêjin toqê Êzdî. Ev kirasekî sipî ye, ku binda tê xwekirin. Dewsa berustyê mîna toqa tê dirûn.

Kulik, kumeke, ku ji hiryê tê çêkirin, bi ava Kanya Sipî tê morkirin û wek xerqe tê rengkirin. Ev jî êzdîtyê da nîşaneke pîroze.

Sitêr jî li cem Êzdîyan pîroze. Êzdî li ber sitêrê mala xwe disekinin due'a xwe dikan. Sitêr nîşana Xudanê malê ye. Dî malên dunavan da, nîşanên pîroz, yan nîşanên ocaxên wan di nav sitêr da têx xweyîkirin.

Ziyareta Êzdîyan Lalisa Nûranî ye. Kîjan dikeve li Başûrê Kurdistanê. Ew merkeza dîn û cîyê Heca Êzdîyan e. Civaka Êzdî him alîyê civakî, him jî olî ji wur va têr rîvabirin. Rêberyê Mîrê Şêxa (Mîrê Êzdîxanê), Babê Şêx (Extîyarê Mergê) û Civata Ruhanî dikan. Qirar-qanûn, rê-rismên dîn destê wan da nin. Cîyê rûniştandina Mîr gundê Bee'dirê ye. Kîjan ji Lalişê 15-16 km. dûre. Niha Mîrê Êzdîxanê: Tesîm Beg e, Babê Şêx jî Şêx Xeto ye.

Civata rihanî bi van dîndaran pêk tê: (3)

1. Mîrê Şêxan
2. Extîyarê Mergê (Babê Şêx)
3. Şêxê Wezîr
- 4 . Pêşîmamê Mergehê
5. Pêşîmamê Babê Şêx
6. Niqîb
7. Bavê Gavan
8. Serokê Qewalan
9. Bavê Çawîş



### Lalişa Nûranî

10. Serderîyê yan jî Feqîrê mala Şîxadî.

Ev wezîfe tev berê-berê da li nav binemalên dunavan da hatine parevekirin. Babê Şêx (Extyarê Mergê) rêvabirê civaka êzdiyan yê olî ye. Ew ji binemala Melek Ferxedîn e (Şemsanî) û ji alyê Mîrê Êzdîyan va tê kivşikirin. Şêxê Wezîr ji binemala Şêxên Şêşimsa ne. Pêşîmam şêxên Adanî ne. Ew li nav Êzdiyan da berpirsyarê paqijaya bawaryê ne. Mara bûk û zavê birîn jî destê vê malbetê da ne. Niqîb pîr e, ji pîrêن Hecîala. Babê Gavan ji şêxên Amadînan e. Babê Çawîş ji binemala pîrane. Serdaryê yan Feqîrê mala Şîxadî ji şêxên Şêxûbekiran yan jî Feqîrên bi xerqe ne.

Tek Meznê Qewalan mirîd e. Qewal qewlbêjên civaka Êzdiyan e, ji êla Dûmûlyêñ Zerzayî. Ew berê da du gunda: Başik û Bahzanê da dijîn. Zanyar dibêjin ew Şîxadî ra hatine wê here-mê. Civak qedrekî mezin didin Qewalan. Heta niha jî ew di nav xwe da bi erebî diaxivin. Karê qewala yê sereke ewe, ku ew

Tawisê li nav heremên Êzdiyan bigerînin, xêrê topkin, qatî qewl, beyt, rê û rizmên êzdîtyê bin. Niha Meznê Qewalan, li nav civakê da eyan, fikirzelal, zanyarekî ulmê bawarya Êzdîtyê, Qewal Silêman e.

Her Êzdî, nenhêri ew ji kîjan parê ye gerekê pênc ferzên Êzdiyatê (heqîqetê) xweyîke. Qewlê da wa tê gotin:

Çê bûn her pênc ferzê heqîqetê,  
Şêx û Pîr, Hosta û Merebî,  
Yar û Birayê Axretê.

Yan

Şêx fêr e, Pîr nîşan e,  
Hosta û Merebî sohbata wan e,  
Ferza Birê Axretê ferzeke giran e.

Bi van ferzan hevgirtinek li nav civakê da çê dibe. Her Êzdî gerekê Şêx, Pîr, Hosta, Merebî û Bira (xûşka) wî ya axretê hebe.. Gerekê bê gotin di nav civakê da rola Hosta û Merebya êdî nayê xanê, wezîfa wan jî, tê bêjî êdî ne dîhare.

Wezîfa Birê Axretê, çawa qewlê da jî tê gotin wezîfa here giran e. Anegorî u'lmê Êzdîtyê Birê Axretê ji pey mirinê ra ruhê mirî (Birê xweyî axretê) ji pira Seelehtê ra derbaz dike, dibe rêberê wî.

Dema Êzdîk (ew mirîd be, şêx yan pîr) dixweze ji xwera Birê Axretê bigre gerekê li navbera wan da Şêx hazirbe.

Ez gelek cara li wê mîrasîmê da hazir bûme. Mîrasîma gitina Birayê Axretê awaye:

Şêx ji mirîd dipirse: "Tu çi dixwezî? Yan xwestina te çiye?"

Mirîd dibêje: " Ez dixwezim... bive Birê minî Axretê. Yan, Ez daxweza biratyê jê dikim."

Şêx ji ew şexsê ku wê bive Birê Axretê dipirse: "Filakes ji te daxwezya Biratya Axretê dike, tu qayîlî?"

“Belê, ez qayîlim lê di sê herfan da ne pêra me. “

Ew sê herf sê gunene. Ewan sê guneyên bingehîn in, ku e-zdiyatî da qedexe ne û tucar nayêن qebûlkirin.


1.Şelbikê zêrîn. Yan ava şelbikê zêrîn tem neke. Yanê hidû-dên zewacê, ku nava parêن Êzdiyan da hatine danîn neteribîne, zinê neke.

2.Dîza den. Yan dînê din qebûl neke.

3.Derba Xerqe. Yanê destê xwe li ser şêx-pîra, evdêن bi xerqe bilind neke.

Edetekî kevnar, ku heta niha jî cem Êzdiyan maye: BISK e. Dema zaroka kurîn dibe heft, neh yan yanzde mehî, dê-bavê zarokê gazi şêxê xwe yê biskê dikin û cara ewlin porê lawik bi destê şêx didine quşandin. Şêx dua'ya Biskê dibêje, porê kurik diqusîne û xelatekê didê. Dê-bavê zarokê jî fitoyê xwe didin Şêx.

Êzdî xweyê eyd-erefat, erf-edet, rê û rizmêن xwexatyê, yêن dewlemendin.



**Mîrê Êzdiyan  
Tahsîn Beg**

Cejnê usan li nav wan da hene, ku ji dema Somerîya û berî wan jî têن. Eydêن sereke evin: Eyda rojîyêن Êzî, Çilê zivistanê,

rojîyê Xidir Nebî-Xidir Lîyas, Çarşema serê Nîsanê, Çileyê havînê, Cimayê û hivd.

Cejnên usan jî hene, ku tek parek, yan Êzdîyêne devereke dîkin. Êzdîyêne Çêlkî eyda Batizmîyê, yê welatêne Sovyêta berê: Çarşemê hesava, Kuloçê serê salê, yê Şengalê Tûafa dîkin û hivd.

Guhertinêne girîng li nava êzdîyatîyê da, di sedala 12-an da, dema Şîxadîyê kurê Misafîr da pêk hatin. Ewî guhertinêne (rê-form) bingehîn kirine li nav vê olê da. Hîmê hed û seda nû danî. Çevkanyêne dîrokî didine kivşê, ku Şîxadî evdekkî dewrêş, filîsof, şayîr, xwedênas, zane û xweyê hunur û kiriyameta mezin bûye. Ew ji Şamê hatîye Lalişê, bawarîya xwe li Tawisî Melek aniye, giregirêne Êzdîyan yê wê demê li dor xwe civandîye, gelek hed û sedêne nû kirye li nav vê ola kevnar. Meremêne wan guhertinan ew bû, ku êzdîyatîyê ji êrîşen olên nû biparêze. Peyhatîyêne wî, îlahî nebîyê biraziyê wî: Şêx Hesen, lawê Şîxadîyê dewîn û geleken din ji bo rêk-pêkirina wê hed-sedê û rîvabirina civaka Êzdîyan karine mezin kirine.

Pêxemberêne Êzdîyan, yê xisûsî, ku xwe ra kiribin rîberê îman û axretê, hebandin û bawarîye nînin, eva oleke esmanî, batinî û suruştî ye. Hebandin û bawarîya wan ji Xwedê, Tawisî Melek, milyaket û qewatêne xiyalî, suruştî yên ne xuya û ne eyan tê.

Her usan jî gelek xas û babçekêne Êzdîyan hene, kîjana dîroka êzdiyatîye ya dûr-dirêj û dijwar da, ji bo parastin, dewlemen-dkirin û kûrkirina wê bawaryê emekê pir mezin dane, rola dîrokî lîstine. (Şîxadî, Şêxûbekir, Şêsim, Şêx Hesen, Pîr Hesen Mam, Pîr Mamereşan, Xatûna Ferxa, Şêx Fexirîyê Adîya û geleken din). Êzdîyan jî li nav bawarîya xwe da ew ewqas mezin kirine, ku gîhandine bilindaya Xwedê û Tawisî Melek.

*Şîxadî û Tawîsî Melek û Xwedê yekin,  
Hûn tu menya jê nekin,  
Ew miraza zû hasil dikan.*

Usane, di bawarya êzdiyatî da sura Şîxadî ji sura Tawîsî Melek e û ew jî her sura Xwedê ye .(2-a)

Çiqas jî Pêxemberên Êzdîyan yên tebyetî tune ne, lê dîsa wan li nav qewl, beyt, due'a û dirozgên xwe da cîkî bi layîq dane Pêxemberan, ew hesav kirine “Qencêن Xwedê” û tim bi pesin, qedir û hisir navê wan dane, di derheqa wan da axivîne.

Di nav qewlên Zebûnî Meksûr, Mûsa Pêxember, Îbrahîm Pêxember û Nebî Îsmayîl, Miskîno jaro da ev yek rind tê xanê. Em çend sebeqa jî qewla Zebûnî Meksûr bînin:

*Piştî wê hêwanê  
Qewmek dê dehir bît dilîda namînit xwefa îmanê  
Ew yek dê xeriqbin bi ava tofanê  
Piştî wan bedîla  
Qewmek dê dahîr bit neye'dîla  
Nuqtek dê nazil bêt ji qendîla  
We li nav dehîr bit Brahîm Xelîla.*

*Birahîm Xelîl ji nuqteke sadîqe  
Bi sê herfa dibû mûlteqe  
Heta Xwedê xwe naskir bi heqe.*


*Heta Xwedê xwe biheq nas kir  
Li gel Azir û Nemrûd û senema behiskir  
Lew giyanê xwe ji kifîryê xilas kir.*

*Piştî wan xelîlulaye  
Î'saye,I'saye û Mûsaye,  
Mehemedê nû kamile  
Muhaba wî di hingifte hindek dile  
Xitmê mîra seyîdê mursile.*

*Ya seyîd el-mûrsilî  
Çemđ bedîl hatin û buhuri,  
Çend xas hatin min hijmirî  
Ew sultan şêx adiye  
tacê ji e'wil heta bi axirî. ( 2-b)*

Di nav zargotina Ézdiyan da gotinêñ wa hene, dibêjin: “Tu naçî dêrê yan mizgevtê, kevir jî navêjê.”

Xizna ulmê vê olê devkî, bi cûrê qewl, beyt, çîrok, due'a û dirozga hatine parastin. Lê gelo kitêbên Ézdîya hebûne? Çevkanîyêñ Ereban, yên kevn da tê gotin, ku du kitêbên Ézdîyan yê pîroz hebûne: Celwe û Mizhef reş. Bi gor wan çevkanîyan, ya ewlin sala 1161-ê, lê ya din 1342-a hatine nivîsar. (4 )



### Baba Şex: Şêx Xeto

Bi texmîna zanyarên êzdiyatî ew têkistên wan kitêban, ku niha hene û di derheqa wan da pir tê axaftin û nivîsar ne yê eslî ne. (5 ) Ew têkistana, sedsala 19-an da, ji alyê evdekî ne Êzdî û ne jî Kurd, ne bi zaravê Kurdên êzdî pê diaxivin, hatîye nivîsar. Çi dimîne li ser qedera kitêbên eslî, di dîroka Êzdîyan, ya di-jware bi qir û bir, bi ferman û talan, wêrandin û xûn da kê zane hêjayî ci bextî bûne ? Şewitandine ? Ji bo parastinê cîkî hatine çelkirin û cî hatîye bîrkirin, unda bûne yan li cem hineka veşartî dimînin?

Di dema Şêx Hesen da usan jî 40 hev Mışûr seva malbetên pîranîyê hatine nivîsar. Wan da navê cî û warêن qebîl û êlên Êzdîyan têن navnîşankirin, ji nav kîjana gerekê pîra xêr topkiranâ. Ji wan Mışûran hinek heta niha jî hene.(6) Ew Mışûr dîroknivîs û dinêzanên kurdzanîyê ra ji bo lêkolînêن dîrokî, dêmografi karin bibin çevkanyê giranbiha.

Sebeqeke qewla **Hizemokê** da wa tê gotin: (6-a)

*Çendî teyreke wê li ezmana  
Navê wî enqer binave,  
Ji qudretê, ji cengê wî teyrî di barî xunave,  
Me şêxek divêt ji malêt Adya,  
Pîrekî heqîqetê,  
Alimayekî ji alima jî zêde  
Derê **reşbeleka** vekin,  
Ji 72 bava xeber bidin  
Ka bi xêra navê Şêx Adî ka behra  
Sihanê çend keşkûl ave,  
Û di deşte çend kevir di nave...*

Reşblek kitêbe, usa ne kitêb hebûne, ku oldaran, a'liman ew xwendine, zanebûn, dîrok, ayîna dîn nîşanî Êzdiyan kirine.

A.H. Layard di nîvê sedsala 19-an Êzdîyên Lalşê û Şengalê dibe mêvan. Derheqa herd gundêñ qewalan: Başik û Bazanê da dinivîse. Dibêje, Êzdiyan digotin ku wan gunda da kitêbeke Êzdiyan, ya kevn veşartî heye. Dilê min pir dixwest ew kitêb bidîta, ji wan hilda, kopî kira. Lê ne, ku min kopî nekir, min nedit jî.( 6-b)

Usane kitêb nîşanî wî jî nedanê.

Ez li ser wê bawaryê me, ku di dema Şîxadî heta ya Şêx Hessen û hela demek pay wan ra jî li Lalişê pirtûkxana Êzdiyan, ya dewlemend, ya bi pirtûkên li ser ayîna dînê Êzdîtayê nivîsar hebûne. Lêkolînên li ser qewl, beyt, çîrok, duea-dirozgên Êzdiyan, ew xizna ruhî, ya gelê me, mirov tîninin li ser wê bawarîyê, ku mirovên ne xwendî û haj edebyet, medenyet, u'lmên ol û dîyanetên dînyayê tune, nikaribûn ev nirxên bedewetiye, yê usaye giranbiha, bi felsefe, dinêzanebûna kûr, bi zanyarya bê qisûr ji pey xwe bihîştana, rê û rismên ola xwe usa ferih rênîşankirana. Gelek nimûnên ulmê êzdîyatîyê eger bi zanestî bêñ lêkolinkirin, şirovekirin û wergerandin bi zimanê cihanê

yêñ mezin, we xizna edebyeta cihanê bixemilînin. Yêñ ku ew berhem efirandine şayîr, filosof û zanyarê dema xweye mezin bûne. Wana nikaribû ciyê vala ew tişt biefirandana û tu tişten nivîskî jî ji pey xwe nehiştana.



Qewalên Êzdyâ despêka sedsala 19 an

### Pelek ji Mişûreke Êzdiyan

Dîroknivîsên Ereb Ahmed bin Tolan, di kitêba xwe, ya bi navê “Thexaîr al-qesir fi tercimat nûbêla al-esîr”, Ahmed Têmûr di kitêba xweye “Al-yêzîdiyê wemensa nihletihim” da dinivîsin, ku Şêx Hesen (biraziyê Şîxadî), zane, filîsoph û bîrtijekî eyan bû, xweyê kitêba “Al-Cewle Lîehlî al-xewle”. (7)

Hema ev şedetya dîroknivîsên Ereban, ji bo li wê demê, hebûna kitêbeke usan, fikira heyîtiya kitêbxana Êzdiyan dide îzbatkirin.

Bextê wan nivîsan di bin kelefên ferman, qir û bira dewrana, ya xûnrêj da veşartîye. Gênosîd / komkujî / ne ku tenê evdê Ézdî hatîye kirin, lê usan jî çand û kultûra wan.



Êzdîyan, di dîroka xwe ya hezaran salan da, xizmeta pir mezin kirine di karê parastin, pêşdabirin-pêşxistina edebyet û medenyeta gelê Kurd da. Ji bo ev ola bawarîke kurdewarî ye, bi serê Êzdîyan gelek erf-edet, eyd-erefat, cûrê sazbendîya miletiyê, ya kevn, heta şexsyet, sifet û xeysetê miletyê, yê kevn jî hatîye xweyîkirin. Têkstên usa li nav ulmê ola Êzdîyan da hene, ku kevnarya wan digihîje bi hezaran sala. Zimanê Kurdî hatîye xebitandin, helkirin, şimşatkin, zengînkin, parastin. Ferhenga zimanê u'lmê bawarya Êzdîyan pirr berfire û dewlemend e.

Şayîrên Êzdîyan, wek Hesedê Al Tewrî, Xidirê Zênde, Pîr Reşê Heran, Pisê Cemî, Şêx Fexirê Adîyan çarsed-pêncsed sal berî şayîrên Kurd yên wek Herîrî, Feqîyê Teyran, Mele Cizîr, Ahmedê Xanî jîtine û bi zimanê Kurdi efirandine. Li cem Êzdîyan nimûnê mûzîka kurda ya olî û civakî, hacetê sazbendîyê yê here kevnar (def û şibab) hatine parastin û heta niha jî hewaska-rya xwe unda nakin.

Gelo berî wan, berî dema Şîxadî filisof, dîndarêñ xwendî, şayîr, medresêñ zanyaryê li nav civaka Kurdêñ êzdî da hebûne? Berhemêñ wane nivîskî, bi zimanê dê hebûne? Bi texmîna me li cîyê vala, carekê va qewl, beyt, qasîde, duea-dirozgêñ wa, bi zimanê kurdî efirandin tiştê dûrî aqilan ne. Usane hîmekî ede-byetê, yê pêşketî li nav Êzdîyan da hebûye, û xwendin-nivîsar jî qedexe nîbye.

Ji pey komkujuyêñ mezin ra, hukumdarêñ dagerkir, ew Xelîfîn Ereb bin yan Sultanêñ Osmanî, tek fermanêñ qirkirinê didan, piştovanî dikirin, kurd jî ji bo “axret-îmana” xwe diketi-ne qırka hev û hev qir dikirin. Bira birê xweyî helal dikuşt, law şûr zikê dê û bavê xwe yê “kafîr” ra dikir, cînara hev serjê dikirin. Şikeke neqenc, xişûşa xirav hindava hev da kiribûne dilêñ evdêñ Kurd. Kurdêñ musulman ra mîna “goştê beraz” nan, xwerin û destkuja Êzdîyan heram kiribûn. Li kîjan feraqan /derdanan/ da evdêñ Êzdî av yan xwerin bixwarana heram dibûn. Kesî rûn, penîr, mast û hasilaêñ din, ku Êzdîyan çê dikir nedikirin. Ji Êzdîyan kesî goşt, heta ce, genim, hirî jî nedikirin.

Usane Kurdêñ Êzdî, welatê xwe da, li nav civaka kurdaye-tiyê da him alyê olî û moralî, him jî cvakî, bazirganî û aborî va dihat îzolekirin. Bi zimanê niha **ambargo** danîbûne li ser wan. Pêra jî ji bo hebandina xwe Êzdîya gerekê “Baca sérî” bidana dewletê. (9)

Anegorî “ferzên” dînî musulmanê esil ra helal bû, ku wan “kafiran” bikujin (ew xêreke mezin dihat hesibandin), mal, milk û hebûna wan xwe ra hildin. Jin, bûk û keçê wan jî xwe ra bivin yan jî bazarên musulmana da çawa hêşir bifroşin.

Kurdên Êzdî jî her tişt dikirin, ku bawarya xwe biparêzin, li ber “dijminê” xwe yê dîn serî daneynin. Ci ji destê wan dihat zîyan didan Kurdên musulman. Wan ra jî musulmanî heram bû. Kîjan evdê dibû musulman ji civaka xwe derdixistin. Qewata wan bigîhiştayê dikuştin.

Dîroknivîsê Kurdi sedala 19 an Mele Mehmedê Beyazîdî destpêka wê sedsalê dinivise “*Kuştina mirovên Êzdî cem Kurdan ne gune ye û her cara, gava rê dikeve Kurdên musulman Êzdîyan dikujin û jinêwan ji xwe ra dikin carî. Ew ji dukanên qesab, yên Êzdîyan goşt nakirin, çimkî Êzdîya mûrted\* dihesibînin*”. (10)

“*Di nav Êzdîyan û meleyên Musulmana da şerekî oldarî digere û her yek ji wan li firsendekê digere yê din bikuje*”. (11)

Gelikî kûrî bêtifaqiyê û ne ku tenê bêtifaqyê, yê dîndijmînatîyê û neyartîyê, yê bi înk û rik kiribûne navbera Kurdan. Heta rewsembir, rêvabir û pêşkîşen Kurdan, yê here mezin û here navdar jî ji wê “haşîşa” qirêj paqij neman. Wan derheqa Êzdîyan da çawa gelekî (miletikî) “biyanî”, “kafîr” yan jî bi navêne nêrind nivîsîne. Êzdîyan jî kilam û sitaranê xwe, yên derheqa ferмана da, peyvîn dijminatîyê, yê tûnd û ne cî li ser sofî, mele û feqyên musulmana yê „serkesk“, „kumsor“ ji ewleda ra hîştine.

Dema em dîroka serhidanên Kurdan, yên wan deman lêkolîn dîkin, dibînin, ku serokên serhildanan jî negîhiştine rastîya dîrokê, kara miletîyê li ser êşa olê ra negirtine. Payê wanî pirê borcê xweyî “axret-îmanê” yê sereke qirkirina wan “kafira” hesav kirine. Em bîr bînin hema serhildanêن paşwextîyê, yê here mezin: ya mergeha Sorana: Mîr Mehmed û Mîrê Cizîrê

Bedirxanê mezin yê mîrgeha Botan. Meremên her du serhil-danêñ gewre jî serxwebûn û çêkirina dewleta Kurda bû...Lê wan herd serokan jî dilên evdên Êzdî da bîranînen bi xûne, bi êş û jan hîştine.

Şedê bûyarêñ wê demê bîr tînin, ku hazirya fermaña li ser Şengalê ra kêfa Bedirxan beg pir dihat. Mal û hebûna wan (Êzdiyan) jêra dima. Keç, bûk û zarokêñ wan jî li Mûsilê, baza-rê kola da difrotin û bi wan pera jî Beg deynê xwe dadida. (11-a)

Ji çevkanyêñ dîrokî em pê dihesin, ku ji 18 jînêñ Bedirxan beg, Mîrê Botayî bi nav û deng 17, bi eslê xwe Êzdî bûne. Wê demê birina her keçeye Êzdî ji alyê Musulmana va (ew mîr bûya yan xulam Êzdiya ra yek bû) dibû bûyareke tiragîk e, me-zin. Jîyana Êzdiyan tev li hev dibû. Di vir va jî tê xanê Êzdiyêñ li bin hukumê Bedirxan beg da halekî zulmeyî çawa da bûne.(11-b)

Gelo Beg pir ji Êzdiyan hiz dikir yan keçen Êzdiyan pir be-dew û xweşik bûn, ku wî ew xwe ra çawa pîrek bijartine? Dibe di gotina dewyê da rastî jî hebe, lê armac tiştekî din da bûye. Bi ferzêñ bawarya İslâmê, kê kafirekê bike musliman, bive li ser dînê heqyê, ji pey mirinê ra diçe buhuştê. Û Beg qesra xwe buhuştê da bi birina keçen Êzdiyan, bi hêşir û xûna zarokêñ wan ava dikir.

Çima ev kîn û dijminatî kiribûne serê gelê nezan û ji alyê hukumdarêñ der û hundur va dihat destek kirin û xurt kirin?

Tê texmîn kirin û usa jî dîrokê da eyane heta sedsalêñ 17, 18- an êzdiyatî qewateke mezin û bi hêz bûye. Çawa niha hu-kumdar û sîyasetmendarê dewleta Tirke nijarperest, seva gelê Kurd dibêjin: “Xeterin ji bo yekparebûna...” usan jî wê demê hukumdaran êzdiyatî xeter didîtin li ser rîya erebkirin û ji holê rakirna gelê Kurd, pey ra jî ji bo yekparebûna dewleta Osman-yê.

Yekîtîya Êzdîyan jî çawe civakeke hevgirtî tune bû. Piştgirtin jî ji cîkî nedihat, Êzdî bi gêogirafî jî ji hev hatibûn parçekirin. Îlê wan li nav bera musulmanyê da ji hev dûr ketibûn, pevgirêdan tune bûn, rêvabirin jî ne li ser bilindaya xwe bû. Çawa niha usa jî wê demê dijmin nedihîst yekîtî çêbe. Ne Êzdî haj musulmanya rast hebûn, ne jî Kurdên musulman haj êzdîtaya rast.

...Û heta destpêka sedala 20-an, dema Împératorya Osmaniye ji hev bela bû, hilweşya, Êzdîyan da jî tişt nema bû, ku wan jî bikaribya, çawa oleke cuda, konfîransa Lozanê da, dewa mafekî bikira. Êzdî êdî qewat nî bûn. Yê revya bûne xerîbyê, yê ketibûne gundên çiyayen hasê û li nava zulm-zora musulmana da heyîtya xwe bi teherekî didomandin.

\*\*\*

Dibêjin 72 ferman li Êzdîyan rakirine. Kê ew qetleme, komkujî jimartine, hesav kirine, derheqa wan da nivîsîne? Çima heftê du ne hezar heftê du? Kê derheqa her fermanekê da bîranîn xweyî kirine, nizanim, tek wê zanim, ku her fermanekê zîyana nebînayî, ya mezin daye gelê Kurd, qewata gel şikêndîye, bêtifaqî û bêbawarî derheqa hev da dilê wan da xurt kirye. Di her fermanekî da gel xêncî undakirina mirovan, mal, milk, wêrankirina welatê xwe, usa jî morala xwe, gumana serxwebûna welêt, tifaq û yekîtîya xwe unda kirye...

*Ferman jî çîye? Ferman ( FITWA<sup>1</sup> ) qirarnivîsa kokbirya xelkekî ye ji alyê hukumdarê wê dewletê û oldarê wêyî payabilind da. Ferman mîaserkirin jî kokbirîye, qelandine bi qewl û qanûnên gênosidê. Fermanê radikin, ku koka evdên wî gelî, yan wê qebîlê, wî gundi, wê olê bînin, erf-edet, ziman, ol û çanda wî*

<sup>1</sup> Fitwa Miftî Ehmedê lawê Mistefa û...(12)

*li cihanê biqelînin, ci ku navê wan va girêdaye wêran bikin, bişewitînin, tunekin...*

*Bi hezaran evdên bi haşîsa olê, yan miletçîtiya sexte korbûyi, fanatîk, bi serokatîya mirovén xweyê meremên tarye ne paqîj, bi alîkarî û desteka hêzên dewletê, mîna lêya har, davêjine li ser gund û şêna, xelqê am-tam, yên bê sûc, li ber tu tiştî nasekinin, zarokan, kal û pîran, jin û mîran qir dîkin, şênan talan û wêran dîkin, dişewitînin, keç û bûkan bi destê zorê xwe ra dibin, yan difroşin, zîyaret û cîyêne wane pîroz diherimînin.*

*Ferman-qetlemên dijî Kurdên êzdî hatine kirin, mirov dikare bi çend şêwaya binirxîne :*

-Ferman-qetlemên, ku dema belakirina olên nû, ji alyê hukumdar û oldarêن dagerkir va hatine pêkanîn.

-Ferman-qetlemên, ku bi destêن hukumdar û oldarêن desthilatdar yên dewletên Êzdî di nav da jîtine hatine kirin.

-Ferman-qetlemên bi destê axa, beg, serekeşîr û oldarêن Kurdên musulman va hatine mîyaserkirin.

*Ebu Siûd El Îmadî. Navê wîyî kurdiyî esil Ehmed bûye. Lawê Mistefa, ji kurdê Amêdiyê. Sala 896- a (1472) ji dayîk bûye. 86 sala jîyaye. Li nav dewleta Osmanyê da gîhiştîye derecê pir bilind. Bûye Miftîyê Sultanê Osmanî :Sultan Qanûnî, paşê jî bûye miftîyê Sultan Slêmanê duyemîn. Hozan û şayîrekî naskirî navdarekî wê demê bûye.*

*Her kes bi emelê xwe tê bîranîn. Karê qenc bi şêkirandin, bi rem û xweşyê tê gotin, para xirava nifir û nelet in.. Bi gîlikî xwezya min li wî evdî, kê bi hizkirin û karê qenc tê bîranîn.*

*Dîrokê da ew bi fitwa û neyarîtya dijî Kurdên êzdî eyane. (13) Ewi fitwa (fermana) qirkirna Kurdên êzdî daye, yanê ji alyê musulmana va kuştina evdên Êzdî di ferzên ola İslâmê*

helal kirye. Fitwa wî da wa tê gotin : « Yê wan (Êzdiyan) bikuje xazî ye (şervanê dînê Islamê) (14), yê bi destê wan bê kuştin şihîd e ( Şihîd, yanê wê here buhuştê). Şerkirin dijî wan, cihad li ser wan mezintirîn cihad e û şehdeke hêja ye, ji bo ku ew (Êzdi) ji kafîra kafırtır in, kuştina wan her çar mesheba da ( henefi, qadirî, şefehî, hembelî) helal e. Cihad li ser wan ji îbabeta dînî jî xêrtire. Ji hev qetandina wan, pirt û belavkirin û kuştina wan û serokên wan, ji erkên olî ne ( ferzên dînî ). Di vê demê da hakim û welî gerekê destûrê didin xelqê û alîkar bin di şerê dijî wan (Êzdiyan) da. Xwedê xêra wan qebûl bike û wan ra alîkar be. » « Ji bo wan heq heye mîrêwan (Êzdiyan) bikujin, keç, pîrekê wan hêsîr bikin û li bazarên musulmana da wek hêsîrên hemû kafıran bifroşin. Herweha wan heq heye keç-bûk û jinêwan jî xwe ra bivin... »( 15 ) Eva perçekî biçûk e, ji wê qirarnivîsa qirkirna Kurdêñ êzdî bi destê mîftîyê kurdî « Xwedênas » hatîye nivîsar. Ez nizanim wî « oldarê gewre » xwedênasîye, axret-îmanê, di nav da jî ji ola xwe bawar kirye ? Dijwar ! Ew çi xwedênasîye, ku bi xûna evdêñ bê sûc-gune tê nivîsar û hîmê wê qirkirin, ji holê rakirin, talan kirin û hêsîrkirina evdêñ ne wê bawaryê ye...

Miftî şayîr bûye jî, ha ! Em zanîn, ku şayîrê esil, xweyê dil û hestêñ here paqîj, qenc, here nazik û here merivhiz in. Tu tişte vê fitwayê di xwedênasîye, meriv hizyê, olê û heqyê ra nîne. Eva berdrwama wê armanca dûr û dirêje, ku hela çend sedsal berê (dema êrîşen xelîfîn Ereban) dagerkirêñ Kurdistanê, yê civakî û ruhî, fikirî bûn, hazır kiribûn û xwe ra kiribûn armanc ku bi destê olê (ji bo destê şûr wan nikaribû) bikaribin gelê kurd parpar kin, ji bingeha wêye kevnar biqetînin, bêtifaq û bêrûmet kin, ziman lê bidine bîrkirin û bi destê kurda kurda ji holê rakin, li nav xwe da bîhelînin (çawa anîne li serê gelek netewan).

Ev nivîs (*fitwa*) ya miftî yan oldarekî sade û şexsekî nîne, usan jî fikira dîndarekî ji heşîşa olê korbûyi nîne, ew qirarnivî-

*sa dewleta Osmanyê ye bi destê mîstîyê wê dewletê, yê herî bilind, û bi eslê xwe va Kurd, hatîye nivîsîn. Ez bawar im, ku ev fitwa ya ewlin nîne, ji bo gelek komkujî û fermanên qrkirnê yêngiran berî wê jî li Kurdên êzdi rakirine. Pey ra jî gelek oldarêni bi eslê xwe kurd fitwê wa dane û bûne xweyêñ qirarnivîsên komkujyêñ dijî evdêñ Êzdi.(16) Ü çiye ecêv? Komkujiya Kurda bi destê Kurda dihate kirin. Ewqas büyarêni reşe bi zulm, Kurdan anye serê Kurda, ku aqara aqilê merivê normal da cî nabîn. Ji pey fitwê wa ra Kurdistanê da dest bi xûnrêtinê dibû. Kurd ji bo "axret-îmana xwe", ku herin Buhuştê, dinya ji hev ra dikirin doje, li hev digelibîn, Kurdistan ser û binî hev dibû. Bira li birê dibû dijmin. Heyîtya hev heram, kuştin û talan kirina hev helal kiribûn. Birayêñ Êzdi û Musulman şûr zikê hev ra dikirin. Erf edet, rê û rismêni miletyê, yê berê dihatin heramkirin, bîrkirin, zîyaret ocax û heykelên kevnar kavil dikirin, kitêb û nivîs dişewitandin. Tiştêni nû jî zû nediketn serê evdêñ sade.*

Nikaribûn zimanê roja "heşer-neşerê" fîrbûna. Çiqas jî duea-dirozgê nû bi zimanê nû bûn. zimanê Kurdiyî şîrin cîyê xwe nedida tu zimanî...

Diplomatê İnglîz A.H Layard êrîşa serokê Mûsilê Teyar paşa bi çevê xwe divîne û derheqa qadîkî "nîv Kurd" "da, ku ew jî" ji bo çûyîna buhuştê, çûbû şerê "kafîra" dinivîse. Dibê, dema leşkerên paşê êrîş dibirin li ser tebyê Êzdîyan, tebyê Êzdîyan pir qewî bûn, leşker pir dihatin kuştin û pir jî birîndar paşda vedikşyan. Dibê qadîk li nav leşker da hebû, ewî leşkera ra digot: "Netîrsin, ji mirinê netîrsin, şerkin, kê bê kuştin jî wê here buhuştê, kê wan bikuje jî wê here buhuştê. "Layard dinivîse, ku wî digot, xwe jî ji gotina xwe bawar nedikir. Him digot, him jî xwe davîte pij zinaran, vedişart, ku neyê kuştin.

Usane wan oldaran ji bo kara xwe xelqê cahil dixapandin, dişandine kuştinê, xwe jî bi mal û milk, talanê Êzdîyan zengîn dibûn. (16-a)

Di dema Şêx Hesen da Êzdî pir bi hêz bûn. Nav û dengê Şêx Hesen temamya Rojhilatê bela bûbû. Mîrgeha wî pir berfire bû. Gelek qewl-qanûnên hiqûqî û civakî yê bi nirx mîrgeha xwe da wî da qebûlkirin, der dorê xwe va hîmê dewlefîyê datanî. Tirsa, ku mîrgeha Êzdîyan kare bigîhîje serxwebûna xwe, der-dorêñ ereb ketine nava fikaran û hewildanan. Rabûn, cudadîya olê kirine mehne, ku wê mîrgehê bişkênin û ji serokê wanî bi aqil xilazbin. Serokbajarê Mûsilê Bedredîn Lûlû du fermanên (ê-rişen) mezin birin li ser mîrgeha Şêxan. Yek di sala 644 (sedsala donzdah, zayînê). Di vî şerî da Şêx Hesen digrin û davêjine zindana bajarê Mûsilê, paşê dixeniqînin. Cara dudan, çawa Îbin Al-Fûtî di kitêba xwe « Al hewaditih al-camîca wêal-tecarîb al-neftiaê fi al-mîa al-sabîca » da dînivîse: Bedredîn Lûlû li sala 652 an (1254-ê zayîn) êrîş bir ser Êzdîyan, gîhişte Lalişê, gora Şîxadî kola, hestûyê wî derxist, şewitand. (17)

Di sala 817 da, weke ku di pirtûka “El-Sîlûk lî marîfat dîwal el mekûk » ya nivîskar Meqrîzî da hatîye nivîsar, li çiyayê He-karî, li welatê Kurdan, li Lalişê Mele Yûsûf Helwanê şafî destûra kuştina êzdîyan yan Fitwa dabû û dîsa gora (mezelê) Şîxadî vekirin, hestûyê ku ji ber qetila Bedredîn Lûlû mabûn şewitandin. Hinek mîrên Kurden musulman êrîş birine ser cî û warêñ êzdîyan, pir evd kuştin, welatê wan wêran kirin.(18)

Berî wê demê ji ferma here mezin di zemanê Mîr Ceferê Desinî da li Êzdîyan rakirine. (Wê dewrê navê êzdîyatîyê hindava musulmanyê da usa hatibû heramkirin, ku navê êzdîtîyê nedigotin, Êzdîya ra digotin Desinî). Salê 225-226- ên hicrî, Xelîfî Abasîyan Muhtesîm, lawê Harûn Reşîdê Ereb, du cara, bi leşkerê giran, tê ser Ezdîyan lê tê şkînandin û paşda diçe. Cara sisyan bi serokatîya Eytaxê Türkmen ordîke Tirka va tê. Leşkerên wî Êzdîyan dişkênin, gund-warêñ wan talan dikin, dişewitînin, xelqê qir dikin. Mîr Cefer, ku nekeve destê wan, jerê duxwe û xwe dukuje. Eyntaxê Türkmen 10 hezar malê

êzdiyan sîrgûnî Tîkrêt, li rex bajarê Bexdayê dike. Eger serê malê 7 nefer jî bêñ hesavkirin, usane tek fermanekê da xêncî bi deha hezara kuştîyan, 70 hezar Kurd jî koçber kirine, ji welatê wan derxistine, li nav Ereba da helandine. Ev şera ewqas dijwar û xûnrêj bûye, ku dîroknivîsê erek wê hesav dikin yek ji şes destanînên hukumdarîya Al-Muhtesîm. ( 19)

Fermanekê pir xûnrêj û jan bûye, ku destpêka sedsala 19-an Mîrê Sorana: Mîr Mehmed (Mîrê Kor ) bi fitwa Mele Xatî li Êzdiyan rakir. Ewî Mîrê Êzdiyan: Elî begê ewlin hêşîr girt, paşê darda kir, 10 000-î zêdetir keç-bûkêñ cîwan bi destê zorê bir û da Beg-axayêñ Mûsil û Erbîlê yên Ereb û Kurdêñ musulman. Gilî dikin, ku tenê li gundê Xetarê 500 evdê Êzdî kuştine û kiri-ne gorekê. (20)

Dîplomatê dewleta Înglis: A.H.Layard, kitêba xwe ya bi ser-nivîsa “Auf dêr Suche nach Nînove,sêite” da dnivîse, ku wê damê sê êrîşê giran (Eîî paşa, Hefiz paşa, Mehmed paşa) çûne li ser Êzdiyan Şêxan û Şengalê. Ji çar Êzdiyan sisê kuştin. Paşayn, ku dihatine wura (Mûsilê) bi xwestina xwe jî ,bêy fermana de-wletê, karibûn êrîşê bibiraina li ser Êzdiyan.(20-a)

Gelek paşa û hukumdarان bi serê xwe fermanê qirkirinê li Êzdiya radikirin ji bo talêñ û zengînbûnê. Çawa me berê jî got, Layard bi xwe besdarî êrîşa Teyar paşayê Mûsilê dibe li ser Êzdiyan çiyayê Şengalê û we'sîtya Ereban û musulmanen din li ser Êzdiyan dimeşandin, bi çevê xwe divîne. Dinivîse: “Deng dihatine min, ku bi zêr û hebûna Êzdiyan Teyar paşa pir zengîn bûbû, ji bo dema qirkirina Êzdiyan hebûna wan payê pirê digî-hîste pasê, hindik jî leşkeran.”

Dîpomatê Înglis, nivîsara xwe da, bi dayîna dîdemêkî di dema şer, rastya fermana, hovîtî û we'sîtya wan “Xazyê” musulman, ku bi kêf diçin “Kafira” ji bo “Xwedênsaya “xwe qirkin û herine “Buhuştê” tîne li ber çavan.

Gundekî Êzdîya yê vala dikeve destê wan. Kal-pîr, zarokên ku nikarbûne birevin, xwe mala da veşartibûn, giska derdixin, tînine nava gund, dikujin, pasê serê wan jê dikin, singoyê tivin ga va dikin, agir berî gund didin û temamya şevê bi wan seryê jêkirî şâ dibin, kêf dikin, direqisin. Nivîskar dibê, min fem nedikir, gişk kuştin, kuştin, lê çîma serê wan jê kirin, ew çi şabûn bû? Dibê, ez jî ji wan ditirsyam û min saw dikşand, ku dikarin wê yekê bînin serê min jî...(20-b)

Sala 1891- ê Firîq paşa ( Navê wîyî esil Emer Wehbî paşa bûye, bi eslê xwe va kurd e, ji bajarê Silêmanyê) erîsheke pir dijwar dibe li ser Êzdîyêng Şengal û Şêxanê. Tawisa û nîşanên êzdîtiyê, yê pîroz bi zorê ji wan distîne, talan dike, Lalişê Nûranî dike medresa Islamî. Bi şûr dixweze Êzdîyan biqulibîne. Xelqê deştê teslîm dibin, lê yê çîya şer dikin.

Gilî digîhîje konsûlên Firans, İnglîz, Rûsa. Di bin hukumê diplomasyayê da, dewleta Osmanîyê ji xwestina xwe paşa vedikşe û dîsa Lalişê didine Êzdîyan.(21)

Evan, min çâ nimûne, çend demên dîrokî, yê bi keder bîr a-nîn. Demên we yê xûnrêj li nava dîroka kurda da pirin. Bawarkî sal tune bûye ku li Kurdên êzdî komkujîyek çê nekiribin. (22)

Gilî dikin, ku dema fermana, yênu ku ji qir-birê serê xwe xilas dikirin, direvyane çîya û diketine şikefta, leşker û fanatîkên olperest, diketin li pey wan, ber derê şikefta tije sergîn û êzingê şîl dikirin, agir berdidanê, bi dû xelq gişk tê da difetisandin.(23)

Şedê wan bûyara,dîplomatê înglis Layard dinivîse,ku paşayêng Bexdayê û Mûsilê xwe ra kiribûn xeyset salê carekê-duda bavêjin li ser Êzdîyan.

Kal-pîr, jin-zarok, nexweş dikirine hundur mereka, derî dadian agir berdidanê gişk tê da dişewitandin. Şûr zikê jinê hemle ra dikirin, zarok li serê şûr va derxistin. Zarokên biçûk cêrgê didane sekinandin, şert digirtin, çıka bi şûr kê kare carekê va serê çenda bifirîne, yan bi fişkekeke tivingê kare çenda bikuje.

Êzdîyan jî ew zulm hêsanî qebûl nekirine. Wan jî dijî wê zulmê, zulma xwe danîne. Çi ji destê wan hatîye wan jî kirye. Wan jî kuştine, wêran kirine, şewitandine. Evdên, ku qetlemê da milk, mal, neferê xwe unda ke, bêyî xwestina xwe dibe gur, bi kîn û neyartî kare zulmên here mezin bike.

Heta niha jî ji alyê musulmana va her keçek yan pîrekeke Êzdî (zorê yan bi rezadilî) birin dibe tiragêdike hemêzdîtîyêye mezin. Êzdî dikevne pey wan, heta herda ji nav xwe dernexin yan nekujin hêsa nebin. Dîrokê da mesele pirin, ku li ser jinekê Kurdên êzdî û musulman qira hev anîne.

Ev xwyset tenê yê Êzdiyan nîne. Kurdên musulman jî, eger xort musulman nebe, keçê nadine Êzdiyan û heta roja îro jî seva bûyarê usa lê ne dinyayê ser Êzdiya da hilşînin.

\*\*\*

Lêkolînvan û zanyarêن derheqa Êzdiyan da nivîsîne, dema besa fermanêن li ser Êzdiyan dîkin, hîmlî seva fermanêن ser Welatşêx (dora Lalişê) û Şengalê ji bîr tînin. Helbet ew herem cîyê hec û zîyareta Êzdiyan bûne, merkeza rîvabirina wane olî û civakî. Neyarê êzdiyatîyê, berê ewlin xwestine wê merkezê kokbir kin. Ku bi jêkirina sêrî dewyê wê ola kevnar bînin. Herem nêzîkî Ereba bûye, wana jî bi kîn û neyartyê timê ajotine ser wê heremê, ku li wur bivine xweyî. Ew herem rastî jî navbera wan û Kurdistanê da mîna derikî, sûrekê bûye. Hedimandina wî deri, wê sûrê wan ra timê pir pêwîst bûye ji bo ne ku tenê musulmankirin lê erebkirina Kurdistanê.

Ew armanc wan ra çiqas li hev hatye li ber çevane. Êzdî mîna zinarekî li ber pozê wan da mane û niha jî bo bigihîjne wan armancêن xwe dixwezin Êzdiyan ji koka wê ya kurdeyatyê bi-qetînin, dibêjin: Êzdî kurd nînin, êzdî erebin.

Menîke din jî ewe ku çevkanyêن nivîskî derheqa wan qetlamên li ser Şêxan û Şengalê da hatine xweyîkirin, lê derheqa,

ferman, qetirmê li ser wan civak û êlên Êzdîyan, yê li heremê Kurdistanêye din pir kêm hatye nivîsar û xweyîkirin. Ji bo wê yekê jî melûmetî û delîlên derheqê wan qetlema da gelekî kêm gîhîstine me.

Ez wan dîroknas û lêkolînvana ra ne qayîlim, ku cî û warêن Kurdêن êzdî, welatê wan, cîyê koka wan Welatşêx û çiyayê Şenglê dihesibînin. Welatên Kurdêن êzdî temamya Kurdistan bûye. Êzdî peyhatyêن kevnarêن Mêzopotanyaê ne. Rast e, li nava dewrana da pir tişt hatye guhestin. Êzdîyatî li ber ba û bobelûskêن dewranan yê dijware xezev helya ne, maşa ne, ji cîkî koçberî cîkî din bûne, hêdî-hêdî civakê wan bûne mîna giravê (adê) biçûk û mezin li nava derya (be'ra) musulmanyê da, lê tim li ser vî erdî bûne, kîjanê ra dibêjin Kurdistan.

Vê lêkolînê da emê hûr gilî li ser fermanêن li ser Êzdîyêن Xalta, komkujiya herd gundêن Dela, şerê Erenzê-Ridiwanê, bûyarêن Mîrê kela Ridiwanê Mîrzkê Zaza û berxwedana wî va girêdayîne rawestin. Usa jî emê hewl bidin derheqa dîrok, cî û warêن hinek êl û eşîrên Êzdîyan, yên din destnîşankin, ku bûyarêن vê lêkolînê va girêdayîne û halê wanî civakî, aborî, olî li nava dewleta Osmanyê da di destpêka sedsala 19-an da, bînin li ber çavan. Wê usa jî bê analîzkirin helaqetî û pêwendîyêن Kurdêن êzdî tev dewleta Rûs, mena koçberya wan berbi wê dewletê.

Ji tunebûna xwendin-nivîsarê delîlên nivîskî derheqa hesav, cî, war, êl, eşîr, jîyana Êzdîyan da di sedsalêن derbazbûyî pir kêm gîhîstîye destê me. Lê bi melûmetyêن heyî jî, meriv kare bêje, ku heta nîvê sedsala 19-an jî Kurdistanê da Kurdêن li ser dînê xweyî kevnar pir bûne.

Şerefhanê Bîtlîsi Şerefnemê da, vir 400 sal berê di derheqa Êzdîyan da wa dinivîse: « ... hinek eşîret û qebîlên kurdan, ku ketine alyê Mûsl û Samê, yên wekî : Desinî, Xaldî, Besyanî û birek jî Mehmedî û Dûmbûlyan Êzdîne... ». (24) Dîroknivîs

gava derheqa fermandarya Cizîrê da dinivîse wa dibêje : «... di destpêkê da kesên vê xanedana hê...li ser rêça dînê êzdiyatîyê dimeşyan. » (25) Dinivîse, ku ji hevt eşîrên nehya Gorgîlê, çî-yayê Cûdî, sisê Êzdî ne: Newdkawun, Şoreş û Hîwdil...(26)

Pişkê duyemînî Şerefnamê da ( berperê sisyan, beşa nehan) derheqa begên Desinya da ne). Gelo dîroknivîs ev beşa nenivîsiye ? Yan paşê unda bûye ? Çima xût ew beş unda bûye? Yan hinek oldarêñ fanatîk ew beş navê derxistine? (E.B.)

Eger ew hebûna, derheqa Êzdîyan da wê melûmetyên hêja bigîhiştana destê me.

**Şerefnamê** da navê gelek êl, eşîr, qebîlêñ Kurdan têñ gotin, li vê demê da jî ji wan nava hineka li nav Êzdîya da hatine xwe-yîkirin. Heta eşîra wî dîrokzanê mezin, ku tê navkirin Rojkanî, niha jî li nav Êzdîyêñ Ermenistanê da heye. Ez bawarim, dema wî da, li mîrgeha Bitlisê, serokê kîjanê malbeta wan bû Rojkan-ye bi bawarya êzdiyatîyê hebûne... Bi texmîna me dîroknivîs nexwstîye wê derheqê da binivîse, ku koka xweye Êzdî dîhar bike.

Dîroknivîsê Kurdî bi nav û deng Mele Mehmûdê Bayazêdi (sedsala 19-an ) dinivîse: "Jimara teyfa Êzdîyan gelekî pire. Eşîrên wanî li wîlayêta Bayêzîdê evin: Husêni, Şasakî, Çux-reşî, Kele-sorî, Kele-reşî, Huwêdî, Sixayîlî, Kilêrî, Remoşî, Qazanî û Desinî. Li wîlayêtê Wanê û Mehmûdiyê ev êlên Êzdîyan dijîn: Beravî, Reşî, Şendakî, Başamî,, Sanda-sorî, Kurtakî, Darkazinî, Botekî, Hurî; li Mûşê û Bedlîsê ev teyfîn Êzdîyan dijîn: Çekoyî, Avokî, Akusînî, Bellî..."(27)

" Ji bil van terefîn Êzdîyan yê me gotin, êlên Êzdîya jî hene, nêzîkî 15 hezar malî ne, navbera Mûsil û Cizîrê, di çiyayê Şengalê da dijîn, bêtirî 300 şenî û gundêñ wan li wura hene. Wana demek dirêj serê xwe danedixistin, lê dewî (?) tesmîl bûn. Pîr, şex û qewalêñ Êzdîyan her wusa hakimên wan jî hemû bi eslê xwe ji çiyayê Şengalê ne."(28)

Helbet, ez ne fikira dîrokzanê navdar, ya dewyê ra me, ji bo ne hemû pîr, şêx û hakimên Êzdîyan bi eslê xwe ji Şengalê ne.

Ji vê nivîsara wî devedevî 150 salî derbaz bûye. Ji wan qebî-lênen jorgotî, niha payê pirê li ser bawarya Êzdiyatîyê nînin. Eva tek li nava 150 sala da. Lî di nava hezaran sala da çi qewimye?

Nivîskarê Kurdî naskirî Ahmed Aras pirtûka xwe ya lêkolînê Evdalê Zeynikê da bîranîna Mehmedê Qanciyî 76 salî (1992 ew bîranîn nivîsyê) tîne derheqa kilama dengbêje bi navê **xozanê** da . Bîranînê da wa tê gotin: “ Di kilma **xozanê** da navê Qeymezê Êzdî tê gotin. Qwymezê Êzdî ji êzdiyênen Întapê bûye û mirovekî jêhaflî, mîrxas bûye.”

“Întap wê çaxê Êzdîxane bûye. Pêşyê wan Sîpka jî Êzdîne. Gundêñ Întabê Dêrik, Xanik, Esmer, Melle Şemdin, Tetika, Bedborya û çend hebêñ din, gundêñ Êzdîya bûne.” ( 29 )

Anegorî Tezakîrê, ya nivîskarê Osmanî Ahmet Cevdet paşa, şerê Xozan daxê di sala 1865-a bûye. Usana wê demê payê êla Sîpkaye pirê, ew êla kevne mezin hela li ser ola êzdiyatîyê bûye û sîyarê wan tev qewatêñ Surmelî Memed paşê tevî şerê Xozanê bûne, Evdalê Zeynikê jî kilameke nemir li ser mîranya Qeymezê Êzdî hûnandîye.(30 )

Pey ra ev êl tîş dibe, dibe du perça. Malmezina wan, malbeta axê perçekê va diqlibin li ser bawarya musulmanyê, xwe disperne dewleta Osmanyê û bi hêlandayînê dewletê, bira-kurapêñ xweye li ser bawarya kevn têne xezevê. Çawa nivîskarê kurdî bi nav û deng, eslê xwe da Sîpkîyê êzdî, Hecîyê Cindî romana xwe, ya bi navê Hewarî da dinivîse, ku qewm-pismamêñ berê hev temûl nakin, dikevne qırka hev, hev dibin neyar. Yêñ, ku berê li şîn-şayê hev bûn, serê xwe li ber hev da didan, nav û nanê hev heram dikin, heta xera bavê hev jî naxwin, dibin dîn dijmin, gîlî digîhîje qirkirinê.

Êzdiyênen Sîpkî dinhêrin wura êdî jîyan nabe, qetlyamê çêbe, direvine Qersê, kîjan wê demê li bin hukumê Rûsa da bûye.(31)

Lêkolîn û melûmetyan em anîne wê bawaryê, ku heta dest-pêka sedsala 19-an, li nav Mergehên kurdan yê serbixwe û nîv-serbixwe da yên Kurdên êzdî jî pir bûne, bi êl û eşîrên mezin û biçûk li welatê kal-bavêن xw da jîtine.

Wê demê hukumdarî Kurdistanê da, hîmlî dest Mezinê Mîrgehan û beglikêan da bûne.

Kovara Ermenya ya : « Azgagirakan handês » (Kovara êtno-girafi), ku li bajarê Tilbîsê neşir dibû, wa dinivîsi : « Raste, Kurd di bin hukumdarya Tirkan û Îranê danin, lê rêvabirin, serkarîkin destê serokeşîra da ne. Her serokeşîr xweyî-xudanê êla xwe ye, hukumdar û hakimê wê ye. Xerc – xerac ew ji nav xelqê berev dike, çap û cûrê wî xercî ew qirar dike. Paşê hinekî jê dide dewletê. » ( 32 )

Destpêka sedsala 19-an, seva Împératorya Osmanyê salnen zeyîfbûnê (lewaz bûn) û hilweşînê bûn. Ewî halî Mergehên Kurdan ra mecal çê kirin, ku hukumên xwe qewîntir bikin, hidûdên xwe mezin û fire bikin. Hinek ji wan, yê wek Mîrgeha Soran li Rewardûzê, ya Botan li Cizîrê usa xurt bûn, êdî rabûne şerkaryê ji bo serxwebûna Kurdistanê. Heta diravê xwe jî wan ji dewleta Osmanyê başqe kirin.(34)

Généralê Alman Hêlmût von Motkê, ku wan salan li nav ar-têşa Osmanyê da çawa şêwrdar û zanyarê leşkeryê qulix dikir, dinivîse, ku di destê serekeşîrên Kurda da li ser êl û eşîran hukmê mezin heye, dewletê ra hesav rûnanên, xerc-xraca nadîn, leşker nadîn...( 35 )

Dewleta Osmanyê çiqas jî hewil da li nav wan sala da bi rî-forman xwe rastke, hukumê xwe qewîke, nehata standin. Şerê dijî Rûsa jî ew zeyîftir dikir, ji hal dêxist.

Meremê dewletê yê sereke ew bû, ku dewyê hukumdarya Mîrgehên Kurda bîne, qewata wan bişkêne, ji hev bela bike û gişka bike bin hukmê xwe. Civaka Kurda jî civakeke fêodal bû, hevgirtî nî bû, hevra tim li nava nakokya, şer û dewa da bûn.

Dewsa bikevin li pey armancê xwe yê sereke, yekîtî û tifaqa navxweyî çêkin, pismam û dostan bivînin, pirsgirêkên mîletyê çaresekin, diketine li pey kara şexsî, qebîlî, pirsgirêkên navxweyî yê hûr. Kesî « kulavê xwe » bin kesî ra nedikir, bi dijminatya olê nêzîkî evdêne ne musulman dibûn.(36)

Ev yeka anegorî xwestina dewletê bû û dewletê jî bi zanebûn nakokyên navbera êl û eşîrên Kurda da gur dikir, xasma dijîtya olê bi hostatî dida xebatê, ku bi destê Kurda qewata Kurda bişkêne.

Quluxçiyê leşkeryê yê Rûs li Stembolê A.S.Zêlênoy wa dinivise : «..hukumat jî bo xwe parastinê, dijminatya olî geş dike, musulmnan û xaçparêzan dijî hev derdixe. Şerê dijî hukumatê dibe şerê olê... » (37)

Lêkolîn didine kivşê, ku xût wan salan him alyê dewleta Osmanyê, him jî bi destê serekeşîr û oldarêne kurdê fanatîk derbine pir giran gîhiştine Kurdêne êzdî.

Ça me berê jî got, şerekî herî xûnrêj û zulm êrişa Mîrê Kora (Mehmed paşa), serokê Mergeha Soran bû, sala 1831-ê, li ser Êzdîyan. Bi hezaran Êzdî hatine kuştin, 10 hezar hêsîr kirin. Elî Begê Mîrê Şêxa girtin birine Rêwandûzê. Xwestin mecbûr kin, ku dînê xwe biguheze, musulman be. Elî Beg xwestina wan qebûl nekir, darda kirin. Sê roja laşê wî dardakirî li ser pira Rêwandûzê ma. Bi seda keç, bûk û jinêne Êzdîyan hêsîr kirin, birin pêşkêşî giregirêne Ereb û Kurdêne musulman kirin. Şerekî dil bi êş navbera Jina Mîr Elî beg û Mîrê kora da dest pê bû.(37-a)

Derheqa wê komkjîya reş da pir hatye gotin. Ev bûyar deqeke dîroka me, ya here qilêr e navê serokekî Kurdayî azadaryê yê herî mezin va girêdayî...

Çiqas jî xeta Elî beg hebû, mafê Mîrê Rêwandûzê tune bû, êrişê bive li ser evdêne bê sûc, bi seda hezara evda qirke, gund û

şenan wêranke, zarok, kal û pîran bikuje. Elî beg xeta kiribû bira wî jî cezayê xeta xwe bikşanda.

Ji pey şerê dijî Rûsa ra Ordîya Osmanyê ya giran bi serokya Reşîd paşa êrîş bire ser Kurdistanê. Gund û bajar wêran bûn, bi sedan hezar evd bi hovîtî hatin qetilkirin. Xelayê, nexweşya, komkujîya welat dane ber xwe. Reşîd paşa, ji pey wî ra jî Hefiz paşa qetilê usaye weşîti Kurdistanê da kîrin, ku hişê Weşa ra jî, kirina zulma usan, derbaz nabe.

« Di şerekî sala 1838-a, meha şeşan da, li çiyayê Xerzan şe-  
sid kurdî xwe li pişt girekî da parastibûn. Evan heta xwûna xwe  
ya dewî şerê xwe kîrin. Pêncî jinan, ku hêşîr nekevin destê os-  
manyan, xwe di zinar da avîtin û li nav avê da xeniqîn. Bi heza-  
ran jin û zarok bi xencerên (singoyê) serê tivingên leşkeran  
xedar birîndar bû bûn »-şedê wan bûyara Hêlmût Von Motkê,  
ku wek şîretkar û zanyarê leşkerî Hefiz paşa ra digerya, dini-  
vîse. (38 )

Halê herî xirav, halê Kurdên êzdî bû, ji bo ew him alyê de-  
wletê, him jî ji alyê Kurdên musliman va dihatine qirê.

« Dîsa di dema şerê Xerzan da, dema Êzdîyan li dijî leşkerên  
me şer dikirin ez çûme cem Hefiz paşa. Ewî xwe dabû li serê  
girekî û şerî mêze dikir. Leşkerên wî gelek jin, mîr û evdên hemû  
yaşan hêşîr girtibûn. Leşkerên serî û guhê ( yê Êzdîyan)  
jêkirî tanîn 50 heta 100 quruş bexşîş zêde distandin. Ew hewar,  
gazî û qîrînên jinê kurd, waneyên gelekî dilşewat bûn... » (39)

« Tirka digotin ji ber Êzdî „Melekê neqenc“ dihebînin, ew  
karin wan wek kole bikirin, bifrişin...» ( 40 )

Rojnema Kovkas, ku li bajarê Tilbîsê, bi zimanê Rûsî dihat  
weşendin, sala 1848-a gotarekê di derheqa Êzdîyan da çap dike,  
wa dinivîse: “Bi dewî Împératorya Osmanîyê ra li hev hat serx-  
webûna wan qebîlan, xazma ya Kurdan û Êzdîyan batmîş bike.  
Pareke ji hinekan lap qelyan, bel-belayî bûn, para din jî tesmîlî

hukumata Tirk bû. Qedera xiravtir yên dewî ra ket, ji bo mecbûr bûn ji bîr û bawaryên xwe dest bikşînin... Geleka serê xwe dane seva dînê kal-bavan, yê din mecbûr musulmanî hildan û xilaz bûn. Tek hindikan serê xwe xilaz kirin, revyane Îranê, welatê Bakûr-rojhilata Tirkyayê û Ermenistana Rûsyayê, kîderê li bin qanûn-qirarê Rûsyayê yê reme, due'akirî da, li nav aramyê û aşîtyê da, bi cûrekî aza û serbest dînê xwe dihebînin.“ (41)

Derheqa êrişa Reşît pasa da têkista kilamekê bi zimanê ermenî hatye xweyîkirin. Ew tê navkirin Kilama êzdîya. Ev kilam, nîvê sedsala 19-an, alyê X. Abovyan da ji dengbêjekî Kurdenê êzdî hatye nivîsar, heyf, têksta wê ya kurdî ne maye, ya ermenî jî bi kurdî welgerandin eve : (41-a)

*Ji Stembolê ferman hat,  
Kulma îslamê gelek giran bûye.  
Eskerê Reşît paşa lawkê min bire ordiyê,  
Wey li min, ewî ewqas gênc bû,  
Çaxê çevê min ew dît, dilê min teqya...*

*Ez çûme bal xweyê xwe,  
Welatê Golê, jê hîvî kir, gune min bîne,  
Ewî hîvî-reca min qebûl nekir.  
Ordiya Reşît paşa bal çêm hêwirîye,  
Cesûs nikaribûn biçûna wî berî.  
Min besek stend.  
Bal çiyayê Şengalê teslîm bûbûn.  
Xanimekê xwe xemilandibû,  
Qerefîl pozê pîjîn va kiribû,  
Lawkê min birin eskeryê.  
Ewî ramûsanek jî min xwest,  
Lê min nedayê û nizam kê ra dihêvişînim.*

*Were, dem û heyam ê mene,  
Kara Xezala li deşta Dîyarbekirê  
Pala xwe daye girê bi gîha.  
Zilamê kawî-kubar li deşta Dîyarbekirê  
Bin kon da lezeta hênkaya siyê dibînin.  
Ba li wane kurîşk dixe, dihejîne.*

*Lawkê kawe-kubar şil bûne,  
Qey bêjî barana gulanê ya.  
Bejna te nazike dara çînarê,  
Çevê teye reşin, reşbelekin.*

*Porê wan lawkê kawe kurîşk,  
Tê qey bêjî şirîte konê Temir paşa ne,  
E'wilê payîzê em sitar bûn  
Üji Araratê derketin, daketin deştê...*

Kilamê da tê gotin, ku ji Stembolê, yanê ji Sultan ferman hatye, kulma îslamê gelekî giran bûye, usane zulm û zora li ser Êzdiyan dijwar bûye. Him ferмана Êzdiyan hatye rkirin, him ji xorta dibine leşkerya Osmanye. Fermanên Sitembolê û îslamê mîna kulma giran temamya Êzdiyan dane li ber xwe, ji pala çiyayê Araratê girtî heta Dîyarbekirê û Sengalê...

Malka dewyê, herd rêsên axrîyê da tê xuyakirin, ku ew êl, (navê êlê kilamê da tune) heta payîza dereng çiyayê Araratê da sitar bûye, paşê, dereng daketine deştê. Usane, qezyak, zulm û zorîk dijî wan hebûye, ku xwe çiyê da parastine û dereng peyayî deşta Araratê bûne.

Vira da navê Temir paşa jî derbaz dibe, gelo ew navê Temir paşa-yê wî paşayê Mûsilê nîne, kîjan bi êrîşê xweye dijî Êzdiyêن Şengalê dîrokê da eyane û be'sa kîjaînî A. Layard kitêba xwe da dike. (40-b)

Bi rastî jî li nava wan salêñ dijwar da, gelek qetlemêñ biçûk û mezin li Êzdîyan hatine rakirin, û li nav wê hel-belê da, ku dagerkir Kurdistanê da çê kiribû, Êzdîyan zîyaneke pir mazin kişandin... Qetlema herd gundê Êzdîyan: Dela, Şerê Erezê û Ridiwanê, qetlema li ser êla Şêx Mîrzayê : êla Anqosya, qetlema Mîrê Kora, ya Bedirxana, êrîşen paşayêñ Bexdayê û Mûsilê û gelekên din. Derheqa hinekan da, xêncî çirokêñ nîvbîrkirî , yên bi zar tu melûmetî negîhiştine me.

Rîspîkî ji êla Zuqurya, kurapê Changîr axê (binhêr rûpel ) Evdoyê Miho, sala 1985-an, wê demê ew devedevî 90 salî hebû, li gundê Hemzelûyê, nehya Masîsê, Ermenistanê da dima, min ra wa gilî kir: „Min ji pêşya bihîstîye, digotin êla me, ji alyê Dîyarbekir-Cizîrê hatine. Wê demê Êzdî li wê heremê pir bûne. Wextekî şer çê dibe. Roma reş û musulmanî davêjine li ser Êzdîyan. Fermanan li Êzdîyan radikin. Ëla me jî tê qirê, yê mayî jî yêr û warê kal –bavan dihêlin, direvne li ser hidûdêñ Ecem, deşta Ebexê da cî dîbin...“

Bi texmîna wî û jimartina bavika em hatine li ser wê fikirê, ku êla wan navbera salêñ 1825-1835 an da revyane deşta Ebexê, navbera gola Wanê û hidûdê Ïranê.

Ji kîjan heremê revî bûn, kê avîtibû ser wan, şer çawa bûbû, nedihate bîra wî.

Salêñ 1835-1855-an ji gelek heremê Kurdistanê Êzdîyn ji ferman,qir-bir, şer û zêrandina xilazbûyî direvine Ermenistana Rojava û li wur,berpala çiyayê Elegezê (alyê bakûr) xwe ra sêzdeh gunda ava dikin. Gund evin: Mîreka Mezin, Mîreka Biçûk, Qundexsaz, Qurubxaz, Korbilax, Cercerîs, Camûşvana Mezim, Camûşvana Biçûk, Pampa Kurda, Çobangermes, Senger, Karvansere û Gozelderâ Kurda.\*Ev gundan nêzîkî hevin. Navbera wan da rîya 2-3 km. a ye.

Wan sala dîsa gundekî Êzdîya jî alyê çiyayê Elegezê yê Başûr rojhilat ava bûye, kîjan weke 70-80 km ji gundê jorgotî dûrtire. Navê gund Baysize.(42)

Lêkolînên meye bi salan nav wan gunda da nîşan dan, ku ew xelqa ji cîkî û bi carekê va koçberî wur nebûne. Koçberya wan bawarkî 15-20 sala domandîye. Nav wan da bi deha qebîl hene, carna cudatya zarav jî li nav wan da tê kivşê, ew jî nîşan dide, ku koka her qebîlekê ji deverike Kurdistanê tê. Li wan gunda da ev qebîlin: Bela ( sê gundin Qundexsaz, Qurubxaz, Çoban-germez), Mehemedîya (Mîrek ), Rojkanya, Serwana (Karvanse-re, Senger), Şerqîya, Sîpka (Korbilax), Pîvazyâ, Gerdenzerya (Cercerîs), Çuxreşya (Camûşvana Biçûk), Sîpka (Camûşvana Mezin, Pampa Kurda). Her usa jî li van gundan Stûrkîya, Anqo-sîya, Belekera, Bûdka, Ortilya, Berava, Desinya dijîn. Şêx û Pîr jî yê her terefekê hene.(43)

Berî teva, Axelera, Mala Kok axa hatine û gundê Mîrekê ava kirine. Melûmetyê dîrokî didine kivşê, ku ev êla, êleke Êzdîya ya pir mezin bûye (êla Çoban Axa) li ser hidûdê Osmanyê û Îranê. Dewya sedsala 18-an da, padşayêñ Gurca û Rûsa tev wî pêwendî danîne ji bo hevkaryê dijî dewleta Osmanyê. Dokû-mêntan da tê gotin, ku êla wî mezin û qewat bûye.

Paşê, bi gotina gotya, hinek Kurdên Musulman, keçekte vê malê bi navê Zerîfxanê direvînin. Ser wê yekê Kurdên êzdi û musulman dikevne qırka hev. Dewlet jî, ku qewata wê êlê bişkêne piştgirya Kurdên musulman dike. Dewa civakî weldigere, dibe şerê dînî. Koka wê êla Êzdîyan tê. Yê mayî direvin Îranê. Îran jî gelek mîrê vê malê dike hebsa, ceza dide wan, darda dike. Ji êla mezin çend malê axlera dimînin, ew jî dire-vine Ermenistana Rûsyayê, gundê Mîrekê ava dikin. Pey Axele-ra ra qebîla Bela tene wê heremê. ( Bela xwera dibêjin Xaltî. )

Derheqa koçberya van êla da melûmetîyêñ nivîsar bawarkî ne mane, bîranîn jî pir kêmîn.

Tiştê tomerî ewe, ku dibêjin Roma reş (dewleta Osmanyê) li pêşyên wan hatye xezevê, musulmanyê jî ew qir kirine, ji bo wê jî revyane welatê Rûs: welatê « Sarî Moskov. »

Di wan sala da gelek bermayên êlên Êzdîya yen mezin û biçûk ji qira reş û sîpî xilaz bûne, revya ne usa jî ber bi Welat Şêx û Şengalê.

## PÊWENDYÊN KURDÊN ÊZDÎ DI DEWLETA RÛS RA

(Dewya sedsala 18-an û despêka sedsala 19-an)

Di destpêka sedsala 19-an da gelek heremên Ptşkavkazê (Gûrcistan, Azeyrbêcan, Ermenistan ) ketne li nav Îpératorya Rûsyayê. Hidûdên wê dewletê nezîkî Kurdistanê jî bûn. Nenihêrî wê yekê, ku Rûsyayê jî siyasya dagerkirinê û kolonalîstîyê dimeşand, lê bi heqî ji alyê kultûrî, aborî, usan jî di parasina hinek mafêñ gelên bindest da pêş bû. Qirar û qanêñ wê jî ji yê diktator û desthilatdarên Osmanyê û Îranê dêmokraktir bûn.

Hê di nivê sedsalya nonzdan mezinekî marksizmê Fridrix Engêls dinivîsî ku Rûsyâ, bi heqî roleke pêşdaçûyinê, li Rojhilatê da dilize. (1)

Hîmdarê edebyeta Ermenîyan ya nû dostê gelê Kurd Xaçatûr Abovyan, wî çaxî bi şekirdarî dinivîsî û due'a li wê demê tanî, gava lingê Rûsa, yê bi rem li axa Ermenya ya pîroz ket, ew ji zulma Osmanî û Eceman rizgar kirin. (2)

Dewleta Osmanîyê bi xwe dewleta talan û cerda, bêqanûnyê û bê edaletê bû. Îlahî ji bo xelqên ne musulman û bindest warê zêrandinê, fermanêñ qirkirinê, qetil û zulmê bû. Evdêñ bindest him ji alyê dewletê, him jî ji destê hukumdar, axa û begêñ cî da dizêryan. Seva xweyîkirin û berfirekirna hidûdên xwe ev dewlet timê cînarêñ xwe ra li nav şer û cenga da bû. Şer û konfilîktên navxweyî jî kêm nîbûn. Ku bikaribe desthilatdarya xwe xweyîke cudatî û nakokîyêñ li nav gel, ol, êl û eşiran da jî tim gur dikir. Qetila here zulm ya bi destê zorê îslamkirna xelqê ne musulman bû. Rakirina her fermaneke îslamkirinê da qira bi seda hezaran evdêñ be gune û sûc dahat, gind û war wêran dibûn... Bi dewrana Kurdistan bûbû meydana fermanêñ xûnrej.

Ziyana mezin berê ewlin digîhîste Kurdên êzdî. Êzdî him alyê dewletê, him jî alyê der dorêñ xwe yê olpereste nezan va dihatin pelçiqandin, qirkirin. Êzdyâ jî ji bo parastin û xilazbûna xwe tim rîyêñ çareseryê digeryan, xwe ra hevalbend çar dikirin. Ji dîrokê eyan e, ku Êzdîyan timê xwe li gel û dewletêñ xaçparêz girtine, mîla wan kirine. Çima, gelo xaçparêz bi ziman, esil, xeyset û deba xwe va nêzîkî Êzdîya ne, yan xaçparêz naxwezin li nav xwe da wan bîhelînin?.. Wan jî pir xwestîye. Lî di wê pîrsê da cudetîya herd civaka heye. Xaçparêz destê zorê, bi zora şûr tu kesî ra nabêjn warin li ser bawarîya me. Antagonîzma olî li nav xaçparêzan û gelê din da ewqas xurt nîne. Ew bi salzemana, bi rîyêñ edlane, bi kultûr, erf-edetêñ xwe gelên bi bawaryêñ din dikşînin li nav hemêza xwe... Musulmanî usa nîne. Em hildin mesela Êzdîyan. Dewletêñ islamê, li nav kîjana da welatê Êzdîyan: Kurdistan parevekirîye, timê du rê danîne li ber Êzdîyan: yan muslimanbûn, yan mirin.

Li nav civaka xaçparêzan da Êzdî karin bi edlayî, aramî bijîn, tevî jîyana wan ya aborî, kultûrî, bazirganî û siyasî bivin. Xaçparêz destkuj, nan, xwerina evdêñ ji oleke din heram nakin, kuştin û talankirina wan helal nakin...

Him Êzdî, him jî miletêñ xaçparêz ji alyê desthilatdar û olperestêñ musulman va tim hatine zêrandin, qirkirin, pelçiqandin. Bextê wan yek bûye. Ji bo bikaribin xwe biparêzin nêzîkî hev bûne, xwestine alî hev bikin

Sebebekî din jî ew bûye, û delîlêñ dîrokî jî izbat dikan, ku payêñ kurdê Serhedê, li ser bawarya êzdîtayê bûne, ewan û gelên Ermeni, Gurc, Aşûrî, di tev hev jîtine, dostanî û helaqetyêñ wan xurt hebûne, armancêñ wan jî dijî zulmkara yek bûye.

Evin sebeb, ku Êzdîyan mîla xaçparêzan kirine, cî jî hatye xwe dane alyê wan û piştgiryâ wan kirine.

Ji bo dewleta xaçparêzan ya here nêzîkî Kûrdistanê Rûsyâ bûye, Êzdîyan jî tim bi bawarîya xweparastin û azabûnê wê dewletê nihêrîne.

Nêzîkbûna hidûdên Rûsyayê, ne ku tenê di jîyana Kurdên êzdî lê ya temamî gelê Kurd da roleke berbiçev listye. Gelek êlên kurdan, bi serê Rûsyayê ji nîrê Osmanyê xwe ra gumana riya rizgarbûnê didîtin.

Çevê dewleta Rûs jî timê li ser wê herema stratêgik bûye. Rûsa xwestîye bi alîkarya gelên wê heremê yê xaçparêz (Gurca û Ermenîya ) bikevne li nav civaka gelên dewleta cînar, yê bindest, wan bikşînin alyê xwe û nakokîyêni li nav wan û dewleta Osmanyê da ji bo kara xwe bidin kêranîn. Gumana wan li ser gelên xaçparêz ( Aşûrî, Kildanî-Sûryanî ) û Kurdan (xazma Êzdîyan ) bûne.

Him zulma dewleta Osmanî him jî dîn-dijminatîya hinek a-xa, beg û dîndarêni Kurdan, yên nezane kevneperek, jîyan li êlên Kurdên êzdî kiribûne doje. Êzdî welatê kal-bavêni xwe: Kurdistanê da, bê welat bûbûn, kî alî da direvyan ji qetil û antagonîzma olê xilaz nedibûn. Li dewleta Rûsyâ, kîderê seva dîn û hebandinê, kesî zordestî li kesî nedikir, fermanêni kuştin, talankirin, zêrandin û cudatîyê tune bûn, ew yêr bi rastî jî Êzidîyan ra xilazbûn bû.

Li nav dîroka gelên Gurca da melûmetyen hewaskar hene derheqa malbetekê Kurd, ya bi nav û deng da, kîjan dîrokê da bi navê Dolgorûkî eyane. Ev peyva bi zimanê rûsî ye, welgera wê bi kurdî ( kurmancî ) dibe Çepil dirêj. Dîroknas dînivîsin, ku ev malbet bi eslê xwe Kurd bûne. Ewledê wê malbetê: İvan ( İvo, İbo, İbrahim ) û Zakarê ( Zahar, Zero, Zoro ) li nav padşatîya Gurcistanê da gîhiştine derecê here bilind, bûne serleşkerê padşa Gurca: Tamarayê. Ji bo mîrxasî, jêhatin û şureta wane leşkeryê, navê wan li nav dîroka Gurca da bûye efsene. Qewi-

mandinê dîroka Gurcistanê, yên here serketî û balkêş, di sedsala 12-an da navê wan herd biran va girêdayîne.

Nivîskar Tosinê Reşîd hîmbûyî li ser belgeyên dîrokî û fikira dîrokzanan (ji wan geleka usa jî nivîsandine), dinivîse: "Ne dûrî aqila ne, wekî ÇEPILDİRÊJA bi ola xwe va Êzdî bûne, ji ber ku mîla Êzdîyan berbi gelên xirîstîyan hê mezin bûye û Êzdî hê-santirîn çûne li nav wan..."(3)

Pelên dîrokê didine kivşê, ku hela nîve sedsala 18-an da, hinêk êl û eşîrên Kûrdan bi rîyêna cuda xwestine helaqetyên donastyê bi Rûsa ra daynin. Di şerên Rûs-Îranê, yê salên 1804-1813; 1826-1828 –an û usan jî şerê Rûs-Tirka yê salên 1828-1829-an hinek êlên Kûrdan, ji wan usan jî Kurdên êzidî piştgirya Rûsa kirine, ji aliyê Rûsa va dijî Osmanyan û Eceman şer kirine.

Hela sala 1701-ê serokekî şerkarya Ermeniya yê azadarîyê Îsrayêl Orî diçe paytextê dewleta Rûsa, nema dewlemend û mezinê Ermeniya tesmîlî qaysirê (padşa) dewletê Pîyotirê Ewlin dike. Wê nemê da Ermenî hazirya xwe dîhar dikin û dinivîsin eger dewleta Rûs alî wan bike, wan ji zulma dewletên Osmanyê û Îranê rizgarke, ewê tev gelên herêmê yê bindest, piştgirya leşkerên Rûs bikin. Nemê da nivîsare, ku di wî şerî da wê usa jî Gûrc, Kurd û gelek gelên din wê pişgirya wan bikin. (4)

Sala 1725-an wekîlê padşayê Gurcan Davîd NazaraŞvîlî nivîsareke xwe da, ya dabû wezîreta Dewleta Rûsyayê ya karê derva, dinivîse, ku tevî Ermenya, Azerya usan jî Kurd şerkarya dijî Tirka da zîyanike mezin didine dewleta Osmanyê. (5)

Nivîsareke din da tê gotin, ku şerkarya dijî Împératorya Osmanyê da tevî Ermenya, Gurca, Azerya usan jî Êzdi hene. (6)

Mezinekî Kurdayî nehya Bazîdê Çoban Oxlî ( Mala Kok Axa. E.B.) 23-ê meha Îlonê, 1770-ê salê nemê padşayê Gûrc

Îrakliyê 2-a ra dişîne û hazerya xwe elam dike ji bo şerkarya tevayî dijî zordestîya dewleta Osmanyê. (7)


Berî şerê Rûs-Osmanîyan yê sala 1768-an li ser daxweza padşayê Gurca Îrakîlîyê duda, di dîwana wî da dokümêntek tê hazirkirin. Ew belge bi sipartina dewleta Rûs pêk dihat. Di wê dokümênta bi sernivîsa: “Şirovekirina li ser gel û cînarêñ Gurcistanê” da xetên wa hene: “Kurdên Bazîdê ewqas jî xizmeta Sultan nakin. Eger dikin jî tenê bi daxweza xwe. Herem li başûr cêrga çiyayêñ Araratê, li sînorêñ Yêrêvanê, Qersê û Salmastê ye. Nişteçîyêñ wur şera da xurtin. Welatê wan jî şen û zengîne.” (8)

Pey ra padşayê Gûrc, bi hevkarya keşeyê (mîteran) Aşûri: Îsayî fikira xwe digîhîne serokên kurdên Êzdi, yê wê heremê (Bazîdê) Çoban Oxlî..

Îsayî li Kurdistanê digere û derheqa rasthatina xwe ya tev Axê Êzdi padşê Gûrc Îrakliyê duda ra dinivîse. Dide eyankirin ku wî qirara Padşê nîşanî mezinê Êzdiyan daye, ew pir kêfxwes bûye, gotîye, eger kela **Xoşavê**, ku niha vala ye, bide Êzdiyan, ewê hevkariyê ji wî ra bikin. Keşeyê Aşûri di nema xwe da usa jî dinivîse: ”Êzdi şervanine xurtin û ji Bazîdê girtî heta **bajarê** Mûsilê tev di bin desthilatdarîya Çoban Axê da nin.” (9)

Çoban Oxlî ( Çoban Axa ) kê ye ?

Çoban Oxlî serokekî malbetekê Kurdên êzdi, ya bi nav û deng û kevn: mala KOK Axaye. Eva li nav Êzdyan da malbeta desthiletdare here kevn ne. Êzdi dibêjin, ku ew malbet berê berê da desthilatdar bûne, yan koka wan Axa bûne, ji bo wê jî wan ra dibêjin KOK Axa. Îlîn, ku vê malbetê serokatî lê kirye li ser hidûdên împêratorîyêñ Osmanyê, Îranê û usan jî pala çiyayê Araratê girtî heta nêzkaya Bazîdê, Yêrêvanê, Qersê, Salmastê heta dewya sedsala 19-a jî jîtine. (10)



### Kela Xoşavê

Delîlên nivîskî derheqa qedera vê malbetê da pir kêmin, û xêncî evêng jorgotî, yan nemane, yan jî neketine destê me. Di navbera salên 1770-1820-î da ci qewimîye, ci hatîye serê vê êla giran, li nav teryê da ne. Navbera salên 1825-1830-î da ji pey qir, bir û fermanen dijwar ra çend malen axelera yê ji vê malbetê direvine Ermenistana Rojava, li binatara çiyayê Elegezê gundê Mîrekê yê vala şen dikin. Heta niha jî peyhatîyê wê malbetê wî gundi da dijîn û jêra dibêjin: Mîreka Axa.

Ji delîlên jorgotî tê xanê, ku ew êla Êzdîyan pir mezin bûye. Li wan belgeyan da tê eyan kirin, ku wê demê Aşûryan kariye weke 20 hezar şervanan derxin meydana şêr. Derheqa hesavê Êzdîyan da melûmetî tunene, lê tê gotin, ku Êzdî jî karin weke Aşûriya şervana derxin. Usane hejmara Êzdîyên wê heremê nêzîkî ya Aşûriya bûye. Hesavên Aşûryan dînîvîsin, ku nêzîkî du mîlyoa bûye. Nuxteke din ya berbiçev jî heye, eger dewleta Rûsan xwestîye tevî Aşûriyan, Êzdîyan ra jî, ji bo hevkaryê û

piştgirtinê pêwendîyan daynîn, usa ne Êzdî jî wê heremê da hêzeke mezin û bi xurt bûne.

Mera eyane, ku wê demê xêncî êla Êzdîyan ya Mehemedîya (êla mala Kok Axa) wê heremê da usa jî êlên Sîpka, Hesinya û gelek êlên din jî hebûne. Pirs pêşda tê, gelo çima Gurca tenê Çoban Axê ra ji bo hevkariyê pêwendî danîne, çima mirovê xwe neşandîye li cem Axên Êzdî yên êlên din jî? Usane hêzên axên din yan biçük bûne, yan ew jî di bin perê mala Kok Axê da bûne.

Di nav Êzdiyan da heta niha jî dibêjin ku gelek malên axa ji vê malê qetyane.

Çoban Axa derheqa amadebûna êla xwe da, seva hevkarya dijî dewleta Osmanîyê nemê padşê Gûrc ra dişîne. Li ser nemê mor heye, ser morê jî bi herfîn erebî nivîsare: COBAN.

Bi kurtayîke biçük nema Çoban axa eve:

*“...Em hukumdarê xwe yê dilovan agahdar dikan, wekî bi destê metranê Asorî Îsayî, we em bi ferman û nema xwe rewa kirine. Ew wartapêt (metêran) hate bal me. Me ferma we û mora li ser dît, me dît û da li ser serê xwe, pir şâ bûn, wekî we em bîr anîne. Em xwelya li ber pîyê we ne. Ci emrê we hebe, em li ber we destdayî ne. Gelê (xelq) Êzdî gişk amade ne hukumdarîya we bipejirînin. Niha em rîspîyên xwe agahdar dikan, wekî Xwedê yet e û bawarî yet e, wekî emê di gotina we da bin. Xwedê piştovanê we be. Hinekî nêzîk bin, wekî em jî li vî alî netîrsin. Em Êzdîyê mehmûdî ne\* û em ji wê tika dikan, ku heta hatina me bal we, ji me ra ferma, ku hêvyen me gur bike, bişînin, wekî em zirarê pir nekşînin. Wekî em bi hêvî bin û Xwedê şede ye, gava em bêñ temene bidin, hûnê wê hingê bizanibin, em çawan xizmetê dikan.” (11\*)*

Bi sedemên cuda, ev hevkari pêk nehat. Lê paşê ci qewimî? Qedera wê êla giran çawa bû ? Delîlên dîrokî, yên pêwîst, pir kêmîn, yan bawarkî tune ne.\* Ji nemê dijwar nîne bê texmînki-

rin, ku li dora êla Çoban axê ewqas jî aramî tune bûye. Ji bo wê jî Axê biryara xwe daye, ku padşayê Gûrc ra dijî desthiletdarya Osmanîyan bikeve nava hevkarîyê. Bê gilî, ewî zanibûye, ku ew hevkarî cêribandineke pir bi qezya û xeter e, lê tê xweîyan êdî rêke din Axê Êzdî ra tune bûye.

Şerê Rûs-Îranê yê salên 1804-1813-an ji alyê Rûsan tevî Gurca, Ermenya, Azeryan usan jî hinek êlên Kurdan dijî Îranê şer dikirin. Yê şer nedikirin jî tevî şêr nedibûn. (12)

Sala 1828-an, 28-ê meha tebaxê, şêr da leşkerên Rûs Bazîd hildan. Mehek şûnda 200 malên Krdêñ êzdî, yê êla Hesinyan bi sroketya Hesen axê\* derbazî alyê Rûsa dibin. Ew ji mîrên êla xwe, yê xurt, alayîke bi 100 siyarî dicivîne û dijî leşkerên Dewleta Osmanyê dikeve nava şêr.

Di şerê Toprax Qalê da (Senceqa Alaşkertê) bi efatî û mîranîya xwe berbiçev dikevin. Li ser rîya Erzirûmê leşkerê Tirkan ra dikevne nav şêr û 140 ga ji wan distînin. (13) Ji bo wê demê, cîguhestina bara, çek-cebirxana hîmlî bi heywanê barbir dihatine kîrin, qîmetê ga ji boy leşkeryê bilind bû. Di şerekî din da siyarê Hesen axê 500 heywanê Ermenya, ku Tirka talan kiri-bûn, biribûn, vedigerînin û paşda didine xweyê wan. Qumanda-rekî leşkerê Rûsa Kinyaz Çavçavazê Serleskerê Kavkazê Gêner-al-Feldmarşal Koms Paskêvîç ra dinivîse, ku çekdarên Hesen axê bi her teherî dixwezin aminya xwe ya himberî Rûsa bidine kivşê, bi mîrxasî şer dikin, ji berî teva xwe davêjne li nav agirê şêr. (14)

Di şerên Rûs-Îranê û Rûs-Tirka yê wan salan da gelek ewledên Kurdêñ êzdî ji alyê dewleta Rûs da hêjayî çîn û nişanên (rewa) efatyê û mîrxwesiyê bûn.


Gerekê şaş neyê têgîhiştin, ku tenê Kurdêñ êzdî xwestine Rûsa ra hevkarîyê bikin. Gelê Kurd temamî bi dewr û zemana hîvyen azabûna xwe û rizgarya Kurdistanê ji nîrên Osmanîyê û

Îranê bi alîkarya Rûsa va girê dane. Gelek meznên eşîran, serokên ûsyana, serhildana, heta oldarên Kurdêñ musulman, yên gewr, pêwendî wê dewletê ra danîne, lê mixabin ji wan pêwen-dîyan tu yek (payê pirê ne gunê kurdan) neçûye sêrî, negîhîşfiye encema hêvîkirî.

Derheqa helaqetyêñ Rûs-Kurda yê wê dewrê da, melûmetyêñ giranbiha, di xebatêñ dîrokzan û rojhilatzanêñ eyan: N.L.Avêryanov, V.A.Karsêv, N.N.Mûravyêv, V.A Gardlêvskî, P.Î.Lêrx, V.F.Mînorskî, V.Nikîtin, M.C.Lazaryêv, Ş.Xudo, H.A.Xalfin, Celîlê Celîl, Xalit Çetoyêv, O.Jîgalîna û gelekêñ din da hene.

Gerekê bê gotin, ku bûyarêñ ve goveka dîrokê, ji boy safî-kirna gelek pirsgirêkên dîroka gelê me, pir hewaskarin û gelek lêkolînêñ kûr û bi qîmet ji vî alî da hatine kirin.

### **Goriistana kevn li gundê Qundesazê (Ermenistan)**



## BERXWEDANA MÎRÊ RIDIWANÊ: MÎRZIKÊ ZAZA

Heta niha navê Mîrzikê Zaza bi sedemên cûrbicûr ji alyê dîroknavîsên Kurdzanyê va hêjayî guhdaryê ne bûye. Nenihêrî derheqa wî û berxwedana wî da gelek delîlên nivîskî, bîranîn, çirok û sitiranên gelêrî hatine xweyîkirin. Despêka sedsala 19 an li dor Êzdiyê Xaltan gelek bûyar qewimîne. Serokê wê êla giran û navê, ku di nav wan bûyara da pir tê bîranîn Mîrzikê Zaza ye.

Emê vê lêkolînê da hewl bidin kar û barê wî şexsyetê dîrokî û berxwedana êlên Xalcyan bi temamîya sifetê wê va raxim li ber xwendevana.

Arşîva Gurcistanê ya dewletê, ya dîrokî da belgeyek ( N 11 66) tê xweyîkirin, naveroka kîjanê wa ye: “ Daxweza mamostayê Ridiwanê Pêtros Xazarov, di navê da nema Mîrza axayê Êzdi, ji bo şandina dermanê çeva”.

Li ser wî belgeyî wa hatye nivîsin: (1)

Destpêk: 2-ê meha Çileyê Paşin, ya sala 1831-ê; dewî: 30-ê meha Çileyê Paşin sala 1831-ê. Di nav da çar belge têne parastin.

-Daxweza mamostayê bajarê Ridiwanê Pêtros Xazarov ji Serleskerê Kavkazê yê sereke, Général-Feldmarşal, Koms Paskêviç ra, bi zimanê rûsî, 22-ê meha Çileyê Pêşin, sala 1830 .

-Nema Mîrza axê Koms Paskêviç ra, 22-ê meha Gulanê, sala 1830-î, bi zimanê ermenî.

-Wergera nemê bi zimanê Rûsî.

-Şe'denema Pêtros Xazarov, ku dîwanxana Paskêviç dayê, ji bo ew bê rewastandin wê herema Rûsyayê bikaribe serbest bigere. Bi zimanê rûsî.

Arşîva Rûsyayê ya bajarê Lênîngiradê (Pêtrosigirad) da usan jî doklada Gênêral-Mayor Pankratêv derheqa cawa nema Mîrza axayê Êzdî, ya duda û têksta nema Axêye sisya têne xweyîki-rin.(2)

Ev belgeyên dîrokî ji alyê lêkolînvan û dîrokzana da bi he-waskarîke mezin hêjayî lênhêrandinê bûne. Hela hê di destpêka sedsala çûyî pirtûkên cude-cuda da ew belge hatine weşandin.(3)

Derheqa van nema û Mîrza axa da ji alyê kurdzan û rewşembirê kurd, yên Kevnesovêta berê da pir hatye nivîsar û lêkolînên giranbiha hatine kirin ( Celîlê Celîl, Hecîyê Cindî, Xalit Çetoyêv, Karlênen Çaçanî, Wezîrê Eşo û hwd...) Hela şayir Casimê Celîl poyêmek jî bi wê naverokê weşandîye. (4)

Doktorê dîrokê Celîlê Celîl sala 1985-a lêkolîneke zanyarî-yê, ya kûr û pir giranbiha vê derheqê da bi zimanê ermenî weşendîye.(5)

...Û wan lêkolînvan, nivîskar, rewşembiran teva jî, di xebatên xweye dîrokî, zanyarî, edebî, rojnemevanî da, bi dengekî kesayatyâ wî Mîrza axayê Êzdî ya Şêx Mîrza va, Şêx Mîrzayê şêxê êla Anqosya va girê dane.

Lêkolînên meye vê dewyê, li navâ Êzdîyên Kurdistana Bakûr da, derxistin holê, ku xweyê wan nemên dîrokî, xweyê qesra Ridiwanê Şêx Mîrza nîne.

Bi îzbatyan û melûmetyan em hatine ser wê zanebûnê, ku Mîrza axayê Êzdi, Mîrê qesra bajarê Ridiwanê, xweyê nema Mîrzikê Zaza ye. (6)

Çima, gelo sebeb ci bûye, ku ev nerastî pêk hatye ?

Pevgirêdanê di navbera êl û eşîrên Kurdan da, îlahî yên Êzdyan da pir kêm bûne, dema bûyar li êlekê da qewimîne êlên

din pê ne hisyane. Îlên Êzdîyan ji hev qetyayî û ji hev dûr bûne. Pêra jî tim li nav rev-bezê ferman û qirkirinê da bune. Înformasya navbera wan da pir kêm yan tune bûye. Pirsgirêkên wan ewqas pir bûne, ku her êlek ancax pirsgirêkên xwe va mijûl bûye.

Êzdîyen Xaltîyan dema wê bûyarê (Şerê Erenzê û bûyaren dor Ridiwanê) nerevyane ber bi Êzdîyen Serhedê, yên wê demê herema di bin desthilatdarya Rûs da bûn. Ji bo wê jî ev çîrok, bi rastîya xwe negîhîştiye nav wan.

Ji tirsa olperestan sitiran û çîrokên wî teherî dengbêjan, xazma yê Êzdî newêribûne civakên berfire da bi serbestî bistirana û li nav êlan belabikirana.

Komkuuya Ermenyan, ya sala 1895-an û pêvajoya dijwerefeta sala 1920-î Kurdêñ êzdî xazma yê li Serhedê, ku tev Ermenya dijîtin, kiribûne li nav gêjgerîngâ xwe. Halê wan ji halê ermenîya çêtir nî bûn. Êzdîyen li bin hukumdarya rûsa da dijîtin ji heremêñ Êzdîyan lap qetyayî bûn. Çûyîn-hatin navbera wan da pir kêm bû. Sala 1917-a ew pêvajo xiravtir bû. Destpêbûna Şorişa Oktyabirê ra leşkerê Rûs kişiyan ji heremê çûn. Herem kete devê leşkerên dewleta Tirk û hêzên hemîdyê. Çi tanîne serê Ermenyan, Êzdî jî ji wê zulmê bêpar nedimam. Îlên Êzdîyan, yê Qersê, Surmelyê û Wanê bi mecbûrî cî û werên xwe hîştin re-vyan Ermenistana Rojava. Ji pey wê rev, bez, qir, bir, xelayî û şerên bi sala yê dijwer ra, ci ji wan Êzdîyen Serhedê da man ketine li bin hukumdarya Sovyêtê, ya nû avabûyî. Wê jî derbine giran erf-edet û jîyana wê civaka qedîmî xist. Derheqa bûyarêñ wek yên vê lêkolînê da kesî newêribû xeberda, bîr banya. Hidû-dêñ wê dewletê jî usan berk bûn, qanûn û qirarê wê jî ewqas sert û hişk bûn, ku bawarkî 60-70 salî ew civak ji gel, welat û netewa xwe hatibûn birîn. Derheqa gelek bûyarêñ li nav gel da qewimî bûn, yan bîra kiribûn, yan nizanbûn.

Hewaskarya min hê zarotyê da ber bi zargotinê pir bû, lê min jî navê Mîrzikê Zaza û derheqa bûyarên navê wî va girêdayî qet ji kesî ( çîrokbêja,dengbêja, kala ) ne bihîst.

Tunebûna xwendin-nivîsarê mecal nedane, ku gelek bûyarên di dîroka gelê kurd da, xazma li nava civaka Îzdiyan da qewimîne bêñ bigîhîjne ewledan, bivine belge, malê dîrokê, hebûna gel, bimînin.

Di dema bûyarên Şêx Mîrza va girêdayî, qira êla Anqosya, pareke Anqosyan revyane li nav Îzdiyêñ Serhedê, wana jî xwe ra çîroka Şêx Mîrzayê anye wur

Bi txmîna me sebebêñ van tevlihevya û nerastîya evin. Helbet rastkirina vê şasya dîrokê tu sîyê navêje li ser mezinayî û berxwedana Şêx Mîrza û bûyarên navê wî va girêdayî. Bûyarên çîroka Şêx Mîrza didine xanê, ku qewimandin û konfîlikt pêsyê li ser dijîtya olê nî bûne, ew zeftir netewî bûne, ji bo xweyîkîrina tifaq, nav û xîreta eşîrê. Ew bûyar karibûn bibûna hîm ji bo yekîti û tifaqa Kurdêñ musulman û êzdî dijî dagerkiran. Lê dagerkir zû wê yekê tê derdixin û ji bo xwenaskirna miletyê li nav Kurda da ji ya olê zeyîftir bû, hukumdarên dewletê, ji pey hebskirina Şêx ra, wê konflîktê weldigerinin dikin ya dijîtya olê û bin wê alê da nêzîkî bajarê Dîyarbekirê, bi destê leşkerê Osmanî û kurdêñ musulman qira 1700 konê Anqoaya tînin.

Bi rastî derheqa hinek qewimandina da tek stranêñ gelêri û bîranînêñ pêşyan yê devkî mane. Ew jî di nav sal û dewranêñ terî da usan hatine guhestin, wan da bûyarên cude-cude usan tev li hev bûne, ku rastî û nerastî bi dijwarî ji hev têñ veqetandin. Her stiranbêj yan çîrokbêjekî bi gorî xwe ew bîranîn guhestine ewledan. Bî gor civaka têda jîyayî ev bûyar şirove kirine. Eger lêkolînvan, nivîskar, dîrokzan wan kilam û çîrokan yekcar, bê lênhêrandin, ca ew hene bikne hîmê xebatêñ xwe û usa bûyaran

binirxînin wê şasî û nerastyê mezin berde û tucar nagîhîje rastîya bûyaran.

Lê bext ra, di derheqa Mîrzikê Zaza, êla wî û bûyarên dema wî da qewimîne, gelek melûmetî û delîlên nivîsar gîhîstine me. Ew hemû çevkanî jî usanin, ku derheqa rastîya wan da tu şik tune. Di wan çevkanya da him cîyê bûyaran, him dema wan, him jî navê hinek şexsyetên navar hatye xweyîkirin, destnîşankirin.

Derheqa Mîrê Ridiwanê melûmetyê nivîskî hene li cem ro-nakbirê Ermenî, kurdzan Xaçatûr Abovyan, arxêologê navdar, yê Înglis A.H.Layard, hinek çevkanyên zargotina Ermenyan û nemeyên Mîr bi xwe, yên ku wî bi destê qasidên xweye ermenî Serleskerê dewleta Rûsa, yê wê demê, Koms Paskêvîç ra şandîye. (7)

Nema Mîrzikê Zaza, ku Serleskerê Rûs ra şandîye bi zaravekî zimanê ermenî, yê wê heremê hatye nivîsar, mora Mîr him destpêkê, him ji dewyê, jêrê heye. Naveroka nemê bi wergera zimanê kurdî ( kurmancî ) eve:

“Ji alyê qûlê Xwedê, Mîrza axayê Ridiwanê, gelek silav û kilavên dostanyê ji leşkerê Îsayî altindar û xweşmîr, birêz Paskêvîç ra, di dema ( daxweza min û nema min) bigîhîje destê wî wextê dilxwesiyê û bextewaryê ye, amîn!

Piştî, ji alyê evdekî ji te nenas û ne dîhar va dîyarkirina silav û hizkirinan, Paskêvîçê maqûl, serbilindî û hizkirîyê min, ez evdekî Êzdî me û gelê min jî biçûke. 1500 sîyar û 5000 leşkerê min yê peya hene. Lê agahdar be, dîsa îro, gava min bihîst besa hatina te li Patnosê, heta niha min nemek, bi destê qasidekî ji te ra şandibû. Lê mixabin tu caw min nestandîye. Wê salê, dema leşkarên te ketine Patnosê, ez, weletê xwe va û henû xelqên Êzdî, Xaçparêz bi tevayî, bi hatina te pir şâ bûn. Eva cara sisya ne ez nemê bi destê qasidên xwe dişînim hizûra te. Qasidê ewlin negîhîstine cem te, xuya ye tirkan rê da ew kuştine. Ez nizanim

çi hatye serê wan. Gava min derheqa kuştina wan dabihist, cara duda min ev meriv navê kîjanî Kîrakos e şand. ( Dîsa wî dişnim). Ew jî hate Bazîdê cem Gênerâl û ji wur jî tevî leşkera vegerya Qersê. Ji wêderê jî tevî hêzên te hate Erzirûmê. Bi alî-karîya Xwedê, we hêzên xwe civandin û bajar hildan. Qasidê min ne ziman zanî bû, ne jî nasê wî li bajêr da hebûn, ku xwestekê min bigîhandana te. Li nava leşkerên te da gêneralekî mezin hebû, di nav teva da yê herî berbiçev bû, qasidê min diçe cem wî gênerâlî û gotinên min jêra dibêje. Ew jî nivîsarekê dide qasid û paşda dişîne. Gava ew vegerya cem min, min neme stand, mora lê dît, pir kêfxweş bûm. Min gazî keşîşa kir, ku bixwînin. Nikaribûn bixwendana. Min tu xêr ji nemê nestand... Îcar, cara sisyan û cara dewî ye ez du kesên xaçparêz, yekî bi navê Kîrakos û yê dinê bi navê Pêetros dişnim hizûra te. Hey qedirmezin û sebilindaya min, dixwezim tu bizanbî, rast e ez bi gelê xwe va biçûkim, lê çevê Osmanyê da gelekî mezin têm xuyakirin. Bi saya Xwedê, sed sîyarê min dikarin dijî sêsid sîyarê Osmanyan derkevin. Ji ber wê jî Osmanî min dijminê xwe dibînin, çimkî ew rastî ye. Padşayê minî mezin, ez xulam, gerekê tu tê derxî nêta dilê min. Dîsa hezar şikir wê demê, ku dengê hatina te, ya li Baxîşê, ku bi xwe Bitlise, bigîhîje min, yan jî qasidê min vejerin û bêjin: hat. Wê demê tu li xulamê xwe mîzeke. Tu Rûsê mezin, ez jî wek gêneralek, serîkî min heye, ezê wî serî jî qurbana te bikim. Û temamya gelê min jî mîna min, bi hizkirin û bawarî... Bi destûra Xwedê, saxî û silametî, amîn!

Careke din ez ji te hîvî dikim, bona xatirê hizkirna navbera me, bi kerema xwe qasidê min ra, dermanekî ji bona çevê kurê min bişîne.

Neme 22-ê meha Gulanê, sala 1830-î, hatye nivîsar.” (8)

for the first time in the history of the world, the  
whole of Europe, and especially England, were  
engaged in a war which was to decide the fate  
of the world. The English people, who had  
been accustomed to consider themselves as  
the chief power in Europe, were now  
overcome by a sense of their own weakness,  
and were compelled to submit to a foreign  
power, which they had hitherto despised.  
The English people, however, were not  
without hope. They had a strong sense of  
national pride, and a desire to defend  
their country from foreign invasion.  
They also had a strong sense of justice,  
and a desire to see that the wrongs of  
the English people were redressed.  
The English people, therefore, were  
determined to do all in their power  
to defend their country, and to  
see that the wrongs of the English  
people were redressed.

# Name Mîrzikê Zaza serleşkerê dewleta Rûs Koms Paskêvîc ra



Gênêral Î.F. Paskêvîç

Ji naveroka nemê tê xanê, ku ew êdî nema sisya ne, ku Mîrê Ridiwanê: Mîrzkê Zaza bi destê qasidêن xwe, yên ermenî Ser-leşkerê artêşa dewleta Rûs ra şandye. Nema wî ya ewlin negihîşte cî: "Qasidêن ewlin negihîştine cem te, xuya ye Tirkan ew rê da kuştine. Ez nizanim ci hatye serê wan"-nemê da hatye nivîsar.

Nema duda bi destê ermenîkî bi navê **Kîrakos Arakêlov** dişîne. Nemebir destpêka sala 1829-an digîhîje bajarê Erzirûmê. Koms Paskêvîç li wur nîbûye, ew rastî Gênêral-Mayor Pankratêv tê.

Pirofêstor Celîlê Celil di miqala xwe, ya bi sernivîsa: "Rûpe-lek ji helaqetyêن dostanya Ermeya-Kurdan, ya dîrokî, çandî" da dinivîse: " Me ra li hev hat arşîva Lênîngiradê (Pétrosbûrg, E.B), ya dîrokê da, doklada Gênêral Pankrâtêve 12-ê meha Çileyê Pêşin, sala 1829-a, Gênêral Paskêvîç ra peyda bikin, der-

heqa rasthatina xwe tevî qasidê Şêx Mîrzayê (Mîrza axa) ( Mîrzikê Zaza. E.B.). Gênêral dokladê da dinivise: "Van roja binelîyê kela Ridiwanê Girîkos hate cem min. Ridiwan dikeve başûrê Sêrtê. Ji nehya Hezoyê rîya denekî dûr e, ewqas jî ji çemê Dicilê dûr e. Wî min ra nema Mîrza axayê Ridiwanê û Keşîş Hovhanêsê Ermenî tanî, kîjan Tirkan li Bitlîsê jê standibûn. Evî Girîkosî min ra ev got: "Mîrza axa, usan jî temamya Êzdî û Ermenî pir kêfxweş in, ku leşkerê Rûsa padşatîya Bayazêtê hildane û dibêjin, eger Rûs pêşdahatina xwe berdewamkin, ewê bi xurtî qulixî Rûsan bikin. Li bin hukumê Mîrza axa da du hezarî zêdetir malê Êzdiyan û ewqas jî yê Ermeniyan hene. Ew dikare sê hezar peya û hevsid sîyarî derxe meydana şêr. Serokatiya bajarê Sêrtê Taxî axa dike, kîjan di gurra Mîrza axa da ne. Du sal berê hukumata Tirkan padşahê Dîyarbekirê guhestine û wê demê da temamya beglikên Dîyarbekirê, yên serbixwe hukumdaya kesî nas nakin". (9)

Ew gênêrala cawa nema Mîrzikê Zaza bi zimanê Rûsî dnivîse û bi destê wî qasidi jî jê ra dişîne. Lê telebext ra neme ne-xwendî dimîne. Axa usan jî pê nahise serleşkerê artêsa Rûs ci cawa wî daya. Ça tê gotin, wê êlê da, yekî xwendin-nivîsandina rûsî zanibûya tune bû. Tê texmîkirin, ku Axê Êzdî amintîya xwe ewqas jî der-dorê xwe neanye. Wekî sura xwe goveka fire da veneke, nemê dîhar nekrye.

Ji naveroka nema jor gotî tê xuyakirin, ku helaqeyên êla Mîrzik û hukumdarên dewleta Osmanyê pir xirav bûne. "Osmanî min dijminê xwe divînin." Mîrê Ridiwanê rind zanibû, ku dewleta Osmanyê li wê demê şerê dijî Rûsa va mijûle, ji pey şêr ra wê vegere ser êla wî. Ji boy wê karê jî dixwest ese rêke xila-zbûnê êla xwe ra bivîne. Û vê nema sisya Rûsa ra rê dike.

Gelê İmpératorya Osmanyê li nava teryê û şûndamayînê da bûn. Ne xwendin-nivîsandina massayî hebû, ne jî infotmasîya pêwîst. Ça piranya gelên wê İmpératoryê, ji wan bêtir jî êlên

Kurdan haj qewimandinê cihanê tune bûn. Ça me berê jî got piranya xelqê ne ku tenê haj bûyarên cihanê yan welêt da diqe-wimîn tunebûn, lê haj êlên cînar jî tunebûn.

Nema Axê Êzdî, ya sisya wê demê hatye nivîsar, wextê bi peymana Adırîapolîsê ya aşîtiyê (lihevhatinê) êdî ew çend meh bûn dewî li şêr hati bû. (14-ê meha Îlonê, 1829-ê salê.)

Ev neme dîsa bi destê nemebirê nema duda Kîrakos Arakê-lov û mamostayê bajarê Ridiwanê, yê Ermêni, Pêetros Xazarov tê şandin. Evan li bajarê Erzirûmê derheqa rewestandina şêr da dihesin. Tê texmînkirin, ku Mîrê kela Ridiwanê spartibû qasida, ku ese Gênerâl Paskêvîç bivînin û nemê bigîhînin destê wî. Ji bo wê nêtê jî qasidê wî diçine bajarê Tilbîsê.

Wê demê bajarê Tilbîsê li herêma Kovkasê da merkeza rî-vabirya dewleta Rûs bû. Li wura jî qasid nikarin wextê da Paskêvîç bivînin. Gênerâl li wê demê çûbye bajarê Pêetrosbûrgê. Di hînya vegera wî dimînin.

Di wê navberê da qasidekî Mîr: Kîrakos ji nexweşîya xolorê dimire. Qasidê din: Pêetros Xazarov heta meha Çileyê Pêşin li Tilbîsê dimîne, rastî Paskêvîç tê û nemê teslîmî wî dike.

Gênerâl bi dilovanî û dostanî nemebir û nema Mîrzik qebûl dike, qasid xelat dike û bê eglebûn cawa nemê dide. Dîyarîkî Mîrzik ra û îlaca çava jî lawê wî ra dişîne. (10)

Tu melûmetî tune, gelo Serleşkere Rûs bi nivîskî cawa nema Mîrzikê Zaza daye, yan ku nema nivîsar rî da nekeve destê dewleta Osmanyê, bi devkî bersîva nemê qasid ra gotye, ku ew jî bi devkî bigîhîne Axê Êzdî. Bi texmîna min fikira axryê nêzîkî bawaryê ye. Menîke din jî hye, ku Gênerâl bersîv dibe bi devkî dabe. Ji bo, li êla Mîr da tunebûna mirovîn zanê zimanê rûsî, neme-bersîva Gênerâl e berî wê jî nexwendî mabû. Bi wê menê jî, dibe bi devkî bersîv dabin...

Ji bo qasidê Mîrzikê bê qezya û astngî erdê Kovkasê ra derbaz be nasnemeke wa dabûnê:

"Dîwanxana dîplomatîyê, ya birêz Gêneral-Fêldmarşal, Koms Paskêvîç Yêrêvanî şedetyê dide, ku xweyê vê nasnemê: mamostayê Ridiwanê Pêtros Xazarov tev dîyaryên (pêşkêş) ji alyê maqûlê mezin da hatye dayîn (xelat û derman) vedigere bal Mîrza axayê Êzdî. 30-ê Çileyê paşin. Sal 1831." (11)

Dîrokê va eyane, ku wê demê bajarê Tilbîsê merkezeke Ermenya, ya siyasi, aborî û çandî bûye. Ermenya roleke berbiçev sîasya dewleta Rûsyayê da, ya berbi dewleta Îranê û Împêrator-ya Osmanyê da lîstine. Bi texmîna me Ermenyê cî jî alîkarî dane nûnerên Mîrê Ridiwanê, ku nemê bigîhînin destê Paskêvîç.

Zulma dewleta Osmanyê li ser gelên wê deverê mezin bû, xazma li ser xelqên ne musliman. Sal tune bûn, ku him ji boy bawaryê, olê û him jî ji bo netewyê ew nehatana zêrandin, talankirin, ferman li wan ranebûna.

Osmanyê dixwest beglikên Kurda yê heyî, ku pir cara hukumê dewletê qebûl nedikirin, leşker nedidan, ji holê rake. Bi zorê nikari bû. Ji boy wê jî bêtifaqî, duşrefî û dijminatî li nav êl eşîrên Kurda da çê dikirin. Ku bi destê Kurdan qewata Kurdan ji holê rakin. Agirê şerê Kurdan, yê navxweyî çiqas diçû gur dibû. Mîrzikê Zaza tê derdixist, ku xeleqa neyartyê li dora **Xal-**ta çiqas diçe ewqas teng dibe, Fermanê dîsa li êla wî bêr rakin, gumana parastina Êzdîyan alîkarya Rûsan va girê dida.

Ji nemê mirov texmîn dike, ku ew û xelqên wî bi hêvîke mezin hîvya alîkarya Rûsan e: "Dîsa hezar şikir li wê demê, ku dengê hatina te ya li Baxîşê, ku bi xwe Bitlîse, bigîhîje min, yan jî qasidê min vegerin û bêjin: hat. Wê demê tu li xulamê xwe mîzeke. Tu Rûsê mezin, ez jî wek gêneralek, serîkî min heye, ezê wî serî jî qurbana te bkim. Û temamya gelê min jî mîna min bi hîzkirin û bawarî..."

Ji nema Mîrê Ridiwanê usan jî tê xanê, ku wê demê êlên di bin hukumê wî da, bi qewat û tifâq bûne, û amede bûne alyê Rûsa va dijî dewleta Osmanyê bikevn li nava şêr. Hesavêñ

leşkerên wîye sîyarî û peya ( 1500 sîyar û 5 hezar peya ), ku nemê da têr nîqaşkirin, hindik nînin. Ew jî çawa hatye nivîsar şervanê bijare ne: “ Sed sîyarê min dikarin dijî sêsid sîyarê Osmanyê şerkin.”

Dîrokê va eyane, ku pir cara Axa, Beg, serokên Kurdan bi dil û can destê hevkaryê dirêjî dewleta Rûs kirine, amintîya xwe jê ra e'lam kirine, hêvî û gumanêñ xwe wê va girê dane, piştovanya wê dewletê xwestine, lê mixabin timê soz û gotinêñ wê dewletê hindava gelê kurd da vala derketine, cî jî ku hatye, pişta Kurda vala hiştye.

Dostanî û yekîtiya bê qelp navbera evdêñ wê heremê yê Kurdêñ êzdi, Emenî û Aşûrya da hebûye. Şedetya wê yekê hemâ ev neme bi xwe ne. Neme bi destê Ermenyan, bi zimanê ermenî hatine nivîsar, Ermenyan jî neme gîhandine cî. Usane Mîrzikê Zaza amintîya xwe pir bi Ermenya anye û ji wan bawar kirye. Tê kivşê dostanîke xurt navbera Serekeşîr û gelê Ermenî da hebûye. Ermenyan jî tanga xwe da Mîr hiz kirine, qedirê wî girtine.

Ronakbirê Ermenya, yê wê dewrêyî mezin **Xaçatûr Abovyan**, di gotara xwe, ya bi nav û deng **EZDÎ** da, dinivîse, ku keşîsekî Ermenî, yê ji Ridiwanê hatibû Yêrêvanê, şedetî dida, ku wî bi xwe “bi meha zarokê Mirê Êzdîyan yê bi nav û deng Mîrza axa hînî xwendin-nivîsandina zimanê Ermenî kirye.”

Di cîkî din em dixûnin: “ Çawa şedekî bûyara gilî dike, vê dewyê serekeşîrê Êzdîya Mîrza axa û keşîşê Ermenya Poxos ecêvîn egîtyê û mîrxasyê nîşan dane. Sala 1828 an, li ber kela Ridiwanê, ji Mûsilê ne dûr, her yek bi êla xwe nêzîkî hêzên ji Tirka û Kurd yê 30 hezarî dîbin û bi qewatêñ xweye biçûk wê artêşa mezin diqelînin. Di wê derheqê da kilameke Kurdan da wa tê stiran...”(12)

Xaçatûr Abovyan di dewya gotara xwe da çawa “Serzêdeyî” bi werger perçekî ji wê kilamê tîne:

## KEŞİŞ POLO (13)

*Kilama Ezdiya ya méranyê  
derheqa şerê dijî Tirkan û  
Serekeşîrê Kurd: Şêx Qasim da.*

*Li Ridiwanê karî şîn dibe,  
Hespê Mîrza axa hîre-hîre,  
Keşîş Polo li Şêx Qasim kire gazî,  
Go: " Min eskerê te gişk qeland, serê wan firand. "*

*Li ber Ridiwanê çem dikşe,  
Eskerê Şêx Qasim xwe da navê,  
Mîrza axa û Keşîş Poloyê egal  
Lê kirin gazî: „Me hezar siyarê te  
Wê dane ber van riman.”*

*Li Ridiwanê baxê tirya ne,  
Eskerê Şêx Qasim kete wura,  
Keşîş Polo lê kire gazî:  
" Serê we ji boy me serê pîvazane. "*

*Delan wê hêjîre,  
Şûrê Miçoyî zincîr kirye,  
Miço kire gazî: „ Xwedê şedeye,  
Mérxwesê min, birayê min,  
Rima te şikestyé,  
Çeqmaqê qirmê me şikestine. »*

*Sûra bigirine xwe  
Û piştê va neferê me xweyî kin,  
Wekî saw bikeve ser kafir,  
Xwe li mera negîhîne.*

Nivîskar Wezîrê Eşo, di gotara xwe ya “ Dost û xêrxwezê cimeta Kurda” da, li ser hîmê lêkolînên Abovyanzana dinivîse, ku sala 1844 an meha adarê helbestvanê alman F.Bodêştêd tê Yêrêvanê û ji Aboyan hîvî dike, ku kilamên hemû gelên li qeza Yêrêvanê da dijîn ji devê stiranbêjan binivîse, berevke û jêra bişîne. Aboyan wê spartina şayîrê Alman cî tîne û heta ew vedigere welatê xwe (sala 1846-a) jêra dişîne. Ew stranên ermenî, kurdî û azeyrî yên bi destê Aboyan hatebûn berevkirin û peyv-peyv bi zimanê almanî hatibûn wargerandin F.Bodêştêd sala 1865-a li bajarê Bêrlînê di pirtûka xwe ya bi navê “Hezar û yek rojî li Rojhilatê” da çap dike. (14)

Usane ev kilama, ku cîyê xwe li nav deftera Aboyan da girtîye, di navbera salên 1844-1846 an ji devê dengbêjekî Kurdê êzdî yan Ernenîkî bi kurdî diaxive hatye nivîsar. Wekî em bala xwe bidine qetlemên Delanê û Elenzê qewimî, ku bi navê Mîrzikê Zaza, Keşîş Polo, Şêx Miço û Şêx Qasim va girêdayîne di navbera salên 1825-1828 –a da qewimîne. Li navbera bûyara û nivîsara kilama wê derheqê da 15-20 sala zêdetir nîne. Dibe dengbêj bi xwe jî tevbûyê wan bûyaran bûye .

Li nav zargotina Ermenya ya gelêrî da gelek melûmetyên giranbiha di derheqa şexsyeta Mîrzikê Zaza, berbirbûna wîye qenc berbi gelê Ermenî û gelên wê heremêye din da, usa jî derheqa şerkarya êla wî dijî dewleta Osmanyê û fanatîkên kurde olpereste sexte da hene .

Çevkanîkê da, di pirtûka zargotinê ya rewşemberekî Ermenya yê wê hênenê, folklorzanê wanî bi nav û deng **Garêgîn Sirvanzyane “Hinos yêv noros”** ( Kevn û nu. E.B.) da xetên wa hene: “Wê hênenê li Sêrtê û li Ridiwanê mîrekî Maran (Kurdan. E. B.) yê serbixwe: Êzdî Mîrzik rûniştibûye. Ew bi dilovanî û xemxurî li Ermenî, Asorî û Êzdîyên li bin hukumê xwe da xweyî derketye. Mîrzik efat bû û rem. Gelek ji zulm û zora zaliman direvyan û li cem wî star dibûn. Her kesî aza dînê

xwe diparastin. Ji ber wê jî binelyê wê qezayê pir û bi hêz bûn. Bûbûne sturyê çevê der-doran.”(15)

Hazirkirye efrandinê Xaçatûr Aboyan derheqa kilama **KEŞİŞ POLO** da melûmetyên hewaskar ji zargotina Ermenya ya nivîskî hildane û di cilda efrandinê nivîskar, ya 8 an da weşendine. Ji bo ew melûmetî seva ronîkirna wan bûyarên dîrokî pir hewaskarin, me pêwîst dît wê nivîsê, temamî, bi wergera Wezîrê Eşo, çawa heye, usan jî bê kêmkirin vira, di nava vê lêkolînê da bînin:

“ ....Xêncî vê kilama Êzdiyan, derheqa Keşîş Polo da usa jî qisa Ermenya ya gelêrî heye, ya bi sala hatye gotin û hatye gi-hîşte berevkirê zargotinê yê mezîn, zanyar Garêgîn Sirvan-zyan. Wî jî ew qise kitêba xwe ya “ Hinos yêv Noros “ ( Kevn û Nû ) da çap kirye. Ji pêşxebera kitêbê eyan dibe, ku ew qise, sala 1852-an, ji alyê folklorzan Poxos Tovmayans da, li dêra Sûrb Arakêlos, ya bajarê Mûşê, ji devê Keşîş Sîmonê ji gundê Kacarana Sasûnê hatye nivîsar. Li navbera qisa Ermenya u kilama Êzdiya da tenê cûrê hildana nava heye. Keşîş Polo bûye Kîşê Polê, Mîrza axa jî Mîrzik ( Qisa Ermenya da navê Mîrzik rast hatye xweyîkirin. E. B.) kîjan bin hukumê zarava da qewimîne. Me pêwîst hesav kir wê qisê bînin, ku naverok pakî bê şirovekirin.”

“Mîrzikê Êzdî Mîrê Sxêrdê û Ridiwanê bû. Ew xaçparêzan ra heyf bû. Li Baxîşê ( Bitlisê) dewrêsekî Mar bi navê Nebî dima ( Li şenlika Üsîl-Giranê) yê ku xelq karoz ( şiret) dikir, yanê cimeta ( xelqê) cîye din bînin li ser ayîna dînê Mehmedyê, yanê jî xezakin. Û awa sala 1820-î ew êrifê teşkil dike diji Êzdiyên Sixîrdê, Ridiwanê û Ermenyan. Serokatyâ wî leşkerê 36000-î hakimê Botanê Mîr Mehmûd dike. Xelqê Ermenî û Êzdî hewara xwe Keşîş Têr-Poxos (kîjanî ra digotin Kîşê-Polê û teva pir jê hiz dikir) û Mîr Mîrzik dadixin.Poxos hêhana dide

xelqê, wan ruhdar dike, wekî heta ruh li ber wan heye şerkin, ji bo ew şer seva azayê û ayîna dîne. Gel, ku rind haj mîrxasya pêşîkarê xweyî oldar hebû bi guman pey wî diçe. Ordîya Êzdiya û Ermenya ya tevayî (weke 10 hezar mirov) biharê şerekî dijmin ra datîne, kîjan şerekî pir giran bûye. Derheqa wi şerî da di qisa gel da we hatye gotin: "Li wî warî, lez, bi bezê sefer kirin, mîna Şêrê hicûmî li ser nêçîra xwe bike û mîna teyrê Sîmir Mîrzik û Têr-Poxos xwe pêra gîhandin, êrifş kirin, ketine nava leşkerê Maran, mîna alav-agirê li qamûş bigre, bişewitîne û mîna ewrê birûskê kirne firtone, rast û çep didanê, dipelixandin, ser sérî tanîne xarê, nize, rim li bedena wan ra dikirin, leşkerê ordya wan e bijare dikuştin, jorda gulol dikirin. Serê du mîrxasê wane kivş birîn, li serê niza xistin, anîn li nav leşkerê xwe. Bi gumana altindaryê xelq ruhdar dibûn..."

"...Ji hevketina herd alya û teqandina çek-sîlihê bê hed hesav rûyê royê hate girtin. Bi şûra, rim û niza hev qir dikirin. Mîna darê daristaneyî kokbirî leşker li ser hevda mîl dibûn. Şîrqîna dengê tîr kevana bû. Şer gur bû, mîna birûska li nav ewrê esman û firtona pêla li berê rabûyî."

"Gelek sehetên dirêj wa derbaz bûn. Ne alyê altindar û ne jî alyê altbûyî dihatine kivşe. Çimkî mîrxasya alîkî û pirbûna alyê din beramberî hev derdiketin."

"Û li vê dema giran serleşkerê ordîya Bohtanê Mîr Mehmûd, wî zilamê zorî zorbe, hespê xwe yê kihêl rikêf kir. Ew ji sérî hetanî pîya bi reşxana hesinî zirikirî bû. Rim dêst da pêşda hicûm kir, rast û çep ji alyê Ermenya gelek raxist erdê, bi xwe jî silamet gîhişte wê tangê, li kîderê Mîrzik bû. Têr-Poxos li pey xwe nihêrî, dema dît, ku karê Mîr Mehmûd ewqas açixe û ew ewqas pêşda çûye, hespa xwe ajot, xwe lez bi wîra gîhand. Parava, ji hespê xweyî quer (reş) banz da ser pişta hespê serleşkerê Mara, para va bi destekî ew qepeçe kir, destê wî li sîngê wî va guvaştin, bi destê din soranî ji ber pişta xwe kişand û patka wî

ra kir. Xûna Mîr Mehmûd kişiya û ew ji ser pişta hespê şiqitî erdê. Paşê rima kuştî hilda, hespê wi yê bozî stukurdirêj syar bû, zengû kir, çû hewara Mîrzik. Mîrzik jî êdî bi mîranya xwe di-gîhişte altindaryê. Ewî jî mîna Têr-Poxos qir dikirin. Û kî ket hemin ket, kî revî hemin revî, li rûbarê dinyayê ji hev belayî bûn.”

“Leşkerên dijmin revîn, li nav kîjana da tivingçî jî hebûn, xwe gomê Sixêrdê ra gîhandin, li wur star bûn. Leşkerê Mîrzik û Têr-Poxos ketin li pey wan, ew goma da kirne li nav hesarê. Dixwestin wan dîl bigirin, lê vana jî şer kirin, li ber xwe dan. Û ji bo teslîm nebûn, Mîrzik emir kir agir berî goma din. Ew goma da zêndî-zêndî şewitîn, bezê wan mîna rûn helya û çawa cew kişiya nava çemê nêzîk. Evdêñ wur ew tev bi çevê xwe dîtin.”

“Altindara talanê leşkerê dijmin gişk birin û bi şabûn vege-ryan cî-warêñ xwe. Marê zêndî mayî nikaribûn meremê xwe yê berê bîr bînin û ne jî heyfa vê altbûna mezin hildin. Hukumê Mîrzik mezin bû, navê Têr-Poxos mezin bû û besa zêndibûna wan saw dikir li ser Mara heta roja mirina wan.”(16)

Helbet vira da, bûyar bi cûrê zargotinê hatine şirovekirin, reng hatine tîrkirin, lê ya serake û pêwîst ji me ra ewe, ku hinek nav, bûyar, cî rast hatine xweyîkirin. Xêncî hinek tiştan naveroka vê û bîranînê li cem Îzeîyan tê gotin li hev digrin. Qîmetê van çevkanyan bilinde usan jî ji bo wê yekê, ku ew ji wan bûyarêñ xûnrêje dîrokî ne ewqas dereng hatine nîvisar ( 1852 ), dema qewimandin hê di bîra xelqê da nû bûn.

Çawa çevkanya zargotina Ermenya da, usan jî bîranîn û kilamên Kurdên êzdî, yêñ dîrokî- gelêrî da derheqa dostanya gelên wê heremê, tifaq û yekîtya wan da tê gotin. Ew germayî ji bîranînê Arxiologê İnglis Aûstên Hêny Layard da jî tê tex-mînkinin.

Wan salan, çevêñ gelek dewletên Rojava li ser Rojhilata navîn, xazma li ser Kurdistanê bûn. Ew war cîkî stiratgîk bû û

dewleteke mîna ya **Înglis**, ku wê dewrê hakimê cihanê bû, dxwest ew herem jî bikira li bin hukumê xwe. Kurdisan navbera herd Împératoryên wê heremê, yê mazin da parevekirî bû. Ew Împératorî jî çiqas diçûn ewqas zeyîf (lewz,qels) û sist dibûn. Dewleta Rûsa jî alyê bakûr va hidûdên xwe ji hesavê wan fire dikir. Mêla gelên xirîstyan û bindest berbirî dewleta Rûs zêde dibû. Ew yek dewletên Rojava xweş nedahat. Wana ji alîkî va nedixwestin bandora dewleta Rûs wê heremê da zêde bibe, alyê din va jî xwe dixwestin bibin hakimê wî warê stratêgikî dewlwmend.

Hewaskarya nivîskar, lêkolînvan, arxîolog û zanyarêne ulm û dîroka kevnar ya Rojhilatê jî berbirî wê heremê kêm nî bû. Ew war dilê Mêzopotamya qedîmîye kevnar bû, li kîderê hîmê şâristanya mirovayê hatibû danîn. Ew cîyê xuliqandina ola û Pêxembera bû, rîya Rojhilat û Rojava digîhande hev. Teva dixwest ew cî û warêne hikyatî bidîtana, rastyâ wan bihsyana.

Wan sala gelek lêkolînvan, diplomat, pisporê leşkeryê, rîwî, nivîskar, dîrokzan hatine wê heremê û melûmetyen hewaskar yê nvîskî ji pey xwe hîstine.

Êzdî jî, çawa perçekî gelê kurd, ku li ser erf-edet û ola xweye kevnar mabûn bala her kesî dikşandin li ser xwe. Derheqa bûyarêne, ku Kurdistanê da wan salan qewimîne gelek tişt ji alyê wan rîwî, diplomatên biyanî va hatye nivîsar. Û ew ni-vîsarêne (raste wan da kemasî û nerastî jî pîrin) wan bûne çevkanîyen giranbiha ji bo ronîkirina dîroka gel û welatê me.

Di wî warî da pir hewaskarin bîranînê arxîolog û diplomatê **Înglisî navdar, xêrxwezê Êzdiyan Aûstîn Hêny Layard**.

Ew zanyarê navdar, du cara tê Kurdistanê û herd cara jî Êzdiyan dibe mêvan. Cara ewlin sala 1846 an tê Başûrê Kurdistanê. Wê hingê Mîrê Êzdyan Huseyn beg bûye. Ew pirtûka xwe, ya bi navê "Aûf dêr Sûche nach Nînove..." Leipzig, 1850-

î, rûpelê 169-205-a da wê derheqê da bîranînên xwe dini-vîse.(17)

Derheqa halê Kurdêñ êzdî li dewleta Osmanyê da ev nivîsa çevkanîke giranbiha ye. Ew, bi çevê xwe jîyan, rabûn-rûniştandin, usan jî zulm û zora li Êzdiyêñ wê heremê divîne, dibe şedê gelek bûyarêñ tiragîk. Zulma dewleta Osmanyê tev xezeva "Cihada" fanatîkên olpereste musulman û hukumdarêñ Kurden qasterî bûbû û li dora Êzdiya bûbû govekeke zulmê, xezevê, fermana û qelandinê. Di serê kê ra çi nêt û fikirê neqenc derbaz dibûn, bi kîn, çek û sîlih, bi çekdarêñ fanatîk davîtin li ser cî û werêñ Êzdiyan.

Layard, pirtûka xwe, ya bi navê "Nîneveh und Babylon" da wa dinivîse: " *Ji Bitlîsê sê rê diçûne Cizîrê. Ji wan hersê rîya dudu li nav çîya, li ser bajarê Sîrtê ra derbaz dibûn. Piranya karvan û rîwî di wan herd rîya ra diçûn. Rîya sisyan li rojhilate çemê Tigrîsê ( Dicle ), li nava gelyêñ dûr û dirêj ra diçû. Min qirar kir rîya sisya ra herim, ku li ser rîya xwe gundêñ Êzdiyan, yên herêma Xerzan bibim mîvan. Em 20-ê mehê ji Bitlîsê derketin.*"

" *Dema em gîhiştin herêma Xerzan li gundê Êzdiyan Hemîkê, roj êdî çûbû ava. Gundîyan tiştê xwe didane ser hev. Gava qelfîn sîyarêñ me nêzîkî wan bûn, ew evdêñ asyayî ecêvmayî û bi tirs li me nihêrîn. Qewal Ûsiv, ku çefya Erebî li serî û dêmê xwe pêça bû, vekir, çû li nav wan û bi dengekî nerm daxwez kir, ku em wê şevê li cem wan bimînin. Lî ji çevêñ wan evdêñ belengaz dihate xanê ku ew wê daxweza me naxwezin û nikarin bersîveke neyînî jî bidin. Wê demê Qewal Ûsiv ew rewşa wan fem kir, çefîya serê xwe bi hêrs avîte erdê û got: "Hey hûn evdêñ nemerd, dêmek hûn naxwezin nan bidin Qewalê xwe jî û dixwezin wî birçîji ber derê xwe vegerînin? "* "

" *Gava wan ev gotinêñ Qewal bihîstîn, carekê va tirs ji dilê wan derket. Teva bi hevra hacetê destê xwe avîtin erdê û haitin*

*destê Qewêl. Xortek bi lez çû, ku mîzgînyê bide gundyan. Çiqas zilam, jin, zarok, kal, pîr gund da hebûn gişk hatine pêşya me.”*

“*Êdî ne hewce bû, ku em xwe bidine naskirin. Şaya ji bo me dest pê kir. Hinekan rahiştinê barê hespê me peya kirin, hineka çadir vegirtin, hineka jî pez seva me serjê dikirin. Feqîran bawar nedikirin me têr bivînin. Wana ji musulmanen der-dorêñ xwe bihîstibûn, ku dema Qewal Ûsiv û hevalên xwe çûne Stembolê, bi emrê Sultan hatine xeniqandin. Ew serê heyşt meha bû Êzdyan tu caw û bes ji Qewal Ûsiv ne standibûn û destê xwe jê şûşti bûn. Wan, nerastîya wan salixyan bi çevê xwe didîtin û bi kêf hevra digotin: ” Ne ew miribû, wê disa sax bûye, ew unda bûbû, carke din va hatye dîtin.”*

“*Piştî demekê rîspîyên gund li dora Qewal Ûsiv civyan. Qewal jî ci li serê me ra derbaz bûbû wan ra gilî kir. Derheqa hatina xwe ya Stembolê, hevraxeberdnê, ku bi berpirsyarêñ dewletê ra ji bo parastina Êzdîyan, xweyîkirina aşityê, çawa em jî paytext derketine, çawa qeyîka sîyar bûne, qeyîka da ci hatye serê me û çawa em hatine gîhiştine herêma Xerzan, tev yeko-yeko, ne kêm, ne zêde wan ra bi rêz kir. Piştî, ku navber dane axaftina xwe, vê carê berê xwe dane min û bi qedir ez silav kirim, xêrhatina min xwestin.”*

“*Dema min ev rûniştandin û axaftina Qewal Ûsiv guhdarvanen wiye extyarêñ gund mîze dikir wenêyêñ kitêbêñ pîroz hatine bîra min. Eger mirovêñ wanekêş yan jî lêkolînvan bixwezin ziman, libas, erfû edetêñ xelqêñ kevnar naskin, wane û şiro-vekirnêñ kitêbêñ pîroz da bi zêndî bivînin, pêwîste ew bêñ li Rojhilatê bigerin û her tiştî bi çevê xwe bivînin.”*

“*Serê sibê ez ji qerebalixa heytehol û dengê lingê hespan hişyar bûm. Camérêñ gundê Hemikî, êvar da mîzgînya hatina me dabûne gundêñ Êzdîan yê nêzik. Heçî ew caw standibûn berbang da sîyarî û peya rê ketibûn, hatibûn. Teva dixwestin me bivînin û rîwîtyê da ji me ra hevaltiyê bikin. Hemyan, cilê xwe*

*yê nûye reng bi reng xwe kiribûn, kum û kolosên xwe bi kulîlkan xemilandibûn. Serokên wan Akko ( Aqo) yê di şerrên berxwedenâ Ézdiyan ( bi texmîna min gilî derheqa şerê li ser Erenza Şêxa da ne E.B.) da şervanekî jêhatî û li wê heremê da zilamekî bi nav û deng bû. Çiqas jî têlên sipî ketibûne li nav porêñ wî, lê ew hê jî pir ser xwe bû.”*

*“Muxtarê gundê Gozelderê, di tev serokên gund ez teglîfi mala xwe kirim. Dixwest em herin mala wî û nanê wî buxwen. Me jî nikaribû vê daxweza wî ra bigota na. Dema em ber bi gundê wî rê ketin gelek komên siyari û peya dihatin pêşya me, destê min radimûsan.”*

*“Koma me çiqas diçû mezin dibû. Evdêñ wan gundêñ li ser riya me, cilêñ xwe yê şayan xwe kiribûn, derketibûn li ser xwenyan, hineka jî pez tanîn û ber piyê hespê min da serjê dikirin.”*

*“Dema em gîhîstîne hewşa mala Akko, jin û mîran bi dengekî lîlandinê. Hemû neferêñ mala Beg derketibûn ber dêri. Çaxê min kir ji hespê peya bim dayka wî xwest bi xwe alîkarya min bike. Em derbazî avayîkî paqîj bûn. Li wur da paqijaya xwenyên Ézdiyan û jîyana wan dahat xanê. Ez û mezinêñ bi min ra li ser xalîçen reng bi reng rûniştin. Pey me ra çend feqîr ji gundêñ dorê hatin. Cilê wan, terîbûn û tûrbanêñ wan reş û sor bûn. Ustîyê yekî da zincîrek hebû. Wî digot, ku ew zincîra ya mirovêñ Xwedê dayî ye. Paşê gelek begêñ wê heremê qelfen siyar û peyayêñ xwe va hatin û li me civyan. Qewal Üsiv dîsa mesela xwe ji wan ra bi temamî dubare kir. Pey xwerina goşte berxan, birinc, şîrmayî û tiryê wê heremê ra, anîn xalîçeve bi destan çêkirî dîyarî min kirin.”*

*“Dû ra em tevî feqîr û komek siyarêñ meznêñ gundê Gozelderê ji gund derketin. Rêva birrek siyarêñ Ézdi û Xaçparêzêñ yakûbî jî hatin gîhîstîn me. Zilamê pêşya wan: Nemo cilê ji şîfonê Hindistanê û qapûtekî pir baha lê bû. Ew begê Kurd muxtarê gundê xaçparêzan bû. Li dora wî mîteranek û gelek keşe*

*hebûn. Heta em gîhiştine gundê Kûşayê sîyaran bi hevra cirîd kirin. Piranya binelyên wî gundi xwe bi cilêن spî xemilandibûn. Pîreka ava sar û dewê cemidî li nav me digerandin. Gelek evd derketibûn û li ser xanya kom bûbûn. Wan jî dixwestin, ku ez peya bim û li wan bivim mîvan. Lî dema me ya rewastandinê tune bû. Min silav da xelqê topbûyî û dû ra em ketine ser rîya ku diçû Ridiwanê.”*

*“Koma me çiqas diçû mezin dibû. Ji gundêن wê heremê mirov dihatin û tevî me dibûn. Rê da em rastî sê qewala hatin. Wê demê ew li nav Êzdîyêن wê heremê digeryan. Ew kesan mirovên Qewal Ûsiv û nasêن min bûn..”*

*“Dema rîya me ji nava çîya derkete deşta rast û em nêzîkî bajarê Ridiwanê bûn, teyê bigota karvanê me ji herbeke serketî vedigere. Komên sîyarî û peya ji gundêن der - doran bi kêt dihatin pêşya me. Li ber Ridiwanê, komeke mezin bi def û zurnê em pêşwezî kirin. Ji pey wan komeke Ermenya, bi keşê xwe va dihatin, dû ra jî Yakûbî û hinek xaçparêzên din tevî oldarên xwe dihatin. Heta em gîhiştine li ber derê Nazî çiqas evd Ridiwanê da hebûn, tev derketibûn li ser xanyan û destê xwe me ra dihejandin. Nava wê mûzîk, lîlandin û heyteholê da em gîhiştin mala Nazî.*

*Nazî meznê Êzdîya yê wê heremê bû. Dema min lingê xwe avîte zengûya zîn û xwest ji hespê peya bim, du pez li ber pîyê min da serjê kirin.”*

*“Qasek şûnda mala Nazî bi giregir û pêşikêşen Ridiwanê tije bû. Qewal Ûsiv mecbûr ma dîsa besa hewildanê xwe yê Stembolê, besa wan qiraran yê ku mafê Êzdîyan weke yê Musulmanan dipejirînin û Êzdî neçine qulixkirna leşkeryê bike. Wê navberê da me te ştê jî xwer. Min bala xwe da rewşa mala Nazî. Mêvan pir dihatin û diçûn. Min texmîn kir, ku ez li nav xwe ji hazira xwest, ku destûra min bidin ez herim li dêra xaçparêzan û li wur rehetya xwe bivînim, ku paşê karibim çêtir wê heyteholê da*

*nikarim rehet bibim. Ji boy wê jî min hizûra bi Axê ra şîvê bu-xum û beşdari şayan bibim.”*

*“Dêr li pala girekî bû. Li serê gir jî quesra Ridiwanê ya hilşayî xanê dikir. Ev dêra ji alyê Mîrza axayê meznê Êzdîyan, ji bo xaçparêzên Ermenî hatibû çêkirin. Ev nimûneke xweş û barkêşe, ku şaristanyêن pêşdaçûyî bivînin, evdêن ji ol u miletêن cuda çâ karin bi tifaq û aza hevra bijîn.”*

*“Nazî ji malbeta serokê Ridiwanê yê dewî ye. Destpêk û de-wya serhatya apê wî Mîrza axa (Mîrzikê Zaza. E.B.) mîna ser-hatya gelek serokên wan gela ne yêن, ku Tirkîyayê da ji bo ser-xwebûnê şerkarî kirine. Gava serfermandarê Osmanyê yê bi nav û deng Reşîd Paşa hucûmî li ser Bakûrê Kurdistanê dike û berê xwe dide Başûr nêzîkî herêma Mîrza axa jî dibe.. Mîrza axa xwe dide destê serleskerê Sutan. Welîyê dewletê Axê ji quesra wî derdixe dewsa wî yekî bi navê Emîn axa datîne. Evê han hê pak li Ridiwanê cî nebûyî jina Axê Êzdîyan, bi destê zorê drevîne. Mîrza axa dewsa dijî wî rahêle çeka, diçe cem Reşîd paşa û dibêjê, ku ew pîreka revandî ne jina wîye, carîke. Dibêjê, bira bawarya te ji min hebe, bira Emîn axa vegere ser karê xwe. Axê Tirk vedigere ciyê xwe. Mîrza axa êrîşê dibe ser wî, wî û du kesen wî ra dikuje. Heyfa xwe hiltîne.”*

*“Reşîd Paşa hicûmî li ser Ridiwanê dike, lê ji bo wê demê leşkerê dewletê şerê dijî Mîrê Rêwandûzê va mijûl bûn, nikare heremê bike bin bandora xwe. Dema Reşîd Paşa şerê dijî begli-kê Kurd da li ser dikeve, Mîrza axa dîsa diçe xwe davêjê. Padşa dîsa Mîrza axa dike serokê wê heremê. Ji pey mirina Reşîd Paşa ra welîkî Tirkî nû tê wê heremê. Ew welîyê nû Mîrza axa teglîfi li cem xwe dike û bi xayîntî dikuje. Mirovên Axê cinyazê wî tînin û li ber çêm, goristana rojavayê bajêr da vedişérin.”*

*“Pey ra, li ciyê wî Nazîyê birazyê wî rûdinê Qesra wan wê-ran bûye û ew jî mîna xulamên xwe di avayêñ kerpiç da dijî.”*

*“...Ridiwanê ra dibêjin bajar, ji bo ew cîkî mezin ava bîye û wê heremê da xweyê sûkeke pir girînge. Ew wek navenda qezayê jî dihate naskirin. Wur da devedevî heysid avayên ne ewqas cîwan çekirî hebûn. Bajar li kenerê çemekî mezin e, kîjan dikşe û 5- 6 km wê da digîhîje çemê Tigrîsê ( Dicle ). Ew jî ji Diyarbekirê tê. Binelyê Ridiwanê da dijîn, xêncî sed malê Ermenî û cil-pencî malê Yakûbî-Kildanî yên din Êzdi ne. Rêvabirê vê heremê yekî Tirke. Ew jî, roja em li wê bûn, ne wur bû.”*

*“...Qewalên, ku her sal ji alyê Huseyn beg ( Mîrê Êzdiyan yê wê demê.E.B.) û Şêx Nasir (Extyarê Mergê. E.B.) têن şandin, ku li nav Êzdiyan bigerin wê demê hê li Ridiwanê bûn.”*

*“...Şayî û dîlana wan heta nîvro jî dom kir. Bajêr da tu mal nema bû, ku ji bo xatirê min berx serjê nekira...Ji pey xwerina şîvê ra, li hrwşa Nazî da şayê û dîlanê heta berê sibê dom kîrin.”*

*“...Me serê sibê teştiya xwe li mala Nazî da xwer û teví komên Êzdiyan ji Ridiwanê derketin.”(18)*

Ji bîranînên Aûstîn Hêny Layard tê xanê, ku wê demê Êzdiyan ji bo parastina xwe hêvîke pir mezin dewletên Rojava va girê dane, ku ew zorê bidin hukumdarên Osmanyê, wekî walêt da mafêñ Êzdiya jî bêñ parstin. Ku ew jî karibin, welatê xwe da bi aramî û aşîti bijîn.

Hatina wî dîplomatî demeke dîrokîye usa da pêk dihat, ku Êzdiyan derbine pir giran û bi êş ji alyê dewleta Osmanyê û oldarêñ kevnepreste, fanatîke musulman da xaribûn. Qira du gundêñ Êzdiya: DELANA, şerê li ser ERENZA ŞEXAN, peyra hincirandina li ser Êzdiyêñ Ridiwanê û dora wê, qetlema Mîrê Rêwandûzê ( Mîrê Kor ) dijî Êzdiyêñ Laliş û Şengalê, zordaryêñ Mîrê Botan li dijî Êzdiyêñ Cizîrê, qelandina êla Şêx Mîrzâyê Anqosî...Eva hinek ji wan rêza bûyarêñ bi xûnin, qetlyamên qirkirna bi seda hezara evdane, derheqa kîjana da pirî hindikî

melûmetî gîhîstine destê me. Lê çiqas bûyar bûne, ku ji wan agadarî nemane, hatine bîrkirin?

Dema em dîroka koçberya Êzdiyan ber bi Ermenistanê dîn-hîrin, dibînin, ku ew koçberî jî di wan salan da pêk hatye. Wan salan usa jî neyartî dikeve li nav eşîrên Êzîdyêن **SÎPKÎ**. Sîpkî eşîreke kurda ya Srhedye here mezin bûye. Evana dibine du para û radibin dijî hev. Para,ku li ser bawarya xweye kevnar dimîne, direvne alyê dewleta Rûs, di qeza Qersê da cî dîbin. Qers wê demê di bin bandora dewleta Rûs da bû.\*(19)

Pêşekzanê Elmanî leşkeryê, yê bi dereca bilind Hêlmût Fon MOLTKÊ, ku wê demê Osmanyâ ra qulix dikir, bîranînê xwe da wa dinivîse. “Dema Reşît Paşa ji pey gelek êrîşen xweye bi mehan berdewam ra, bajarê Cizîrê kire li bin hukumê xwe, pi-ranya binelyê wê yê zilam, ewên Êzdî, an jî ew evdêن “MELE-KÊ NEQENC” dihebandin kuştin, pîrekên wan jî hêşîr girt.”(20)

Usane wê demê tevî hincirandin û ji holê rakirina beglikên Kurdan, wêrankirina Kurdistanê dewlwtê dutîretî, nakokî û neyartîya xirabe qirêj kiribû li navberan ol, êl û e'şîrên kurda da jî. Ku yekîtî û tifaqa Kurdan çê nebe. Bi destê Kurdan Kurdanbihincirînin...

Qulixçîkî Rûs, ku wê demê li dewleta Osmanyâ da qulix dikir û rind haj xeystê kurdan hebû dinivîsi : ”...qelsaya kurdan ji bêtifaqya wan tê. Tirk jî ji wê bêtifaqya di nav bê hesav eşîrên kurda da heyî, di warê bihêzkirina dewleta xwe da karê dibînin.”(21)

Êzdî pir bi coş û germayî **Aûstîn Hêny Layard** qebûl di-kin. Bawarkî êlên Êzdîxanê, yê wê heremê tev têne pêşya wî. Hatina wî li nava Êzdiyan da dibe mîna cejneke netewî.

Ji bîranînan usa jî dijwar nîne mirov tê derxe, ku di nava pir-sên pilana Layard da, rasthatina di gel Êzdiyan ya here hîmî bûye. Eva bi texmîna min tek ji hewaskarya dîplomat-arxiologê

naskirî, ya berbi Êzdîyan nayê, ew hewaskarya Împératorya Birfityayê ye, ku bi destê diplomatê xwe xwestye qewata Êzdîyan, berbirbûna wan berbi wî welatî, bawarya wan e siyasî bihese.

Tiştikî barkêş û cîyê fikirandinê ye, ku rêvabirya wî diplomatê payabilind yê wê dewleta mezin û bi hêz qewalekî Êzdîya: qewal Ûsiv dike. Eyane qewal Ûsiv oldarekî Êzdîyan bûye, li nava wê dewlet û civakê da li kîderê êzdîyatî dihat înkarkirin û bi ola dewletê ya fermî: İslâmê qedexekiin. Ewî qewalî nikaribû bêqezyabûna rîwîtya wî jî mîyaserke. Lê gelo çîma wî, qulixçîkî dewletêyî derece bilind, li wan dera beled, zanê zimanê înglisî, yan yekî xwendîyi-zane, yan jî mirovekî xaçparêzî zimana zane xwe ra nekîrye hevalê rê? Çîma seva hevalîtya rê qewal Ûsiv bijartîye?

Bi texmîna min ewî ev bijartin bi zanebûn, diplomasî kirye, ku bikaribe amintîya Êzdîyan dest bîne, bikeve li nav civaka Êzdîyan û rastîya wan bihese.

Eşkere ye, ku Êzdî, bi dewr-zemanan ji ber bîr û bawaryê xwe alyê der-dora da dihatine zêrandin, pelçiqandin, qelandin, mafêن wan dihate binpêkirin. Fermanên qirkirnê li wan radikirin bi her cûreyî dixwestin Êzdîyan ji holê rakin, hebandina wan bikin mesela qerf û qara, li nava civaka der-dor da wê bawaryê bêrûmet bikin. Bi her cûreyî meydan li Êzdîyan hatîbû tengkirin. Astengyêن aborî, civakî, sîyasî tevî fermanên qirkirine heta riya jîyanê jî li Êzdîyan dihate birîn.

Li nav gelê kurd da peyva “**Dîn dijminatî**” heye. Yanê dijminatyâ navbera civakekê da seva dîn, seva bawaryê. Eva na-kokya gele navxweyî ye. Dijminatî û neyartî ji hev ra kişandine ji bo bawaryê. Wekî êzdîtyê, çawa xweykirê nirx û ruhê kurdî-yatyê ji holê rakin dagerkirê olê û civakê kurd rakirine dijî kurdan.

Ne ku tenê li nav kurdên musulmam, lê usan jî li nav biyan-yan da vir-derew bi zanebûn bela kirine, ku giva Êzdî “Melekê ne pak” “dihebînin, Êzdî “Xwedê nas” nînin, “Kafirin”, “Hera-min”, “Merivkujin” û şer-şiltaxê din. Eva yeka ne tenê bi destê oldar û fanatîkên musulman lê usa jî xaçparêzan hatye kirin. Çevê herdu ola jî qelandina Êzdîyatî bûye. Lê zora musul-manyê li ser Êzdîyan bi hêztir, zêdetir û xezevtir bûye. Ji bo musulmantyê wê heremê da êzdiyatî çawa hêzeke dijî xwe didîtin.

Êzdîyan jî, ku xwe ji wê neyartî û êrîşa dere bi hêz biparêzin “Sûreke pola” kişandine dora xwe, zewaca xwe di evdêen olên din ra qedexe kirine, rastîya xwe kesî ra negotine, amintîya xwe bi kesî nanîne, sura ola xwe ne devkî ne jî nivîsar kesekî ne ji dînê xwe ra venekirine, der-dor tev ji xwe ra xêrnexwez dîtine. Çimkî bi çevê xwe dîtine, ku li nav civaka îslamê, ye wê dewrê da kuştina evdekî Êzdî û çivîkekê yek bûye. Ne morala civakê, ne jî hiqûqa dewleta Osmanyê Êzdî parastine. Ji bo van

sedeman civaka Êzdîyan çiqas çûye teng bûye, bûye civake-ke girtî. Mînakeke barkêş bîranînê Layard da heye, ku vê fikira me ızbat dike. Dema ew têne hereme Xerzan, gundê Hemikê, Êzdî amintya xwe ji wan evdêن xerîb naynin, naxwezin wan qebûlkin û wê şevê gundê xwe da jî bisitîrinin. Lê dema eşkere dibe ku “mêvan ji wanin” carekê va têن guhestin û derê her malê li ber mîvanan vedibe. Êzdiyan bawarya xwe ji der-doran unda kiribû.

Tê xweyakirin pêwendî di navbera dîplomatê Înglis û rêvabirêñ Êzdiyan da hebûne. **Wê demê Mîrê Êzdîxanê Huseyn Beg, Extyarê Mergê (Babê Şêx) ji Şêx Nasir bûye.**

( Di bîranînê xwe da Layard derheqa herda da jî fikireke bilinde). Wan zanibûne Layardê cara dûdan bê û merivê xwe (Qewal Usiv û hinek navdarêñ Êzdiyan)şandine Sitembolê pêşya wî.



Huseyn Beg, Mîrê Êzdîxanê



Şêx Nasir : Baba Şêx, Extyarê Mergê

Ji axaftina Qewêl dihar dibe, ku armanca çûyîna wan e bajare Stembolê ew bûye, ku bi piştgiryâ dîplomatê Înglisî payabilind pirsgirêkên Êzdiyan derxin ber **Sultanê dewleta Osmanyê**. “*Qewal Ûsiv dîsa mecbûr ma behsa hewildanê xwe yê li Stem-bolê, behsa wan qiraran, ku mafen Êzdiyan weke yê Musulma-nan heye, Êzdî neçine qulixkirina leşkerya Osmanyê bike...*”

Xelkên feqîr, ku li nav wê zulm-zorê da heyîtya xwe bêçatî didomandin gumana mezin hatina Layard va girê didan.

Wê dewletê da, ji bo parastina mafê xelqê mîna Êzdiyan, tu hewildan nedihatîn kirin. Ji bo kuştina evdêñ Êzdî bawarkî kes nedihate cezakirin. Qulixçî, mafxweyîkirêñ wê dewletê jî ne tenê mafê Êzdiya nediparastin, lê serda jî hêlan didane mirovên cahile nezan û dînçiyêñ fanatîk, ku zordestiyê li Êzdiyan bikin, wana bikujin, morala civaka gele Musulman jî hîmlî dijî Êzdiyan bû. Em bîranînê wî da van xeta dixûnin: “**Du sal** berê, (sala 1847-an) begekî kurd li nêzîkî bajarê Bîtlîsê, sê qewalêñ Êzdiyan dikuje. Ew xizmîn qewal Ûsiv bûn. Walîyê dewletê: Şerîf Beg jî dest danye li ser dokûmênt û wê fitoyê, ya ku qewala li nav eşîrên Êzdiyêñ Ermenistanê berv kiribûn...”, Qulixçiyêñ dewletê bi bêqanûnî zar û zêçen Êzdiyan difroşin...”(22)

Dema mirov, halê Kurdistanê, yê wê demê tîne ber çevan û melûmetyê cuda-cuda analîz dike, dibîne, ku ne tenê halê Êzdiyan lê usa jî halê temamya gelê kurd û gelên walête din, yê sade xirab bû. Dewleta Osmanyê bûbû cîyê kaosê, bêqanûnyê, bê-e'daletê, cîyê xezev û zulmê. Rastî jî wê dewleta mezin da kes xweyê serê xwe nî bû.

Li nava wê bêe'daletê da halê Êzdiyan yê teva xiravtir bû, ji bo ew him ji dest dewletê, him jî alyê Musulmanyê da dizêryan.

Aüstîn Hêny Layard melûmetyê pir bi qîmete giranbiha derheqa bajarê Ridiwanê da me ra hîşfiye. Dinivîse, ku Ridiwan werekî kevnare, li cîkî fire ava bûye û wê heremê da xweyê sûkeke pir girînge. Ew wek navenda qezayê jî dihat naskirin. Li

wur da devedevî heysid avayêne wqas cîwan çêkirî hebûn. Bajar li kenerê çemekî mezin bû, kîjan dikşe û 5-6 km wêda digihîje çemê Tigrisê(Diclê). Dicle ji Diyarbekirê dikşe, tê. Binelyê Ridiwanê, xêncî 100 malên Ermenyan, 40-50 malên Yakûbyan û Kildanyan yê din Êzdi ne.”(23)

Ji nivîsara arxiologê Înglis tê zanîn, ku qedirê Mîrza axa (Mîrzik) ne ku tenê li nav Êzdiyan lê usa jî li nav Ermenyan û Aşûryen wê heremê da bilind bûye. Çawa, ku me berê jî got wî axê Êzdî qedrê wan gelan û bawarya wan zanibye, fikira zane û gire-girênen wan ra hesab rûniştiye, nehîştiye navbera gelên êla wî da xrabî, bêtifaqî çê bibin, heta zarokên xwe jî li cem mamosatîyên Ermenî daye xwendinê. Li nava şewirdarê dîwana wî da xêncî maqûlên Êzdîyan usa jî rîspîyen Ermeniya û Aşûryan hebûne.(24)

Layard dinivîse, ku Mîrê Ridiwanê ewqas qedirê Ermenya zanibûye, ku wan ra li bajarê Ridiwanê da, rex quesra xwe dêr çê kirye. Di nava dîrokê da ev nimûne, ya bi hevra, bi tifaq, aşîfi, dostanî jîyana gel û olên Mêzopotaniye here ronayî û geş e. Arxiologê navdar bi şêkirandin dinivîse:”...ev mînakeke xweş û balkêş e, kû şaristanyê pêşdaçûyî bîvînin evdêne ji ol û netewêne cuda çawa karin bi tifaq û aza bi hevra bijîn.” (25)

Lê çawa lêkolîn îzbat dîkin dostanî û biratya gelan, bi aşîfi li kîleka hev berdewamkirna olan, mesheban dewleta Osmanyê, desthilatdar, nijarperest û qewatên xwexatyê, yên qafterî xweş nedihat. Wana her mecal didan kîranîn, ku wê tifaqê biteribînin, gelê sade bi virr-derewan bixapînin, rakin dijî hev, gel bi destê gel bidone qirkirin, nehîlin ew derheqa pirsgirêkên xwe yê restî da bifîkirin. **Sîasya “Avê şêlûke, ku di navda bi rehetî masya bigrî “-meşandine.**

Dîroka gelê me, ya dûr û dirêj da mirov kare bi hezara mînaka bîne, çawa serekeşîr û dîndarêne kurde fanatîk, nezan , di destê nyarêne Kurdistanê, yê civakî û olî da bûne hacet û qetilêne

mezin anîne ne tenê serê kurdên Êzdî, Elewî, gelên xaçparêz, lê usa jî serê xelqên kurdê Musulman.

Gelo kêmasya gelê kurde, nezanye, cahiltîye yan ez nizanim çawa fikira xwe eşkerekim, ku ew karên wan şexsyetan, yên kirêt alyê gel da, netewê da, ne hatye şermezakirin, neletkirin, hela serda jî çiqas ew neqenc bûne, bûne sebebê neheqyan, komkujyan, wêrankirinan, sebebê neyartiya nava eşîran, êlan, sebebê têkçûna serhildanan, eşîrên wan piştgiryâ wan şexsyetan kirune, kilamên mîranyê, egîtyê avîtine li ser wan, pesnê wan qaçax, xûnrêj, xweyîn û neheqan dane.

Heta iro jî hinek, wa gotî “zanyar, nivîskar, rewşembîr, xwendevanên “me pişta wan “serokên” êl û eşîrên xwe digrin, kêleka wan disekinin û li bin defa wan da direqisin. Hinek nivîskarên me hê bi çevên oldarîeye teng pirsên dîroka gelê kurd lêkolîn dikin.

Li nava dîroka me da hê şil û zaha, terî û ronay, qenc û xirab, reş û sipî ji hev nehatine bijartin. Dîroka me hê nebûye weneyekî safî, weneyekî eşkere yê rastîyê, ku tê da kar û zirara gelê kurd bê xanê. Ders hildan ji dîroka me hê pir dijware. Vê demê jî li nava serok, rêvabirên civak û olên kurda da hesavê şexsyetê neqenc, qafseqet, sextekar, gelfiroş kêm nînin. Nivîskar-rewşembîrên kurd jî pir caran bi korayî rex wan ra derbaz dîbin, culet nakin rastîyê binivîsin, nafikirin, ku iro ew rastî, gelê me ra ji bo dîtina rîya azayê pir pêwîste...

Dîroka hezaran sala da evî xeysetî zîyanekê pir mezin daye gelê kurd. Û niha jî didê, ji bo nahêle tifaq û yekîtya gel çêbe, li ser rîya azayî û rizgarya wê dibe kelem. Gelek rewşembîr difikirin: “Ez nivîsara xwe da navê filan şexsî bidim, derheqa xeletî û neqenciyê wî da binivîsim gelo mirovê wî, e'şîra wî, peyhatyê wî ji min nexeyîdin?” Eva fikireke şaş e û dijî kara gele. Gerekê her kesayetîk gorî kar û emelê xwe dîrokê da bê bîranîn. Ewê ji bo kara xweye şexsî, yan seva navê xwe gelê xwe, hebûna wêye

madî û ruhî dîfroşin, ewê dijî gelê xwe dibin hacetê destê di-jmin, ewê neheqyê û neyartyê gel ra dikin gotî dîrokê da çâ hene usa bêne nîşandayîn... Ku ewled jî dersê ji emelê wan hil-din, xweyî ziman, nav û nasnema xwe derên, kirên pêşyên xwe-ye ne qenc newakilînin, navê xwe li bin ala xîret, şerefa gelê xwe da bi serfinyazî û bi keda xwe ye helal binivîsin.

Çawa li nava melûmetyên çavkanyêن Ermeyan, usan jî bî-ranînê A.Layard da navêna mala Dewrêşê Dewrêş Nebî, Şêx Qasim, Esabê Cimo û hinekêن mayîn derbaz dibin, ku çawa qetlema herd gundêن Êzdîyan yê Delan, serê li ser Erenza Şêxa û neyartya navbera kurdêن Musulman û Êzdîyan cînar da pêka-nîne.

“Li ser rîya me gundê kurdayî mezin Gonya bû. Gund milkê Şêx Qasim bû. Şêx yek ji wan fanatîka bû,- arxiolog dinivîse,- ku li serê Kurdistanê bûbû bela. Ew bi dijîtya xwe ya himberî Êzdîyan eyan bû. Herema wan da qetil û wêrankirin çê dikir. Kê diket dêst dikuşt. Hicûmkirina wî, ya dewî (li ser Êzdîyan, E.B.) jê ra açixî ne anî. Gelek peyhatyê xwe unda kirin û paşda hate raqatandin.”(26)

A.Layard li mala biraziyê Mîrza axa (Mîrzkê Zaza) dibe mêvan. Wê demê êdî êla Mîrzikê hatibûye hincirandin. Ji nivî-sarê tê xanê, ku qewata êlê ya berê êdî ne maby. Ji pey Axê ra biraziyê wî: Nazî li dewsê rûniştîye. Lê Nazî jî ji zordestîya dewletê belengaz bûye. Ew ji quesre derxistine, mîna xulamekî xwe xanîkî kerpiç da dijî.

Ciyê fîkirandinê ye, gelo lawê Mîrzikê yê mezin, an yê jêha-tî tune bûne ku birazyê wî dewsê girtîye? Yan dewletê qestî mirovekî ne ewqas jêhatî danye dewsê, ku ew eşîra bi nav û deg, ew malbeta kevn li ser xwe da neyê û ji holê rabe.

*Bîranînê Arxiolog da çîrokek jî heye, ku li nava tu çevkan-yêن vê serbihatyê da tune. Ew çîroke revandina jineke Mîrza axa ye ji alyê quluxçîyê dewletê Emîn axayê Tirk da.*

*Gelo vê derheqê da Layard şas nivîsiy, yan pak tê negî-hîştiye, yan bûyar li tev hev kirine?*

*Bi texmîna min tu menî tune, ku em rastîya nivîsara diplomatê Înglis bawar nekin.*

Tê xuyakirin ji pey şerê li ser Erenza Şêxa ra nav û dengê Mîrzik li nava êlên der-dorê da pir bilind dibe. Emîn axa, ku hatibû dewsa wî, dixweze Mîrzikê nuxsan bike, navê wî ra bili-ze, li nava gel da bêhurmet bike, ji bo wê yekê jî jina wî zore direvîne. Tê texmîkîrin, ku çend jinê Axê Ézdi hebûne û wîra dijwar nîbiye, wê surê pir girtî û dizîva xweyî bike. Usa bike, ku xêncî çend mirovê nêzîkî wî, kes wê surê nehisin, ku pîreka re-vandî jina wiye. Di

bêje : "Carya mine..." Wekî usa nîbya Reşît Paşa jî jê bihar nedikir, Emîn axa venedigerya û Mîrzik ew nedikuşt. Usane Axê usa kirye, ku xêncî çend mirovê dora wî kes rastîyê nizanbe. Û usa jî bûyar ji êlê girtî maye. Dibe mirovekî pir nêzîkî Axê ev sura diplomatê Înglis ra vekirye. Bi texmîna min Ermenîkî nêzîkî Axê haj vê surê hebûye û wî jî dizîva Layard ra gotye...

## ZARGOTIN

Çevkanîke din, ku melûmetyê derheqa Mîrzikê Zaza û bûyârên dema wî da qewimî gîhandîye me zargotina gelêriye. Ew stranê dengbêja û çîrok-bîranînin, ku bi zar ji nivsekêî derbazî nivşê pey bûne û usa heta gîhiştine roja îroyîn.

Eşkere ye, ku bi dewr-zemanan xwendin-nivîsar li nav gelê kurd da ji sedemên cûr bi cûr pir kêm bûye. Yê, ku pirî hindikî qelem girtine destê xwe jî h'îmlî oldar û hakim bûne, payê wanî pirê jî bi zimanê ola xwe, yan jî zimanê dewleta hukumdar derheqa wan û pirsên ola xwe da nivîsîne. Carma nav, nasneme û derheqa kurdîtya xwe da jî tu melûmetî dîrokê ra nehîştine. Derheqa bûyarên Kurdistanê da qewimî, çiqas ez zanim, bawarkî ji kurda pir kêm yan kesî tiştekî balkêş bi zimanê kurdî nivîsar ji pey xwe nehîştye. Ew nivîsarê ku mane jî bi zimanê Erebî Farizî û Tirkî (Osmanî) ne û bandora olperestiyê wan da bilind e. Belgeyên Dewleta Osmanyê jî dîroknasya kurdîye eslî ra hê nebûne hîm. Li nav kurdên Êzdî da ew hê xirabtir bûye. Xwendin-nivîsandin li nav civaka Êzdîya da hatibû heramkirin û qedexekirin. Oldar û rêvabirên Êzdîyan ne bi xwe nivîsîne, ne jî rastya xwe bîyanyê, ku xwestine derheqa Êzdîya da binivîsin gotin e. Bi texmîna min di warê wan fikir û tiştên çewte nerast da, ku alyê biyanya da derheqa Êzdyâ da hatye nivîsandin rêvabir, oldar û zanên Êzdîyan jî gunekarin. Wana biyanya ra rastya xwe negotye, biyanî jî çûne cem keşîş û oldarên olên din, axa, begên nezan, vana jî ci vir-derew derheqa Êzdîyan da zanibûne wan ra gotine, biyanyan jî usa nivîsyê û pêşkêşî xwendevanê xw kirin e.

Bi texmîna min, di dema Şîxadî heta dema Şêx Hesen jî xwendin-nivîsar li nav Êzdîyan da, xazma Lalişê, li nav oldar û rêvabirên wê civakê da xurt bûye. Eger usa nîbûya helbesvanê wek Şêx Fexirê Adîyan, Pîr Reşê Heran, Xidirê Zênde, Pisê

Cemî pêşda nedhatin. Paşê zor û astengyên der doran, ferman û êrîşen olên din Êzdi mecbûr kirine ji bo parastina ola xwe wê gava malwêran bavêjin.

Ji alyê olên din va êrîşen li ser Êzdiyan û êzdîtayê ne tenê yên zordaryê, fermanên qirkirin, kuştin û talankirinê bûne usa jî êrîş ji alyê zanyarya olê, pirs û pirsgirêkên dîndaryê va bûne. Di dest Musulmanan da tamamya qewata zanyarya dewletên Rojava, ya desthilatdar, bi hezaran zanîngeh û medresên dîndareyê, zaneyên olê yê gewre, rewşembîr, nivskar, ordîya oldaran, gelê fanatîk, bi mîlyona mizgeft, medrese û hicra... Civaka êzdîtayê jî, bi wê hêza xwe, ya biçûk, bi mecalên xweye zanyaryeye kêm, dîndarênen nexwendîye, cahil, û zordarya dijwer nikaribûye bersîva wê êrîşa zanyarêna ola İslâmê bidin, ne jî mîna gelên xaçparêz, pişta wane xurt ya zanyarya olê ji derva hebûye, ku xwe bikaribe ji êrîşen oldarênen İslâmê biparêze.

Ev êrîşa zanyaryê dijî êzdîyatîye çeka here mezin û xeter bûye. Bi texmîna min, wekî bikaribin xwe ji wê lêyê biparêzin û xelqên Êzdi ji wan êrîşan agahdar nebin xwendin-nivîsar li Êzdiyan heram kirine.

Heramkirina xwendin-nivîsandinê ji mirîdên sade girtî heta rîvabir û oldarênen wê civakê, yê berpirsyar, bûye sebebekî bin-gehîn, ku temamya civaka êzdîtayê bikeve li nav terî û nezanya dewranen dirêj. Ji rûyê wê yekê da temamya diroka ola Êzdiyan, ya berî Şîxadî hatye bîrkirin. Pirtûkên li ser dîndarya êzdîtayê unda bûne, gelek qewl, beyt, qasîde, çîrok, duea, dirozge, xizêmok ku alyê şayîr û zaneyên dema Şîxadî û berî wî da hatibûne efirandin hatin bîrkirin, gelek jî ji bo orgînala wan ya nivîsar tune bûye, ji bingeha xwe dûr ketine, peyv û fikirênen xerîb, heta carna jî yê dijî wê bawaryê ketine li nav wan.

Eger rîvabirya Êzdiyan yên civakî û olî xwendî bûna û bi hevra (Mala Mîra, Bavê Şêx û Civata ruhanî) her deh sala carkê hema 10-15 rûpel, ji bûyarêna dema xwe, yê berbiçev, ku emrê

Êzdiyan da qewimî binivîsyana û ji pey xwe bihîştana, niha dikire heta 1000 rûpelî. Ew nivîsar, ne ku seva dîroka Krdêñ êzdi lê ya temamya Kurd û Kurdistanê wê bibya bingehêke dewlemend. Lê mixabin kal-bavêñ me ew mîrat ji mera ne-hîştîye... Raste dîrok kal-bavêñ Êzdiya ra rem nîbûye, gelek rîvabir ji bo bawarya xwe hatine qetilkirin, qetlemêñ xezev li ser xelqê da anîne, lê tişt hene borcin, borcê rîvabiryê ne... Eger rîvabirî, serokî, mezinê gelî, gotî ci hal jî dor te çê bive borcê xwe himber gelê xwe, himber dîrokê biqedînî... Tu tiştê mezin, hêja û bi nirx rehet çê nabin... Heta niha jî rîvabir û oldarêñ Êzdiyan ji wî xeysetê malwêran dest nakşînine, iro jî nikarin dema nû ra gava bavêjin, ku wa berdewam be, ez bawarim wê nikaribin Êzdiyan rîva bivin, pêşengya wan bikin...

Bi texmîna min ji alyê Êzdiya va heramkirina xwendin-nivîsandinê bandora xwe li ser temamya gelê kurd jî hîştîye. Bi fermana, bi rezadîlyê yan berjewandîyan, êlên kurda yên biçûk û mezin, ku berê li ser bawarya êzdiyatî bûne welgeryane ser dînê îslamê. Ez bawarim ew êlana ji pey qulibandinê ra jî de-meke pir dirêj ji bawaryêñ êzdiyatî xilaz nebûne û zû xwe kitêb-deftera negirtine. Gelek mînak hene ku hinek êlên Kurdan ku bawarkî 150-200 sal e qulubîne, lê dîsa gelek xisûsyêñ kuka xwe xweyî dikan.

Çi bikin, bixwezin, nexwezin kal bava ev mîrat, ev welat, ev dîrok û ev halê dijwar ji me ra hîştine.

Berovajî vê zargotina kurda ya gelêri xizna bê ser û bine, dewlemendîke pir mezine. Kal-bavan zargotineke rengîn, baxçekî ruhî, yê pir cûre, durr û cewahirêñ nemir ji pey xwe hîştine. Dengbêj, çîrokbejan, mirovêñ sade ew xizne sal bi sal dewlemend kirine, pêşda birine, xweyî kirine. Odêñ gundan yên terî bûne dibistanêñ perwerdekirinê, xweyîkirina nirxêñ miletyê, zanîngehêñ gelê sade. Bi bawarya min, terya wan odan, bi de-

wrana gelê me ra bûye ronayî, bi wê ronayê jî gelek dûrr û ce-wahirên zargotina me hatine parastin, çîrokêñ derheqa bûyarêñ Kurdistanê da bûyî hatine xweyîkirin, axaftina kurdî bi reng û ewazan xemiliye, ziman dewlemend û şîrin bûye. Ruhê gelê me bûye destanêñ nemir, durr û cewahirêñ giranbiha. Derheqa ge-lek bûyarêñ giring da stiran û çîrok mane. Dîroka me li nava wan stiran, çîrok, destana da veşartîye. Zargotina me kanîke usa ne, ku tu caran namiçiye. Gelê me efrandare. Gelên cînar çîqas jî ji xizna zargotina me dibin, lê dîsa jî ew tije dimîne.

Bûyarêñ, ku emrê gel da qewimîne ji alyê dengbêja da bûne stiran, çîrokbêja jî oda da ew civatê ra gilî kirine. Emîrê wan stiranan şureta dengbêja va girêdaye. Stiranêñ, ku alyê dengbê-jîn xurt va efirîne zû nayêñ bîrkirin. Ew ewleda ra dimînin. Nivsek wê derbazî nivşa nû dike. Lê stiranêñ zeyîf zû têne bîr-kirin.

Derheqa bûyarêñ vê pirtûkê da ten analîz kirin gelek stiran, bûyar-çîrok li nav gel da hatine parastin. Di bin destê me da ev çevkanyêñ zargotinî hene:

- stiranêñ li ser komkujya herd gundêñ Êzdîyan: Dela.
- stiranêñ li ser berxwedana Erenza şêxan û Ridiwanê.
- çîrok-bîranînêñ, ku ji devê dengbêj-çîrokbêjan hatine nivîsar.

Stirana “Serê Delanê”, ku ji kasêteke dengê dengbêj Xelîlê Berfê hatîye nivîsar, bi texmîna çîrokbêjan, rîspîyan, zanêñ serhatya wê bûyarê ya here nêzîkî bingeha wê kilamê ye. Bi gotina wan, ew stiran, stiraneke ser bi xweye û stirana qewi-mandina şerê li ser Erenzê va girêdayî nîne. Stiran bi naverok, miqam, teqil efirandineke zargotina gelêryêye giranbha ye. Dema mirov vê kilamê dibihî tê bêjî temamya sifetê wê qetlema şîpûk tê li ber çevê mirov... Gund dişewitin, xûna evda dikşe, axîn û nalîn e, ferman û talan e, hewar-gazîya *evdan* e. Peyv,

cimle û gotinê dilêş di pey hev têن, rê nadine hev, guhdara dikine li nav halekî dilşewat.

Ewazên tebyetî, yê xweş têkista kilamê hemêz dikan, jêra dibin ruh û hêz, kel û alav dila digre.

Meriv ji jêra olê dîn bûne, qalibê xwe yê îsanetîyê derketine, bûne teva, weş, serya jê dikan, jin, zar, kal, pîra bi şûra, rima, nîza dikujin, meyt raxistîne, ava çêmê Dela (Ridiwanê) bi xûnê, bi qetilê dikşe...

*Serê Ezdiyan jê kirin, laşêن wana  
Bi ava çemê Ridiwanê da berdane.*

Sitiran hewar û gazîye. Hewara evdêن bê sûc û gunê ji bo jîyanê. Hewara xwe kê dadixin, kes hewara wan nayê. "Eskerê Dewrêş Nebî girane" li ber tu tiştî nakeve, qewata wan nagîhîjê, ku jê ra şerkin, xwe biparêzin, xwe xilazkin. Kes jî hewara wan nayê. Kes wan ji wê neheqyê naparêze. Heta qewm-pismam jî dûrva li wê qetlemê mîze dikan, nêzîk nabin. Nelet bêtifaqyê û békaryê ra, nelet bêisafyê û bêvîjdanyê ra...

*Ecêba mezin di dinê da ew ecêbe,  
Çawa xwerzî jî hewara xala nayên, lawo, lawo.*

Erîşkar, tenê ji bo kuştina "kafîra" nehatine, hatine talan kin, wêran kin, xirav kin... Kilamê da tê gotin "Dest ji malê dinê berdin". Yan nekevne pey hebûna xwe, serê xwe xilazkin...

*Lê, lê Rewşê mala bavê şewitîyê, Delane,  
De hûnê dev ji malê dinê berdin  
Malê dinê hemû qirêja destane.*

Ji naveroka stiranê jî xweyaye, ku yê êrîş birine li ser gun-dên Dela hîmlî dîndar bûne, şerê dîn dijminatyê bûye. Gelê kurdî sade kêm tevî van birakujya bûne, ewê tev jî bûne ji alyê dinperesta va, oldarêñ sextekar va hatine xapandin. Şerê bêfikir û bê menî bûye, ji ber wê yekê jî ew dengbêjê ev kilama efiran-dîye, bi zanebûn, ev şerê navbera kurda da himberî şerê ga, nêrî û beranan kirye:

*Serê sofyêñ Musulmanan  
Û feqîrêñ Ézdîyan,  
Lê dayê, xortêñ Niqîyan û  
Dewrêşê mala Dewrêş begê  
Xwestire ji şerê ga û beranan...*

Ga û beran jî nizanin seva çi şer dikin, evd çîma wan berî hev didin? Dijmin ra yek bûye sér da kê tê kuştin, ji kî alî tê kuştin. Wan ra ya sereke ew bûe ku kurd hev biqelînin, bêqewat û bê tifaq bin. Şerê hev da bikevin, guh nedine pirsgirêkên xwe-ye miletyê.

Sitirana, ku Salihê Kevirbirî ji devê dengbêj Salihê Qubînî girtîye xetêñ wa hene:

*Kino dibê Emo lawo Delan e  
Ji kula dilê min ra xweş Delan e  
Min dît birek mele derketin  
Ji alyê gelyê Botane  
Her yekî birek feqîyêñ wan li pey wane  
Bi hev ra qîrîn û selawet dane  
Şirkekî tivingan li me dane  
Dibêñ li ber eynî Mehemed Selewat  
Îro me anî qira Ézdîxan e.*

Ev xeta carek din jî didine kivşê ku dijîtya olê û dîndarêñ fanatîk bi dewrana mala gelê kurd xirav kirine û heta niha jî nahêlin yekîtya Kurda çêbe, Kurd qencî-xiravya xwe bihesin, dost û neyarêñ xwe naskin.

Kilam bi hevokeke pir barkêş xilaz dibe, dibê:

*Ezê xwe heramkim ax û ava vî welatî, lawo...*

Dengbêj ev fikira 160-170 sal berê gotye... Kurdistanâ Bâkûr da, ku wê demê Kurdên êzdî pir bûn, van salêñ dewyê pir kêm bûn. Yêñ mayî jî ji dest zor û zolma der û hundur welatê kal -bavêñ xwe terikandin, têda ne man... Ciyê fikirandinê ye, gerekê em, kurd baş bifikirin rûyê bêtifaqyê sibê jî kurd tev ji dest gênosîda reş û sipî welatê xwe da nemînin...

Dijwer nîne mirov tê derxe, ku kilamê da rêz hatine li hev xistin, peyv hatine guhestin, ciyê malika hatye guhertin û hivd, lê bi tomerî kilamê qîmetê xweyî bedewetîyê unda nekireye, efrandineke hêja ye, li nav kilamêñ kurdaye gelêriye dîrokî da.

Sitirana din ya “Serê Erenzê” li ser bûyarêñ Ridiwanê (Erenza şêxa) ye. Ev kilama li ser zimanê herd jinê Hesabê Cibo hatye gotin. Dewrêşê mala Dewrêş Nebî ji pey qelandina her du gundê Êzdîyan: Dela Paşo û Dela Qaşo ra berê xwe dide êla Êzdîyan, ya here bi xurt û bi hêz: êla Mîrzikê Zaza. Rind zanibûye şikêñandina vê êlê pelçiqandina temamye êlén Êzdîyêñ Xaltya ne. Bi leşkerekî giran (30 hezar) bi serokatyâ xweşmerekî mîna Hesabê Cibo têñ li ser “Ridiwana bavê Temo.”

*Hesabê Cibo hatye ji kela Rimêlê,  
Bi tevî koma Şêxên Ereban û eskeran,  
Eynikê, Eyndwarê, Eynkafê, Eynberanê  
Ciqaş hecî, soyen Xerzan, Xiya û Bekiran,  
Hemû anye bi xweran...*

Yan:

*Heshê Cibo ji kela Rimêlê  
Koma şêxê Ereban anîye bi xwe re,  
Bi tevî eskerê Eynikê, Eyindarê, Eynkafê, Eynberanê,  
Bi hecîyê Xerza va, bi softiyê Xiya û Bekiran,  
Hemî anîne bi xweran...*

Yan cîkî din wa tê gotin:

*Go: Hesab axa rabû bi giranî,  
Esker ji Mazîkê, ji Mazêayê,  
Ji Qewînê, çîyayêñ jorîn xwe ra anî  
Avîte ser Ridiwana Bavê Temo: Mîrzikê Zaza...*

Ji van her sê perça em divînin, ku ew malke vê stiranê ne, lê ji alyê her dengbêjekî va hatye guhestin. Naverok, fikir maye, lê peyv û hevok li hev xistine. Gelek caran dengbêj pir bêxem û nezan, bê cawdarî û xemxurî nêzîkî kilamê gelêrî dibin, bêyî rind mih'andin, ezber kirina wan kilama dibêjin, kilamê ji bin-gehê, orgînalê dûr dixin û ji bo orgînal jî bi nivîsar tune, zîyanê didine kilamê. Car heye dengbêj gor civakê bi zanebûn stiranê da guhertina dikê, eva êdî naveroka bûyarên dîrokî jî li hev dixe, stiran êdî qîmetê xweyî dîrokî jî unda dike.

Di kilama, ku ji stirana dengbêj Salihê Qubînî hatye gotin xetine wa hene:

*Emo lawo Delan e,  
Ji kula dilê min ra xweş Delan e,  
Li pêşya malê me şer e  
Li paşya malê me ferman e  
Fermana me ne ji cem Sultan e  
Fermana me ji cem Dewrêş Nebî  
Şêxê Têlanê, şêxê çirdika ne ban û kane.*

Ji van hevokêن kilamê tê zanîn, ku dewleta Osmanyê û nav cihana Musulmanyê da civaka Êzdîyan ketibû halekî bê mafye û neheqyeyî usan, ku heta ŞÊXEKİ musulmana jî karibû ferma-na wan rakira, bibûya sebebê komkujya evdan, wêrankirina şenâن û bê ceza bima, hela di serda jî, carna li ser wê "mêrxwesi û egitya wî" kilamên méranyê dengbêjan çêkirana û pesnê wî bidana. Lê vira tiştek heye ku dengbêja negotye...eger dewleta Osmanyê da mafêن Êzdiyan bihatana parastin kes nikaribû li ser Êzdiyan da biçûya...Usane, herge Dewrêş Nebî êrîş brye li ser Êzdiyan dîsa bi gotin û piştgirya deshilatdarêن dewletê bûye...

Xulese, Dewrêşê mala Dewrêş Nebî bi qewateke mezin "...şêxê Ereban, leşkerê Osmanyê, olperestêن fanatîk li xwe dicivîne bi qetil û qanê dajo li ser Kurdêñ êzdî, ku ji bo "axret û imana" xwe wan biqrlîne... Ez usa jî tê nagîhîjim bi xûna zarok, kal û pîran, evdêن bê sûc û gune ew ci ole, ku derê Buhuştê van evdêن qetil ra vedike?

Vê carê Êzdî bi temamya hêza xwe tev gelên wê heremêye din yê ne Musulman radibn dijî ferma-na Dewrêşê mala Dwrêş Nebî. Melûmetyêن heyî, ku gîhîştine me derheqa mezinaya wî şerî da dibêjin. Qewatêن Dewrêş Nebî 30 hwzar bûne. Ev hejmareke pir mezine û meremê wê hêza gewre wêrankirin, qetikirina wê herema Xaltîya bûye.

Qewatêن Êzdîyan 10 hezar bûne, yanê sê cara ji hêzêن Dewrêş Nebî kêmter. Çiqas jî Hesabê Cibo xweşmêr û zirîkirî bûye. Vî şerê heqî û neheqyê da heqî li ser dikeve. Herd jinêن Hesabê Cibo li ser laşê zilamê xwe digrîn û dibêjin:

*Edlayê digot: Nûrê, xweya minê,  
Hsabo Ronî, ne mon got wa meke,  
Tu ji xeberê sofî û feqî û meleyê ber ava Bota meke,  
Neçe şerê Erenza Şêxa,*

*Ridiwana bavê Temo: Mîrzikê Zaza,  
Serê giregirên Êzdîyan,  
Yê Mîrzikê Zaza, Keleşê Çelo, Geşhemê Gîro,  
Êganê Meyro, Miçoyê mala Şêx Îsayê ne heneke...*

Vê kilamê da, tê bêjî, îcar dengê egîten Êzdîyan yê altindar bilind tê: “Emê bikin, heft roj û heft şeva aşê Sipî û aşê Ridiwanê li ber xûna sofî, feqî û melê ava Botan reş bigere.”

Kê ev kîn û rika dîndijminatyê, neyartiyê li nav Kurda da ewqas xurt kirye? Çima Kurd dixwezin aş bi xûna Kurda bigerin, yan çima dixwezin Kurdê Êzdî kokbirkin? Ev ci je're ketye li nav dil û mejûyê Kurdan? Kê ew jer û kîn kirye?

Vî şerî da koka kurda tê. Çawa çîrokê da tê gotin ji 30 hezar êrşkaran teka-tûka xilaz dibin. Ji çekdarên Êzdîya jî kuştî hindik nî bûne. Usane bi gotina gotya tek wî şerî da weke 20-25 hezar kurd hatine qirê... Gelo ji vê komkujuyê kê karê dikevin? Kurdê êzdî? Kurdê musulma? Yan neyarêwan wan?

Kê çû Buhûstê? Kê dojê da ma? Kê ew şerê “Nêri û bera-nan” dûr va mêze kir û li ser cahilya Kurda kenya?

Paşê, ji dîrokê eyane leşkerê Osmanyê bi serokatya Reşit paşayê xûnxur (paşê Hefiz paşa) bi şûr ketine Kurditanê, êdî nenhîrîn kîye Musulman, kîye Êzdî, kîye li ser dînê wanî “heq”, kîye “kafir”, herd alî jî bi devê şûrekî birîn. Ji wan ra ya sereke Kurd bû, Musulman jî, Êzdî jî ji wan ra dijmin bûn...

Ev sitirana jî bi naverok, teqil, ewaz, dîdem û bedewya xwe nimûneke zargotina kurda ya glêriye giranbiha ye. Li nava de-wrana da ev stiran jî hatye guhestin, her stiranbêjekî bi gorî xwe stiraye. Tê bêjî fikira kesî ra jî derbaz nabye bikeve pey bingeha stiranê, hevekî xwe ra lêkolîn bike, çika kilama, ku ew distire çiye rast, çiye şaş? Çiye kêm, çiye zêde?

Me ji çar varyantê vê kilamê malek hildaye û çâ nimûne tî-nin, ku her dengbêjekî çawa gor xwe kilam guherye:

Vaeîyanta yekê:

*Rindê digo: Heznayê  
Erenza Şêxan bişewite bi darê mezî,  
Erenza xopan bişewite bi darê mezî,  
Emê bala xwe bidinê,  
Li Erenza Şêxan, li Ridiwana bavê Temo,  
Bû hewar qîr û gazî...*

(Ji kilama ŞERÊ ERENZÊ, stiranbêj Xelîlê Berfê).

Varîyanta duda:

*Min go: Erenza Şêxa darê mezî,  
Erenza Şêxa darê mezî,  
Ridiwana bavê Temo dibe hewar û qîrîn û gazî,  
Kesê Ridieana bavê Temo derdikeve,  
Şûrê wî, ser milê wî rût û tezî,  
Wele dikuştin xal û xwerzî, ap û birazî, dayê,  
Daye, lê dayê, lê dayê...*

(Ji kilameke dengbêj ne dîhar).

Varyanta sisya.

*Esabo Ronî ezê Erenza Şêxa diketim bi darê mezî,  
Min dît suyarê Îzdîxanê derketine  
Muxara qûçika, suyarêni bi hespê sayî,  
Kumê wana li serê wan da,  
Şûrê wana li destê wan da rût û tezî,  
Sond xwerine bi beyraqa Îzî, bi navê Tawisî Melek,*

*Meyê kuştîye Mihê û Cihê, me heftê timm kirye  
Ji xal û xwerzî, am û birazî...  
Lê dayê, lê dayê...*

(Ji kilama bi stirana Hemzoyê Xalit).

Varîyanta çara:

*Edlayê digot: Hesabo Erenza Şêxa bi şewite  
Bi dara mezî,  
Min dî li Ridiwana bavê Temo,  
Bavê Memed û Mistê bû hewar û qîr û gazî,  
Ezê bi qûçika hafê Ridiwanê ketim  
Selefek sîwarê Qizila, birek sîwarê Niqîba  
Û xorvê Ézdiyan, hemî sîwerin,  
Şûrê wan li ser milê wanin rût û tezî,  
Derbekê lê dane li Hesê Cibo, li apê lawika,  
Li Mihê, li Cihê, ji azbeta bavê min,  
Qelandine tovê xal û xwerzî, belê am û birazî.  
Lo lo wî, lo lo wî, lo lo...*

(Ji kilama bi stirana hozan Aydîn Ronak).

Ji van her çar malika tê xanê, ku teqla kilamê, naverok, ewaz mane, lê hinek hevok, pevv hatine guhestin, navê şexsa zêde û kêm bûne, hinek nav ji kilamê din hatine, ketine li nav kilamê. Mesele navê “bavê Memed û Mistê” em bawarin ji kilama “Keleşê Çilo”ye..

Guhestin, şaşî û lihevketinê wa bawarkî her varyanteke kilama da jî hene. Xêncî stirana “Miçoyê Şêx Îsa”, ku me vê pir-tûkê da anye, yê din li hevketnê her du stiranên jorgotî ne. Yan herd stiran kirine yek. Nav van da jî stiranbêja gorî xwe ciyê

xeta û hevoka, peyva, nava guhestine, gelek tiştên ne pêwîst kirinê, carna xwestine fikrê jî biguhêzin.

Kilama “Miçoyê Şêx Îsa” bi texmîna min, ji pey wan bûyarê dîrokî ra gelek dereng ji alyê dengbêjên Êzdiyên Ermenistanê va hatye efrandin. Dengbêjê ev stirana efrandîye jî derheqa bûyara da pak nizanbîye. Ji bo naveroka kilanê ji her alya va dûrî bûyara ne. Li radioya Yêrêvanê da Dengbêj Reşîdê Baso ev kilam distira. Şerê Dela, yê Erenzê û bûyarêن Şêx Mîrza, Şêxê êla Anqosya va girêdayî, tev li hev kirine. Eyane, ku Miçoyê Şêx Îsa mîrxwesekî êla Qizilya (Mîrzikê Zaza) bûye, şerê li ser Erenzê da mîranîke xurt kirye û di şer da derheqa kuştina wî da tu gîlî nayê gotin.. Tu cîya nayê bîranîn, ku Miço wî şerî da birîndar bûye, yan haye kuştin.

Dibe Miçoyê Şêx Îsa (yan jî yekî bi wî navî) tevî serê li ser êla Anqosya jî bûye û li wur hatye kuştin? Melûmetyê usan li dest me da nînin, ez jî ji wê yekê ne bawarim.

Navê Keşîş Polo jî anîne kirine li nav vê kilamê. Ji mera eyane, ku Keşîş Polo serok û mîrxaswkî Ermenya ye, yê herema Ridiwanê, kîjanî jî di şerê Erenza Şêxa da dijî qewatên Dewrêş Nebî bi mîranî şer kirye, tu helaqetyê wî û êla Anqosya tev tune. Hela pirse, gelo bûyarêن Şêx Mîrza va girêdayî di wan sala da qewimîne yan na?

Tê bîra min, dema ev kilam radyoya Yêrêvanê da dihate ni-visandin, hinek hevok û peyv jê hatin guhestin. Peyva “Musulman” kirin “Romî”

Tu girêdana qira gundêن Dela qîkrina êla Anqosya ra tune. Ew gunda ji êla Niqîba bûne.

Ev kilama jî efirandineke gelêrîye bi qîmete, lê ji alyê dîrokî va dûrî naveroka bûyarêن rastî ye û ji bo analîzkirina bûyaran nikare bive belgeyekî pêwîst.

Xêncî stiranan, ev bûyaran bi cûrê çiroka jî di bîra gel da mane û nava civaka da tim têr bîranîn.. Çirokêñ derheqa wan bûyara da ketine destê me evin:

-Çiroka, ku çevkanyêñ zargotina Ermenya da hela sala 1852-a hatye nivîsar û xweyîkirin.

-Çirok-bîranînêñ, ku ji devê Kurdêñ êzdî hatine nivîsar. Ya dengbêjê hizkirî Aydîn Ronak, ku kovara ROJ da hatîye weşendin. Bîranînê Hemzoyê Xalit û Elî Qecer.

-Çirok, ku ji dengbêjê welêt, yê bi nav û deng Salihê Qubînî hatye nivîsar.

Hinek sitiran û çirokan da bi texmîna min nerastyê dîrokî ji hene. Sitirana ŞERÊ DELA da, ku dengbêj Gêncoyê Temo gotye xetê wa hene:

*Emo dibê, Kino lo lawo,  
Qaso bav û biraو,  
Ezê bi Delana Paşo diketim bi karkore,  
Mala bavê min da, wey li min me'rimê ore – ore,  
Ezê ne ketime ber kuştina Firatê Gûlo,  
Miçoyê mala Şêx Mîrzayê,  
Îskanê Zoro, bavê fariz axê,  
Ezê diketim ber wê yekê, iro serê sê rojan  
Laşê Firatê Gûlo, Mçoyê mala Şêx Mîrzayê  
Li xopanê çemê Dela mane nevesartî...*

Kilamê da eyan dibe, ku Firatê Gûlo, Miçoyê mala Şêx Mîrzayê (Şêx Îsa bi şasî bûye Şêx Mîrza), Îskanê Zoro, bavê Fariz axê li şerê Dela da hatine kuştin. Me ra ji kilama û çiroka eyane ku ev şexsêñ jorgotî tevî şerê Dela nebûne. Ew mîrxwesên şerê Erenza Şêxa ne û di şêr da derheqa kuştina wan da tu delîl tune-ne.

Navê Îskanê Zoro, bavê Fariz axê tu kilamê û çîrokê da tune, hela li bîranîna Êzdiyên Xaltya da rind maye, ku Mala Zoro axa, xwe dabûne li “serê girê Qereçiyê”, neketine nav şêr, he-wara Dela neçûne. Usane dengbêja ev xet bi xeletî zêde kirine, giva xwestine, sitiran bi hêz be û li mala Zoro axa jî xweş bê.

Ev nerastî usan jî di kilama ŞERÊ XALTA da heyen, kîjan sala 1943 an kovara HEWAR da çap bûye. Vira dewsa navê Îskanê Zoro, Bişarê Zoro ye. Usane şashi ne ya dengbêj Gêncoyê Temo ye, dengbêjê berî wî ew guhestin kirine sitiranê.

Li vê kilamê da xeteke wa jî heyen : “Dengê tivinga li ser peyayê mala bavê min da, wey lê min merimê ore – ore...” Tê texmînkirin, ku ev xeta jî ji kilameke Kurda yeke din, ya mîranyê hatiye hildan û kirine li nav vê kilamê. Wê demê şer, hîmlî bi şûr û riman bûye. Kilama da jî usa tê gotin: “şûrên wan e destê wan da rût û tezî”, yan jî : “Rima li destê Geşhemê Gîro, Êganê Meyro...Keleşê Çelo bîst û pênc movike...”

Kilama Salihê Qubînî da tê gotin, ku:

*Derbekê lê dane bejin û bala Mîrzikê Zaza,  
Qelenderê tovê Êzdixanê...*

Çîrokê da jî wa hatiye nivîsar : “Mîrzikê Zaza jî wî şerî da tê kuştin”. Çawa me jorê jî got, çevkanyêñ dîrokî jî usa didin îzbatkirin, ku Mîrzikê Zaza şerê Erenzê da nehatyeyê kuştin, weke deh-panzde sal pey ra, dîsa bi cûrekî tiragîk, bi destê de-wleta Osmanyê jîyana xwe dest dide.

**SITIRANÊN GELÊRÎ DERHEQA  
KOMKUJYA DELA U ŞERÊ  
LI SER ERENZA ŞÊXAN**

**ŞERÊ ERENZÊ**

*Rindê digo: Heznayê  
Erenza Şêxan bişewite bi darê mazî,  
Erenza xopan bişewite bi darê mazî,  
Emê bala xwe bidinê,  
Li Erenza Şêxan, li Ridiwana bavê Temo  
Bû hewar, qir û gazî...*

*Rindê digo: Edlayê  
Erenza Şêxan bişewite bi darê tere  
Erenza xopan bişewite bi darê tere,  
Hesabê Cibo hatîye ji kela Rimêlê,  
Bi teví koma Şêxên Ereban û eskeran,  
Eynikê, Eyndwarê, Eynkafê, Eynberanê,  
Çiqas hecî, sofyên Xerzan, Xiya û Bekiran  
Hemû anîne bi xwe ran.*

*Min dît Miçoyê mala Şêxo  
Li Êganê Meyro,  
Li Keleşê Çilo,  
Li Şêx Hemê Seyro,  
Li Gêçanê Gîro,  
Li peyayên Niqîban,  
Li xortên Qizilan, Êzdiyan dikire gazî û digo:  
“Bav û biran, hûnê mîr çêbin, destê xwe xweş hilînin.”*

*Êganê Meyro li egît û xweşmêran dikire gazî û digo:  
Ezê bi beyraqa Êzî kim  
Herge Xwedê û Sultan Êzdî iro bi mera dest hilîne,  
Emê bikin, heft roj û heft şevan aşê Spî û aşê Ridiwanê  
Bi ber xûna reş bigerin.*

*Edlanê digo:*

*Hesabo hane, sed û bîst car bi min hane.  
Ne min tera go: neçe şerê Erenza Şexan.  
Ezê bi hefa qûçikên Ridiwanê diketim,  
Wa qeflek ji siyârên Qizilan, peyayê Niqîbyan  
Serê dizgînê reşbozan ajotine qûçikên Ridiwanê  
Li ser milê wan şûrê rût û tezî,  
Digotin: Derbekê dane li Hesabê Cibo,  
Li apê lawikan, li Cihê û li Mihê,  
Qelandine tovêن xal-xwerzî, birazî-apane.*

(Têkista vê stiranê ji ber debgê Xelîlê Berfê, ku kasêtekê da hatibû gotin, hatîye nivîsar. Binhêre Kemal Tolam “Hebûn û tinebûna Êzdîyan...” 2000 s. rû.-45.)

## **ŞERÊ ERENZÊ Û KELA RIDIWANÊ**

*Edlayê dibê: “Nûrê xweya minê,  
Bes ser min bike hêle h êle,  
Tu rabe serê xwe bişo  
Û porê xwe berde têl bi têle,  
Esabê Cibo çûye sefera welatê Xaltîya,  
Kela Ridiwanê û Erenza Şêxa,*

*Şerê Gêş Hemê Gîro, Êganê Meyro, Erfûyê Qizili,  
Miçoyê mala Şêx û Keleşê Çelo,  
De bila ne bi xêr û ne silametî vegere malê  
Xwe jêre bike bermalîyeke nû helêle.*

*Edlayê digot: Esabo Ronî hanê neke,  
Tu yê bi xebera sofî, mele û feqê  
Ber ava Bota neke,  
Şerê Gêş Hemê Gîro, Êganê Meyro, Erfûyê Qizili,  
Miçoyê mala Şêx û Keleşê Çelo,  
Şerê Êzdixanê ne heneke.*

*Ezê bi hefa Erenza Şêxan diketim bi darê mezi,  
Min dît bire sîwarê Êzdîyan sîwrin  
Li hespên boze sayî,  
Kumên wane li serê wan de  
Şûrên wane bi destên wan de rût û tezî,  
Sê şade û şûdê Miçoyê mala Şêx hene,  
Ewî sê denga gazî dike li giregirê Êzdixanê :  
Geş Hemê Gîro, Êganê Meyro,  
Erfoyê Qizili û Keleşê Çelo,  
Ezê bi navê Tawisî Melek kim,  
Minê heftê temam kirye,  
Minê kuştîye Mihê û Cihê,  
Xal û xwerzî, am û birazî.*

*Ezê bi hefa Erenza Şêxan diketim bi darê tere,  
Rima li destê Geş Hemê Gîro, Êganê Meyro,  
Erfoyê Qizili, Miçoyê mala Şêx û Keleşê Çelo  
Bîst û pênc mofike, berde bila here.  
Şade û şûdê Keleşê Çelo, bavê Memed û Misto  
Gelek hene li vê dinyayê,*

*Ew dibêje: Ezê bi navê Tawîsî Melek kim,  
Ezê bikim iro aşê Sipî û aşê Gewro,  
Li ber xwîna softî, mele û feqê musulmanên nezan  
Li ber ava Bota bigere.*

*Ezê bi hefa Erenza Şêxan diketim bi tepeye  
Girane eskerê Esabê Cibo,  
Girtîye ser Ridiwana bavê Temo,  
Ser wan gire - girê Êzîdîxanê çar ewleye  
Şade û şûdê Ëganê Meyro hene li dinyayê  
Ewê dibêje: Minê derbekê daye Esabê Cibo,  
Serê wî kirye çar perçeye,  
Minê bi destê xwe hilanye heyfa hêşîrê Dela,  
Wan zarok, kal, jin, qîz û bûkêñ salê ye.*

(Hemzoyê Xalit ev stirana di 21.04.00 de gotye û Kemal Tolan nivîsandîye. Binhêre Kemal Tolan, “Hebûn û Tunebûna Êzdîyan...” 2000 s.rû 47.)

### **SERÊ DELA**

*Heyla dayê Delane,  
Heyla bavo Delane,  
Nûrê digo:  
Emo lawo de Delane,  
Qaso birayo Delane,  
Lê, lê Rewşê mala bavê şewitîyê Delane,  
De hûnê dest ji malê dinyayê berdin,  
Malê dinyayê hemû qirêja destane.*

*Serê softyên Musulmanan  
Û seqîrên Êzdiyan  
Lê dayê xortên Niqîbyan û  
Dewrêşê mala Dewrêş Begê  
Xweştire ji şerê ga û beranan.*

*Ezê bi diyara Delana Başo diketim  
Waye li ber tehte,  
Min di eskerê mala Dewrêş Begê hat û girane,  
Ewana derbekê dane li Hemo, Sîno û Xaço,  
Azbata bavê min rebenê anîne ber mîratê.*

*Ezê piştî xortên Êzdiyan, peyayên Niqîbyan  
Çi bikim ji ters û talanê giran, malê dinyayê,  
Digo: Dewrêşê mala Dewrêş Begê,  
Serên xortên Êzdiyan jê kirine  
Cinyazê wan di ava çemê Ridiwanê da berdane.  
Cinyazê xortên Niqîbyan  
Çûne heta serê Du avê, newala Şêlîwa û pira Bota,  
Ezê gulî birê,  
Îro sê roje cinyazê xortên Niqîban  
Çûne li gola Matarê geryane.*

*Heyla dayê Delane,  
Heyla bavo Delane,  
Sîno digo:  
Emo lawo de Delane,  
Qasim lo lawo Delane,  
Lê, lê Rewşê mala bavê şewitîyê Delane,  
Hûnê bala xwe bidinê,  
Pêşya eşîrên Êzdiyan û peyayên Niqîbyan,*

*Çûne Ridiwana bavê Temo, Baxizma bavê Melo,  
Ezê gulî birê  
Îro sê roje pêşya eşîrên Êzdîyan  
Çûne li tehtê Çinêriya, qedyâ ne lawo...*

*Heyla dayê Delane,  
Heyla bavo Delane,  
Sîno digo:  
Emo lawo de Delane,  
Qasim lo lawo Delane,  
Lê, lê Rewşê mala bavê şewitîyê Delane,  
Delana Başo di şewite li sérî dûmane.  
Ezê hewar dikim, hewar nayê, wê,  
Li jorê hewara me Xweda ye, wê,  
Li erdê tu kes bi hewara me nayê,  
Minê hewar kirye Mehmûdê Çelikê wê,  
Ewê hatine li serê girê Merê,  
Xwe dane li ser darê rima ne, wê.*

*Minê hewar kirye mala Mîrzayê Zoro Axa,  
Ewê hatine li serê girê Qereçile,  
Xwe dane ber beroşka ne, wê...  
Ecêba mezin di diyayê da ew ecêbe,  
Eskerê mala Dewrêş Begê eskerekî girane, wê  
De dayê rebenê, lawo minra xayîne, wê,  
Çawa xwerzî hewara xala nayê, lawo, lawo.*

*Heyla dayê Delane,  
Heyla bavo Delane,  
Pêşya malê me şere,  
Paşa malê me fermane, lawo  
Dewrêşê mala Dewrêş Begê*

*Serên Êzdiyan jê kirine, laşen wana  
Bi ava çemê Ridiwanê va berdane.  
Ezê ne ketime ber heyfa kuştina mérane  
Ezê dikevime ber wê yekê, wê  
Tê bala xwe bidê xortên Êzdiyan  
Serê xwe di rihîna dînê Êzdi da dane, wê...*

*Cinyazên xortên Êzdiyan, ha ho,  
Peyayêñ Niqîbyan, ha ho,  
Çûne serê Du avê, ha ho,  
Navrûya Şelûya, ha ho,  
Tila Potan, ha ho, ha ho,  
Ezê gulîbirê, iro sê rojin  
Cinyazê xortên Niqîban,  
Di gola Nadoran, qelibîne, heyla dayê, ha lawo,  
Ezê pişti van xortên Êzdiyan, peyayêñ Niqîbyan,  
Çi bikim ji terş û talanê giran, malê vê dinya yê,  
Ezê xwe heramkim ax û ava vî welatî, lawo...*

(Têkista vê stiranê ji ber dengê Xelîlê Berfê, ku di kasêtekê  
da gotibû, hatîye nivîsar. K.Tolan , HEÛN Û TUNEBÛNA  
ÊZÎDIYAN....,rû 56.)

### **ŞERÊ MÎRZA AXA, KEŞİŞ POLO, MIÇOYÊ İSA**

*Delane bi kimkore,  
Kelo bin Miçoyê İsa da nore-nore,  
Keşîş Polo dike gazî, dibê:  
“Reşîd Paşa, paşayê xezebê,*

*Min duh va ji te kuştîye  
Hezar û pêncsed eskerê  
Ser bi keskî, ser bi pore.*

*Dibê, Delane wê bi gezgezke,  
Miçoyê Isa dika gazî, dibê:  
„Kelo min ra mal derxin,  
Zîn bûsatkin“.  
Keşîş Polo dike gazî, dibê:  
“ Reşîd Paşa, paşayê xezebê,  
Minê nîveka dînê te ha-ha kiro,  
Min duh va ji te kuştîye  
Pênc sed eskerê ser bi keske.”*

*Delanê xûna sor girtîye,  
Şîrin dike gazî, dibê:  
“ Mîrza Axa, Keşîş Polo, Miçoyê Îsa,  
De lêxin, birano hev ra lêxin,  
Ev eskerî temamî xwînxarî dîn-dijmine...”*

(Ji romana Hecîyê Cindî HEWARI; rû 66-67)

## MIÇOYÊ ŞÊX ÎSA

Ne berf e, ne baran e,  
*Ne mij e, ne dûman e,*  
*Ne erd e, ne esman e,*  
Şerê Êzdiya û wan Romyan e  
*Ax, gidîno, çiyayê Delanê*  
*Ber çevê min bûye mij û dûman e,*

*Ser xweş kirye Miçoyê Şêx Îsayê,  
Biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno, şerê Delanê şerekî giran e,  
Xwedê mérê Xwedê va eyan e  
Ser xweş kirye Miçoyê Şêx Îsayê,  
Biçûkê heft bira ne,  
Xwedê mérê Xwedê va eyane,  
Miçoyê Şêx Îsayê vê sibê  
Kuştîye sêsid melê Romya  
Yê xweyî kitêb û xweyî Quran e.*

*Hewar e bavo, hewar e,  
Birayo hewar e,  
Dayê hewar e, hewar e,  
Ne berf e, ne baran e,  
Ne mij e, ne dûman e,  
Ne erd e, ne esman e,  
Şerê Ézdiya û wan Romyan e,  
Ax, gidîno, çiyayê Delanê  
Ber çevê min bûye mij û dûman e,  
Ser xweş kirye Miçoyê Şêx Îsayê,  
Biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno, şerê Delanê şerekî giran e,  
Xwedê mérê Xwedê va eyan e,  
Ser xweş kirye Miçoyê Şêx Îsayê,  
Biçûkê heft bira ne  
Delana şewitî dinhêrim wê gezgezke,  
Miçoyê Şêx Îsa bi sê denga kire gazî, got:  
“Zadê xaînga birê xwe kiribî,  
Rabe ménegya birê xwe meheske,”  
Miçoyê Şêx Îsayê kire gazî, got:  
“Geli lawkê Anqosîya,*

*De hûn lêxin, min vê sibê jê kirye serê çarsid  
Melê Romyan yê serbekesk e.*

*Ne berf e, ne baran e,  
Ne mij e, ne dûman e,  
Ne erd e, ne esman e,  
Şerê Ezdiya û wan Romya ne,  
Ax, gidîno çiyayê Delanê  
Ber çevê min bûye mij û dûmane,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx İsayê  
Biçûkê heft biran e,  
Ax, gidîno şerê Delanê şerekî giran e,  
Xwedê mérê Xwedê va eyan e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx İsa,  
Biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno wezê Delana xopan dinhêrim wê kemkor e,  
Xwedê mérava eyane, vê sibê Miçoyê Şêx İsayê  
Kuştîye pêncsed mérê Romya yê ser bi por e.*

*Ne berf e, ne baran e,  
Ne mij e, ne dûman e,  
Ne erd e, ne esman e,  
Şerê Ezdiya û wan Romya ne,  
Ax, gidîno çiyayê Delanê  
Ber çevê min bûye mij û dûman e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx İsa,  
Biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno şerê Delanê şerekî giran e,  
Xwedê mérê Xwedê va eyane,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx İsa biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno, wezê Delana kavil dinhêrim wê bi gevez e,  
Vê sibê li herafê meydanê Miçoyê Şêx İsa birîndar e,*

*Ax xwîna sor ber saqê sapoka ra çâ dibeze,  
Miçoyê Şêx Îsayê kire gazî, got:  
"Gelî lawkê Anqosîya,  
De hûn lêxin, min vê sibê jê kirye  
Serê şesid melê Romya yê ber miraze.*

*Ne berf e, ne baran e,  
Ne mij e, ne dûman e,  
Ne erd e, ne esman e,  
Şerê Êzdîya û wan Romay ne,  
Ax, gidîno çiyayê Delanê  
Ber çevê min bûye mij û dûman e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx Îsa, biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno şerê Delanê şerekî giran e,  
Xwedê mîrê Xwedê va eyan e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx Îsa, biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno çiyayê Delanê  
Ber çevê min bûye mij û dûman e,  
Şer xweş kirye Miçoyê êx Îsayê, biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno wezê li Delana kavil dinhêrim wê bi hez e,  
Miçoyê Şêx Îsayê sîyarê Çîçeka dêl gevez e,  
Vê sibê li herafê meydanê Miçoyê Şêx Îsayê birîndar e,  
Ax, xwîna sor ber saqê sapoka ra çâ dibeze,  
Miçoyê Şêx Îsayê kire gazî, got:  
"Gelî lawkê Anqosya,  
De hûn lêxin, min vê sibê jê kirye  
Serê şesid melê Romya yê bermiraz e.*

*Ne berf e, ne baran e,  
Ne mij e, ne dûman e,  
Ne erd e, ne esman e,  
Şerê Êzdîya û wan Romya ne,*

*Ax, gidîno çiyayê Delanê  
Ber çevê min bûye mij û dûmane,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx Îsayê, biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno şerê Delanê şerekî giran e,  
Xwedê mîrê Xwedê va eyan e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx Îsayê, biçûkê heft bira ne,  
Rîsyê sûr mertala pola wî xweşmîrî ra bûne ben û piştî,  
De vê sibê şûrekê Miçoyê Şêx Îsayê dane, orta meydanê  
Bûye mîna merekî nîvkuştî, weeêe, weeêe.*

*Ne berf e, ne baran e,  
Ne mij e, ne dûman e,  
Ne erd e, ne esman e,  
Şerê Êzdiya û wan Romya ne,  
Ax, gidîno çiyayê Delanê  
Ber çevê min bûye mij û dûman e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Sêx Îsayê, biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno şerê Delanê şerekî girane,  
Xwedê mîrê Xwedê va eyan e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx Îsayê, biçûkê heft bira ne,  
Wezê li Delanê dînhîrim kevirê şîne,  
Kesekî xwedanê xêra tunîne,  
Cawekê daxe Keşîş Polo ra,  
Bê: "Keşîş Polo malik li te xirav be, ocaxê te kor be,  
Işev sê şev e, sê roj e mawûzêra  
Destê Miçoyê Şêx Îsayê da ye  
Li herafê meydanê ingirî ye, ne diteqe, ne dike denge.  
Keşîş Poli kir gazi, got:  
"Geli Êzdiya serê xwe reş mişot kin,  
Kê berê xwe dide şerê Delanê,  
Ber çevê wî dibe mij û dûman e.*

*Ne berf e, ne baran e,  
Ne mij e, ne dûman e,  
Ne erd e, ne esman e,  
Şerê Ezdiya û wan Romya ne,  
Ax, gidîno çiyayê Delanê  
Ber çevê min bûye mij û dûman e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx Îsa, biçûkê heft bira ne,  
Ax, gidîno şerê Delanê şerekî giran e,  
Xwedê mîrê Xwedê va eyan e,  
Şer xweş kirye Miçoyê Şêx Îsayê, biçûkê heft bira ne,  
Ax, birano, wezê Delanê dinhêrim wê bi war e,  
De gelî Ezdiyan, hûnê xwe kin, li Xwedê kin,  
Hûnê serê Ezidê xweyî Sor kin,  
Hûnê Şemsê xwe kin,  
Hûnê ocaxa Şêxa, Pîra kin,  
Hûnê piştâ Miçoyê Şêx Îsayê  
Bidîne darek dara çînarê ye,  
Hûnê şûrê hêşîn bidîne destê di rastê ye,  
Mertala pola bidîne destê di çepê ye,  
Bira eskerê Roma reş bê derbaz be,  
Çev li Miçoyê Şêx Îsa keve,  
Jê bikşîne tirsê û xofê ye,  
Bira bêje, Miçoyê Şêx Îsayê xweş e, rûbarê li dinê ye,  
Hetanî hêşirê Ezdixanê derbas dibe ji avê ye.*

(Stiranê Gelêri; berev kirye, weşandîye Hesenê Alê; Weşana MEDYA, N 5, Stockholm, 1998.)

## MÎRZIKÊ ZAZA

*De hê hê hê hê hê hê  
Kino digot: "Emo, lo lawo, Zazao bavo,  
Şemê lê xweyê,  
De mala bavê lê xirav biyê,  
Xema nexwe, işev xem xiyalin,  
Dibê bi mîrgale,  
Delana Paşo bi mîrgale,  
Min dît çar sîyar ji Zivinga Zoro derketin xare,  
Şerê Delana Paşo, Aviska Pîro, şewitîye maxibe  
Sekinye girê Qereçawilyê wele,  
Kuştîye sîw sê dewrêşê ser bi pore, sim egale,  
Dayê, dayê, dayê, dayê, dayê.*

*De dayê Delane  
Pêşya malê me şer e, paşa malê me ferman e,  
Şerê qewalê Êzdîyan, sofiyê Musulmana ne,  
Wele xwestire şerê nêrî, koç-berane,  
Dayê, dayê  
Dayê Delane,  
Dayê, dibe min girbane,  
Delana Paşo bi girbane,  
Dengê tivingê Êzdîka ser mala bavê min da têñ ore, ore,  
Roja şerê Delana Paşo, Aviska Pîro, şewityo,  
Bakanê sekinye serê girê Qereçelyê,  
Kuştine 33 dewrêşê sim elbane, serî bi pore, dayê!*

*Dayê Delane, dayê Delane,  
Pêşya malê me şere, lawo,*

*Pasya malê me ferman e,  
De şerê qewalê Êzdiya, sofyê Musulmana  
Îro xweştire ji şerê nêri, kozî berane,  
Dibên, Mîrzkê Zaza li Ridiwanê  
Xwendkarê dînê Êzdixanê,  
Qesra Baxizmê, ew jî wan va xane,  
De ew jî qinyata ber dilê xorta ne, dayê...  
Hey lê dayê Delane...*

*De lê dayê, lê dayê, dibêñ dilê min tame,  
Dinya talane, dilê min tame,  
Rima destê Keleşê Çilo, bavê Memed û Misto,  
Gavanê sîyara, wele 24 movikê dara çame,  
Hey lo, hey lo, hey lo, hey lo,  
Derbekê lê dane li Laşoyê Simo, li Feratê Gûlo  
Li Êganê Meyro, li Mîrzkê Zaza, Miçoyê mala Şêx İsa  
Şevger miştevanê mala havê min rebenê,  
Bira serî kirameta Şîxadî da be,  
Destê Tawîsî Melek ser serê wan be,  
Xêra vî sîyarê sorbozê, Memûdê xulam kanê  
Lo dayê,  
Dayê Delan e, bavo Delan e,  
Pêşya malê me şer e, paşya malê me talan e,  
Şerê qewalê Êzdiya, sofiyê Musulmana ne,  
Bi Xwedê xweştire ji şerê nêri, kozî, berane,  
Dibên Mîrzkê Zaza li Ridiwanê,  
Xwendkarê dînê Êzdixane,  
Qesra Baxizmê ji wan jî xwîyane,  
Ew jî qinyata ber dilê xortane,  
Dayê, hey dayê...*

(Ev stirana ji kasêta dengbêjê bi eslê xwe Ermenî, Karapêtê  
XAÇO ya bi navê: XEZAL hatye nivîsar)

## **DELANE**

*Dayê Delane, bavo Delane,  
Pêşya malê me şere, paşa malê me ferman û talane,  
Şingîna şûrave, birna qolê rima ye, dayê,  
Dayê Delane,  
Kino dibê: "Emo lawo, Qaşo bavo, birayo,  
Hûnê guh nedine malê dinyayê,  
Malê dinyayê qirêja destâ ne,  
Bala xwe bidinê, na wele, eskerê  
Dewrêşê Dewrêş Nebî girane,  
Lê xistîye, kuştine xortê Ezdiya,  
Laşê wan ava çemê Ridiwanê da berda ye,  
Çûye Cizîra Bota, nava şergê  
Laşê wan gola binatara Qesiyayê, dayê  
Lê dayê, lê dayê, lê dayê, dayê".*

*Dayê Delane, bavo Delane,  
Berfo dibêje: "Dela Kaşo bişewite serê tetê,  
Eskerê Dewrêşê Dewrêş Nebî girane,  
Vêspê lê xistîye, jê kirye serê Emo, Kino, Qaso  
Û xortê Ezdiya,  
Pêşya wan Baxizma bavê Eyo,  
Mala Hemzê Çelikê, li tatika Çilêrya qetyaye,  
Mala bavê min sala îsal xirav bûye  
Çûye berê vê mîratê".*

*Dayê Delane, dayê Delane,  
Berfo dibê. "Gevezê lawo,  
Dela Paşo bişewite devê çayê,  
Dela Paşo bişewite devê çayê,*

*Berf û baranê hev ra dayê,  
Na, wale eskerê Dewrêşê Dewrêş Nebî girane,  
Laşê xortê Êzdiya, peyayê Niqîbya  
Çemê Delê da berdaye,  
Çûye nava Serwa Cizîra Bota, gola binatarê  
Laşê wan qetyaye...,dayê....”*

*Dayê Delane, dayê delane,  
Şingîna Şûrane, birîna qolê rima ye, dayê,  
Dayê Delane, dayê Delane,  
Şerê sofyê Musulmana, xort û feqîrê Êzdiya,  
Sofî serkêşê Surmana,  
Xwestire şerê nêrî, koz berana,  
Na wele,xwestire reqasa ber govenda,dayê.*

*Besê dibê: "Berfo dayê, bavê min kanê?"  
Dibêje: "Bavê te rahişîye dara deware,  
Çûye Eynikê, Eynbaranê,de na wele,  
Çûye ber garanê, dayê.*

*Dayê Delane, dayê Delane, dayê,  
Pêşya malê me şere,  
Paşa malê me ferman û talane, dayê,  
Dela Paşa bişewite bi şirte,  
Dela Paşa bişewite bi şirte,  
Sîyarê mala Mîrzê Zoro Axa, mala Hemzê Çelikê,  
Hatine serê girê Merê, girê Qereçê, girê Sirgûtê  
Hewara Mîrzikê Zaza, xwendkarê Êzdixanê nayên, dayê.  
Qotê gesra Baxizmê Mîrzikê Zaza va xuyaye,  
Ew jî qinyata ber dila ye, dayê.*

*Dayê Delane, dayê Delane,*

*Pêşya malê me şere, paşîka malê me xirav dewrane û talane,  
dayê,*

*Hê hê hê hê hê hê hê  
Go, Hesab Axa rabû bi giranî  
Hesab Axa rabû bi giranî,  
Esker ji Mazîkê, ji Mazea, ji Qewinê, çîyayê jorîn xwe ra a-  
nî,*

*Avîte ser Ridiwana Bavê Temo: Mîrzkê Zaza,  
De na wele, dîsa, heyfa İslamyâ gewr hilanî, dayê,  
Lê dayê, lê dayê, lê dayê...*

*Min go: Erenza Şêxa darê mezî,  
Erenza Şêxa darê mezî,  
Ridiwana bavê Temo dibe hrwar û, qîrîn û, gazî,  
Kesê Ridiwana bavê Temo derdikeve,  
Şûrê wî, ser milê wî rût û tezî.  
Wele dikuştin xal û xwerzî, ap û birazî, dayê.  
Dayê, lê dayê, lê dayê...*

*Erê lê dayê Delane  
Miçê mala Şêx Îsayê sê denga dikire gazî,  
De na wele sîyarên Qizila, xortên Êzdîyan,  
Digot, bav û bira, mîrbin, mîr çêbin, hûnê lêxin,  
Serê Mihê, Kihê jêkin,  
Sîyarê Hesabê Cibo, Kafir Kelo, hûnê serê wan jêkin  
Şevkê serê feqîr û melê Musulmana, şevkê ser bi porin,  
Herge Xwedê Tehla rast hilîne,  
Qewata Xwedê-Tawisî Melek, emê bikin  
Aşê Spî sê şev û sê roja xûna sor bigere, dayê.*

*Lê dayê, lê dayê!*

*Dayê Delane, dayê Delane,  
Pêşya malê me şere, paşîka malê me xirav dewrane û tala-  
ne, dayê.  
Dayê Delane, Delane, Delane, Delane, Delane,  
Erê min go reca Tehranê bi rî teme,  
Rêca Tehranê bi rî teme,  
Rima destê Eganê Meyro, Geşhamê Gîro, Erfanê Qizili,  
Keleşê Çilo-gavanê suyara cil û çar movike, darê ca-  
me, dayê...  
Dayê, lê dayê, lê dayê, lê dayê!*

*Erê, min go, ava Başûra şewitî leme-leme,  
Ava Başûra şewitî leme-leme,  
Heçî kesê ji mala xwe rabe...*

*/Li vir stiran tê birîn. Lê ne xeta kasêtê ye, dengbêj çend gil-  
ya bi xeberdan, derheqa dengbêjê ew jê ev kilam fîr bûye davê-  
je navê û paşê berdewam dike/.*

*Hê hê hê hê hê hê  
Nûrê dibêje, lê, lê Ediayê, gulî birê, te çi ser min da hêle-  
mêle,  
Nûrê dibêje, lê, lê Edlayê, gulî birê, te çi ser min da hêle-  
mêle  
hesabê Cibo, apê lawika, sîyarê Kafîr Kelo,  
Seqera ser Xalta, ser Ridîwana bavê Temo,  
Mîrzkê Zaza xêr û silamet bêye male,  
Wele ezê pismamê xwe ra bivim berdêleke nû helêle,  
Dayê, lê dayê, lê dayê, lê dayê.*

*Nûrê dibêje, Edlayê gulî birê, tu rabe, rahêle sîtilê,  
Here ber avê, serê xwe bişo, biskê xwe berde*

Zirav û dirêj têl bi têle,  
De, wele hesabê Cibo, apê lawika, sîyarê Kafîr Kelo  
Ridiwana bavê Temo, Mîrzkê Zaza bêye malê,  
Ezê pismamê xwe ra bivim berdêleke nû helêle,  
Kesê nizane, wê bêje: "Nûrê rebenê, rebenê, Edlayê gulîbirê  
Çiqasî aşiq mère...  
Lê lê lê lê lê lê dayê.

(Ji kasêtekê min nivîsyê. Navê dengbêj li ser tune).

## ŞERÊ XALTA

Delane, xweş Delane!  
Pêşya malê me şer e, paşya malê me ferman a !  
Şerê feqîrê Ezîdiya, sofiyê Misilmana  
Xwestir e ji şerê nêrî û berana !

Delana Başo, wa bi şitil !  
Çend peyayê Mala Zoro  
Li serê girê Qereçêrî bûne gûtil,  
Derbekê dane Hesarê Cibo û Bimbaê Mîro,  
Miço ê mala Şêx İsa.  
Ji mala bavê mi qelandin tov bîst û pênc  
mêrên rimbîqetil.

Delana Başo, li berê bendê !  
Mertala destê Hesarê Cibo giran e, kete zendê.  
Şerê Feqîrê Ezîdiya û Sofî Misilmana  
Xwestir e ji reqis û govendê !

Lê darê, Delane !  
Pêşiya malê me şer e, talî ferman a !

*Pêşya êsîrê Êzdîxan çûye tila Botana.*

*Delana Başo, bi qirkor e !*

*Hespê Bişarê Zoro di meydanê de bore-bore,  
Derbekê dane li Hesarê Cibo, Bumbaê Mîro,  
Ji mala bavê min qelandin tovê bîst û pênc  
Şêxê serbipore !*

( Kovara HEWAR; N 54; 15. 04. 1943; Rû. 6. )

### **ŞERÊ DELA**

*Şerê néryan û koz-berana...*

*Emo dibê Kino lo lawo  
Lo Qaso bav û birao,  
Ezê iro Delana Paşo diketim ber bi tetî,  
Bê tu bala xwe bidê ber û barûdê  
Payayê mala bavê min rebenê,  
Wey li ez merimê dibûne qatî,  
Ezê ne ketime ber kuştina  
Firatê Gulo, Miçoyê mala Şêx Mîrzayê,  
Îskanê Zoro, bavê Fariz axê,  
Ezê diketim ber we yekê iro serê sê rojane  
Laşê Firatê Gûlo, Miçoyê mala Şêx Mîrzayê  
Li xopana çemê Dela mane ne veşartî.*

*Emo dibê Kino lo lawo Delane,  
Lo Qaso bav-birao Delane,  
Îro li pêşya malê me şere,  
Paşa malê me fermane,  
Tu were şerê feqîrê Êzdîyan*

*Softi-serkeskê musulmanan,  
Xwestire şerê nêryan, koz-berana.*

*Emo dibê Kino lo lawo,  
Lo Qaso bav û birao,  
Ezê vê sibê xopana çemê Dela diketim,  
Lawo bi gîhaye,  
Bala xwe bide mala Zoro  
Li serê girê Qereçeyîrê rûniştine,  
Mîrzikê Zaza, di tevî koma Qizilanyê  
Li serê girê Qil rûniştine,  
Mala Çelikê tevî koma Berekanyê  
Li serê girê Melî rûniştine,  
Lawo, yek hewara peyayê mala bavê min nayê.  
Qesra Baxizmê ji peyayê mala bavê min va xuyaye,  
Lawo, ew jî qinyata ber dilê xortaye, lo lawo Hê hê hê hê hê  
hê*

*Dibê Kino lo lawo Delane,  
Lo Qaso bavo û birao Delane,  
Îro li pêşya malê me şere,  
Li paşa malê me fermane,  
Şerê feqîrê Ezdiya,  
Softi-serkeskê musulmana,  
Lo lawo, xwestire şerê nêryan, koz-berana...*

*Emo dibê, Kino lo lawo  
Qaşo bav û birao,  
Ezê bi Delana Paşa diketim lawo, bi kerkore,  
Bala xwe bidê, dengê tivinga, li ser peyayê  
Mala bavê min da, wey li min merûmê ore-ore.  
Ezê ne ketime ber kuştina Firatê Gûlo,  
Miçoyê mala Şêx Mîrzayê,*

*Îskanê Zoro, bavê Fariz axê,  
Ezê diketim ber wê yekê pêşya hêsîrê  
Mala bavê min rebenê  
Gîhiştîye gola Natore...  
Lo lawo...*

*Emo dibê, Kino lo lawo Delane,  
Lo Qaso bav û birao Delane,  
Îro li pêşya malê me şere  
Li paşya malê me fermane,  
Tu were dîyarê şerê feqîrê Îzdîyan  
Sofî-serkeskê musulmanan  
Lo lawo xweştire*

*...*  
*Emo dibê Kino lo lawo Delane,  
Lo Qaso bav û birao Delane,  
Îro li pêşya malê me şere,  
Li paşya malê me fermane,  
Şerê feqîrê Îzdîyan  
Sofî-serkeskê muaulmanan,  
Xweştire şerê nêryan û koz.berana.  
Lo lawo...  
Got Gêncoyê Temo.*

## KELEŞÊ ÇILO

Keleşê Çilo di dema Mîrzikê Zaza da mîrxwesekî êla Qizil-ya bûye, mezinekî bavikekî. Kilama „Şerê Erenzê“, da navê wî jî tê gotin, pesinê mîranya wî jî tê dayîn. Ew tê navkirin „Şivanê suyara“, „Bavê Memed û Mistê“, „Suyarê Kafir Kelo.“ Çirok û kilamên li ser wî li nava gel da mane û heta niha jî li nav civaka Êzdîyan da têr bîranîn.

Çirokbêj Hemzoyê Xalit dibêje: „Pêşya digotin, serokatya êlê di dest Mîrzikê Zaza da bûye, lê mîrxasî ya Keleşê Çilo bûye“

Çiroka Keleşê Çilo usa jî li ser kasêtê bi gotina dengbêj Gêncoyê Temo gîhiştîye destê min. Ser bingeha çirokên wan çirokbêjan (serecema teva jî bawarkî mîna heve) me ev têkstan nivisî.

Li nav civaka kurda da, kilam hîmlî, li ser şerê navxuyî, talan û cerda da kuştina mîra hatine sêwirandin. Bi wî awayî, wan li nav civaka cahil da, nav û dengê xwe hîştine.

Wextekê, (li ser ci bûye, çirokê cuda têne gotin, seva vê lê-kolinê, serecema wan ewqas jî pêwîst nîne) navbera Keleşê Çilo û bûrayê wî (birayê jina wî) Elyê Kilho li hev dikeve, xirab dibe. Keleş lê dixe bûrayê xwe dikuje. Jina Keleş: Qeşema Kilho, ji bo kuştina birayê xwe, mîr dihêle diçe mala bavê xwe.

Gundê Keleş Dûsalike, Gîrê Çilo, gundê mala bavê Qeşemê jî Mizereşe. Li rex gundê Keleş girek heye. Heta niha jî jêra dibêñ Girê Çilo. Navbera herd gund da 5-6 km in. Çem navbera wan ra dikşê.

Herd malbet pismamên heve nêzîk bûne.

Rojekê, Keleşê Çilo koma xwe va ji seferekê vedigere, nêzîkî gundê Têlanê Mîrwanê Gundikî, mirovên xwe va, dajone pêşya wan. Şerê navbera wan da Memûdê xulam (xulamê Keleş) tê kuştin. Keleş ad û qirar dike, sond duxwe heta Mîrwanê

Gundikî nekuje û heyfa Memûdê xulam hilnede gerekê mala xwe da rehet ranezê..

Keleş radibe, tenê berê xwe dide gundê Mêrwanê Gundikî, diçe. Lê dînhêre Merwan wê li nav zevya xwe da, ya birinc dane, zevyê av dide. Dey lê dike, dibê hazir be, çekê xwe hilde em şerkin.

Li nav Kurda da şerme, bê dey lê kirin, derbê li dijminê xwe dî. Heta Mêrwan radihîje şûr, mertal û rima xwe, hespê Keleş li nav zevya avdayî da dikeve hezekê û lingê hespê çokê da dişkê. Şêr da Keleş bi du gula birîndar dibe, vedigere mal. Hekîm tê ser, bîrînê wî derman dike. Birîn ber bi xêrê diçin, baş dîbin.

Lê çawa dibe, rojekê birînê wî bi sivikayî dêşin. Keleş xulam dişîne pey hekîm. Hinek çîrokbêj dibêjin hekîm ji gundê mala bavê Qeşema Kilho bûye, hinek jî dibêjin rîya gundê hekîm wî gundi ra derbaz bûye. Qeşem pê dihese. Dema xulam derman tîne, yan hekîm diçe, ku derman bive birîna Keleş pê derman ke, Qeşem wan dixapîne, jerê dike li nav dermên. Bi wî dermanî Keleşê Çilo dimire. Usa Qeşem heyfa birê xwe: Elyê Kilho ji mîrê xwe: Keleşê Çilo hiltîne.

Kilama ku li ser Keleşê Çilo hatye sêwirandin, me ji kasêta dengbêj Gêncoyê Temo nivîsî:

*Ha hî î î î î î î î î*

*Wî lê lê ê ê ê ê ê ê ê*

*Memed dibê dayê bavê min kuy?*

*Mistê dibê dayê bavê min kuye?*

*Belê lê Hezarê dibê, lawo bavê te wê çûye*

*Xopana qesra Ridiwanê,*

*Şêwrê dike, davêje li ser talanê Eynûkê, Endêranê,*

*Lo lo ê wa yê lo lo wey lo lo.*

*De rabe, derdê dilê min, bavê Memed, bavê Mistê,*

*Gavanê suyara, suyarê Kafîr Kelo,  
Kanê, lê min kanê, lo min kanê...*

*Wî lê lê ê ê ê ê ê ê ê  
Dayê berika Têlanê berî tevê,  
Bavo berîka Têlanê berî tevê,  
Belê, rima ser destê bavê Memed, bavê Mistê,  
Gavanê suyara, bê cil û çar movik darî çamê,  
Gelek şaneşûnê bavê Memed, bavê Mistê,  
Gavanê sûyara hene li dewra vê dinyayê,  
Rojê sê cara bi şûrê zirav dajote ser laşê Memûdê xulam,  
Lo lo wa ye lo lo ,wey lo lo*

*De rabe, derdê dilê min, bavê Memed, bavê Mistê,  
Gavanê suyara, suyarê Kafîr Kelo,  
Kanê, lê min kanê, lo min kanê...*

*Wî lê lê ê ê ê ê ê ê ê  
Dayê meneka bavê Memed, bavê Mistê weteye ji bezê,  
Bavo meneka bavê Memed, bavê Mistê weteye ji bezê,  
Ezê rabim serimeke qerimekê çêkin  
Ji bavê Memed, ji bavê Mistê ra vê sibê ji darî gezê,  
Ezê rabim herim xopana quesra Ridiwanê  
Xwe bavêjim tol û bextê Mîrzîkê Zaza-  
Bêjim gelî Ézdîya ez bextê we û Xwedê me  
Hûnê dilê xwe ji kuştina Keleşê Çilo xweş nekin  
Rojeke weke roja şerê mîrate Erenzê kêri me tê.  
Hey lo lo lo hey lo lo hey lo lo ...*

*De rabe, derdê dilê min, bavê Memed, bavê Mistê,  
Gavanê suyara, suyarê Kafîr Kelo,  
Kanê, lê min kanê, lo min kanê...*

*Wî lê lê ê ê ê ê ê ê ê  
Ezê bêjîm hekîmo, ez qurbana te me  
Nizanim çîma usa tu nezanî,  
Hekîmo, ez qurbana te me  
Nizanim çîma usa tu nezanî,  
Îro te qutîk û melhemê xwe  
Li bal Qşema Gelho danî,  
Ax avite birîna bavê Memed, bavê Mistê  
Vê sibê jera Silêmanî,  
Hey lo lo lo hey lo lo hey lo lo...*

*De rabe derdê dilê min, bavê Memed, bavê Mistê  
Gavanê suyara, suyarê Kafir Kelo,  
Kanê, lê min kanê, lo min kanê...*

( Got dengbêj Gêncoyê Temo\*\*\*).

## BÎRANÎNA HEMZOYÊ XALIT \*

Ev şerên Dela û Ridiwanê-Erenzê di demekê da bûne. Xwedê min kilama şerê Dela jî zanibû, lê min tev bîra kirye. Berê,digotin mala Dewrêş Nebî hebûye, Şêx bûn, Şêxê mala Qadi-rya bûn. Şêxê Musulmana. Esker top kirine, hatine ser Dela. Dela gundêñ Êzdîya bûn. Du gundêñ Dela hebûne.Yek girê Merê bûye, yek jî alyê Qelayê-Hechrê bûye. Eskerê Dewrêş Nebî li wan dan, maf kirin, kes ji wana nehîştin. Mezina sond dixwe-rin, digotin li Müsilê torê masya berdidane avê, digotin hingê gulyê qîz, bûk û xortan tev hev girêdayî, meyt ji avê de-

ranîn. Yanê meytê kuştîya ewqas zef bûne, ku avê ew birine, derxistine heylo li wura.

Cîyê Dela berçeme. Çemê Xerza di ber ra dikşê, digîhîje Dicilê. Alikî gundê Dela ye, alyê din gundê ziyareta Şêx Vend e. Şêx Vend Şemsanî ye. Ew ziyaret hê jî heye. Cimaya wê serê Gulan û havînê ye. Miletê wê cewlê temam Niqîbî, Xendeqî, Berekî ne. Tev diçine ziyareta wê. Heta îslam û file jî dihatin ziyareta wê. Wê dîlan-govenda giran digirtin, şayî dikirin. Li qarîşî Dela quesra Baxîzmê ye. Ew quesreke bi nav û denge. Baxizmê da mala Çelikê diman. Ew û Dela du km. ji hev dûrin.

Mala Zoro gundê Zivingê bûn. Ew jî weke 5-6 km ji Dela dûrin. Dema şerê Dela da herd mala jî çûn sêr (mêze) kirin lê neçûne hewara Dela. Dela du gund bûn. Delanekê ra gotine Dela Qaşo, ya din ra Dela Paşo.

Gundê Dewrêş Nebî jî ji Dela 20-25 km-î dûre, gundê Telanê. Wê dema şerê Dela da wê deverê Musulmanî kêm bûye, tev gundên Êzdîya bûne. Li gundê Badayê, eva jî wê heremê da gundê şêxê pismamê gundê Têla bûne. Ev jî Şêxê Qedirîya bûn. Qedirîya dibêjin em ji zureta Şêx Ebdil Qadirê Gêlanî ne. Mala Mîrê Êzdîyan dibêjin, ew ji mala Şêx Ebdil Qadirê Rehmynî ne. Em, Êzdî dibêjin, Şêx Ebdil Qadirê Rehmanî, mala Şîxadî jê çê bûye û serdarê kul û ewlya ne-yanê Şêxê mezinin, şêxê temama ne. Şêxê şêxa ne. Ne, ku tenê şêxê Êzdîya ne lê şêxê dinyayê ne.

Herd gundên Dela jî gundine mezin bûne. Feqîr bûne. Bi texmîna min ew li bin bandora mala Zoro da bûne. Ew jî li ser Niqîbya têne hesabê. Delan û Qubîn 3 km ji hev dûr bûne. Wê demê Qubîn bajar nî bûye. Bajarê nêzîk Ridiwan bûye. Ridiwan qeza bûye.

Êzdîyan wê hingê lep hilnanîn. Gire-girê Êzdîyan: Mala Zoro Axa niha jî hene, 150 mîr wan da heye. Wê demê jî maleke bi nav û deng bûye, lê lep hilnanîne. Mala Çelikê. Mala Çelikê

du car, sê car weke wanin. Wan ra digotin mala Sêvdîn Paşa. Berek, Erzik, Baxizm tev gundêñ wan bûn. Wana jî hat, şer dûr va sêr kirin, qet lep hilnanîn, deng nekirin. Wextê deng nekirin, Musulmana ew xilaz kirin, îcar gotin emê Qizila xin, dîsa Êzdî deng nakin...

-Şerê Dela ser çi bûye ? Çi bû sebebê wê qetlemê ?

Na, wele tu sebeb jî tune bûye. Min ji mezina ne bihîstyé, ku Delanya tiştek kirye. Min ev gilya devê geleka bihîstîye, lê kesî negotîyr seva çi bûye. Usa jî herd gund ji hev 25-30 km. dûrin. Çima cara ewlin ferman li Êzdiya radikirin. Musulman bûn ferman li Êzdiya rakirin. Herd cî ji hev dûrin jî. Navbera Dela û Têlanê da rêya denekî ye.

Lê ya Ridiwanê, şerê li ser Erenzê, digotin ji mala Dewrêş Nebî du Feqîyên Musulmana têne cem Mîrzik. Giva Êzdiya serê herd Feqya jî jê kirine. QURAN jî li cem wan hebûne. Quranê wan jî paşê birine bajarê Sêrtê firotine. Digotin Êzdiya pêşyê li wan dane. Dema li wan dane wan texmîn kirine Êzdiyê wan bikujin, Quran da nivîsîne, ku Êzdiya tiştekî wa anye serê me. Êzdî jî bi xwe nwxxwendî, nezan, cahil bûne, nizan bûne çi-çîye, Quran birine Sêrtê firotine.

Ü bi wê nivîsarê Dewrêşê mala Dewrêş Nebî ji Bota, Cizîrê girtî heta Mêrdînê, Sêrtê, lo heta Mûsilê musulmanyê li hev dicivine û fermaña Êzdiyan radike. Serkêşya ferمانê mala Dewrêş Nebî kirye.

Wana zanibû, dema Delana xistin Êzdiyan deng nekirin, usa ne Qizila xin jî kes deng nake. Ü wextê hatin, Qizila ji Berekya û Niqîbya çêtir lep hilanîn.

Bi eskerekî pir giran têne ser Ridiwanê. Min xwe dîtye. Ne min tenê, geleka dîtye. Tawîşî Melek me teva dîtye ew şikêra kevira. Dû şikêrin.(Qûça kevira). Yek ji vê odê bilindtir e. Gava hatine sêr li ser Êzdiyan her yekî kevirek anye avîşîye ciyê tan-ga şer bive. Kevirê mezim jî nînin, biçükîn. Gotine emê van

kavira bivin cîkî qûçkin, çika em çiqasin, gotine me şer qedand, bira yê sax mayî dîsa rahîjine keviran, emê bizanbin ji me çiqas hatine kuştin. Mezina digotin payê hatya erekê eskerê Osman-yê bûne. Eskerekî giran bûye.

Go wextê têr dora Erenzê digrin, Mîrzk li Ridiwanê bûye, dibêje, dengê tivinga Bado hat, usane Bado saxe hê Erenz neqelandine. Bado birê Mîrzik bûye, Erenzê da maye. Wê demê tiving nû derketine, tivingê kesî tine bûne, lê tivingeke Bado hebye û ji tivinga wî jî dengekî bilindî pir ecêb derketye. Go wî çaxî Ridiwanê da jî, der dorê wê jî, file pir bûn, Ermenî bûn. Navbera Mîrzik û fila jî xweş bû.

Mîrzik gazî Keşîşê file dike, eva ENCÎLÊ dinhêre. Keşe remildar bûye. Go yê File got, go bisekinin, şer nekin, idare kin heta roj diqulibe. Pişt ra kengê we dît kewekî sipî, hat derkete serê qubê (li nav goristanê, ya mala Mîrzikê Zaza, qube li ser tirba çekirine, heta vî axrîyê jî ew qube hebûn. Vê axrîyê goristana wan xirav kirine), xwend, wî çaxî hûn lêxin. Hûnê eskerê İslâmî bişkînin. Go eynî ew kew derket. go, vê carê lê xistin û dijmin işkînandin.

Mezinayî ya Mîrzikê bûye lê egîtî ya Keleşê Çilo bû. Mêrê mîrxas hebûne nava Êzdiya da :Miçoyê mala Şêx Îsayê, Geşhemê Giro, Êganê Meyro, gelekê dinê. Navê wan heta naha jî kilama da tê gotin.

Pêşya digotin hidûdê desthiletdarya Mîrzikê Zaza gelekî mezin bûye, hete, heta yaxlîyê mîlyonek îsan pêva girêdayî bû. Go, ji Çêlkîyê Elyê Remo heta 100 km hebû digîhişte pira Aviskê, heta ava Sêrtê, heta Başûrê.

Kilamê da pîreka Esabê Cibo wa davêje ser şêrr :

*Edlayê digot : Nûrê, xweya minê,  
Esabo Ronî, ne min got wa meke,  
Tu bi xeberê sofî û feqe û meleyê ber ava Bota meke,*

*Neçe şerê Erenza Şêxa, Ridiwana bavê Temo, Mîrzikê Zaza,  
Şerê giregirê Ézdîyan, yê Mîrzikê Zaza,  
Keleşê Çilo, Geşhemê Giro,  
Êganê Meyro, Miçoyê mala Şêx Ísayê ne heneke.*

*Edlayê digot : Nûrê xweya minê, bese mida bikî hêle, hêle,  
Serê xwe bişo, porê xwe çêke, sê-sêbiskê xwe berde,  
Ser hinarêñ rûya têl bi têle, Esabo Ronî  
Gava ne bi xêr tu vegerî malê, ezê hingê  
Xwe ji te ra bikim bermalyeke nû helêle.*

*Esabo Ronî ezê Erenza Şêxa diketim bi darê mezi,  
Min dît bire siyarê Ézdixanê derketine  
Mixara Quçika sûyarin li hespê boze sayî  
Kumê wane li serê wan da,  
Şûrê wanî destê wan rût û tezî,  
Sond xwerine, bi beyraqa Êzî, bi navê Tawisî Melek,  
Meyê kuştîye Mihê û Cihê, me 70-ê temam kirye  
Ji xal û xwerzî, am û birazî...  
Lê dayê, lê dayê.*

*Ezê Erenza Şêxa diketim bi darê tere,  
Rima destê Keleşê Çilo, Êganê Meyro, Geşhemê Giro,  
Miçoyê mala Şêx Ísayê, giregirê Ézdixanê  
Bîst pênc movik bira here,  
Emê bikin aşê Sipî, aşê Gewro  
Li ber xûna sofi, feqî û meleyê  
Ava Botan heft şev û heft roja ber xûna reş bigere...  
Lê dayê, lê dayê*

*Ezê bi Erenza Şêxa diketim bi tepeye,  
Eskerê Esabê Cibo girane, girtîye dora*

*Erenza Şêxa çar ewleye,  
Şede-şûdê Miçiyê mala Şêx ïsa  
Gelek hene li dinyayê,  
Dibêje: "Min serê Esabê Cibo, apê lawika,  
Jê kirye bi destê xweye,  
Min hildaye heyfa bav û bapîrê xweye..."*

Dewyê da Mîrzik girtin. Dewleta Osmanyê Mîrzik girt. Zilamekî ji mala Huseynê Kelo, mala wam Kelhoka bûn. Berê ne Kelhoka bûn lê vê paşyê hatin Kelhoka. Min navê wî zilamî jî zanibû, lê naха ji bîra min çûye. Mera usa hatîye gotin. Herda digirin, dibin hebsa Dîyarbekirê. Go ji hebsê revyan. Wê deverê çiyayek heye, jê ra dibêjim çiyayê Kinêrya. Gundê Pîra wur heye. Direvin çiyayê Kinêryan. Dikevne şikeftekê. Wê şevê berf dibare. Berfê da dixeniqin. Sibê şivan meytê wan divînin. Diçin cinyazê wan tînin. Mezelê Mîrzik nava Çilêrya ye. Çilêri-ya tev pê zanin.

## BÎRANÎNA ELÎYÊ QECER \*\*

Şerê Erenzê ayrı ye, şerê Dela ayrıye. Dela du gund bûne, Delana Paşo, Delana Qaso. Dela diketin alyê Qubînê, nêzîkî zîyareta Şêx Evenda.

Ewil şer li ser Dela çê bûye. Navbera şerê Dela û Erenzê da 3-4 meh bûne. Bavê min hela digot mehek bûye.

Şêx Qasim, ji mala Dewrêş Nebî, musulmanyê tov dike tê davêje ser Dela. Herd gunda jî diqelîne. Dela gundê Feqîra bûne. Niha dewsa wan gunda jî nemaye. Dewse kirine zevî, cot dikin, pembo davêjin. Xwedê, min ew zevî bi destê xwe cot jî kirye. Delana Paşo nayê cotkirin, qefa çiyêye, berave, nêzîkî Kevirê qule. Pêşber Kevirê quj jî li cem zîyarete Şêx Evenda ye. Dela Paşo binya çiyê dane, gişk şikeftin, loma dibên:

*Delana Paşo devê çayê,  
Berfê û baranê hev ra dayê,  
Mala Çelikê hatine ser girê Mirê,  
Xwe dane li ser darê rimayê,  
Hil li dinyayê,  
E'cêb ew e'cébe,  
Xal hewara xwerziya nayên...*

Herd gundê Dela jî dibirin. Zar, jin, mîr, kal, pîr teva davê-jin devê şûr. Çem ber ra dikşe, dibêjin çemê Dela. Digotin çem ji cinyaz û xûna evda sor bûbû. Çem diçe li ber Ridiwanê ra derbaz dibe. Çemekî xurte. Havînê jî mirov bi hespê nikare nav ra derbaz be. Ava wê pir zelale.

Sebebê wî şerî ci bûye, nizanim. Kesî qala wê me ra nekirîye. Digotin şerê Îzdîya û Musulmana bûye, bona dîn bûye. Gundê Dela êla Niqîbya bûn. Niqîbya eşîra mala Zoro ne.

Wî çaxî Dela mala Zoro xwe ra mezin hesab dikirin yan na, nizanim.

Ji pey qelandina Dela ra, wextê Musulmanî dinhêre Îzdîya seva Dela deng nekirin, berê xwe didine Ridiwanê, êla Qizilya.

Mîrzik serokê êla Qizilya bûye. Êla wî pir mezin bûye.

Berî Mîrzikê,- bavê min digot,- serokê êlê apê Mîrzikê bûye. Navê apê wî Zaza bûye. Mîrzik kurê birayê wî bûye. Navê bavê Mîrzik Hesen bûye. Wextê apê wî: Zaza dimire, (çar kurê Zaza hebûne). Axayên cînarê wan: mala Zoro, mala Çelikê, mala Ferhoyê Hizêr Axa (bavê min navê hinek malen axê Musulmanyê jî digot, bîra min çûne) têne Ridiwanê, ebakî axatîyê tînin, ku dewsa Zaza, ebê kurekî Zaza kin u wî çawa axakî nû elam bikin. Xwedê ez navê wan Axê hatî nizanim. Bavê min jî nizan bû.

Mîrzik sêwî bûye. Apê wî pir neheqî lê kirye. Ew birayê xweyî Bado û diya xwe bûne. Mîrzik hela gênc bûye 18-19 salî.

Dema Axa tê Mîrzik dîya xwe ra dibêje: "Ezê jî herme dîwana apê xwe". Dê dibêjê: "Herî neçî, yeke. Kê guh bide te. Tê dîsa ew Mîrzikê golikvan bî."

Mîrzik radibe diçe dîwanê. Lê dinhêre, axa rûniştine, eba danîne wê navê, kes ber tune. Silavê dide wan, radihîje ebê, xwe dike û dibê ez axa me. Yê hatî tev hev dinhêrin, dibêjin hema axatî bira vî ra be, evî jêhatîye. Ev jî bira bive serokê Ridiwanê. Digotin heft kurê Mîrzik hebûne. Yê mezin navê wî Temo bûye. Yê din navê yekî Mamed bûye, navê yekî Sincan bûye, navê yê din nizanim. Çend keçê wî hebûne. Navê yekê Heno bûye.

Bavê min digot zêrzema wî hebûye, mîna hebsê. Qîzeke xwe kirye wê zêrzemê. Keçikê dilê xwe kirye xulamekî. Gotye tu çîma lawê Axa ra nazewicî? Keçik têda dimire. Dibêjin ewê jî nifir kirye, gorye: "Hûn biqelin". Wele em neqelyan lê hatin li ber qelandinê.

Ça dibe serokê Ridiwanê, Mîrzik dest pê dike qwsra xwe çê dike. Sûrê çê dike. Milet mecbûr dike, ku bi torba xwelyê bikşînin, bînin. Bi tûrkê xwelyê gir çê dike û li ser gir jî quesra xwe lê dike. Bavê min jî, apê min jî Ridiwanê da mane. Goristana mala Mîrzikê hebûye, qube bûne. Pênc qube bûne, her yekê da du-sê mezel bûn. Go mîna gunda bû. Xelqên xerîb tirê gunde. Birê bavê minî mezin, apê min Mistê li wur kirine çel. Keleşê bavê Silê, kalkê Elî Eslan jî wura kirine çel. Pîreka bavê min, ya ewlin, keça wî Keleşî dîsa li wur kirine çel.

Qizili heft bavin: Amîrkî, Metînkî, Şemsikî, Tekorî... Navê yê din nizanim.

Mîrzik û mala Dewrêş Nebî kirîvê heve xûnê bûne. Wan ra digotin şêxê Têlanê. Têlan qeza bû. Pey şerê Dela ra Dewrêşê mala Dewrêşnebî sê Feqa dişîne cem Mîrzikê, seva gênim. Mîr-

zik wan dişine Cimsarîyê cem mirovên xwe. Mîrzik temyê dide mirovên xwe ku dest nedine feqîyan, rind verê kin, bira paşa herin. Zanibye, ku piştî qira Dela, eger tişt bê serê Feqîyan wê ji êla wî ra xirav be. Evan barê wan dadigrin, verê dikin. Rêva wan Feqa dikujin. Dibêjin Êzdîya kuştîye. Bavê min digot, pêşyê me me ra gotye, kê kuştîye usa jî dîhar nabe. Bavê min digo, gotine giva cem feqa Quran hebûne. Feqa Quranê xwe da nivîsîne Êzdiyê em bikujin. Giva Êzdî wan Qurana dibin bajarê Sêrtê, difroşin. Wura jî dixûnin û dibêñ Êzdîya kuştîye. Usa Şêx Qasim fermana Êzdîya radike. Musulmana top dike tîne ser Mîrzik. Ereb jî li nav wan da hebûne, eskerê Osmanyê jî hebûne. Bi texmîna min Hesabê Cibo bi xwe Ereb bûye. Ji Mûsilê girtî heta Cizîra Bota, deşta Bişêryê, Sêrtê eskerekî pir giran tînin, ku Ezdiyê wê deverê, ku bîqelînin. Têr dora Erenzê digrin. Wê ra dibêjin Erenza Şêxa. Malê şêxa Erenzê da pir bûne. Wê demê Êrenzê da Badoyê birayê Mîrzik jî maye.

Li rex Erenzê qûçê kevira hene. Dibêñ dema eskerê Şêx Qasim hatine ser Ridiwanê her yekî ji xwe ra kevirekî biçûk anye, kirine qûç, ku pey şerra bizanbin, ji wan çiqas hatine kuştin. Êzdiya geleka ew qûç ditine.

Mîrzik Êzdîya dicivîne: Keleşê Çilo, Geşhemê Gîro, Êganê Meyro, Miçoyê mala Şêx Îsayê mîrxwesê wî bûne.

Hesabê Cibo mîrxwesê musulmanyê bû. Go zirîkirî bû. Mêrê weke wî xurt tune bû. Kesî pê nikaribû. Çek zirîyê wî da nedîçûn. Go hespê wî jî xurt bû. Go meydana şer da him wî, him jî hespê wî mirov dikuştin.

Bavê min digot Êgan Pîr bûye. Şer da Egan Esab dikuje.

Go eskerê musulmanyê hatye dora Erenzê girtîye, zevî gîhiştine, wextê firîka ne. Mîrzik lê dinhêre eva Êgan wê li ber zevyê rûniştîye xwera firîka destê xwe da dipişirîne, nîvî du xwe, nîvî jî dike cêva xwe. Mîrzik dibêjê: "Malava, Êzdî qelan-din, dora Erenzê girtine, şere, wextê te û van firîka ne."

Êgan divê: "Cenim şere, sibê ez şêrda bême kuştin, zarê minê bêxweyî bimînin, xema teye?"

Mîrzik jêra sond duxwe, dibêje: "Eger şêrda tiştek te bê, heta qesra Ridiwanê hebe, zarê teyê şirîkê wê qesrê bin."

Paşê Êgan radibe, hespê xw siyar dibe diçe şêr.

Keleşê Çilo xweşmerekî êla Qizila bûye. Jêra gotine şivanê siyara. Navbera wî û Mîrzikê ewqas xweş nî bûye. Mîrzik bawar nake Keleş bê hewara Ridiwanê. Keleşê Çilo siyarê xwe va têñ hewara Ridiwanê, lê dinhêrin bi emrê Mîrzik av berdane dora Ridiwanê û Erenzê kirine hezek. Dipirse, dibê çima we usa kirye. Mîrzik dibê, ku dijmin nikaribin bi rehetî bikevn Ridiwanê. Keleş dibêje eva pirsa Êzdixanê ye, pirsa xîretê ye. Rabin em herin pêşya dijmin. İro roja mirin- jiyanê ye.

Keşe Polo keşê Mîrzikê bûye. Keşe remildar bûye. Remil a-vîtiye, gotye: "Kengê teyrek derket li serê qubê danî, wê himgê şerkin.

Usa jî dikin Êzdî eskerê wan dişkênin û ser dikevin...

Çend sal pey ra Mîrzikê digrin divine hebsa Dîyarbekirê. Ji hebsê direve. Du-sê xulamê wî pêra bûne. Direvne çiyayê Çinêriya, nêzîkî gundê Pîra: Cinêrya. Wura çawa dibe, nizanim, di-mire.

Pîr tînin meytê wî Ridiwanê vedîşerin. Bavê min digot me mezelê Mîrzikê vekirye û meytê Keleşê apê xwe kirye mezelê wî.

**SALIHÊ KEVIRBIRÎ \*\*\*\***

**ŞERÊ QEWALÊN ÊZDIYAN Û  
SOFIYÊN MISILMANAN**

Mîzikê Zaza li gundê Ridwanê ya Batmanê, Dewrêş Nebî li gundê Têlanê ya Misircê (Qurtelan) dima. Mîrzikê Zaza mezinê Êzdiyan bû. Mîrzikê Zaza û Şêxê mala Qedirya Dewrêş Nebî hevnas û dostên hev bûn. Rojekê du heb feqiyê Dewrêş Nebî dibêjin: "Wele malbatên me birçî mane û debara me nemay. Dewrêş Nebî dibêje: "Herin li Ridiwanê cem mala Mîrzikê Zaza, silavê min jêra bibêjin, bila her yekî we zad, genim, xwerin û vexwerina salane bide we.

Her du feqî radibin diçin Ridiwanê ba Mîrzikê Zaza. Ew ji Têlanê diçin Ridiwanê û silavê Dewrêş Nebî jêra dibin. Mîrzikê Zaza pir kêfxweş dibe û rês û hurmetê nîşanî wan dide. Du heb feqîrê êzdîyan jî êvarê têne mîvanaya Mîrzikê Zaza. Ew dibêje du heb feqîyê musulman mîvanê me ne û du heb feqîrê me jî hatin. Dê îşev şevbihûrka me xweş derbas bibe.

Ew mijûl dibin û li rewşa hev dipirsin. Ji koçekan ra dibêjin du feqiyên musulman jî mîvanê me ne dê îşev şeva me xweş derbas bibe. Ji feqiyan pirs dikin û behesa axretê ji wan dipirsin. Feqî dibêjin:

-Mîrzik wele ya me kitêba me heye, Qurana Kerîm heye, ku ji alyê Xwedê va ji bo pêxembeê me hatîye û behsa îslamiyetê dike...

Ji koçekan behsa axretê dixwezin. Ew jî li gora xwe şirove dikin. Ew jî dibêjin:

-Ji me ra heft kat binerd û heft kat jî ji esmanan xuya ye!

Dibêjin:

-Wê çaxê dînê îlamê jî wekî dînê me gelek bi qewat e. Xwedê mertebeya we mezin bike.

Êvarê dema şîvê tê. Şîvê tînin, sifra koçekan cuda tînin û goştê wan dixin bin sêniya wan. Û ya feqîyan jî cuda tînin û goştê wan dixin serê sawarê, dibêjin kerem bikin xwerina xwe bixwin. Koçek naçin ser sifrê, dbêjin:

-Hûn çîma nayêñ xwerina xwe naxwin?

Ew dibêjin:

-Em rêberê we ne, ku xelasiyeyke we hebe bi destê meye. Em têñ dibin mîvanê we, hûn tu qîmetê nadine me. Du heb feqîyê misilman hatine mala te û bûne mîvanê te. Tu qedirê wan digirî, divê tu qedirê me bigirî, ku em herin li her derê pesnê te bidin û bibêjin mezinê êzdiyan ew qas qedrê me girtîye û tu qedirê me nagirî û te godt daye feqîyan û te nedaye me.

Mîrzik dibêje:

-Heyran ew dibêjin kitêba me heye û em li gorî kitêbê, Xwedê ci bibêje, em jî gel re dibêjin. Lî hûn dibêjin em heft kat li esmanan û heft kat li binê erdê dibînin, tu çîma sê santîm goştê d bin sawarê de nabînî? Weleh tu derewan dikî.

Ev yek pir li zora koçekan diçê. Berê katibê her axa û mezinî hebû. Mîrzik jî gazî katibê xwe dike û dibêjê:

-Bila herin Darûselê, ba mala Çelê her yekî barekî genim bide van feqîyan, bila ji xwe re bibin...

Derûsel di nava Mûskan de û dikeve pişta Çiyayê Bêkendê. (Bêkend, gundekî Kurtalanê ye). Koçek diçin cem katib û dibêjin:

-Tu li ser navê Mîrzik binivîse, ku Çelê va du heb feqî min şandin ba te. Tu wan bikuje.

Koçek vê yekê ji katib ra dibêjin bêyî ku haya Mîrzk jê hebe. Çelê jî dewlemendekî êzdiyan e û li Derûselê dimîne. Feqî radi-bin nemeyê dibin Darûselê, diçin mala Çelê. Wan dibin xanî û xwerinê ji wan ra dibin. Cihê wan çê dikin ku wan bikujin û veşerin. Bûkeke Çelê heye ku wê rewşê dibîne tê çev li feqiyan dikeve du heb xortên wisa delal in, dilê bûkê bi halê wan dişewite û digirî. Di vê navê de di nava her du feqî û bûka Çelê de ev gotin derbas dibin: dibêjin:

-Kirîvê tu çima digriyî?

-Ez bi halê we digrîm.

-Çima?

-Wê niha we bikujin!

-Çima dê me bikujin?

-Weleh wê niha we bikujin. Niha li hewşê di binê dara çilo de çelekî dikolin ku we tê da veşerin. Dê we bikujin bixin wê çelê.

-Riyeke revê ku em xelas bibin tune ye?

-Wele ku hûn bibin teyr û bifirin jî hûn xilas nabin.

Feeqî radibin bi erebî tiştekî dinivîsin û dikin nava Qurana xwe. Û deryê wê digirin. Pişt re jî her du feqî têne kuştin û çelkirin. Dewrêş Nebî jî qet li feqiyan napirse û dibêje qey ji xwe re genim anîne û çûne mala xwe. Heta ku dibe havîn. Êzdî dibêjin: "Emê Quranê bişewitînin." Lê dîsa naşewitînin û dibêjin: "Gava ku em çûn Sêrtê an jî Misircê, emê bifroşin û ew jî pirtûkeke dê pere bike."

Dibe havîn, zadê wan dertê, zadê xwe li heywanan dikin ku bibin li Sêrtê bifroşin. Ew wê Quranê jî bi xwe re dibin ku bi-

froşin. Ew digihîjin binê Dîrêncâ Têlanê, rastî du feqîyan têñ, ku ji Têlanê têñ û diçin Sêrtê. Feqî xwe naxin nava karwanê êzdiyanû ji dûr va diçin.

Yek ji êzidiyan dipirse:” Kirîv hûn çi kes in?” Ew dibêjin: “Em feqî ne.” Wê dibêjin: “Kitêbeke we bi me re ye, hûn nakirin?” Feqî dibêjin: “Weleh kitêbên me kêmîn em diçin herin Sêrtê ji xwe re kitêban bikirin. Ku ji me re lazm be û hûn jî erzan bidin, emê bikirin.” Dibêjin: “Bila yek ji we were lê binêre...” Ew jî dibêjin: “Bila yek ji we kitêbê bîne vir em lê binêrin.” Baweriya wan bi hev tune ye.

Yek ji wan Quranê tîne û dide destê wan. Gava ku feqî deryê Quranê vedikin, ew nemeya ku feqiyê kuştî nivîsî bû, derdikeve. Ew nemeyê dernaxin û wusa dixwînin. Feqîyan her tişt heya ku çawa çûne mala Çelê jî tê da nivîsîne. Hevalên wan dixwînin. Deryê Quranê digirin û dibêjin:”Kirîv, kitêba ku em lê digerin ev e. Lî li ser me pere tine ye. Niha em diçin herin Sêrtê. Misilman zekat û pere didin me. Cihekî ji me re bibêjin, emê bêñ û ê pirtûkê ji we bikirin...Gotina xwe dikin yek û cihekî ji xwe re kivş dikin, ku li Sêrtê hev bivînin.

Çawa ku feqî diçin Sêrtê gilyê wan dikin. Ew ji feqîyan re dibêjin ku rast be hûn herin bazara xwe bikin emê bêñ. Ew diçin bazara xwe dikin di nava destê feqîyan de berpirsên asayîşê êzidiyan digirin. Diçin mala Çelê û li bin dara çilo de cendekê feqîyan derdixin.

Paşê haya Dewrêş Nebî jî pê çê dibe û her kes pê dihese.. Dewrêş Nebî dewa fermaña êzidiyan dike. Ji ber ku di dema dewîn a Osmanyan de ev bûyer qewimiye, paşayê wê demê li ser kar e xwestîye kurd bi xwe koka hev biqelînin. Lewra jî ji Dewrêş Nebî re gotye:

-Here tu çi dikî bike, tu bi xwe here tola xwe hilde...

Bi fermaña Dewrêş Nebî ji her derekî misilman têñ û bi ser êzdiyan va digirin, şerekî giran derdikeve. Li binê Qubînê li

Delawa Paşo şerekî mezin derdikeve. Xwîn cendekan dibe. Li Erenzê: Asafê Cibo ji beryê hatibû û siwarê kihêlê bû û zirêh-pûş bû û tu tişt tê nedîcû. Ava Erenzê berdan ser mexelê. Mihîneke bi fel di navê de girê didin. Gava ku Asafê Cibo vê carê jî tê bi ser wan de. Ew ber bi cihê ku avê lê berdanê û mihîn lê ye ve direvin. şîhînî bi mihîna fel dikeve û hespê Asafê Cibo jî mihînê dibîne û qesta mihînê dike. Asafê Cibo dike û nake bi hespê xwe nikare. Gava ku hespê Asafê Cibo ber bi mihînê ve diçe, cihê ku av ji êvarê ve berdanê wir, hespê Asafê Cibo hete ber sîngê xwe di heryê da diçe. Tên lê dixin û Asafê Cibo dik-jin. Mîrzikê Zaza jî di vî şerî da tê kuştin.

Kerem bikin niha jî kilama ku li ser vê bûyerê hatye gotin, ku me ji devê dengbêj Salihê QUBÎNÎ girtîye:

*Emo lawo, Zazo birayo  
Rewşê lê xwehê te malî babê mîratê  
Ezê bi Baximsa Babê Beyar diketim bi bax û rez e  
Heyfa min nayê li wê heyfê  
Derbekî lêdane li bejn û bala Mîrzikê Zaza  
Qelandine tovê Êzîdxan e.*

*Emo lawo Delan e ji kula dilê min re xweş Delan e  
Li pêşiya malên me şer e  
Li paşiya malên me ferman e  
Fermana me ne ji cem Sultan e  
Fermana me ji cem Dewrêş Nebî  
Şêxê Têlanê, şêxê Girdika ne ban û kan e.*

*Kino dibê Emo lawo Delawa Paşo bi kerkor e  
Heyfa min nayê li wê heyfê  
Heyfa min tê bi pîr û gewala  
Îro bi Çayê Hezo ve çûne hetanî*

*Gola Natore.*

*Kino dibêje Emo lawo de şere  
Şerê feqî û melan e  
Şerê softyên musulman e  
Şerê Êzdîxan e  
Xweştir e ji reqsê dîlan û govend û yar  
Xweştir e ji şerê nêrî û kol beran e.*

*Kino dibê Emo lawo de lêxe  
Mîrzikê Zaza de lêxe  
Êrganê mîran de lêxe  
Peyayê mino Mirtat e de lêxe  
Destê Melekê Tawûs li ser çevê we be  
Hûn iro xêra Melekê Tawûs de xeriqîn.*

*Kino dibê Emo lawo Delan e  
Ji kula dilê min re xweş Delane  
Min dît birek mele derketin  
Ji alyê geliyê Botan e  
Her yekî birek feqiyêñ wan li pey wan e  
Bi hev re qîrîn û selewat dane  
Şirkekî tivinga li me dane  
Dibêñ li ber eynî Mihened Selewat  
Îro me anî qira Êzdîxan e.*

*Kino dibêje Emo lo lawo  
Ezê bi Erenza şêxan diketim  
Li bendî reze  
Piştekê Asafê Cibo apê lawikan  
Mirîdê mala Dewrêş Nebî şêxê Têlanê heye  
Piştekî nem e qez e*

*Heyfa min nayê li wê heyfê  
Heyfa min tê li wê heyfê  
Jêkirin serê Asafê Cibo apê lawikan  
Mirîdê mala Dewrêş Nebî şêxê Têlanê  
Birine Kela Ridwanê ji Mîrzikê Zaza re  
Ji êzîdiyên Xerzan re héja kirine diyarî.*

(Kovara HÎWA, N 65; 26.10.200)

Aydin RONAK \*\*\*\*\*

## FERMANA XALTA

Dema hinek kesên, ku bi navê stiranbêjî, dengbêjî stiranê me yê kilasîk dibêjin û vedijînin, meriv pirs û pirsyarê ji wan dike, li gor civata lê rûniştî, yan jî li gor serê bavikekî dibêjin, yan jî nizanin xwe zane dihesibînin. Ev yekahan dibe sebebê mirina stiran û serpêhatiyêng gelê me.

Nezanî edete, ger nezan xwe zane bihesibîne qebheteke herî mezin e, ji bo stiranê me, yên kilasîk, xwezya min bi nezanyê lê ne bi îgoîzmê û xwerazîbûnê. Meriv stiranê nizanbe ne pirobilême, ger meriv stiran û serphatyan dizanibe û wê ji koka wê derxe ji hev belav û gelçe bike, hingê dibe sebebê mirin û hindebûna kilasîka xelkê me, yên kevnar. Ger stiranê me bê ferq û meyil bêne gotin, da bi tevaya dengbêjên me xweş be û xweş bê ristin û awaz kirin.

Ev stiran di kovara Hewarî (j.57) li 15 gulanê de hatîye weşandin, sipas, lê gelekî seqete. Li gor lêkolîna min ferma Xalta, ferma Êzdiñ Şêr, ê serleskerê wî Hesabê Cibo û De-wrêşê mala Dewrêş Nebî, mala Dewrêş Nebî jî ji malbeta mala

Qadirîya merivê Êzdîn Şêr in. Bi rastî ez gîhîştîme bawaryekê, ku li ser Êzdîyên Xalta hemyan ferman bûye. Eşirek ji eşirekê mestir ew tiştekî dinê belê xîret yekbûye. Li gor bîr û bawarya min, ku ez têgîhîştîme şerê Dela û şerê Erenzê û Ridiwanê di yek meh û rojekê da bûne, yek şere. Ku meriv li sitiranê guhdar be tê digihîje, ku Dewrêşê mala Dewrêş Nebî û Hesabê Cibo şer ji ser Delanê (Delana Başo) şer dikin, yanî wan dişkînen, ku şer dikeve ser Erenza Şêxa û Ridiwanê. Êganê Meyro ramanek pêşketî, jîr, zirî (êlekê hrsinî) ji Hesab dike û di kujê, şênde leşker ji ser Xaltanyê dişkê.

Sitirana Keleşê Çelo jî bilî şerê Dela, Erenzê û Ridiwanê sti-raneke bi serê xwe ye. Dema meriv dibêje şerê Xalta, ne gun-dek, du gund bûne, ji Batmanê heta Hesenkêfê, çem bi çem heya Tila navrû ye, berojê êvarê heta bi Sêrtê Kûrtelan (Gûrdi-lan), cardin were Çemê piçûk, Bişêri û dîsa Batman. Ev hemû Xalta tê jimarê.

“Ev edeteke İslâmî bûye” -xalê Xelîl, Xelîlê Berfê, dema de-stpêka stirana xwe de di go: Xwerzê Bisilmana deve reş kiribûn û li cîyê bisilman lê hebûn gerandin, ji bo hewarê. Xalê Xelîl emrê wî dor 80 salî ye, dema stirana xwe di got gelekî vekirî bû, bê tirs bû, lê mixabin bîna wî hebekî diçikya û carna jê ji radibû piyan û li şibakê li derive li çolê di meyizand û di got: Dibe hi-nek gotin yan nav jî bîr kiribin, ji bilî xalê Xelîl min ji gelek kesen din jî ev stiran ber bi hev kirye.

Go, şer ketibû Erenzê, xumîn û nalîn bû. Mîrzikê Zaza, bira-yê xwe Bado şandibû Erenzê nava şêr, û wek li ser agir bû, her qasekî û carek ji Fuqre Xatê dipirsî: Gelo wê çawa çêbibe? Fu-qre Xatê bersîv dida, digo: berê sitêra li alyê Hesabe, piştî sê rojan cardin dipirse, Fuqre Xatê déjê: Hema serê tatê Çirt çiya-yê Gurdila wê kewekî sipî li pêşya we perê xwe lihivde, wê demê hûn karin biserkevin.

Go, Mîrzik rabû ber bi qubê Ridiwanê ve çû, ber çem, ber çem. Êganê Meyro jî, ka ji ci xeyîdî bû, hespê xwe destkêşî xwe kiribû û firikê zad difirikand û dixwer. Mîrzik gote Êgan şer bê te nabe, Êgan go: Mîrzik ci tişt destê min da nîne, ma ez bême kuştin, kî wê zaruyê min xweyî ke? Mîrzik go: Ez bi beyraqa, ala, mérê Êzdî kim, heke tiştek bi serê te were, zarokên te wê şirîkêن quesra Ridiwanê bin.

Go, hêja rabû Êgan deng li Keleşê Çelo, Gêçhanê Gîro, Miçoyê mala Şêx Îsa, li Bado, li Erfo yê qizılı û hwd, kire gazi , go: Hûn avê berdine ser mexera Erenzê, mihîna Êgan falbû, hespê Hesab xwe li mihîna Êgan girt, kete komelîşkê, di teqnê (heryê) da ma, bi wî halî Hesab girtin û serê wî jê kirin. Bi wî rengî leşkerên Hesab şikestin.

Stiran destpê dike ji Delan û we dibêje:

*Lê lê dayê Delane hê ê  
Kino digo Emo lawo Delane, Qaşo biraو Delane,  
Lê lê Rewşê mala bavê şewitîyê Delane,  
Pêşya malê me şere, paşa malê me fermane,  
Nava malê me heyde dane,  
Şerê Dewrêşê mala Dewrêş Nebî, xortê Niqîba  
Xwestire ji şerê ga û berane,  
Ezê nakevme ber kuştina mérane,  
Ber terş û talanê girane,  
Ezê dikevme ber wê yekê  
Pêşya xortê Êzdîya çûye Ridiwana bavê Temo,  
Navrûya Şêlûya, Tila Bota, serê Du Avê  
Eve sê şev û sê roje di gera Natora şevîn mane,  
Paşa peya maye li Baxizma bavê Eyo,  
Li tatikê Çinêrya, qefiyane dayê, wê ê ê û wê ê ê ...*

*De h ê ê ê ê...*

*Edlayê digo: Hesabo were tu wa meke,  
Tê neçe şerê Erenza Şêxa, Ridiwana bavê Temo,  
Wele şerê Êzîdxanê ne heneke,  
Ji malbeta mala bavê min kuştine heftê û pênc mér:  
Xal û xwerzî, am û birazî, bê hesab soyê ser bi keske,  
Lo, lo wî, lo, lo...*

*Kino digo: Emo lawo Delane, Rewşê porkurê Delane,  
Delana Başo bişewite ber bi bayê,  
Ezê hewar dikim, hewar nayê, hewara me li jorê ye,  
Li erda Ridiwana bavê Temo qinyata ber dila ye.  
Gazî, gaziya dûv guraye,  
Minê hewar kirye mala Hamidê Çelikî,  
Minê hewar kieye mala Mîrzayê Zoro axa,  
Eskerê mala Dewrêşê Dewrêş Nebî girane û xayînin,  
Nizam çima xal di hewara xwarziya nayên,  
Dayê, wî ê ê...*

*Edlanê digo: Hesabo hanê, sed û bîst cara bi min hane,  
Bala xwe bidê xortê Qizilan, peyayê Niqîban  
Serê dezgînê reşboza ajotine qûçikê Ridiwana bavê Temo,  
Derbekê lêdane li Hesabê Cibo, li apê lawika, li Cihê, li Mi-  
hê,  
Heftê û pênc mér ji konê bavê min qelandine tova xalan û  
xwarzî,  
Belê apan û birazî, lo wî lo lo wî lo...*

*Piçûkê mala Şêx İsa bi sê denga dikire gazî:  
Li Éganê Meyro, li Keleşê Çelo, li Gêeçhenê Gîro, li peyayê  
Qizila,  
Li peyayê Neqîba, li xortê Êzîdxanê, dogo:  
Bavê min, hûnê xweş dest hilînin,*

*Xwedê û Siltan Îzî mera rast hilîne,  
Wele emê hilînin heyfa Delanê. Wî lo lo, wî lo lo...*

*Heyla dayê Delane,  
Kino digo: Emo lawo Delane, Qaso birao Delane,  
Lêlê Rewşê mala bavê şewityê Delane,  
Dev jî malê dunyayê berdin hemû qirêja destane.  
Delana Başo bişewite li derê tatê,  
Min dî eskerê mala Dewrêş Nebî ji jor û jêr da wa tê.  
Derbekê lê dane li Kino, li Emo û Qaso afata mala bavê min  
Anîne ber mîratê.  
Ezê pştî kuştina mîra, piştî terş û talanê giran, piştî xortê  
Niqîba*

*Ezê li xwe heramkim ax û ava vî welatî, dayê...wî ê ê ê, wî ê  
ê ê...*

*Edlayê digo: Hesabo Erenza Şêxa bi şewite bi darê mezî,  
Min dî li Ridiwana bavê Temo, bavê Memed û Mistê bû he-  
war û qîr û gazî,  
Ezê bi qûçika hafa Ridiwanê ketim selefek sîwarê Qizila, bi-  
rek siwarê Niqîba*

*Û xortên Îzdîyan, hemî siwarin, şûrê wan li ser milê wanin  
rût û tezî.*

*Derbekê lê dane li Hesabê Cebo, li apê lawika, li Cihê, li  
Mihê, ji azbata bavê min*

*Qelandine tovê xal û xwerzî, belê am û birazî, lo lo wî lo lo,  
wî lo lo...*

*Nûrê digo: Hesabo herî, sed û bîst carî bi min herî,  
Emê rabin herne beravê, serê xwe bişon bi gulê, bi gulavê,  
Emê biskêن xwe berdin têl bi têlî,*

*Eger Hesabê Cibo, apê lawika, ji sefera ser welatê Xalta bê-ye malê,*

*Wele emê hê ji nû de nigê xwe bi kela Rimêlê va berdin,  
Emê xwe bikin berdêlîyê nû helêlî, lê lê, wî lê lê...*

*Êganê Meyro li egît û xweşmêran dike gazi:*

*Ezê bi Erenza Şêxa diketim kerkore,*

*Hesabê Cibo li kela Rimêlê koma Şêxê ereban anya bi xwere,*

*Bi tevî eskerê Eynikê, Eyndarê, Eyinkafê, Eyiñberanê,*

*Bi hecîyê Xerza ve, bi sofyê Xîya û Bekiran ve, hemî anîne bi xwere.*


*Ezê bi beyraqa Ezî kim, ji hezaran yekî nabe bi xwere.*

*Ezê bikim aşê Sipî û aşê Ridiwanê sê şev û sê roja*

*Bi xwîna sor bigere, lo lo wey lo lo...*

(Kovara ROJ N 3,sala 1997; rû 60-65).

## AÜSTİN HENRY LAYARD



Dost û xêrxwezê Ézdîyan A. H. Layard sala 1817-an li Parîzê dayîk bûye. Zarotyê da demekê tev bavê xwe li Îtalyayê jîtine. Sala 1833-a vedigerin Înglîzstanê wur hiqûqê dixûne. Wî dixwest bibya parêzger, lê rîyêñ emir wî ber bi cihanekê nû, ya hewaskar dibin. Sala 1839-an berbi Rojhilata navîn derdikeve seferê. Dû ra li bajarê Ştembolê li baylozxana Înglîzstanê da derbazî ser xebatê dibe. Sala 1845-an li Mêzopotamyayê dest bi karê arxîolojîyê dike. Di navbera salên 1852-1861-ê du caran dibe şîretkarê wezîrê çêkirinê. Sala 1869-an da dibe baylozê Înglîzstanê li Şamê, Bexdayê û Îranê.

Du cara Kurdên êzdî dibe mîvan. Amintîya wan dest tîne, wan rind nas dike, dibe dost û xêrxwezekî wanî helal. Dema mirov nivîsarê wîyî derheqa Ézdîya da dixûne, tê bêjî nivîskarekî Ézdî ew nivîsîne. Ew xeyset, paqijayî, mîvanhizî, rabûn-rûniştandin, helalya Ézdîyan hiz dike, Ézdî jî wî hiz dikin, ras-tîya civak û hinek xalêñ dîyaneta xwe li ber vedikin. Dinivîse: „Ne min li nav wan da xwe xerîb hsav dikir, ne jî wan ez xerîb didîtim.“

Ew evdê bi dilê mezin dinivîse, ku ew nerastî, neheqî, xiravyên biyanyan li ser Êzdîyan nivîsîne gişk derewin, nerastî û bêbextî ne. Êzdî jî evdine xwedênasin, xweyê bawarîke pir kevnarin. "...Eger gelên cinarêن wan .... belgeyên dîroka xwe ya kevnar xwyî kirine, bi wan belgan alyê cihanê va têن naskirin, lê Êzdîyan rûyê cahiltya xwe da ew belge xweyî nekirine. " Rastî jî eger dîroka bawarya Êzdîyan ya kevnar bihata xweyîkin wê dinyayê da zû bihata naskirin çawa oleke cihanê ya here kevn û Xwedênas.

Demeke pir bi aloz û dijwar da Layard li Êzdîyan dibe mîvan. Êrîşen pir bi dijwar û xûnrêj hatibûne li ser wê civaka herema Şexan û Şengalê. Farmana Mîr Mehmed ( Mîrê Kor ) zîyanekê pir giran gîhandibû Êzdîyan. Elî begê Mîrê Êzdîxanê xeniqandibû, bi seda hezar evdêن Êzdî kuştibûn, gund û warêن wan wêran kiribûn, şewitandibûn. Layard dinivîse: " Jî çar Êzdîyan sisê hatibûn qetilkirin." Ew bi çevê xwe wan komkujyan divîne û bi keder derheqa wan da dinivîse.

Wê demê Mîrê Şêxa Huseyn begê 18 salî bûye, Bavê Şêx jî (Extyarê Mergê) Şêx Nasir bûye.

Layard derheqa şexsyeta wan herdu meznê Êzdîyan da mîlumetye pir bi serecem û balkêş bîranînê xwe da hîşîne. Dini-vîse, ku Huseyn beg xortekî pir bedew û aqil bû, Şêx Nasir jî zilamekî devedevî cil salî, gelekî zane bû. Civakê ew serokê xwe didîtin û qedirê wî gelekî zanibûn.

Hewaskare, dema ew li mala Mîr mîvan bûye kurek Huseyn beg ra dibe. Eşq û şabûn dikeve li nav Êzdîyan. Qedrê wî digrin û çâ nîşana hurmetê dibêjnê ku ew nav li lawik bike. Ew jî navê kalikê: Elî begê mezin lawik dike. Dinivîse wî navî pir kîfa Ezdîyan anî.

Wî teglîfi oda pîreka jî dîkin. Vira da jî tê xanê, ku nav civaka Êzdîyan da pîrek mina civakêن Rojhîlatê yê din bê maf nînin, aza ne, nav civakê da serbest diçin-têن û rola hêja dilîzin.

Nivîsînên xwe da ew tim besa paqijaya mala Êzdîya dike, mîvanhizî û helalya wan dike. Dibêje ez pir li Rojhilatê gerya me, malên Êzdîyan yên here paqij in.

Hewaskarin axatina wî û Bavê Şêx derheqa bawarya Êzdîya da, rola Tawîsî Melek di wê bawaryê da û pirsên din... Balkêse, ku Şêx Nasir gelekî bi aqil, biserecem û zanyarîke kûr cawa pirsê wî dide..

Civaka Êzdîyan jî hêvyêne mezin wî quluxçiyê dewleta Înglîsî payebilind va girê dabûnn. Dema, ku cara duda dixweze derkeve seferê nava Êzdîyan qewal Ûsiv dişînîne pêşyê. Raste melûmetyê berfire tune ne derheqa nîta çûyîna qewale Stembole, lê ji axaftina qewêl li gundê Hemikê û Ridiwanê tê texmînkin, ku bi alîkarya Layard hewil dane pirsgirêkên Êzdîyan bilindkin, bigîhînin dergê Sultan...


Bi xêra wî evdê mezin derheqa Êzdîya, û bûyarên wê demê da gelek zanyaryêne girîng gîhîştine me. Eger bîranînê wî nîbûna, derheqa Mîrzîkê Zaza da jî melûmetiyê pir kêm bûna.

Her kurdekî welatparêz, îlahî Kurdên êzdî, ku karibe rastîya dîroka gelê xwe, pêşyên xwe û rastya xwe ya îroyîn femkin, gerekê van nivîsarên wî nivîskarê mezin bixûnin.

Ji pey A. H. Layard ra jî peyhatyê wê malbeta jî Êzdî bîra nekirin. Torinekî wê malbeta hêja Johannês Dûchtîng devedevî sed sal paşî pêşyê xweyî mezin, dîsa di rîya kalkê xwe da hate li nav Êzdîyan. Gundê Êzdîya Hemdûna da ava vexwerinê tune bû. Çawa bîranîna kalkê xwe, bi kîsî xwe, bi lûla av da kişandin û gund da kanî çê kir. Sala 19 -a pirtûka wî, ya giranbiha li ser erf, edet, dîrok û êtnogirafya êzdîyan çap bû.

Em minetdarê wê malbeta dostin. Kirina wan dostênmeye mezin tu cara gerekê neyê bîrkirin. Berî teva Êzidî gerekê emekê wan bişêkirînin. Gerekê pirtûkên wan bi wergera kurdî, bîvin xemla her maleke me.

## XACATUR ABOVYAN ( 1809-1848 )



Xaçatûr Abovyan 15-ê çirîya pêşin, sala 1809-an li gundê Kanakêrê, nêzîkî bajarê Yêrêvanê, Ermenistanê da ji dayka xwe ra bûye. Xwendina ewlin mekteba merkeza ola Ermenîya, dêra Îcmiadzinê da standîye. Sala 1824-an çûye bajarê Tilbisê mekteba wur, ya bi nav û deng, ya Nêrsîsan da xwendina xwe berdewam kirye. Wê salê ew mekteb nû vebûbû.li wur zanyarên Ermenyan yên wê hênenê, here eyan, bi nav-deng ders didan. Perwerda wur anegorî mektебen din li ser dereca bilind û pêşketî bû. Gelek kutakiryê wê mektebê paswextiyê bûn mirovên naskirî, karêñ mezin kirin di karê pêşdabirina edebyet û çanda gelê xwe da.

Sala 1826-an bi qîmetêñ here bilind wê mektebê diqedîne. Wê demê şerê Rûs-Îranê bû. Ermenistana Rojhilat ji bin destê Îranê xilaz dibe û digîhîje Împêratorya Rûsyayê. Abovyan wê

bûyarê çawe ji zulmê xilazbûna gelê Ermenî qîmet dike. Heta dewya şêr ew li warêن Ermenistanê yê rizgar bûyî digere, halê xelqê sada ra dibe nas

Sala 1828-an diçe Îçmîadzînê, dibe tercmeçî û katibê Katoxîkos û Sînoda dêrê. (Katoxîkos serokê Ermenya yê dînî, yê herî bilind e. Sînod-civata rihanî ye, ya wan e here bilind e).

Sala 1829-an di jîyana Abovyanê gênc da guhertineke berbiçev dibe. Pirofêsurê Ûnîvîrsîtêta Dorpatê (bajarê Talînê, Esto-nya) Frîdirîx Parrot, bi koma xwe va tê Îçmîadzînê, ku hilkişin serê çiyayê Araratê. Abovyan bi koma wî ra 27-ê îlûnê hildikşin serê wî çayâ. Li ku, çawa evsene ya olî da tê gotin, giva dema lêhya mezin, gemya Nuh pêxember sekinye.

Çûyîna wî ya serê Araratê, oldarêن Ermenya, yêne wê demeye kevneperek, paşverû xweş nayê. Ew wê çûyînê hesav dîkin nîşana bêxwedatîyê û binpêkirina qewl-qanûnên ayîna dîn. Bi alîkarîya pirofêsur, sala 1830-î, Abovyan diçe Dorpatê û zanîngehê da dixûne.

Ji pey heft salêن xwendinêye bi emek ra, zanîngehê bi açixî xilaz dike û bi fikir-ramanêن pêş vedigere. Perwardeya Ewropî, goveka zanebûnêن fire, armancêن wî yê ji teryê, paşdamayînê hişyarkirina xelqêن Ermenî, him hukumdarêن dewleta Rûs, him jî oldar û giregirêن Ermenyan yen kevneperek xweş nayê. Li ser rîya wî tim hasêgeha çê dîkin, dibin kelem.

Sala 1848-an, sibeke zû, Abovyan ji mal derkeve û êdî vengere. Heta niha jî eyan nîne çi hatye serê wî.

Abovyan hindik jît. Nenihêrî astengîyan û çetinayan jî, wî navê xwe bi herfîn zêrîn li nava dîroka gelê xwe da nivîsî. Bi romana xwe ya BIRÎNÊ ERMENISTANÊ, helbest, kurteçîrok û gotarêن xwe hîmê Edebyeta Ermenya ya nû danî. Bû ronakbirê

gelê xwe. Li nav Rojhilatxanyê, îlahî Kurdzanyê jî peyva xwe ya zanyaryêye giranbiha got. Ew intêrnasionalistekî mezin, dost û xêrxwezê gelê Kurd bû.

Ewî du miqalên dîrokzanyê - rojhilatxanyê, yên pir bi nirx û giranbiha KURD û ÊZDÎ nivîsîne, kîjan sala 1848-a rojnema KAVKAZ da çap bûne.

Ew pir caran li nav kurdan geryaye, ew bi nêzîk va nas kîrine, bûye dostê wan. Îzbatî hene ku berî wî jî dostaña mala bavê wî Kurdish ra hebûye. Apê wî kurdî rind zanibûye. Cara ewlin, dema hilkişandina serê Araratê ew rastî Kurdish tê.

Sala 1845-a du heftîya diçe li nav qebîlên Kurdish. Derheqa wê gera xwe da wa dînivîse: "Par na pêrar, min bi xwestina birêz, koms Bênkêndorf, wedê xwe yê ji quluxê aza, hema roja bûyîna Îsa, zivistana here sur û seqem, kîsî xwe dest bi sefera xwe kir ber bi Kurdish û Êzdiyan: wan fênomênên dîrokê, du heftîya li nav wan da mam.

Min xelatên qîmetlî kal, pîr û jinan (yê kurdan. E.B.) pare vekir, ku ew îtbarê li min bînin û bi vî teherî, mola min dan ser xwe, ku ji wan mirovê hindava hemû tiştî da şikber gilyê qîmetlî bihesim, derheqa deb, rism, edeb, hebandin û xeysetê wan da rastîyê bizanbim. Du meha zêdetir, temamya şevê dixebeitîm, ji bo rojê dema mine wî karî tune bû. Min miqaleke hewaskar û êpêce mezin nivîsi... Min miqale bi Almanî nivîsiye....Niha Xwedê zane li kîderê-Almanyayê yanê Tilbisê wê derê." (X.Abovyan, Cild-7, rû-194-195 )

Derheqa Kurdish da Abovyan fikirine wa nivîsîne: „Cara ewlin ez ji wan hîn bûm, wekî li nav derecê here giran da jî mirov kare kubar bimîne.” (Cilda 8-a, rû 259 )

"Mêvanhizya wê cimetê li temamya Rojhilatê da bûye evsene (lîgênd) " (Cild-8; rû 257)

"Her Kurdek, lo hela her jineke Kurd jî, bi ruhê xwe va sayîre." (Cild- 8; rû 377.)

“Em karin Kurda hesav kin suyar,aspêtê (qehreman. E.B) Rojhilatê, bi fikira wê xeberê, ya here tam.”(Cild-8, rû 381).

„Kurda carna padşa û xanê zor mecbûr kirine, wekî li ber wana bilerizin.“

Wezîrê Eşo derheqa X.Abovyan da wa dinivîse: „Abovyan qîmetekî bilind dida xeysetê Kurdan, ku ewana bêbext nînin. Eger dijminê qane-qan jî xwe davê ber bextê Kurd, ew xiravya wî nake. „Hela hê neqewimye, wekî Kurd borcê malxwêtyê biteribîne û dijminê xûnê bikuje, çaxê ewî (dijmin.E.B.) bêçare...Eger Kurd sozê tam dide û hebûna xelqê çawa amenet hil-dide yanê jî soz dide surra himberê xwe eyan nake, wê diha zû ji serê xwe derbaz be, ne ku navê bêbextiyê bîne ser xwe. Qe-dirgirtina wan hindava jina da, bele jina xaçparêz da, layîqî ecêvmayînê û jêhînbûnê ye.“ (W.E. KURD, ÊZDÎrû 43, X,A. Cild-8; rû 338. Ew derheqa rasthatina xwe tev Temir Axa, sere-keşîrê Kurdên Rûsyayê yê Êzdi, serokê êla Hesinya da wa dinivîse: “Min li cem wî qebûlkirina layîqî mîr û hakiman dît...“

Di gotara xweye KURD da xeberne pir xweş û delal derheqa mîrxwesî, helalî,comerdî û mîvanhizîya mala Axê êla Sîpka, xazma serokê êlê yê wê demê Îbrahîm Axê da dinivîse.

Ewledên gelê Kurd, ye bi nav û denge mezin jî bi şêkirandin derheqa wî ronakbirê mezin, xêrxwezê gelê me da nivîsîne û qîmetê mezin danê. Pirofêsorê Kurde navdar Hecîyê Cindî, Qanatê Kurdo, Ordîxanê Celîl, Kinyazê Îbrahîm, doktorê ul-man Karlêne Çaçanî, Çerkezê Reş miqalên zanyaryê yê hêja derheqa Abovyan da nivîsîne.



### Abovyan tev Kurdan

Nivîskarê Kurdî bi nav û deng Wezîrê Eşo herd miqalên X.Abovyan: KURD û ÎZDÎ wergerandîye zimanê Kurdî, wergerê ra pêşnivîsareke pir bi nirx û giranbiha nivîsiye, bi sernivîsara „Dost û xêrxwezê cimeta Kurdayî mezin“ û li sala 1986-an li Yêrêvanê bi pirtûkeke başqe weşandîye. Ev xebata, bi heqî, ne ku pirtûkeke wergerê ye, lê xebateke edebyetzanyê ya kûr û giranbiha ye derheqa wî dostê gelê Kurdî mezin da. Degmene ew zanyar yan nivîskarênen Kurdêñ Ermenistanê, ku li nav xebatêñ xwe da derheq Abovyan da nenivîsîbin.

## **NAVEROKA BUYARAN**

( Bi kurtî )

Li ser hîmê lêkolînên dûr û dirêj ( melûnetyên dîrokî, nivîskî, zargotinî, kilam, bîranîn, vekolîna bûyarên wê demê ) em hatine wê zanebûnê, ku bûyarên njara gotinê destpêka sedsala 19-an da ( navbera salê 1820-1850 ) li deşta Bişêryê, nêzîkî bajarê Qubînê ( Bişêryê ) qewimîne. Wê demê Qubîn bajar nî bûye, gund bûye.

Naveroka bûyaran bi kurtî wa bûye:

## **KOMKUJÎYA DELA**

Dela du gundê nêzîkî hev bûne. Yek li girê Merê bûye, yê din alyê Qelayê-Hicrê. Gundine mezin bûne. Navê yekî Dela Paşo bûye, ya din Dela Qaşo. Gundên oldaran: Feqîran bûne. Cîyê Dela berçem e. Çemê Xerza ( Ridiwanê ) li ber wan ra dikşe, diçe digihîje milê Diclê. Çemekî piravî xurt e. Alîkî çêm Dela bûne, alyê din zîyareta Şêx Evinda.

Cîyê Dela Qaşo rast e, xweş e. Dela Paşo qefa çyêye, nêzîkî Kevirê qul e. Dela û Qubîn weke 3 km. Ji hevdu dûrin. Pêşber Dela gund û Qesra Baxizmê ye. Wê demê ew destê mala Çelikê da bûye.

Binelyê her du gundê Dela jî Kurdên êzdi bûne ji qebîla Ni-qîbya . Malmezina Niqîbya berê da jî mala Zoro axa bûne. Wê demê ew gundana di bin bandora wê malê da bûne yan ne, eyan nîne. Mala Zoro li gondê Zivingê da mane, ew jî weke 5-6 km. ji Dela dûre.

Eyane, ku dema komkujya herd gundên Dela ne mala Zoro, ne mala Çelikê, ne jî Mîrzikê Zaza neçûne hewara Dela. Kilamê da wa tê gotin:

*Hey lê dayê Delane,  
Hey lo bavo Delane,  
Sîno digo:  
Emo lawo de Delane,  
Qasim lawo de Delane,  
Lê, lê Rewşê mala bavê şewitîyê Delane,  
Delana Paşo bişewite li serî dûmane,  
Ezê hewar dikim, hewar nayê, wê  
Li jorê hewara me Xweda ye ,wê  
Li erdê tu kes bi hewara me nayê,  
Minê hewar kirye mala Mehmûdê Çelikê, wê  
Ewê hatine li ser girê Merê,  
Xwe dane li ser darê rima ne, wê  
Minê hewar kirye mala Mîrzayê Zoro axa,  
Ewê hatine li ser girê Qereçilê,  
Xwe dane li ber berojka ne, wê,  
Ecêba mezin di dinyayê da ew ecêbe,  
Eskerê mala Derêş begê eskerekî girane, wê  
De dayê rebenê, lawo min ra xweyîne, wê  
Çawa xwerzî hewara xala nayên, lawo, lawo...*

Mala Dewrêş Nebî ji Şêxên Qedirya bûne, şêxên musulman-yê, yê qedîmî. Navê gundê wan Têlan bûye. Ew ji Dela wek 20-25 km. dûre. Bi salixyan, bîranîna wê demê musulmanî wê hremê da kêm bûne. Payê pirê Kurdên êzdî bûne, gelên xaçparêz jî hebûne. Bi gotina gotya, heta wî çaxî navbera Kurdên êzdî û musulman yê wê heremê ewqas xirav nî bûye. Pevçûn, nakokî û bûyaen xûnrêje, qelandinê, qelandinê yê usa mezin neqewi-mîne, yan pir kêm bûne.

Şêx Qasimê ji mala Dewrêş Nebî komeke mezin Musulman-nîn fanatîk, talançî li xwe dicivîne, têr davêjin li ser wan herd

gundêñ Êzdîyan jin, zar, kal, pîe, zilam teva qir dikin, diqelînin,  
talan dikin, dişewitînin,diçin.

*Hey lê dayê Delane,  
Hey lo bavo Delane,  
Pêşya malê me şere,  
Paşya malê me ferman û talane, lawo,  
Dewrêşê mala Dewrêş Begê  
Serê Êzdîyan jê kirine, laşen wana  
Di ava çemê Ridîwanê da berdane.  
Ezê ne ketime ber heyfa kuştina mîran,  
Ezê dikevme ber wê yekê, wê  
Ta, bala xwe bidê, xortên Êzdîyan  
Serê xwe rihîna dînê Êzdî da dane, wê...*

*Cinyazêñ xortên Êzdîyan, ha ho,  
Peyayêñ Niqîban, ha ho,  
Çûne serê Duavê, ha ho,  
Naverûya Şêlûyê, ha ho,  
Tila Potan, ha ho,  
Ezê, gulibirê, iro sê rojin  
Cinyazê xortên Niqîban,  
Di gola Nadoran, qelibîne, heylayê dayê, ha lawo,  
Ezê piştî van xortên Êzdîyan, peyayêñ Niqîban,  
Çi bikim ji tîrş û talanê giran, malê vê dînyayê,  
Ezê xwe heramkim ax û ava vî welatî, lawo...*

Ew komkujî seva çi bûye, sebeb yan nakokî di navbera herdu alya da hebûne yan na, kes nizane. Kilama û melûmetyêñ nivîskî da jî derheqa tu menya da yê xanê, yê ku xelq rakirine dijî hev nayê gotin. Min jî çiqas ew bûyar kolan û pirsi tu sebekî usa nedît. Rû va tê bêjî sebebê şerê navbera wan da li rex

hev, hev qebûlnekirin, temûlnekirin e, şerê dijîtya dîn bûye, lê bi texmîna min menî û sebebêن kûre bingehîn hebûne, ku neyârên gelê Kurd ew komkujuyêن Kurdan bi destê Kurdan çê kirine. Dema em wan FITWE\* yê bi dewrana li pey hev hatine dayîn û bi destê oldarêن musulmanyê yê gewre va hatine nivîsar ( payê wan oldarayî pirê, mixabin bi eslê xwe Kurd bûne ), kîjana da qira Kurdêñ êzdî ji alyê musulmana va hatye helalkirin, analîz dikin û fermanêن qirkirna Êzdîyan, ku ji alyê desthilatdarêن dewleta da hatine dayîn dinhêrin, dibînin, ku bin wan teva da armanca şikêñandin, par-par kirin, bê tifaq kirin, bê hêz kirin, ji holê rakirin, di nav xwe da helandina temamya gelê Kurde. Gelo ew oldarêن kurde gewre yê ew fitwa, ferman nivîsîne, fikira dagerkiran tê derxistine, yan na? Dibe ji cahilya xwe kiri-ne yan wan jî xwestine gelê xwe qurbana ola xwe bikin.

Fanatîzma olê li cem Kurdan pir bi hêz û qewate. Ew fanatîzma li cem Kurdêñ musulman jî, Êzdî jî, Elewî û Kakayî jî xwe dide nîşandan. Bi texmîna min, ew ji xeysetê Kurdan yê sade û paqij tê, ku Kurd gelê çiya ne, pir dilsax û ruh zelalin, zû bawar dikin, tîştê bawar kirin jî bê şik bawar dikin, pirtir ne bi zanyarî, lê bi dil ola xwe dihebînin. Tirsa olê ya ne eyan jî rola xwe dilîze. Bingeja zanebûnêñ olê, heta niha jî, li cem Kurdan pir zeyîf e. Piranya Kurdan, xêncî hinek zanebûnêñ kilasîk, nizanîn bingeha hebandina wan çîye, merem û armancêñ ola wan çîye, çîma wê olê dihebînin. Edî ez nabêjim, ku tiştêñ çewt, nerast, şaş, heta neyartî kirine serê Kurdêñ olekê, derheqa kurdêñ olêñ din da. Heta kuştina Kurda bi Kurda ra jî dane helalkirin. Eva sebebekî bingehîne, ku heta niha ev gelê mezin, ev gelê xîret, ev gelê kevnarî mîrxwes û xweyê mdenyeta zengîn nikare ne li nava gelê dinyayê da, ne cihana musulmanyê da, ne jî ew de-wletêñ, ku welatê wî li bin hukumê wan da ne cîyê xwe bigire û ne jî bigîhîje azaya xwe...

Sebebekî komkujyan, yên hîmlî jî, talankirin û ji hesavê xelqên qirkirî zengînbûna hukumdarên dewletê û dîndarên musulmanyê yê desthilatdar bûye.

Bîranîna xwe da Hemzoyê Xalit wa dibêje: “Eskerê Dewrêş Nebî li wan dan (gundêñ Dela; E.B.), maf kirin, kes wana nehîştin. Mezina sond duxwerin, digotin, li Mûsilê torê masyan berdidane avê, digotin hingê gulyê qîz, bûk û xorta tev hev girêdayi, meyt ji avê derdixistin. Yanê meyt ewqas zef bûne, ku avê birine, derxistine, heylo li wura.”

Dibêjin dema qirê, êrîşkarên qetil kome keç û bûkêñ gundêñ Dela yê bedew anîne li ber gelyê devê çêm kom kirine, dane seinandin, ku tevî talêñ wan jî ji xwe ra bivin. Evana, ku ji wan tu yek bi zêndî nekeve destê muslimanan, gulyê xwe bi hev va girê dane û bi hev ra xwe avitne çêm, xeniqîne. Mala Dewrêş Nebî hebûna wan hedu gunda, heywanê wan jî tev top dikin, talan dikin, xwe ra dibin...”

Berê jî min got, ji êlêñ Êzdiyan yê cînar, tu kes neçûne hewara Dela. Gelo ji bêtifaqqa navxweyî bûye? Pê nehisyane? Tirsyane? Yan sebebekî din hebûye?

Bi texmîna min Êzdiyan bawar nekirye, ku cînarêñ wan, tev kîjana dost û kirîvin çûyîn-hatin, kirîn-fîrotana wan teve, kurê bavê hevin, ca gel dibêje: “Eşîr bavê eşîrê ye“ wê usa bê sebeb rabin komkujke wî teherîye biraqîrî pêk bînin.

Ya duda nexwestine pevçûna navbera hinek evdan yan gun-dan welgere, bive şerê dijîtya olê. Zanibûne, eger bive şerê dîn, Kurdê musliman, Ereb, Tirk, Ecem, dewlet, wê gişkê dijî wan bivine qewatek û bajone ser wan.

Hinek jî dibêjin, giva berî Dela, pevçûnek navbera musulmanyê, bi piştgirtina hêzêñ dewleta Osmanyê û mala Çelikê da qewimîye. Wê demê jî kes neçûye hewara qebîla Berekyâ: Mala Çelikê, loma jî ew neçûne hewara Dela.

Ji pey komkujya Dela ra, dema oldar û talançiyêq qetil e fanatîk, texmîn dikin, ku wan ew herd gundêñ Êzdiyan qer kirin, gundêñ Êzdiyan yên din deng nekirin, wan jî bi rehetî him CI-HADA xwe, ya îslamî pêk anîn, him jî talanekî xurt birine malê xwe, vê carê berê xwe dane Ridiwanê, Qizila: êla Mîrzikê Zaza, ya wê demê êla here bi xurt bû di wê heremê da û desthiletdar bû..

Dibêjin, niha dewsa wan herd gunda qet nayê xanê. Mirov texmîn jî nake, ku wextekê li wur şen hebûne. Dewsa wan kirene zevî, cot dikin, pembû dicînin. Lê komkujya Dela ji bîra ewleda naçe, ew bûye deqeke bêtifaqyê, birakujujyê, hovîtyê ya reş ketye rûpelê dîroka gelê Kurd. Heta niha jî dengbêj bi keder navê Dela dibêjin, distirêñ û neletê wê birakujujyê, wê bê tifaqyê û wê dîndijminatyâ navera Kurda tînin. Di nava hezara sala da çiqas gundê mîna Dela ji ser sîngê Kurdistanê, bi xwûna evdêñ Kurd hatine şûştin, unda bûne, çûne...

## ŞERÊ ERENZÊ Û BERXWEDANA MÎRZIKÊ ZAZA

Melûmetyên dîrokî didine ïzbatkirin, ku ew dema bûyarêñ em li ser van lêkolîna dikin Ridiwan qeza bûye û ketya li nav senceqa Sêrtê. Ji hevt qezayên Sêrtê yek bûye. Sêrt jî pareke vîyalêta Bitlîsê bûye. Binelyê wur hîmlî Kurdêñ Êzdî bûne. Di nav wan da usa jî Ermêñ û Aşûrî jîyane.

Êzdîyên wê heremê Xaltî bûne Berê, berê da xaltîya li dora Sêrtê, Batmanê (Elîha), der-doraêñ qeza Qurtelanê (Misircê), Erûhê (Dihê Elmedanê), Bişêryê jîtine. (1)

Ev herêma heta destpêka sedsala 19-an jî herêmeke Êzdîyan ya here mezin û xurt bûye, beglikên wê, yên biçûk û mezin serbestîya xwe xweyî kirine. Eşîrên xaltîyan, yê mezin evin: Qizilî, Xendeqî, Niqîbî, Berekî, Anqosî. Evana jî belayî li ser bi deha qebîl, berek û bavika dibin. Li nav serokqebîl û malmezinîn wê heremê yê fêodale mezin û biçûke da, li wê demê hukumê Mîrzikê Zaza, mîrê quesra Ridiwanê, serekeşîrê Qizilya mezin bûye. (Malmezina niqîbya: mala Zoro, ya Bereka: mala Çelîkê, ya Anqosya: malmezina wan mala Salihê Sehdo axa, navdarê wan Şêx Mîrza bûne. Xendeqya êleke xurt bûye. Demen cuda-cuda malên wane zengîne xurt hebûne, lê malmezin yan maleke desthilatdar ya eyane usa, ku navê wê bê bîranîn nîne.)

Şedetya bi hêzbûn û mezin bûna wê herema Xaltîya usa jî ewe, ku ji hevt Tawisêñ Êzdîyan yek ya Xaltîya bûye. Ew Tawis usa jî hatîye navkirin: "Tawisa welatê Xaitîya".

Wê demê Ridiwan bajar bûye, merkeza qezayê. Tek li qeza Ridiwanê da 111 gund hebûne.

Bajarê Ridiwanê li ber kenerê çême. Çêm ra dbêjin çemê Ridiwanê, kîjan diçe digîhîje milê Dicilê.

Ji navê bajêr va jî tê xanê, ku ew cîkî rind û xweş hatye avakirin. Nêzîkî Ridiwanê pira Aviskê û Kevirê qulin. Berê da rîya bazırganyê wur ra derbaz bûye. Ridiwan jî, sûka wê, ya mezin hebûye û merkezeke bazırganyê, ya wê heremêye eyan bûye.

Arxiolg û dîplomatê Înglis, yê bi nav û deng Layard dema nîveka sedsala 19-an li Ridiwanê dibe mîvan, wa dinivîse: "Ridiwan bajar te hesibandin, ji bo ew cîkî mezin ava bûye, li wê heremê da xweyê sûkeke pir girînge û wek navenda qezayê tê naskirin. Têda 800 avayê ne ewqas cîwan hebûn. Bajar li kenerê çemê mezin bû, kîjan 5-6 km. wêda digihîste milê Tigrisê (Diclê)."

"Binelyê Ridiwanê xêncî sed malê Ermenî, cil-pêncî malê Yaqûbî - Kildanî yên din Êzdîne." (2)

Îzbatî didine kivşê, ku Ridiwan warekî Kurdistanê yê kevname. Heta destpêka sadsala 19-an jî kûçen wê yê kevne selkirî hê dihatin xweyîkirin. Wê demê li ser kelefên kevn quesra Mîrzikê Zaza hatîbû avakirin. (3)

Wî wextî xweyî û hukumdarê wê herêma Ridiwanê sero-keşîrê Qizila; Mîrzikê Zaza bûye. Melûmetyê zargotinî û nivîskî da, ku derheqa bûyarên wê demê li wê heremê da qewimî mane, hîmlî navê, wî hukumdarî va girêdayîne. Dîrokzanê kurdî navdar, profêstor Celîlê Celîl dinivîse: "Serwêrtîya Şêx Mîrza (Mîrzikê Zaza,E.B.)\* li ser xelqê Ermenî û Kurdên wan der dora bê sînor bûye. Ewî bi meclîsa rîspîyan serwêrtî li wê êla giran kirye. Meclîsê da nûnerên Ermenya, Kurdên êzdî û Aşûrya, bi mafêن weke hev, cî girtine. Bi şedetya Layard Şêx Mîrza (Mîrzikê Zaza. E.B.) ji alyê êla xwe va hizkirî bûye

...wek nîşana qedir û dostanyê wî li Ridiwanê Ermenya ra dêrek ava kirye. ( 4 )

Dema Layard derheqa wê kirina helalî dilpakî da dinivîse, bi heybeteke mezin ser da zêde dike, dibêje: "Dêr li pala girekî bû. Li serê gir jî quesra Ridiwanêye hilşayî xwenê dikir. Ev dêra ji alyê Mîrza axayê mezinê Êzdîyan va ji bo xaçparêzên Ermenî hatibû çêkirin. Ev nimûneke xweş û barkêş e, ku şaristanya pêşdaçûyî bivînin evdêni ji ol û miletêna cuda, çawe bi tifaq û aza bi hev ra djîn."( 5 ) Nav û dengê Mîrzikê Zaza gelekî belabûyî bûye senceqa Sêrtê û der - dorê wê da. Di çevkanîke Ermenya ya wê demê da wa htye nivîsar: "Di wê demê li Sêrtê û li Ridiwanê mîrek rûdinişt, yekî bi navê Êzdî Mîrzik, mîrekî Meda (Kurda: E. B. ) yê serbixwe û bi eslê xwe şêx. Ew bi xemxurî û dilovanî li hemû Ermenî, Aşûrî û Êzdîyên, ku li bin hukumê wî da bûn xweyî derdiket. Mîrzik mîrxwes bû, bi xeysetê xwe rem. Gelek evdêni ji nîrêni bindestîyê, zor û zulma zaliman direvyan, dihatin li bal Mîrzik sitar dibûn. Bi wî sedemî qeza bi binelya pirtir û bi hêztir dibû, gişk jê ra dibûne pişt û situryê çevê der doran." ( 6 )

Mîrzikê Zaza mirovekî dema xweyî zane û têgîhîstî bûye. Kilamekê da tê navkirin: "Xwendkarê dînê Êzdîxanê." /Binhêre kilama, ku ji kasêta Karapêtê Xaço hatye hildan/.

Vira peyva "xwendkeár" nîşan nade ku ewî xwendî bûye, medresa da xwendîye. Wê dewrê da evdê Êzdî ra, bi sedemên olî, civakî jî mecal tine bûn, ku ew xwendî bûya, lê zane û serwext bûye. Ewî di dema xwe da rola xwendin-nivîsarê, ya mezin di jiyana civakê da tê derxist û zarokên xwe li cem mamo-stayê Ermeî daye xwendinê. Nivîskarê Ermenya, yê mazin Xaçatûr Abovyan dinivîse, ku keşîsekî Ermenî ji Ridiwanê hatibû Yêrêvanê, şedetyê dide, ku wî bi xwe, li Ridiwanê bi mahan,

zarokên serekeşîrê Ézdîyan bi zimanê Ermenî, hînî xwendin û nivîsarê kirye. ( 7 )

Ev kira wî, wê demê gaveke pir bî culet û pirogirêsiw bû li nav civak û olperestê Ézdîyan da. Rêbertya Ézdîyan tiştê usan qebûl nedikirin. Usane hukumdarya wî pir bi hêz û xurt bûye, ku ew netirsîya ye û ew gav avîtye.

Hemzoyê Xalit, ku bi xwe jî ji wê heremê ye, kîjan 170-180 sal berê li bin hukumdarya Mîrzikê Zaza da bûye, bîranîna xwe da dibêje: “Pêşya digotin hidûdên Mîrzikê Zaza gelekî mezin bûne, heta-heta yaylixê mîlyonek îsan pêva girêdayî bûye. Go, ji Çeikîyê Elîyê Remo heta 100 km. hebû digihîste Pira Aviskê, heta Ava Sêrtê, heta Başûr...”/binhêre bîranîna Hemzoyê Xalit /.

Malbeta Mîrzikê Zaza malbeteke kurdên Ézdî, ya kevn e. Dîroka vê malbeta desthilatdar kengê dest pê bûye tu melûmetî yan bîranîn tune ne. Tek eyane, ku ji berî Mîrzik, serekeşîr apê wî: Zaza axa bûye. Mîrzik lawê Zaza nîne, lawê birayê wîye. Navê bavê wî Hesen bûye. Ji pey mirina birê ra Zaza axa gelekî neheqyê li zarê birayê xwe dike. Mîrzik, birayê wî: Bedo û dayka wan, idara xwe bi rîncberyê dîkin.

Dema Zaza axa dimire, axayê wê heremê yê cinar: mala Zoro axa, mala Çelikê, mala Ferhoyê Hizêr axa û hinek serekeşîrên kurda yê din ( Ézdî û Musulman ) li hev dicivin, ebakî axatyê hildidin, têne Ridiwanê, ku dewsa axê çûye remetê eba li lawekî wî kin û çawa axê nû elamkin. Wê demê çar lawê Axê hebûne, tê xanê ew ewqas jêhatî û zîrek nî bûne.

Wê demê Mîrzik 19-20 salî bûye, xortekî serwextî, jêhatî. Dema dibîhî li dîwana apê wî da axayên cînar, malmezinên Xaltya hatine, li hev civyane, dayka xwe ra dibêje: “Ezê jî herim dîwana apê xwe.” Dê dibêjê: “Herî-neçî, yeke. Kê guh bide te. Tê dîsa ew Mîrzikê golikvan bî.”

Mîrzik radibe diçe dîwanê, lê dinhêre axa û mîvanê hazir rûniştine, ebayê axatyê danîne wê navê, kes li ber tune, kes ser ebê da jî naçe. Silavê dide hazira, radhîje eba û xwe dike, dibê: “EZ axa me !” Hazir tev çevê hev dinhêrin, dibêjin: “Axatî he-ma bira vî ra be. Evî jêhatîye û ji vî çêtir tune. Ev jî bira bive serokê Ridiwanê.”

Mîrzik navê apê xwe jî xwe ra dike paşnav û usa dest bi de-sthilatdarya Mîrzikê Zaza dibe, nav û dengê wî heremê da bela dibe. Dest bi çêkirina qesra xwe dike. Xelqê wê heremê mecbûr dike, ku bi torba xwelyê bînin, li cîyê çêkirina qesrê rokin, wekî cî bilind be. Gilî dîkin, ku tiştekî ecêb hatibû çêkirin. Rêyê dizi-va hebûn, ku diçûn digîhiştine ber çêm, ku dema dijmin dor wan bigirin, karibin avê ji çêm hildin, rê hebûn, ku karibin dizi-va ji qesrê derên, rîyê dizîva va birevin. Li bin qesrê da zêrzeme (hebs) hebûye. Usane pirs û pirsgirêkên xelqê bi destê wî hatine safîkirin. Xerc û xerac ewî daye topkirin. Girtin, cezakirna xel-qê jî destê wî bûye. Çawa melûmetî nîşan didin, dema wî da li nava binelyêñ mîrgehê, yêñ Kurd, Ermenî û Aşûri da tifaq, e-dlayî û aramî bûye, qedirê hev zanibûne, neheqî kesî li kesî nekirye û tev di gura Şerokeşîr da bûne. Bîranîna da tê gotin, ku navbera wî û serokeşîren Kurdêñ musulman, yê wê heremê jî xirav nî bûye, heta ew û mala Dewrêş Nebî jî kirîvê heve xûnê bûne. Nema, ku serleşkerê dewleta Rûs Pasêvîçra şandî da dini-vîse, ku dikare 1500 sîyar û 5000 peya derxe meydana şêr. Her mîrxwesê wî jî kare dijî sisyan şerke.

“... Bi saya Xwedê sed sîyarêñ min dikarin dijî sêsid sîyarêñ Osmanyâ derkevin.” Bi gilîkî dema wî da ew mîrgeheke Kurdêñ Êzdî ya here hevgirtî, serbixwe û xurt bûye.

Heyîta mîrgeheke Êzdîyan, ya bi hêze usa, ne dewleta O-smânyê xweş hatye ne jî serokoldarêñ Kurdêñ musulman, yê fanatîk. Û awa, dema gundêñ Dela diqelînin, dinhêrin Êzdîyan dest ji ber xwe hilnedan, pişta hev negirtin, vê carê berê xwe

didine wê êla Êzdîyan, ya here xurt û bi hêz: Ridiwanê. Rind zanibûn şikêndina Ridiwanê, şikêndina temamya êzdîyên Xaltî ye.

Çend mene û sebebêñ wî şerî jî hebûne:

-ya ewlin û bingehîn ewe, ku çâ berê jî me ev fikira gotayé, dewleta Osmanyê ra dest ne dida, ku li nav wê da beglik û mîrgehîn kurdaye serbixwe û nîv serbixwe hebin. Dîrokê va jî eyane, ku wê demê Êmîratên Kurda yê usa qewat hebûn, ku êdi dewa serxwebûnê dikirin, dixwestin ji dewleta Osmayê biqetin. Dewletê hewl dida, ku ji wan a xilaz be, qewata wan bişkêne û wana bike destê xwe. Ji bo wê jî vira nakokya dijîtya olê dane xebatê, ku kurd xwe bi xwe hev qirkîn, bêtifaqî û neyarî bikeve navbera wan, ku cî jî bê dijî dewletê nikaribin bivne yek. Bi texmîna min wî şerî da ne serketina mala Dewrêş Nebî jî ji wê menyê tê. Dewletê ra dest nedaye, ku mala Dewrêş Nebî jî qewatbe. Merem altindarya olê nî bûye, armanca wan zeyîfkirna kurda bûye.

-ya duda, dijîtya olê jî roleke mezin lîstîye, fanatîzmê, hev temûlnekirinê.

-ya sisya jî ewe, ku ew heremêna destê Êzdîyan da bi ax, av û hewa xwe Kurdistanê da cîyê here xweş û dewlemendin. Deshilatdarêñ mîna mala Dewrêş Nebî xwestine dijîtya baweryê bikine menî, bi xûna bawarmendêñ nezane cahil, bivine xweyê wê heremê.

Menî jî çê dibe. Çendekî ji pey komkujiya herd gondêñ Dela ra mala Dewrêş Nebî çend qantira didine ber du yan sê feqeyêñ xwe, dişînine li cem Mîrzikê Zaza, ku wan ra bi deynî çend bar arwan bişîne. Anegorî bîranîna, Mîrzik meremê şandina feqeyan tê derdixe, mirovêñ xwe wan ra datîne, dişîne gundê Cimsarîyê, ku barê wan dagrin û paşda verêkin. Dispêre mirovêñ xwe, ku wan bêqezya paşda bişînin. Lê feqe nagîhîjne cî, rîya vegevê da, yan li cem Êzdîyan hersêk jî têne kuştin. Kê wan dikujin ne

eyane. Bîranîna da çîrokek hatîye xweyîkirin, serecema wê eve: cem feqeyan kitêba pîroz Quran hebûye, gîva dema Êzdî di-xwezin wan bikujin, ew wê kitêbê da dinivisin: "Êzdî yê me bikujn." Êzdîya jî, ku xwendin nizanbûne û nizan bûne feqa ci di Quranê da nivîsîne, wê Quranê dibin li bajarê Sêrtê di-froşin. Yê, ku Quranê dikirin, wê nvîsara feqeyan dixûnin, cawê didine mala Dewrêş Nebî, ku Êzdîya fwqeyê wan kuştine.

Dijwar nîne mirov tê derxe, ku kuştina feqa da girêfûtk û pîrsên teri hene. Ez texmîn dikim eger Êzdîyan Feqe bikuştana, çiqas jî nezan bûna ew Quran zû nedibirin, nedifrotin, we bifî-kiryana: "Dibe Quranê naskin û bizanbin wan kuştîye."

Bawarî heye, dibe Êzdîyan jî feqe kuştibin. Vira xeta xar dîsa li bin mala Dewrêş Nebî da ne. Wana zanibûn, ku ji komku-jya wan herd gundên Êzdîya-Dela, hela çendek derbaz nebûye, dijminatî ketye navbera wan û Êzdîyan, agirê kîn û neyartiyê gure, çawa feqeyê destevala, usa bi hêsanî dişînîne li nav Êzdîyan? Yan çîma feqeyan dişînin? Ji kîjana, çawa oldarên musul-manyê, yê here cahile fanatîk, Êzdî a'cizin. Dibe hema bi merem jî şandibin, ku Êzdî wan bikujin û menî çêbe seva ferman, şer û hucûmkirna li ser Qizila.

Dûrî bawaryê nîne usa jî ew fikir, ku alyê mala Dewrêş Nebî yanê jî hukumdarên dewletê da feqe hatibin kuştin û qetilkirina wan avîtibin li ser Êzdîyan. Dibe zilamê mala Dewrêşnebî oldarên dewletê va girêdayî jî bin, ku wê konfîlikte bi wî cûreyî çêkin û şerekî navxweyî hema li dilê Kurdistanê da daxin.

Bîranîna dengbêjê hizkirî Salihê Qubînî da, ku çîroka kuştina feqan usa dûr û dirêj, hûr-hûr tê şirovekirin, bîranîn, lê gelek qewimandinê wê bûyarê, yê sereke hatine bîrkirin, cîyê fikirandinê ye. Ev kilam û bûyar bi vî cûreyî li nav civakên êl û êşîra da, bi dewrana hatye gotin, bûyar jî hatye şirovekirin. Eşkere ye, ku Êzdîyan newêribûye cîyê usa da rastîya xwe bê-jin... Helbet li cem Êzdîyan jî gelek bûyar hatine tîrkirin û ren-

gkirin. Amadekarê wê komkujuê bi wî cûreyî ew bûyar şirovekirne, xwestine sûcê xwe ji gelê sade veşerin û bêjin, ku Êzdî neheq bûne, loma ji me xwestîye heyfa (tola) feqa hildin. Vira nuxta hîmlî tê danîn, ku kitêba dînê Êzdîya tune û dîndarên wan nezane û cahilin. Vira da rastî heye, ku li nav dîndarên Êzdîya da nezan, cahil pir bûne lê di nav oldarên Kurdên mu-sulman da jî yê mîna wan kêm nîbûne...

Eger, hema çawa vê çîrokê da tê gotin, hinek Êzdîyan weşîti kiribin, feqî kuştibin, yan ji dijîtya olê, yan di bin hukumê qet-lema qirkirna herd gundên Êzdîya: Dela da ew yek pêk anîbin, tu mafê Dewrêşê mala Dewrêş Nebî tune bû 30 hezar evdên fanatîk, yên, cahile, talançî xwe bicivînin û bajone li ser gund û warên evdên bê sûc... Kê feqe kuştibûn û ew qetla ne îsanî kiribûn, bira ew jî bihatana cezakirin.

Evan mene bûne, ji dîrokê eyane, ku bi hezaran fermanêñ wa, ciyê vala û bê sebeb li Êzdîyan hatine rakirin, gund û warên talan kirine, şewitandine xwelk avîtine devê şûr, bîranîn jî ji gelek fermanan, nemane...

Çi jî hebe, konfilikte çê dikin, agirê “dîn dijminatîyê” gur dikin û Dewrêşê (Qesim) mala Dewrêş Nebî dikeve li nav “miridîn” xwe, ordîke giran (devedevî 30 hezarî) dicivîne û têndora Erenza Şêxan (nêzîkî Ridiwanê) digrin.

Stiranê da wa tê gotin:

*Rindê digo: Edlayê,  
Erenza Şêxan bişewite bi darê tere,  
Erenza xopan bişewite bi darê tere,  
Hesabê Cibo hatye ji kela Rimêlê  
Bi tevî şêxên Ereban û eskeran,  
Eynikê, Eyndwarê, Eynkafê, Eynbaranê,  
Çiqas hecî, sofiyê Xerzan, Xiya û Bekiran  
Hemû anye bi xwe ra.*

Ji peyvên vê malka stiranê dijwar nîne bê têderxistin, ku ev şera ji alyê dewletê û merkeza dîndarava hatîye organîzekirin û rêvabirin. Di nava wê komê da, ku hatine li ser Erenzê şêr “Şêxê Ereban û esker” hebûne. Piranî jî dîndarêñ fanatîk bûne: “Çiqas hecî, sofi, feqe...hemû anîne bi xwe ra.” Usane gelê musulmanî sade yan teví wî şerî nebûne, yan jî zef kêm li nava wê ordîya 30 hezarî da cî girtine. Ewê cî girtine jî evdine cahil bûne û ji alyê oldara va hatine xapandin.

Bîranîna da usa jî tê gotin, ku hinek axa-begêñ Kurdêñ musulman, yên wê heremê, yên cînar, navbera kîjana û Mîrzikê xweş bûye, bê alî mane, neketine li nav şerê dijî Êzdîyan: navê Ferhyê Hizêr axa tê bîranîn.

Mêrxwesê wî leşkerê musulmana Hesabê Cibo bûye. Hesab evdekî sade, yan egîtekî gelêrî nîne, ew serleşkerekî dewletê, yan jî çekdarekî beglikekî eyan bûye. Evdêñ sade nikarin cilê zirî xwekin û şerkin. Hesabî bi zirî bûye. Çirokbêjêñ Êzdî dibêjin Hesab bi eslê xwe Erebe. Zargotina Ermenya da jî dewsâ navê Hesab, navekî din: ”Hakimê Bota Mîr Mehmûd” tê gotin û tê zêdekirin, ku ew mîzînê eşîreke Cizîra Bota bûye.

Çawa me berê jî nivîsiye, di wê demê mîrê mîrgeha Bota Bedirxanê mezin bûye. Mîrgeha wî pir bi hêz û qewat bûye. Ewî jî pir neheqî li Êzdîya kirye. Usane rastî serkanya Ermenya da jî heye.

Kilamê da wa tê gotin:

*Edlayê digot: Nûre, xweya minê,  
Esabo Ronî, min go were meke,  
Tu bi xebera sofi û, feqe û,  
melayê ber ava Bota meke,  
Neçe şerê Erenza Şêxan,  
Ridiwana bavê Temo, Mîrzikê Zaza,*

*Serên giregirê Êzdiyan, yê Mîrzikê Zaza,  
Keleşê Çilo, Gerşemê Giro, Êganê Meyro,  
Miçoyê mala Şêx Îsayê ne heneke...*

Ev stirana li ser zarê herd jinê Hesabê Cibo hatye gotin. Sitanê da axîn û keser heye, poşmanî heye ji bo wî şerê navbera kurda da, yê bê fikir û bê merem.

Li vê malka stiranê da, dengbêjê, ku ev stiran efirandîye, neheqya êrîşkaran û qewata berxwedana Êzdiyan anîye ber çevan: "Hesabo Ronî min go were meke, tu bi xebera sofî, feqe û melayên ber ava Bota meke, şerê giregirê Êzdiyan ne heneke." Ji van xeta va jî tê xanê, ku rêvabirê êrîşê hîmlî oldar û leşker bûne.

Pirsa kesayetya Hesabê Cibo, ew ereb bûye, yan kurdekî ji Bota bûye, di vê nuxtê da ne pirsgirêka sereke ye, ya sereke ewe, ku ew leşker bûy, leşkerekî perwardekirî yê payebilind. Usane ev şera pevçûneke gelêri, yan êrîşa komeke fanatîk, ji je'ra olê korbûyî nîne, ew ji alyê hukumdara va hatye hazirkirin, leşkerê dewletê li nav wan da hebûne u ji alyê leşkera va hatye serkaeikirin, rêvabirin.

Em bêne li ser hesavê leşkerên êrîşkaran. Gelo, ew gotina "Eskerê giran", ku bîranîna û stirana da tê gotin, raste?

Cevkanya Ermenya da we hatye nivîsar: „Li Baxîşê (Bitlîsê, E.B.) dewrêşekî mar bi navê Nebî dima (li şenlika Ûsîl-Giranê), yê ku xelqê xwe karoz ( şîret ) dikir yanê cimeta mayîn bînin ser ayîna dînê Mehmedîyê, yanê jî xeza kin. Ú, awa, sala 1820-î ew êrîşê, seferê teşkîl dike dijî Êzdiyê Sixîrdê ( Sîrtê, E. B. ), Ridiwanê û Ermenyan, bi serkarya hakimê Bhotanê Mîr-Mehmed, bi 36 hezar eskerava.” (8)

Sitirana gelêri da derheqa hesavê êrîşkara da hevoka wa tê kîranîn: "Eskerê Dewrêşê mala Dewrêşnebî girane."

Rastîya pirbûna êrîşkaran ew şikêrên (qûçen) kevira ne, ku heta niha jî, çawa heykelê reş, şedê wê bûyara birakujyê li cîyê şêr da mane.

Hemzoyê Xalit bîranîna xwe da wa dibêje: "Ne min tenê, geleka dîtîye. Bi Tawîsî Melek me tava dîtîye şikêrê kevira. Du şikêrin. Yek ji vê odê bilindtire, ya din qûckeke biçûke. Gava hatine li ser Êzdîyan, her yekî ji wan, kevirek bi xwe ra anye, avîtye tanga cîyê şêr. Kevirê mezin jî nînin. Gotine em van kevira bivin, cîkî qûçkin, çika em çiqasın, gotine me şerr qedand, bira yê sax mayî, dîsa rahîjne kevira, emê bizanbin ji me çiqas hatine kuştin."

Xêncî Hemzo, yên ku ew şêkêr dîtine dibêjin, ku qûçek pir mezine, yek jî biçûke. Ya mezin kevirê wane yên şerr da hatine kuştin, ya biçûk jî hesavê wane yên sax mane û revya ne.

Ev mesela kevira carke din jî dide îzbatkirin, ku rasti jî ev şerra, êrîşa gelê sade, yê fanafîkê olê nî bûye. Di dîroka herba da, wekî hesavê undayên xwe bihisin, pîrr caran serleşkeran ev çurê kevira pêk anîne. Usane serokê vê êrîşê zanekî şerr bûye.

Ew "eskerê" giran, li bin ala musulmanyê da tê dora gundê Êzdîya: Erenzê digre. Erenz gundê şêxa bûye, binelî hîmlû şêx bûne, loma jêra gotine Erenza Şêxa. Ew nêzîkî Ridiwanê ye. Navbera wê û Ridiwanê da ewqas bûye, ku dema li wur sîlih teqandine, Ridiwanê da hatyebihîstin.

Bîranîna da tê gotin,ça me berê jî got, ku hinek axa-begê wê heremê yê Kurdê musulman tevî wê êrîşê nebûne, bêteref mane. Ji tirsa musulmanyê newêribûne herin pişta Êzdîyan, nexwestine tevî wî şerrê neheq jî bivin, dijî cînar, dost û pismamên xwe şerkin.

Êzdî tê derdixin, ku ew şerra yê mirin-jîyanê ye. Eger qewatê Dewrêş Nebî serkevin, kesekî ji wan sax nahêlin, wê teva mîna gundîyên Delanya devê şûr ra derbazkin, ev jî fermaneke bi sirê ye li wan radibe, nakokî, dijminaiya li nav xwe didin

alîkî, jino-zaro, mîna mirivekî radibin himber êrîşkaran. Tavî Êzdîyan usa jî xelqên xaçparêz radibin. Ji bo di warê dijitya oли da ew jî halê Êzdiya da bûne. Dest bi berxwedaneke mezin dibe. Weke 10 hezar evdêne ewqas pak sîlikirî, derdikevin dijî 30 hezar leşkerê şer ra hazir.

Him stirana, him jî bîranîna da tevî navê Mîrzikê Zaza usa jî navê gelek mîrxasên Êzdîyan hatya xweyîkirin. Dema meriv kilamên kurdaye mîranyê dibihî, dîbîne, ku wan da hîmlî navê merivekî, mîrxwesekî, ew jî hîmlî navê axa, bega, seroka têne gotin, bîranîn. Lê vê kilamê û çîrokê da ji Mîrzikê Zaza zeftir derheqa mîrxwesya egîten din da tê gotin. Ew mîrxwesan evin: Keleşê Çilo, Êganê Meyro, Keşîş Polo, Geşhemê Gîro, Miçoyê mala Şêx Îsayê, Erfanê Qizilî û hvd. Hela li ser mîrxwesya ji van hineka sitiranê başqe jî hene. Çawa sitirana Keleşê Çilo.

Gelek çîrokêne hewaskar, yê derheqa wî şerî da, di bîra ewleda da mane.

Êrîşkara dora Erenzê girtine. Mîrzik li Ridiwanê qesra xwe da bêsebire, nikare cîyê xwe da bisene. Bedoyê birê wî li Erenzê nava şer da ne. Gazî keşîşê Ermenî kirye. Keşîş remildare. Kitêba pîroz: Êncîl vekirye, dixûne, remil avîtye û dibêje: «Sebirkin. Niha dest bi şer nekin. Berê qulbê ber bi dijmine, hema we dest bi şer kir, dijminê we biqelîne, hîvyê bin heta roj ve-digere. Dîna we lê be, eger teyredeke sipî hat li serê qubê danî, (li goristana malbeta Mîrzikê Zaza da, li ser mezela qube hebûne) serbest rabin, lêxin, serketin ya we ye.

Go, Mîrzik pir bêsebir bûbû, Ii nav qesrê dahat - diçû li alyê Erenzê dinhîrî. Tivingeke Bedoyê birayê wî hebû. Dengê wê jî, go, e'cêb bilind bû. (Wê demê nû tivng derketibûn, tivingê kesî tine bûn). Go, timê guhê Mîrzikê ser bû, gava dengê teqîna tiv-inga Bedo dihat, Mîrzik digot: “Bedo saxe, usane dijmin neketye Erenzê.”

Bi gotina gotya, di pey demeke dirêj ra, dinhêrin, teyreda sipî hat li serê qubo goristana mala Mîrzik danî. Keşîş dibê, de îcar rabin, lêxin. Serketin yameye !

Keleşê Çilo, mîrxwesekî Qizilya yê bi nav û deng bûye. Mezinaî bavikekî wê eşîrê kirye . Heta niha jî derheqa mîrnya wî xweşmîrî da û bûyarên dema wî da çîrokên hewaskar bîra gel da mane, li ser kilam hatine sêwirandin. Navbera wî û Mîrzik xweş nî bûye. Mîrzik bawar nake Keleş bê hewara Ridiwanê. Lê Kelrş egîtên xwe va têr û li wî şerî da mîranya mezin dikan. Ew siyarekî pir xurt bûye. Jêra gotine : "Şivanê sîyara", "bavê Memed û Mistê".

Êganê Meyro, go zilamekî pir bi gewde bû, lê pir bêxem bû, guh nedida kesî, wê êlê da tayê wî mîrê xurt û sîyarê çê tune bûn. Mîrzik dinhêre, wê dijmin hatya dora wan girtîye, Êgan jî xema wî nîne, li ber zevîkê rûniştîye, simila (firîka) diçine, destê xwe da dipişêre duxw. Mîrzik dibêjê:

-Malava, wextê te û firîka ne, nanihêrî dijmin dora Erenzê girtîye...

-Cenim girtîye! Ez herim, sibê bêm kuştin, xema teye. Zarokê minê bêxweyî bimînin...

Mîrzik jê ra sond duxwe,dibêje:

-Êgan, ez bi Tawisî Melek kim, eger şêrr da tiştek bê serê te, heta ez saxim, heta quesra Ridiwanê hebe, zarokê teyê şirîkê wê qsrê bin

Êgan radibe, hespa xwe sîyar dibe, derdikeve meydana şêr.

Navê Miçoyê mala Şêx Îsayê, li nav Kurdên êzdî da pir bela bûye û gelek kilama da gerheqa mîrxwesa wî da tê gotin.

Wê çaxê şer hîmlî bi rim, şûr û mertala bûye. Hesabê Cibo, serokê leşkerê musulmanyê, xweşmerekî pir xurt, pêra jî zirîkirî bûye, sîlih zirîyê wî da neçûne. Hespê wî jî, go, li meydana şerr da kê biketa li ber, sîyar bûya, peya bûya, dixeniqand, li bin lingê xwe da pêpez dikir, dukuşt.. Go Hesêb gava meydanek li nav şêr da dida, mîna kêtlandûyê laşê merya li ser rîya xwe redixist.

Mêrxwesên Êzdiyan wê yekê tê derdixin. Avê berdidin li ser mexelê erdê dora Erenzê û Ridiwanê. Go hespa Êgan mihîn bû, mihîn jî bi fel bû. Êgan mihîna xwe nîzîkî erdê avdayî ra dajo. Hespê Hesab xwe mihîna Êgan digrê. Hesab li hespê nikare. Hespê wî dikeve hezekê. Êgan jî mihîna xwe dajo nêzîkî Hesêb, para va banz dide li ser pişta hespê wî, yê li nav heryê da gut bûyî, parava wî qepeçe dike, ji hespê tîne xar, qelşa ziryê ra bi rimê lê dixe, Hesêb dikuje.

Cevkanya Ermenya da wê derheqê da wa hatye gotin: „Ü rûyê hevketina herdu alya û ji agirkirina sîlihê bê hed û hesab rûyê royê hate girtin û bi hevxistina şûra, rim û nîza hev qir dikirin û mîl dikirin mîna darê mîşe, lê dengê tîr û kevana dikirin şîrqîn mîna, birûska e'wr û e'zmana û dengê pêlê be'ra firtone jê rabûyî.“

„Gele sehetê dirêj wa derbaz bûn û ne alyê altindar, ne jî alyê altbûyî tê kivşê, çimkî mîrxwesya alîkî û pirbûna alyê dinê beramberî hev derdiketin.“

„Ü vê dema here giran sereskerê ordîya Bohtanê Mîr Meh-mûdê mîr, wî mîrê zorî, zorbe, hespa xweye kihêl rikêf kir, ji sêrî heta pîya reşxana hesinî (zirî) wergirtî, rim dêst da, pêşda sefer kir û rast û çep gelek ji alya Ermenî li erdê raxistin û bi xwe jî silamet gîhişte wê tangê, li kîderê Mîrzik bû, çimkî çek-rihalê başê lê bûn.“

“Têr-Poxos li pey xwe nihêrî û çaxê dît, wekî şuxulê Mar haqa açixe û ew haqa pêşda çûye, evê te ajot, xwe lez pêra

gîhand û para va ji hespê xweyî qap banzda ser pişta hespê sere-skre Mara, para va bi destekî ew qepeçe kir, destê wî sîng va guvaştin, bi dstê dinê soranî (qeme) ji ber pişta xwe kişand û patka wî ra kir û xûna wî rêt û evê te ji ser pişta hespê jorda şiqitî erdê û bi xwe jî (Têr Poxos) rima kuştî hilda, hespê wîyî bozî stukurdirêj sîyar bû, zengu kir, mîna birûskê çû hewara Mîrzik, yê ku bi mîrxwesya xwe, êdî digîhîste altindaryê, ewê mayîn Têr-Poxos qir kirin û yê ket, hemin ket, kî revî, hemin revî: li rûbarê dinê ji hev bela-belayî bûn.“ (9)

Stiran û bîranînên Êzdîya da xêncî keşîşê remildar, derheqa tevbûyna Ermenya di şer da û mîrxwesya wan da tu gîlî nayê gotin, gelo ji tirsâ axa, beg û dîndarêñ musulmanyê bûye ku wê derheqê da tişt negotine, yan sebebekî din hebûye?

Gelek extyarêñ Êzdîya, yê wê heremê, minra gîlî kirin, ku tirsâ axa, beg û dîndarêñ musulmana dengbêjîn Êzdîyan newêribûn wê kilamê li nava civaka da serbest bistirêñ, yan jî dema sitirane, gelek tişt kilamê da bi gorî dilxwestina wan bi guhertin digotin. Ji bo wê jî kilamên li ser komkujiya Dela û şerrê li ser Erenzê ewqas hatine guhertin.

Rastî ewe, ku Ermenyê wê heremê him wî şerî da, him jî berxwedan û şuxulkirina Mîrzikê Zaza da roleke mezin lîstine. Raste, çîroka Ermenya ya jorgotî da jî mîrxwesya Têr-Poxos pir hatye mezinkirin. Ev jî tebyetî ye, ji bo bûyar cûrê çîroka gelêri (hikyat) hatye gotin, çîrokbej xwestye mîranya agîte çîroka xwe pir mezin bide kivşê, ya din jî ewe, ku her krs dixweze kirina gelê wî mezin bê xanê.

Gelo Hesab ji alyê Êganê Meyro yan alyê Têr-Poxos va hatye kuştin? Bi texmîna min ew ne mihûm e...Dibe Êgan jî bi eslê xwe Ermenî be. (Çîrokbejê Êzdî dibêjin ew pîre, pîre êzdîya ne). Navê Êgan jî, navê Meyro jî navê Ermenya ne. Ermenî dibêjin Yêgan, Yêgor û navê dayka wî Mayram...Raste, ji vê

fikira min ra, çirokbêj û stiranbêjê vê bûyarê qayîl nînin, lê ew jî nikarin dijî vê fikirê şedetîke bingehîn bînin.

Stiranekê da jî tê gotin, ku Miçoyê mala Şêx Îsa Hesab kuştîye:

*Ezê bi Erenza Şêxa dketim bi tereye,  
Eskerê Hesabê Cibo girane, girtîye dora  
Erenza Şêxa çar ewleye,  
Şede-şûdê Miçoyê mala Şêx Îsa  
Gelek hene li dinyayê,  
Dibêje: "Min serê Hesabê Cibo, apê lawika,  
Jê kirye bi destê xweye..." (Kilama Hemzoyê Xalit.)*

Çawa li çevkanya Ermenya da jî tê gotin şer pir giran û xûn-rej bûye. Êrîşkar dema kuştina pêşîkêşê xwe dibînin, tirs, saw û xof dikeve ser wan, xwe şaş dikin, çarçev dibin, rev li wan dikeve, direvin. Lê Ridiwanya jî her alya va hicûmî li ser wan dikin, li wan dixin. Ji wî sîh hezarî teka-tûka xilaz dibin.

Kilamê da wa tê gotin:

*Edlayê digo: Hesabo hane, sedû bîst car bi min hane,  
Bala xwe bidê xortê Qizilan, peyayê Niqîban  
Serê dizgînê reşboza berdane,  
Ajotine qûçika Ridiwana bavê Temo,  
Derbekê lêdane li Hesabê Cibo,  
Li apê lawika, li Cihê, li Mihê  
Hevtê û pênc mér ji konê bavê min  
Qelandine tovê xalan û xwerzî,  
Belê, apan û birazî, lo wî, lo, lo wî lo... (Aydin.Ronak.)*

Dibêjin ji xûna kuştîya ava çenê Ridiwanê sor bûbû, ewqas laşê kuştîya ketibûne çêm, ku berê çêm hatibû girtin. Li meyda-

na şêr ewqas xûn rijya bû, ku heft sala li wî erdî tişt şîn nebûye. Çevkanya Ermenya da dîsa derheqa dewya şêr da, qala bûyareke pir bi dilêş tê kirin: ”...ê revîn, li nava kîjana da bûn tivingçîyê peya, xwe li gomê Sixêrdyara gîhandin, li wura sitar bûn, eskerê Mîrzik û Têr-Poxos dane dû wan, ew goma da kirin nav hevsarê, dixwestin wana dîl bigirin...lê ewana teslîm nebûn. Mîrzik emir kir agir bidine goman, û yê starbûyî zêndî-zêndî li wur da şewitîn, û bezê wan mîna rûn helya, û mîna cewa di-kişya nava çêmê nêzîk û merivê hizûrê ev gişk dîtin...”(10 )

Altindarya dijwar nav û dengê Mîrzikê Zaza, egîtya Xaltîya û binelyê Ridiwanê qezayên der-dor da bela dike. Hukumdarya Mîrzik, mîrê quesra Ridiwanê xurttir dibe.

Lê bi rastî gotî ew altindarî Ézdiya ra tiştekî qenc jî nayne, raste ew mîna Ézdiyê Dela nayêne qelandin, lê li dora wan goveka dijminatyê, neartyê xurttir dibe. Raste,stiran û çîroka da derheqa undayê Ridiwanya da tişt nayê gotin, lê tê txmînkirin undayê wan jî hindik nî bûne...

Çawa gelek şerên vî teherîye ku berê navbera kurda da qewimîne uas jî ev şerê bê mene û bê fikir zîyanekê pir mezin dide temamya Kurdê wê heremê. Him kuştina bi dehan hezara evdan, (ew jî ewê xebatçî, yê xweyê mal û zarokan, yê karibûn dîjî dijminê welatê xwe ê eslî sîlihê hildin, ji bo azaya gelê xwe, welatê şerkin), him navbera wan da xurtbûna bêtifaqyê, dîn dijminatyê, ziyana madî û moralî, gelê kurd ji hal dêxe.

Emê paşê bivînin, dema artêşa Osmanyê bi teherekî dewyê şerê dijî Rûsa tîne, serokê serhildana Misrê ra li hev tê, vedige-re, berê şûrê xwe dide ber bi Kurdistanê, mîna gurê birîndar dikeve nava gelê kurd, Kurdistanê wêran dike, dişewitîne, zulma nebinayî tine şerê xelqê, nanhêre kê ye musulman, kîye ézdi, kê ji dînê wane, kê ji dînê wan nîne.

\*\*\*

Lêkolinê dîrokî didine kivşê, ko di wê demê rewşa Împêratorya Osmanyê him alyê sîyasî û leşkerî, usa jî di alyê aborî da pir dijwer bû.(11) Hukumdarya navxweyî jî pir sist bûbû. Împêratorî bûbû mîna laşekî mezinî rizyayî. Ji bo xweyîkirna sînoran, tim bi dewletn cînar ra nav pevçûn, şer û dewan da bû. Halê wê ne alyê Balkana, ne Kovkasê, ne jî Îranê va pak bû. ( Şerê Tirk-Îranê yê salê 1821-1823; Tirk-Rûsaye 1828-1829-an û hîvd ). Tevrabûn û serhildanê gela yên mezin li nava dewletê xwe da jî pêk dihatin. Fêodalên biçük û mezin hukumdarya Sultên qebûl nedikirin.

Salê 1831-1832-an hukumdarê Misrê: Mehmed Eli çend derbine giran gîhande qewatên Sultan, ew mecbûr kirin tesmîl bin. (12) Mîrgehêن Kurdan, yên mina Soran, Botan ewqas qewat bûbûn, ku ne tenê hukumdarya osmanyê qabûl nedikirin lê êdî xwe çawa dewletên serbixwe elam dikirin.( 13 )

Siyasya Sultanê osmanî ya wan salan, ku bi rôforman (tanzîmatan) karibe desthilatdarya xwe biparêze, tu encamên berbiçev nedidan. Armancêن wan rôforman bûn, ku bi nûkirin, qewîkirinea cûrên rîvabirina hukumdarye, organîzekirina ordîyê, sîstêma finansyê û hinek nûkirinê din wê dewletê derxin li ser rîya kapîtalîzmê. Lê ew halê Împêratorî têda bû mecal nedidan mîaserkirna wan rôforman.

Ji pey li hev hatina tev hukumdarê Misrê, sala 1833-an, 9-ê meha gulânê û 8-ê hezîranê, dîsa wê salê bi Rûsyayê ra, dewleta Osmanyê ra mecal saz bûn, bi alîkarya şêwrdarêن Ewropî “bi sur û agir ” berê xwe bidin Kurdistanê.( 14.)

Raste Ridiwanya li wî şerê birakujuyê yên mezin da (ser Erenza şêxa) ser ketin, lê seva êrîşeke dewletê ya mezin hazır nî bûn.Qewata wan jî nî bû.

Mîre Ridiwanê texmîn dikir ku halê wan ewqas jî pak nîne. Li dora wan, roj bi roj xeleqa neyartyê, çiqas diçe teng dibe. Ne hêza wan heye dijî qewatên mezin xwe biparêzin, ne jî karin ji

kesî hevkarî û alîkarya mezin hêvîkin. Bawerya wî ji cînara: Mîrê Soran û hukumdarên Botan jî nedihat, ji bo ew jî ji qirêja olperestiyê paqîj nemabûn û bi neyartî Êzdîya dinhêrîn.

Şerê Tirk-Rûsa yê salêن 1828-1829-an, û wî şerî da serketina Rûsa çira gumana xilazbûnê li dilê Mîrzik da vê dixe. Di vê pîrsê da, bi texmîna me rola Ermenya mezine. Çawa me berê jî got, qeza Ridiwanê û bi xwe bajêr da jî gelek Ermenî hebûn. Navbera wan û Mîrzik jî pir xweş bû. Tê texmînkirin pevgirêdanê wan li tev Ermenyên herema şêr da jî hebûne, guhê wan li ser bûyara bûye. Êyane, ku temamya gelê Ermenî hêvyêñ azaya xwe bi Rûsa va girê didan.

Navbera salêن 1828-1830-î Mîrê Ridiwanê, dizîva, bi destê Ermenya sê nema Serleşkerê Ordîya Dewlwta Rûs, ya Kovkasê Gêneral-Fêldmarşal, Koms Paskêvîç ra dişîne û dewa hevkaryê lê dike. Lê bi sedemên cûrbicûr her tişt bê encam dimînin..

Dewî şerê Rûs-Tirka jî tê. Hêvyêñ Mîrzikê Zaza wî alî da jî dişkên.

\*\*\*

Dî vê çîrokê da bûyarek heye, ku tek di pirtûka A. H. Layard da tê bîranîn. Ev bûyaran, ne kilama da, ne bîranînên mezina da, ne jî di nav zargotina Ermenyan, ya nivîskî da nemaye. Eger bûyareke wa, eşkere, li wê demê biqewimya, dijwarbihata bîrkirin. Ev bûyar di pirtûka A. Layard da wa hatye nivîsar: "Gava Serfermendarê Osmanyê, yê bi nav û deng Reşîd paşa hicûmî li ser Bakûrê Kurdistanê dike û berê xwe dide Başûr, nêzîkî herêma Mîrza axa dibe, Mîrza axa xwe dide desê Serleşkerê Sultan. Walyê dewletê Axê ji quesra wî derdixe, dewsâ wî yekî bi navê Emîn axa datîne. Evê han hela rind li Ridiwanê cî ne bûyî, jina Axê Êzdîyan bi destê zorê direvîne. Mîrza axa dewsâ dijî wî rahêle çekê, diçe li cem Reşîd paşa û dibêjê, ku ew pîreka ne jina wîye, carîke jina wîye. Dibêjê, dibê bira bawarya te ji min

hebe, bira Emîn axa vegere li ser karê xwe. Axayê Tirk vedigere cîyê xwe. Mîrza axa êrîşê dibe li ser wî, wî û du kesên bi wî ra dikuje, heyfa xwe hiltîne. Reşîd paşa hicûmî li ser Ridiwanê dike. Lê ji bo laşkerê dewletê wê demê şerê dijî Mîrê Rêwandûzê va mijûl bûn, nikare wê herêmê bike li bin bandora xwe. Wextê Reşîd paşa şerê dijî Beglikê Kurd da li ser dikeve, Mîrzîk dîsa diçe bal, xwe davêjê. Paşa Mîrza axa dike meznê wê heremê.”(15 )

Gelo ev bûyara Layard şas nivîsiye, yan bûyr û şexsyetine din tev li hev kirye ? Kê derheqa vê bûyarê da jêra gotye?

Bi texmîna min, tu mene tune, ku em nivîsara diplomatê Îngîls bawar nekin. Surrê Axayê Êzdî pir bûne. Em mesela nemê, ku wî Serleşkerê ordîya Rûsa ya Kovkasê ra sandî ji bîr bînin, derheqa wan da jî xêncî çend merivêن Ermêni, ewê nêzîkî wî jî kesî nizanbûye.

Tê xanê, çawa hukumdarekî fêodalî wê demê çend jinê wî jî hebûne. Ji pey şerê Erenzê ra nav û hurmeta Mzik li nav wê heremê da gelekî bilind dibe. Emîn axa, ku hatibû dewsa wî, dixwze tîştekî usa bîne serê Mîrzîk, ku wî êlê da nuxsan bike, navê wî ra bilîze. Jineke Mîrzîk direvîne. Mîrzîk û der dorê wîye nêzîk, wê surê pir bi dizîva xweyî dikan. Tê texmînkirin der-dor û mirovêن Mîrzîkê yê amin hîmlî Ermêni bûne .Û, dema Layard ji mala birazyê Axê:Nazî diçe dêra Ermenya, dibe Keşîş jî dizîva jêra ew sur dîhar kiribe...

\*\*\*

Sala 1837-a Reşîd paşa ji nexweşya xolorê dimire: Layard dinivîse: “ Ji pey mirina Reşîd paşa ra, walîkî nû tê wê heremê. Ew walî Mîrza axa tegiîfî li cem xwe dike û bi xweyîntî dikuje. Mirovêن axê, cinyazê wî tînin û li ber çêm, li goristana rojava-yê bajêr da vedîşerîn.” (16 )

Bîranînê gel da jî tê gotin, ku wexta Reşîd paşa dimire, Mîrzikê Zaza jî bi koma xwe va diçe hewaryê. Hema li wura jî wî digirin, dikine hebsê.

Hemzoyê Xalit bîranîna xwe da wa dibêje: "Dewyê da Mîrzik girtin. Dewleta Osmanyê Mîrzik girt. Zilamek ji mala Huseynê Kelo, mala wana Kelhoka bûn, berê ne Kelhoka bûne, lê vê paşyê hatin Kelhoka. Min navê wî zilamî jî zanibû, lê niha ji bîra min çûye. Mera usa hatye gotin. Herda digrin, dabin hebsa Dîyarbekirê. Go ji hebsê revyan. Li wê deverê çiyak heye jê ra dibêjin çiyayê Kinêrya. Gundê pîra li wur heye. Direvine çiyayê Kinêrya. Dikevne şkeftekê. Wê şevê berf dibare. Berfê da dixe-niqin. Sibê şivan meytê wan divînin. Diçin cinyazê wan tînin. Mezelê Mîrzik li nava Çilêrya ye. Çilêrya tev pê zanin."

Elî Qecer jî wa gîlî dike: "Çend sal pey ra Mîrzik digrin, dîbin hebsa bajarê Dîyarbekirê. Ji hebsê direve. Direvne çayayê Bizêrya, nêzîkî gundê Pira-Çinêrya. Wura çawa dibe, nizanim, dimire. Pîr tînin Ridiwanê vedîşerîn. Bavê min digot me mezelê Mîrzik vekirye û meytê Keleşê apê xwe kir yezelê wî."

Ji hersê çevkanya jî xweya ye, ku Mîrzikê Zaza di sala 1837-a girtine, kirine hebsê. Wê salê jî mirye, Gelo, çawa Lîyard dibêje hebsê da dewletê kuştîye, yan revya ye û le çiyê, ji bagera berfê xeniqîye? Herd çîrok jî nêzîkî bawarê ne. Dibe quluxçîyê dewletê ji kuştîbin, ku wê kuştînê ji ser xwe derxin, laş birîbin, avîtîbin, ciyê, ku derheqa tê gotinê.

Çi jî hebe sebebê mirina wî jî dewlet bûye.

Bi Mîrzikê Zaza jî dewî wê mîrtya Îzdiya, ya welatê Xalta tê, gund wêran dîbin, hinek direvine Şengalê û welat şêx... Ev malbeta desthilatdar hukumê xwe unda dike, ji ciyê wan tê derxistin.

Niha peyhatyê wê malbetê hatine Almanyayê, dijîn.

## **XALTÎ U HINEK ÎLÊN KURDÊN ÊZDÎ YÊN BAKURÊ KURDISTANÊ**

Ew eşîrên kurdêñ êzdi li dor kîjana ev lêkolîn hatye kirin xwe ra dibêjin Xaltî. Berê berê da, heta van salêñ dewî, wan eşîra heyîta xwe li der-dorêñ bajarêñ Sêrtê, Batmanê, qeza Qurtelanê, Erûhê, Bişêryê xweyî dikirin. Li bin zor û zulm, helandinê da çiqas diçû hesavê wan û warêñ wan kêm dibûn, goveka wan teng dibû. Van 15-20 salêñ dewyê bi masayî cî û werêñ xwe berdan hatine Ewropayê, xazma Almanyayê.

Wextê da mîrgeha Xalta li nav Kurdistanê da mîreheke mezin, û bi hêz bûye. Di av da ev çend eşîrên mezin bûne: Qizili, Niqîbî, Xendeqî, Berekî, Anqosî û hinekêñ biçûke usa çawa Bisiyan, Biletinî, Emeran, Mamereşan û hvd. Ji van hinek niha li ser bawarya êzdityê nînin...

Çawa tê zanîn, wextekê, hela 1300 sal li berî zayînê, li der dorê golêñ Wanê, Ûrmyayê û çiyayê Araratê hukumdarîke mezin çê bûye û heta sala 585-an dom kirye. Dîrokê da ew bi navê Xaldî (Ûrartû) eyane. Gelo navbera navê wê dewletê û navê van eşîrên Kurdêñ êzdi da girêdanek heye, yan na? Ji bo dest me da delîlên anegor tune ne, em vê pirsê bihêlin dîrokzanan û paşwextiyê ra.

Lê bêjim, hela ez zarok bûm, kalê gundê me jî oda da diciyan, diaxivîn, çîrok digotin, li ser gelek babetan xeber didan.. Ji haj hatincûyîna cihanê jî kêm hebûn. Xwendî jî nîbûn. Wana ne dîroka cihanê zanibû, ne jî haj tiştên kevnar û lêkolînên zanyarî, arxolojyê û medenyeta Mêzopotamyayê hebûn... Çi ji kalbavêن xwe bihîstibûn, derheqa wan tiştan da gîlî dikirin. Digotin qebîla me, ya Bela jî Xaltî ne... Navê çend qebîlên din jî didan, ku li nav êzdiyêن Ermenistanê da hebûn (navê wan bîra min da nemane). Wan ji mîna kalên van eşîran digotin Xaltî navê eşîrê, yan qebîlê nîne, Xaltî navê were, cîye... Eger navê war e, usane wana herêma xwe, welatê xwe ra gotine Xalta. Gelo navê Xelatê jî ( Sîpan Xelat ) ji wî navî nayê?. Çawa Êzdi br xwe dibêjin hemû qebîlên êzdiyân Xaltî nînin, usa ne bi bawarya min, di bingeha Kurdan da (Kurdên êzdi jî nav da) gelek civak, medenyet û şaristanyên cûrbicûr yêن wê heremê rol lîstine.

Lê gelo Kurdên wê heremê, yêن Musulman çîma xwe ra navêjin Xaltî... Bi texmîna min li nav wan da ev nav hatye bîrkîrin, sebeb ewe û dîrok jî wê dide îzbatkîrin ji pey qulibandinê ra kurdan bêtir koka xwe înakar kirine û hela gelek malmezinan koka xwe birine malbetên navdarêن gel û olêñ desthilatdar va girêdane.

Tê texmînkîrin, di dema xwe da mîrgeha Xalta mezin û bi hêz bûye. Salêñ 1820-1850-î eşîrên mezin, yê li wê heremê ev bûne: Qizilî, Niqîbî, Xendeqî, Anqosî, Berekî. Ji bo kilam û bîranîna da navê wan tê bîranîn. Mezinayî li wê heremê Mîrzikê Zaza mîrê quesra Ridiwanê, serokê Qizilyanyê kirye. Pêra jî lêkolînên dîrokî derdixine holê ku êle mezin bûye û li nav axabegêñ fêodal da parevekirî bûye. Hevgirtin û tifaqa xurt jî tune bûye.

Ji bo belgêñ dîrokî derheqa mezinayî, hesavê evdêñ Êzdi, gund û warêñ wê mîrgehê da destê me da tune, em jî wan me-

lûmeta tînin, kîjan hevkarê me Kemal Tolan ji devê mezinên wê heremê top kirye û weşandîye. Bê şik hinek şaşî dibe vê nivîsa-�ê da, çawa di nirxandina da usa jî hesav û navên gundêñ êzdîyan da hebin, lê rastîk sedî sede, ku wê demê hesavê gundêñ Kurdêñ êzdî yê wê heremê ji evêñ nivîsar pirtir bûne... Gelek guhestinêñ mezin jîyana wê heremê, û jîyana Êzdiya da bûne, dest zulm û zorê, qir û birê goveka êzditayê teng bûye... Mînakêke biçûk em ji dirokê bînin: Dema ferma Sultan Mehemedê I da “Reşîd paşa êrîşê dibe li ser Kurdistanê, wê êrîşê da ewî 40 hezar Êzdî kuştine...” (Dr. P. Müllér Sîmonîs, Dûrch Armênién, Kûrdîstan und Mêzopotamien; Meinz 1897.)

Eger her gundekî Êzdiya da 400 nefer jî bê hesavkirin, usa ne tek wê êrîşê da 100 gunden Êzdiya hatine wêrankirin, li ser rûyê dinyayê unda bûne... Lê çiqas welgerya ne?

Bi bîranîna mezina heta destpêka sedsala derbazbûyî, cî, war û stirûktûra wan qebîlan bi van şikila bûye:

#### QIZILANÎ:

Gund û warêñ vê eşîrê ji zîyareta Şêx Evinda û Aviskê (li ber çemê Delan) dest pê dike li ser milê cepê diçe heta Bilweris (Çelikê Eliyê Remo û Ridiwanê) û diçe derdikeve çiyayê Xerzan (Gurdilan û Bîrika Kuêdiyê).

Dibêjin hevt bavê Qizilya hene: Amêrkî, Metînî, Takorî, Şemsikan, Bavbîna. Navêñ dudan em nikaribûn pê bihesin.

Navêñ hinek gundan ku Qizilî lê mane, evin:

Aşik, Girê Çelo, Ridiwan, Xindûka, Înxala, Bêleka, Hemdûna, Sûlan, Zengav, Qumaro, Bêtam, Kanî Sorkê, Terno, Zêwika Şêxan, Xindok, Bîrka Kurêdyâ, Kelemaran, Şêx Osel,

Zorava, Dûşa, Cim Sarîbê, Kûşana Şêx Ûnis, Zuxêr, Dûsadek, Cimzeq, Marîpê, Şêx Evinda, Qinask, Milêha, Darasel, Mêrga Elî, Wehzdê, Dêra Hemzo, Xanikê, Şikevta Emer.

Wê demê mezinaya vê êlê malbeta Mîrzikê Zaza kirye û bi melûmetyên dîrokî izbat dibe ku Mîrzikê Zaza mzinayî (ji alyê dewletê va) temamya Xalta û gelên qeza Ridiwanê kirye. Ji pey Mîrzikê Zaza ra dewî desthilatdarya wê malbetê tê. (Nîvê sedsala 19-a).

## XENDEQÎ

Cî û warêن Xendeqyan ji çiayê Bûzêrî dest pê dibe, ji ber ava Heskîfê heta pira Batmanê û ji ava çemê Dela ji milê rastê digîhîje heta Kêl û Midêwirê (Ridiwanê). Heta sala 1934-an, jî dama pêtrol li çiyayê Reman ne dîtibûn, çiyayê navbera Heskîf û Batmanê ra digotin ÇÎYAYÊ XENDEQYAN.

Bavkê Xendeqyan evin: Himeydî, Axikî, Reşî, Gever, Îdikî, Veysikî, Qodoxkî, Kaşaxî.

Navêن hinek gundêن Xendeqyan li herêma Batman û Bişêryê,evin:

Baherziq, Dêrikê, Memika, Pêşîm, Sîxura, Barisil, Feqîran, Mezirka, Şahsim, Basorkê, Gêdûk, Mirdêsi, Şêhê, Bazbût, Girê Reş, Mizareşê, Şêkestekê, Baziwan, Keverzo, Qulibdor, Şimzê, Bêdalê, Korik, Sîlexer, Zercil, Çnêriyan, Malê Biniyê, Sînê, Zêwa Mîran.

## **NIQÎBÎ (Reşkotî)**

Gund û werêñ Niqîban ji çîyayê Qozlix-Gaza Kursî dest pê bûye heta ber Sîlvanê (Tepê Berava û Pira Mala Badê) û Bekir-Şêx Doda.

Hinek bavkên Niqîbyan, ku hê jî hene, evin: Şedikî, Şewrikî, Mehemedikyê Rêza Gundî, Mehemedkîyê Dermankî, Pîvazî, Kavarî, Dirbêsi.

Malmezina vê êlê mala Zoro ye.

## **BEREKA**

Gund û warêñ wan û Niqîbyan tevin. Bereka qebîlê mala Çelikê û yê mala Zirçî Axa ne.

Navêñ hinek gundan, ku wan da Niqîbî û Berekî mane, evin:

Alavê, Enapê, Gaza Kursî, Şêx Evenda (Ziyaret), Apika, Germik, Kela Şêx Evendan, Tapoyê (Tapî), Awîska Elî, Gozeldere, Kelhok, Texerî, Awîska Omo, Gundikê Golo, Kurtiê, Zivingê, Bîmê, Hecir, Liçkê, Baxizm (Berekî), Bolinde, Helwik, Malegir, Baxizm (Berekî), Cerdeka, Herfasê, Mêrîna, Cînesker (Berekî), Darabiyê, Hêshêse, Mîlka, Dumbêskê (Berekî), Dela Paşo, Hethetkê, Newalê, Êynkerm (Berekî), Dela Qaso, Hiznemir, Qorix, Êzîka Jor (Berekî), Dêra Qêr, Kaçka, Qubîn, Êzîka, Xwar (Berekî), Dirbêsa, Kara Xwe, Eco.

## **ANQOSÎ**

Ev êla hîmlî koçer bûne. Lê hinek gundêñ wan jî hebûne, kîjan ji rîya Aviskê–Qurtelanê dest pê bûne, gîhîştine heta Sêrtê. Merkeza Anqosya Koçka Gûmêrdê bûye.

Bavkê Anqoaya evin: Betranî (eva usa jî navê gundekî Anqosya ye), Reşî, Canikî, Dena, Stûrkan. Stûrka û Reşa li nav êzdîyên Ermenistanê û Gurcistanê da jî pirin. Ew li dema fermana Şêx Mîrzayê da revyane wur.

Navê hinek gundê Anqosya,\* evun:

Başûra, Doqatê ( Gundê Şêx Mîrza ), Kezerê, Berhûrik, Înapê, Sewdiq, Betran, Gûmerdê, Sorik, Bey Satûn, Kelhok, Xişêna, Canika, Zozanê Şêrînê.

\* Anqosî hîmlî koçr bûne. Kilama ŞÊX MÎRZA da tê gotin, ku berî fermanê 1700 konê wan hebûne.

Xêncî van usan jî li der dorê Amedê devedevî 50 gundê Xendeqya, Qizila, Niqîba, Sihanya, Berava hebûne.

Heta destpêka sedsala derbazbûyî jî li Bota gundê êzdîyan hebûne. Fermana dewî ya meha gulanê, sala 1916-a, ku li Bassa hate rakirin 350-400 evdêwan hatine qetilkirin.

Cî û warêñ Kurdêñ êzdi li herema Bozava, Nizîpê, Sirûc, Sêwrekê û Wêranşehêrê jî pir bûne.

Xêncî Wêranşehêrê wan heremêñ din Êzdî ne mane, helyane. Der dorê Wêranşehêrê devedevî 40 gundê Êzdîyan hebûne.

Li der dorê Cizîrê, Silopîyê, Nisêbînê, usa jî Mêrdîn, Mîdyad û Kercewsê cî û warêñ êzdîyên ÇELKÎ ne: ( Qolka-Çolî û Torî ). Hesavê gundêwan devedevî 80-î bûye. (47 yê Çolya ne, 30 yê Torya).

Li nava dîroka dijwar da gelek êl û êşîr jî helya ne, yan koçber bûne û tu bîranîn ji pey xwe nehîstine...

Îro li Bakûrê Kurdistanê kurdêñ li ser bwarya êzdîtayê meriv kare ser tilya hesavke.

## ÊLA SÎPKA

Êla Sîpa, êleke Kurda, ya mezin, kevnar û navdare. Delîlên dîrokî didine kivşê, ku hê sedsala 18-an da ev êla li Serhedê, nav Xanedana Êrêvanê da bûye, kîjan jî ketya bin hukumê dewleta Îranê. Êle bi hêz, xurt û bi nav-deng bûye, roleke berbiçev e'mrê wê heremê, ya leşkerî û civakî da lîstîye. Hukumdarên dewletê meznê wê êlê ra hesav rûniştine. Şedetya wê yekê, ew qirarnivîse, pê kîjanê xanê Êrêvanê: Muhemed-Xan Qecer, di sala 1785-an mezinê wê êlê MÎRZA AXAYÊ Sîpkî, bi nav û ritimê axatyê yê bilind rewa kirye. ( H. D. Papazyan: "Rewakirina Mîrza Axayê Sîpkî û Ehmed Axayê Zilanî bi ritbê axatyê bi qirara Xanê Êrêvanê Mehmeh Khan Qecer va. (Sedsala 18); Berevoka xebatên Înstîtûta Rohilatzanyê ya Akadêmya Ermenistanê; Cild 8; Welat û gelên Rojhilata Navîn û Nêzik, Kurdzanî; 1985, rû 272.)

Qirarnivîsê da derheqa amintîya wî axayê kurd hindava dewleta Şahê Îranê da, zîrekî û jêhatina wî tê nivîsar, ew tê navkîrin çawa evdekî bilind derece, hurmet mezin, qedir bilind û li ser evdn temamya êla sîpka hukumdarya wî ferz dike.

Gelo, wê demê êl bi temamî li ser bawarya êzdîtayê bûye, yan êdî musulmanî hilda bune? Qirearnivîsê da derheqa bawarya (ola) êlê da tu gîlî tune.

„Dema Jûstîn Parkînstîn sala 1837-an ji Ûrmîyê diçe Erzîrûmê ew li başûrê çiyayê Agirîyê (Araratê) û li temamya der û dora çemê Feratê rastî eşîra Êzdîyê Sîpikî tê.“ (John S. Guést, Yêzidilerin Terihi, Avêsta, İstanbul 2001.)

Sala 1845, Xaçatûr Abovyan ji bo gotarêن xwe yê dîrokî, KURD û ÊZDÎ binivîse, du heftya li nava qebîlêن kurda digere,

êla Sîpka jî dibe mîvan. Ji nivîsara wî tê eyankirin, ku êdî malmezima Sîpka û payê êlêyî pirê welgerya bûne li ser ayîna ola îslamê. Ronakbirê Ermenî bi hizkirin û dostanîke helal derheqa mîrxwesî, helalî, comerdî û mîvanhizya meznîn wê êlê: Evdal axa, Silêmn axê lawê wî û lawên Silêman axê: Îbrahîm û Şemdin axa da dinivîse. Ewî gotara xwe da derheqa gelek bûyareñ mîrxwesya Silêman axê da dîrokê ra hîştine. Ew dinivîse: „ Bi nav û nîşanê wa û kirinê efat va ew gilî-gotin berbiçevin, yê derheqa mîr û êlbaşyê qebîla Sîpka: Evdal axê da nin, kîjan min ji devê dîtya bihîstyê. Lê nav û dengê kurê Evdêl: Silêman axa diha bilind bû. Tenê bi hildana navê wî sîyarê mîrxwes Wan, Tewrêz, Bazîd, Êrêvan û Erzirûm lerizîne. Şevekê, ewî ordîya tika ye 15 hezarê pê 200 kurdên li bin qolê xwe da, tam hinci-randîye. Ji nivîsara Abovyan tê xanê ku li nav sîyarê Axê da Êzdî hebûne.

Dema Abovyan diçe nav Sîpka, meznê wan Îbrahîm axa bûye. Ew gelekî qedirê Abovyan digire. „ Êdî pêşda zanibû, wekî ezê li wana biqesidim. Hema çawa ez li ber derê wî kivş bûm, kurdekî quî qalin, qewat pêşya min da hat, bawarkî li ser destâ ez ji hespê peya kirim... Min li wura komeke giran dît. Gişk rabûn pîya û pêşya min da hatin. Îbrahîm axa jî ji wan şûnda nema. Yekî solê min êexist, dudu jî ketin bin milê min, min nizan bû çawa bikira. Gişka hal û kêfê min dipirsîn, hatina min ya xêrê hesav dikirin, usa bi dil, ku çetin min ev yek cîkî mayîn texmîn kiribe. “/ Abovyan, efrandin, cild 8 , rû 252-257./

“Çaxê ez cara ewlin bal meznê qebîla Sîpka: Îbrahîm axa bûm mîvan, raste, ew jî ketibû halê tunebûnê û zêdeyî milkê wî tam ji ser hatibû birîn, ewî dixwest hespê xwe yê herî bijare, pêşkêşî min ke...” / KURD rû 75 /

Nivîskarê Kurdî naskirî Ahmed Aras pirtûka xwe ya lêkolînê EVDALÊ ZEYNİKÊ da bîranîna Mehmedê Qencîyî 76 salî (sala 1992 ew bîranîn nivîsiye) tîne, derheqa kilama dengbêje bi

navê XOZANÊ. Bîranînê da wa tê gotin: „Di kilama Xozanê da navê Qeymezê Êzdî tê gotin. Qeymezê Êzdî jî êzdîyên Întapê bûye û mirovekî jêhatîyî mîrxwes bûye.”

“Întap wê çaxê Êzdixane bûye. Pêşyê wan Sîpkî jî êzdîne. Gundê Întapê Dêrik, Xanik, Esmer, Mella Şemdin, Tetika, Bedborya û çend hebêن din gundê Êzdîya bûne.“

Anegorî TEZAKÎRÊ, ya nivîskarê Osmanî Ahmet Cevdet Paşa, şerê Xozanê di sala 1865-an bûye. Tê da nivîsare: “Piran-ya sîyarêن Kurdan, axa û begêن eşîrêن Kurda bûn û giş meri-vêن bijare bûn.” /Ahmet Aras; EVDALÊ ZEYNİKÊ; DENG; 1996;rû 201/. Usane Qeymezê Êzdî jî ji maleke bi nav-deng bûye û wê demê li nav êla Sîpka da Êzdî jî xurt û bi hêz bûne.

Anegorî bîranîna, nîveka sedsala 19-an navbera Sîpkîyên Musulman û Êzdî da nakokyên mezin tine bûne, bi edlayî nav hev da bi hev ra jîtine. Lê dîsa jî hinek bavkêن wan, wek Mixayîla û hineke din, hela nîveka sedsala 19-an, têن digîhîjine Êzdîyên navça Axbaranê-Elevezê dikevne gundê Camûşvana mezim û Pampa Kurda.

Bi salixdayîna nivîskar Wezîrê Eşo Êzdîyên wê êlê li navça Eleşgirê (Alaşkert) mane û navenda wan gundê Eyntavê bûye (Întab). Piştî şerê Rûs-Tirkan, yê salêن 1877-1878-an, gava dewleta Rûsyayê wî şerî da li ser dikeve û qeza Qersê dike bin hukumdarya xwe, hidûdê wê dewletê nêzîkî warê Êzdîyên vê êlê jî dibe. Navbera Musulman û Êzdîyê Sîpkî jî hev dikeve. Mala Axê jî li Êzdîya tê xezevê. Dewleta Osmanyê dewsa ji zordesî û neheqyê Êzdîyan biparêze zulm û zora xwe ya li ser wan hê hişk dike. Êzdî macbûr dimînin rê xilazbûnê xwe ra bigerin. Giregir û navdarêن Êzdîya dizîva li hev dicivin, çend zilamêن xweye şereza û jêhatî dişînine bajarê Tilbîsê, ku destûrê hukumata ji Rûsyayê bistînin û êla xwe derbazî alyê Rûs kin.

Nivîskarê Kurd Baxçoyê Îsko, kitêba xwe ya bi navê KUR-DÊN KAVKAZIYAYÊ da (bi zimanê gurckî li bajarê Tilbîsê hatye weşandin) van nava dînivîse: Nihoyê Miho, Emer axa, Ayibê E'mo, Okizê Mamo û Xalitê Elo. Pirofêstor Hecîyê Cindî jî di romana xwe HEWARÎ da navê sisya dide: Elyê kurê Eme-re Polat (Elî axa), Nihoyê Miho û Bedoyê Mamo. (HEWARÎ, rû. 93; Roja nû; 1999 s.)

Jî herda nivîskara kê raste, û kê çûne bajarê Tilbîsê ji bo destûrê bistînin ewqas jî mihûm nîne. Kê jî hebin çûne û destûr standine. Herd nivîskar jî ewledê wê êlê bûn, koçberî ya sala 1918-an bi çevê xwe dîtibûn û rind haj dîroka pêşyê xwe hebûn.

Qasidê Sîpka rastî cîgirê qiralê Rûsyayê yê Tilbîsê Voronsov-Doşkov tê. Hukumdarê Rûs wan rind qebûl dike û 16 gundê navça Dîgorê ya qeza Qersê, ku wê demê vala bûne dide wan, wekî êla xwe bînin û li wur cîkin. Evan vedigerin û bi teherekî êlê derbazî alyê Rûsa dikan. Di wê demê da Sîpkêñ êzdî û musulman ji hev diqetin. Gerekê bi rastî bê gotin, hizreta qewm û kuraptyê, bîranîna kokê tim jî dilê herd alya da heta niha jî maye.

Sîpka li navça Qersê xwe ra van gundan ava dikan: Emençayîr, Sûsiz, Dîgor, Şîrinku, Bacelî, Quzulqule, Êngiku, Dûzgêcî, Hesencano, Taşnîka Çuxreşan, Sîçan, Qereqela Baro, Qozilce, Kosesoxîtlî, Ýyla Sinco, Şatirxlî.

Navê êlê êla Sîpka bûye lê vira usa jî Hesinî, Rojkanî û hinek qebîlên din ji tev wan mane. Wî çaxî da, bi salixyê Hecîyê Cindî, hukumdarê Rûs yê qezayê desthilatdarya malmezina êzdîyêñ Sîpkî mala Elyê Emerê Polat li ser wê êlê nas dikan. Wê demê da jî dest bi axatya wê malê dibe û dikşîne heta çêbûna qeydê Sovyêtî li Ermenîstanê da.

Cenga cihanê ya yekemîn (1914–1918) jiyanâ vê êlê jî li hev xist. Komkujuyêñ Ermenyan ji alyê dewleta Tirka va gelê Kurd jî

kirin li nav gêjgerîngê. Hinek komên Kurdên musulman jî, dijî evdêne ne musulman li bin defa dewleta Tirke qetil-talançî da reqisîn. Nakokî û bûyarêner nerind di navbera kurdên Êzdî û Musulman da jî çê bûn.

“Sala 1918-an çekdarêne Ermenî dora gundekî Kurdên musulman, gundê Sorxuliyê girtin, hemû rûniştvanen wê kirin gomê û agir bi wan xistin, hemû şewitandin. Pir mixabin, ku hin Kurdên êzdî bi serokatyâ Elî axayê Emer axê beşdarî vê zulma giran bûn mîna piştgirêne Ermenya. Lê kurdên Sorxulyê jî, weke tê gotin, ne am û tam bûn...” (Wezîrê Eşo, Nûdem N 31; 1999; rû 12.)

Neyartîya navbera kurdên herd bawarya da, bi hêl dayîna nexazên Kurdan, çiqas diçû gur dibû. Ji pey şorişa Oktyabirê ra li Rûsyayê, leşkerên Rûs jî ji heremê kişyan cûn. Leşkerên Tirk û alayên Hemîdiyê ketine wê heremê. Govek li Êzdîyan teng kirin. Dîsa şûrê qirê dardayî li ser serê Êzdîyan bû. Xelq mecbûr bû cî-wer, milk û malê xwe bihêlin û ji wura jî birevin. Hecîyê Cindî pomana xwe HEWAR da wan dîdemên revê yê zulm nîşan dide. Xelq têne talankirin, kuştin, çemê Erez da jin, zårök, kal û pîr dixeniqin. Erez bi xûna Êzdîyan dikşe. Heçê ji qirê xilaz dibin û ji çêm derbaz dibin diçin cem qewmên xwe, gundêne berpala çiyayê Elegezê, hinek jî li bajarê Tilbîsê. Dikevin devê xelayê û nexweşya.

“Hema wê salê jî, gava leşkerên Kara Bekir paşayê Tirk êrif anî li ser Ermenistanê, çekdarêne Kurdên musulman jî bi serokatyâ Teyo begê bi tirkân ra hatin. Ew li navça Axbaranê, li gundê Camûşvana mezin, (pişt ra Eegez), Elî axa û neferê wî weke tolhildanê kuştin û bi ser da jî 150 mîren Kurdên êzdî li ber pira gund serjê kirin û laşê wan avîtin çêm. Leşkerên tirkân li navça Axbaranê bi sedan mîren Kurdên êzdî weke dîl girtin û birin alyê Erzirûmê. Ji wan her bi tenê du kes bi revê xilas bûn, ve-

geryan, yên din jî bêxeber û bêguman wunda bûn.” (Dîsa li wur)

Eger çekdarêن Changîr axê nîbûna, zû hewara Êzdiyêن wan gundan nehatana û berî dijmin nedana ji wur dernexistana, wê xelqên wê heremê dest pîya biçûya.

Sala 1920-î Ermenistanê ji pey demezirandina qeydê sovîtyê ra mihacirêن Sîpkî li başûrê çiyayê Elegezê, navça Telînê, Îçmîazînê, Serderebê xwe ra hinek gundêñ vala ava kirin. Berê ew gundêñ Kurdêñ musulman bûn. Wan salan tevlihev ew revya bûn alyê tirka, Qersê, ketibûn gundêñ Êzdiyan, Êzdî jî dikevne gundêñ wan û van gundan li nenyâ Te'lînê (Ermenistanê): Sîçanlû, Heko, Beroj, Gelto, Qibix tepe, Zurbe, Keleşbeg, Sorîk, Tilik, li nehya Îçmîazînê: Kûrekend. Eva ew gundin, ku heta niha jî mane. Gelek gund û qijle jî heta salê pênciyî hebûn, paşê çawa warê bê pêrispêktîv, hatine cîderxistin û belayî li ser gundêñ din kirin. Ji Sîpkyêñ mihacir hinek jî gundêñ Êzdiya yê navça Axbaranê: Camûşvana mezin (Elegez), Pampa Kurdan û Korbilaxê da li cem qewm û pismamên xwe cî bûn.

Gelek ewleden vê êlê, dewra sovyêtê da navê xwe li nav dîroka gelê kurd da nivîsîn û karne mezin kirin di alyê pêşxistna ziman, çand û zanyarya gelê Kurd da. Ji vê êlê bûn ronakbir, pirofêstor Hecîyê Cindî, zimanzañ û kurdzanê mezin, pirofêstor Qanatê Kurdo, kurdzan, nivîskar Emînê Evdal, nivîskar Casiê Celîl, berpirsyarê rojnema RÎYA TEZE, yê ewlin Cerdoyê Gêncîco, şayîr Fêrikê Ûsiv, nivîskar Baxço û Ezîzê Îsko, akadêmîkê akadêmîya Ermenistanê, kurdzanê bi nav û deng, pirofêstor Şekroyê Xwedo Mihoyî, pirofêstor, kurdzanêñ eyan Ordîxan û Celîlê Celîl, pirofêstorê doxtoryê Gorgîyê Xwedo, nivîskar Wezîrê Eşo, Egîtê Xwedo, nivîskar Rizalî û Tosinê Reşîd û gelekên din.

## ÊLA HESINYA

Ev êla êleke kurdên êzdî ya bi nav û deng e, kevnar e. Maqû-lekî wê êlê Feyzo Beg navê 26 bavê wê êlê didan, kijana demên derbazbûyî da axatî li wê êlê kirine. Sala 1980-î, wê demê ew êdî ji 85 salî derbaztir bû, xwexa jî xwendî bû, destpêka sedsala borî li mekteba gundê Zorê da xwendibû, gilî dikir, ku pêşyê wan li Întapê jîyne, Serhedê. Berî wê ku bûne, nedihate bîrê. Navbera êla wan û Sarî Silêman Axayê Sîpkî da xiravî çê dibe, dijminatî dikeve.

(Wê demê êla Sîpka hê li ser bawarya Ézdiyatî bûn e yan na, nizanbû). Dewleta Osmanîyê jî li wan tê xezebê, bar dikan, têngundên dora Bazîdê, yên vala da cî dibil. Demekê li wura derbaz dikan. Wî wextî serokê qeza Bazîdê jî Balûl paşayê bi nav û deng bûye.

Ev paşayê zalim gazî Axê Hesinya dike û qewleke zulm datîne ber: yan musulman bûn, yan jî 12 hezar mîyê zayîye qer bidine wî, ku bî şîrê wî pezî Kela Bazîdê çêke, bi goşt jî palê ser kelê dixebeitin xweyîke. Bi gotina Feyzo Begê, wê demê çêkirna Kela Bazîdê berdewan bû. Heta niha jî extyarê wê êlê dibê-jin: "Kela Bazîdê bi şîrê pezê Hesinya hatîye çêkirin". Pêz top dikan didine wî Paşê neheq, lê ew dîsa ji neheqya xwe paşda nasene. Axê êlê dinhêre çar tune, li welatê Osmanyê da kuda jî

birevin, yeke ji neheqyê xilaz nabin, xwestina serokê qezayê tînine cî û pêra jî rûyên xilazbûnê ji bo êla xwe digerin. Dizîva çend giregirê êlêye serwext: Simoyê Eylo, Osmanê Mexso, Mistoyê Kelo dişîne bajarê Tilbîsê cem Serokê Rûsyayê yê Kavkazê, destûrê distînin û heyamê havînê, dizîva ji zozana, şev derbazî alyê Rûs dîbin. Li Surmelyê, çiyayê Sînekê xwe ra gunda ava dikin. Navê gundênen wan ev bûne: Eslanlû, Qerextîn, Alçalû, Gundê Şêxan, Sarîblax, Baş-Sînek, Gundê Mexso, Xirbê sor, Taşûşan, Damîxan, Zerîfxan, Germaşiv, Xan, Qûç, Zor, Gundê Kalo, Qerequ, Qerehêsar, Bandemûrad, Taşkorpîn, Tendûrek. Bi texmîna Hesinyan pêşyên wan di navbera salêd 1820-1830 -î derbazî alyê Rûs: Sînekê bûne.

Gênerâl Üşakov di pirtûka xwe ya bi navê "Dîroka bûyaren herba Tirkya Asyayê yên salê 1828-1829" da, ku 1848 salê li Varşavayê çap bûye dinivîse, wekî sala 1828 an, 28 ê meha tebaxê, şêr da leşkerên Rûs Bazîd hildan. Mehek şûnda 200 malên kurdên Êzdi, yên êla Hesinyan, bi serokatya Hesen axê derbazî alyê Rûs dîbin. Ew ji mîrên êla xwe, yên xurt, alayîke bi 100 syarî dicivîne û dijî leşkerê osmanyê dikeve nava şêr. Ew şerê Toprax Qelê da (Sinceqa Alaskrte) bi esfatî û mîranya xwe berbiçev dikevin. Li ser rêya Erzirûmê leşkerê Tirka ra dikevin nav şêr û 140 ga ji wan distînin.

Di şerekî din da syarê Hesen axê 500 heywanên Ermenyan, ku tîrkan talan kiribûn vedigerînin û şûnda didine xweyê wan. Sereskerekî leşkerê Rûsa Kinyaz Çavçavazê Serleşkerê Kavkazê Gênerâl-Fêldmarşal Koms Paskêvîçra dinivîse, ku çekdarên Hesen axê bi her teherî dixwezin amintya xwe ya himberî Rûsa bidine kivşê, bi mîrânî şer dikin, ji berî teva xwe davêjin li nav agirê şêr. (Binhêr Navnîşana serkanyan; Pêwendyêr Kurdên êzdi di dewleta Rûsra: Çevkanî 4.)

Derheqa êla Hesinya û malmezina Hesinya da (Wê demê se-rekeşîr Temir axa bûye) melûmetîyê hewaskar nivîsara Fon-

Gakstgauzen e “Zakavkazskii kray” (Qeza Pişkavkazê) da hene. Sala 1843 a tevî X.Abovyan û Nayêm, dema rêuwyta xwe, dibine mîvanê obeke kurdên êzdi. “ Mezûrvanê me,- ew dinivise,- ji êla Hesinya bû, meznê wana Teman axa (Temir axa )bû. ( Ordîxanê Celîl; Stirana derheqa Hesen Axê da, Malper Êzdixan. Com. 21.06. 2005.)

Ji pey Temir Axê ra lawê wî Hesen Axa dibe serokê êlê. Bi gotina gotîya Hesen Axa zilamekî xurt û pir bi aqil bûye. Şerê Rûs-Tırka da bi mîrxwesî û amintîya xwe ya himber Rûsa va berbiçev dikeve. Hêjâyî çîn-nîşanên dewleta Rûs dibe.

Zanyarê ermenî, prof Yêxyazarov, ku bi xebatê xwe yên derheqa Êzdiyan da naskirîye, derheqa Hesen axê da salixyên hewaskar ji pey xwe hîşte. ( Dîsa wî cî.)

Wê demê prof. Yêxyazarov diçe nav êla Hesinya ku melûmetya komke ji bo nivîsara pirtûka xwe derheqa Êzdiyan da. Ji mera eyane ku alimên Êzdiyan derheqa bawarya êzdiyî da biyanya ra tişt nedigotin û ulmê êzdiyî veşartî xweyî dikirin û nivîsandin jî pir guneh hesab dikirin. Hesen axa bi hewaskarî berbirî nîta pirofesörê Ermenî dibe û alîkaryê didê ji bo komkirina salixyan. Ew gazî alimên êlê yên here zane dike, û ji wan ra dibêje, ku alî zanyar bikin. Alim jî nikarin gotina serekeşîr derkevin.

“ Pîr Hesen, kîjan Hesen axê teglîf kiribû ku minra derheqa wê olê da gilîke, ji pey kerayîke dirêj bi pirseke wa deylî min kir: “Zanebûna ulmê me çî terane? Em jî wek kal-bavêñ xwe Xwedê dihebînin. Xwedê ji bo her kesî yeke. Bira her evdek ebûbeta xwe wek xwe pêk bîne, çawa kitêba wîye pîroz da nivîsare.”.

“Derheqa ayîna dînê we da gelek tiştîn bêfikir dibêjin,-min cawa wî da,- ez dixwezim rastyê bizanbim”. “Mêvanê me eslî e’sîre, tu tiştî venâşêre, wê temamya rastyê bêje”- Hesen axa kete nav axaftinê. “ Eger usane, binivîse. Ezê tera rastyê bêjim,

lê bi wî qewlî, wekî tu jî xelkê ra usa bêjî çawa ku min tera gotye. Tu soz didî?..”

Hesen axa merivekî pêşverû bûye. Ew dispêre Yêxîazarov ku pirogramê çêke seva mekteba ji bo zarokên êzdî. Ewî pir dixwest mekteba zaroka ra bide vekirin. Û wekî êzdî zarokên xwe bişînin mektebê, xwendinê ew lawê xwe: Üsiv beg dişîne xwendexana ermenî ya dêra Êçmîazînê..

Ji bo mîrxwesî û efatya wî şerê dîjî Tirka da, li ku wî serkarî alaya kurda dikir, ji alyê dewleta Rûs da hêjayî çîn û ordênenê bilind dibe. Ordêna Anna buhurtî (Svyatoy Annî) ya dereca sisya û Stanîslavê buhurtî (Svyatoy Stanîslav) dîsa ya dereca sisya didne. Ji bo wan rewa jêra aylixê kivş dîkin (176 rûb). Ev dirav wê demê bi qîmetê xwe mezin bû.

Ev rewa gelek mafêن tebyetî jî didinê. Ew kare tevî bijartinê hukumata dewleta Rûs bibe....

Bi salixa kalên êla Hesinya sala 1896 a wî teglîfî cem padşê Rûsa dîkin. Axa hazir dibe here bajarê Tilbîsê û wêra jî Pêtêrbûrgê. Lê ji çevreşyê axêن hinek êlên Kurdan jerê didinê û di-mire.

Helbet teglîkirneke usa ji alyê hukumdarê dewleteke mezinê usa çawa Rûsyâ bû karibû roleke dîrokî ne tenê seva Kurdên êzdî lê temamya gelê Kurd bilîsta.

Di derheqa vê malbeta desthîletdar da nivîskar Wezîrê Eşo wa dinivîse: “Temir Axa kurê Hesen Axa bûye, derheqa kîjanî da A.S.Pûşkîn (nivîskarê Rûsa, yê dinêe'yan.E.B.) nivîsiye. Wekîlê wê malê ber dîwana padşê Úrisêtê (Rûsyâ) da bi helalî qulix kirine, timê xwe li dewleta Úris girtine. Ewana sîyarêن xwe va tevî hemû şerê ûris-tirkaye sedsalya 19-an bûne, bona kîjanê ordêñ-mêdalê dewletê pêşîra wan xistine û usa jî navê sereskeryê dane wan. Ewana kivş kirine çawa serkarê hemû Ezdiyêن Kavkazê û ev qulixa bilind heta kutasyê jî destê vê malê da bûye. Êla Hesen Axa û Temir Axa li çiyayê Sînekê


bûye, wê ra gotine êla Hesinya. Ew li nav goveka qeza Surmel-yê da bûye. Pey Temir Axê ra serkarî ketye destê Hesen Axê (navê kalkê wî lê kirine), kîjan Axê êlêyî herî hizkirî bûye, bi saya xeyset, terbê xweyî maqûlî, bi saya fikirêن xweye pirogirê-sîv. Ewî gelekî xwestîye, wekî kurdê Êzdî hînbin, kîjan wî zemanî fikireke bi culet bû, miqabilî tirêqê Êzdîya, yê ku xwendin bona Êzdîxanê tiştekî gune hesab dikirin. Pey Hesen Axê re serkarya êlê û temamya Kurdê Kavkazê yê Ezdî dikeve destê kurê wî: Ûsiv Begê.”

“Hesen Axa ewî dide ber xwendinê çêmarana ( xwendin-xwena) dêra Eçmîadzinê da. Du fikirdarê ermenya yê here mezin: X.Abovyan û Komîtas hevaltî bi ewlwdên wê malê ra kirie, bûne dost: Abovyan dostê Temir Axê bûye, lê Komîtas hevalâ Üsiv Begêyî çêmaranê. Wextê şerê hemdinyayê yê pêşin êla Üsiv Begê xwe li Ermenyê bira girt û welgerya hat deşta Araratê, li kîderê heta roja îroyîn dimîne, bo birêن xwe yê kurde mayîn ra bûye xweyê emirê aza û bextewar Yekîtya sovyêtê da.” ( Kurd. Êzdî.Hazir kir,ji ermenî tercime kir, pêşxeber nivîsi Wezîrê Eşo.Yêrêvan-1986.rû 34.)

Dibêjin Hesen axa gelekî aqil û xurt pêra jî rem û merivhiz bûye. Ji bo mîrxasî û efatya wî şerê dijî tirka da, ku wî serokatyâ alaya şervanên Kurd dikir ji alyê hukumdayra Rûsyayê va bi ordêma (Sivyatoy Anna) dereca III û ordêna (Sivyatoy Stanislav) dereca III tê rewakirin.

Der-dorêن xêrnexwez, çevreşyê lê dikin, jerê didinê, bêwext, dimire: Üsiv begê hela zar dewsa bavê rûdinê. Kilamê da wa tê gotin:

*Bê axayo nabe, de nabe,  
Lo maqûlo nabe, de nabe,  
Bê êla Hesinya girane, Üsiv zare,  
Sal-zeman girane, bê te nabe.*



Üsiv Beg serokê êlê û Begê vê malbeta qedîmî yê dewyê bû. (Hukumata Sovyêtê dewî hemû desthilatdaryên usa anî). Navê Üsiv Beg va gelek bûyarên hêja girêdayî ne. Ne ku tenê êla Hesinya lê temamya Kurdên (Êzdi û Musulman) Sovyêta berê navê wî bi hizkirin bîr tînin. Temamya êlê jêra gotine KEKO. Ewî gelek ewledêن gelê Ermenya yê bi nav û deng ra hevaltî kirye. Evdekî dewra xweyî herî xwendî û pêşketî bûye. Bi alîkarya wî, hunermendê Ermenyan yê herî mezin Komîtas, wê dewrê da gelek kilamên kurdî ji zarê dengbêjan nivîsiye û çap kirye. Ewropayê da doktorya xwe li ser dengbêjî û sazbendiya Kurdî xweyî kirye.

Navbera wî û torina mala Kosa jî pir xweş bûye. Serdewatî û kirîvê hev bûne. Bi pêşdanîna Hesen Axê bavê wî, paşê jî wî sê gundêن Kurdên Êzdi da, salêن 1900-1904-a mektebêن zimanê Rûsî yê kîsî dewletê vedikin:

Gundê Zorê li navça Surmeliyê.

Gundê Qundesazê li navça Elegezê, Axbaranê.

Gundê Bacelûyê li qeza Qersê.

Salê 1915-1920-î bi serokatîya Ûsiv Begê, Êzdi şerê dijî Tirkan da gelekî alî Ermenîya dîkin. Beg tê bijartîn çawa endemê Parlamenta dewleta Ermenyan ya ewlin û wezîrê hukumata wê dewletê.

Ji pey serketina Şorişa Oktobirê li Rûsyayê, leşkerên Rûs ji Kavkazê dikşin, diçin. Surmelî dikeve destê Tirkan. Sala 1918-an ev êla dîsa ji cî û warêñ xwe dişihitin, çemê Erez derbaz dîbin diravne berbi Yêrêvanê. Belayî deşta Araratê dîbin. Ji dest xelayê, nexweşyan gelek qir dîbin. Sala 1920-î xwe ra gundê Şamîramê yê vala ava dîkin.

Usiv Beg sala 1934-a diçe rema xwedê.

Ev êla niha pir mezin bûye û ewledên wê niha temamya welaştên Sovyêtyê yê berê da bela bûne. Peyhatiyê mala Axê niha ji xwe Axa dihesibînin û li gundê Şamîramê da dijin. Ji pey hil-weisîna dewleta Sovyêtê ra jî Şamîran gundekî Ermenistaneyî herî mezin û şene.

## KILAMA BAVÊ ÛSIV

*Axa, qurba malê me danîne  
Li zozanê Eslanlûya xopan  
De lê lê lê lê li beleyka,  
Wey lo mîro, malê me danîne  
Li zozanê Eslanlûya xopan  
De lê lê lê lê li beleyka,*

*De Xezal Xanimê korê, ne mayê  
Rabe porê serê xwe kurke,  
Temaşike li qeyd û zincîrê,  
De lê lê lê van girtya,  
De, dibê feleka bavê Ûsiv, sîyarê Kewê*

*Di nav hezar hevsid malên Hesinya da welgerya...*

*Bê Axao nabe, de nabe,  
Lo maqûlo nabe, de nabe,  
Bê êla Hesinya girane, Úsiv zare,  
Sal-zeman xirabe, bê te nabe...*

*Axao, qurba malê me danîne,  
Li zozanê Eslanlûya xopan  
De lê lê lê li berî golê,  
Wey la mîro, şênyê me danîne  
Li zozanê Eslanlûya xopan,  
De lê lê lê berî golê,*

*De xwezila xêra mala Xwedê ra  
Cawekêbihata, bigotina:  
De bavê Úsiv, sîyarê Kewê, nexweşê mirinê  
Ne gotina: Vê sibê berê wî dane  
Kambaxa wê Stembolê...*

*Bê Axao nabe, de nabe,  
Lo Maqûlo nabe, de nabe,  
Bê êla Hesinya girane, Úsiv zare  
Sal-zeman xirabe, bê te nabe.*

*Axa qurba, malê me danîne  
Li zozanê Eslanlûya xopan,  
De lê lê lê li vî çiyayî,  
De wey lo Mîro, malê me danîne  
Li zozanê Eslanlûya xopan,  
De lê lê lê li vî çiyayî.*

*Hela binhêr, di ser me da girtîye ewre,  
De lê lê lê lê nabe sayî,  
De xwezila xêra mala xwedê ra,  
Mizgînîkê bihata, bigotina:  
De bavê Ûsiv, sîyarê Kewê vege riya  
Nava koma bira-pismama xêr û şayî...*

*Bê Axao nabe, de nabe,  
Lo Maqûlo nabe, lo nabe,  
Bê êla Hesinya girane, Ûsiv zare,  
Sal-zeman xirabe, bê te nabe.  
( Ji sitirana Reşîdê Baso; Radîoya Yêrêvanê.)*

## ÊLA ZUQURYA

Berbang bû. Koma sîyara, şiverya quntara çiyê ra hevraz dibûn. Pêşyê sîyarê hespê kumeyt dimeşa. Ew gêncekî qemerî, bedewî, bi çek-rihalê serekeşîryê bû. Mirov hewas dikir sîyar, hespê bin, xemla wî mîzekira. Kom pir nî bûn, heft-heyst sîyar bûn.

Nişkêva, ji alyê gêlîî din, dengê çeka û hêwarza mirovan hat. Xortekî cilê qelişî lê ji newalê derket û berbi wan bezya.

-Gund da şere. Cerdevana avîtine li ser gndê me, talan dibin.

-Çawa?-sîyara ecêvmayî li xort nêhêrîn,-ne îro cinyazê lawê H.Beg tesmîlî axê dikin. Em hatine hewaryê.

-Erê,-xort bi e'cele got û li wan nesekinî, berbi alyê gêliyî din bezî,-cerdevana kerê pezê bavê min dane li ber xwe , dibin. Çika ci anîne serê bavê min?

Sîyaran çevê hev nêhêrîn, lawê H.Begê êla Takorîya wefat bûbû. Siar diçûne hewaryê.

-Cerdevan nêzîkin. Serokên wan wê li serê topin. Haj xwe hebin,-xort dûrva li sîyara kire gazî û li nava zinara da unda bû.

Sîyarê hespê kumeyt berê hespê xwe guhest û komê, mîna bayê bobelîskê li pey sîyar ber bi alyê xort nîşan dabû çûn. Derketine li ser hêsyâ pişt gund. Li ser gîrê pêşber serokê cerdevana, du hevalê xwe va sekînî bûn. Navbera wan da newal bû. Pişta cerdevana wan da, dûrva sipartin didane sîyarên hevalên xwe yên heywanê xelqê ji guhera derdixistin, dajotin...

Sîyarê gênc cerdevan nas kirin. Tahar Xan û koma wî bûn. Çend meh pêşda bû. Serokê qeza Bêrkiryê: Cewze padşa, meznê eşîrên Kurdan, yê wê heremê, tev teglîfi merkeza qezayê: Sera Mexîna kiribû. Elamî wan kir, ku ji derê jorê (ji Sultan) qirar hatîye, gotî ji kurdan komê hemîdyê bêne demezirandin.

Got, ku dewleta Osmanyê ber tu tiştî nanihêre, wê her alîkaryê bide wan, her mecalê wan ra sazke, tek ew wan alaya zû çêkin. Wê çeka bide, ji xerc-xeraca aza bike, serokê rewa, çin û nîşana Osmanyê bistînin.

Serekeşîra tê derxistin, ku demezirandina alayên usa hema seva eşîrên Kurdan qezyane mezinin. Kurdên sîlihkirî ra wê mecalê vebe heyf û xûnê xweye kevn û nû ji hev hildin. Eşîr û malbetên bikevin pêşîra hev. Xûnê mîna çema bikşe. Tifaq û aramya heremê wê biteribe. Ewê nikaribin ew dostanî û pi-smamîya li nav eşîra da çêbûyî xweyî kin. Rojên giran ji bo gel û xeiqêne ne musliman dest pê dibûn. Gelên, ku qezayê da mîna bira bi edil dijîtin wê rabin dijî hev. Ermenî, Aşûrî û Îzdîyê dest pîya herin.

Meznîn eşîran Cewze paşa ra gotin, ku wext bide wan, ew giregirê êlên xwe bişêwirin û paşê bersîva wî bidin.

Cewze paşa xeysetê Serekeşîrên Kurdan rind zanibû, ku serokeşîr xwe qirarê didin. Ew bersîva axa-bega danê ewî çawa înkarkirina daxweza dewletê qebûl kir. Bi hêrs û kîn got:

-EZ dixwezim hûn wan alaya demezirînin û serokatyê lê bikin, yan na mirov hene, lava dikin, lingê min paç dikin.

Rastî jî dema ji cem Cewze paşê derketin, komên Kurda li hewşê da sekinî bûn. Li nav wan da koma Tahar xan jî hebû. Ew birazîyê Axê êla H.bû. Çend sal bû dijminatyâ Axayê apê xwe dikir. Wî û apê hevra xeber nedidan. Xiravyê û qacaxçityê va mijûl bû.

Ü ewê, ku cerd-talan, dzyê, qaçaxçityê va mijûl bûn, mîrkuj bûn, ji alyê dewletê va piştgirtin, çek, hukum standibûn, dora xwe mirovên gorî xwe civandibûn, li ser serê evdê wê heremê bûbûne bela. Davîtine li ser gunda, pez-dewarê xelqê dajotin, xwe ra dibirin, xelq talan dikirin, jin direvandin, kê wan xweş nedhat dikuştin. Navbera wan û xizmên wan da seva doşeka serokeşîriyê şerekî ne elamkirî dicû. Dewletê piştgiryâ wan

dikir. Wê rojê êla Takorîya bûbû hedefa wî serokekî alaya hemîdyê: Tahar xan, kîjanî ra digotin Mîr Penc. Xan li nav qezayê da bûbû şûrê qetil û xûnê. Navbera wî û Begê Takorya da we-xtekê xiravî çê bûbû. Xan bihîstibû, ku lawê Beg mirye, êl li nav şînê dane, rikana va, nişkêva li ser gundê wî da gitibû. Dixwest talanê Beg bive, nehêla Beg cinyazê miryê xwe hilde, Beg li nav êl û eşîra da nuxsan ke, heyfa xwe hilde. Cewze paşa jî Begê Takorya hiz ne dikir. Xanê bû, ku tilya paşê jî li nev cerda wê rojê da hebû.

-Tahar xan, Tahar xan, were bê xûn ji vir here. Bihêle bira Beg cinyazê lawê xwe hilde. Ev kira tu îro dikî mîranî nîne.

Xan paş da zivirî, sîyar nas kirin:

-Hey Cangoyê lawê Xetîv, ez serê Şîxadîkê te kim, ji pey Takorîya ra dora teye. Îcar laşê Xetîvê bavê teyê bin pîyê hespê min da bipelçiqe,-Xan got û demança ber xwe ra derxist ,rastî sîyara kir...

-De emê niha binhêrin, laşê bavê kêtî, bikeve bin pîyê kê,-sîyarê gênc got û mecal neda Xan. Qırçîna demança wî ra demança Xan ji dêst pekyâ û Xanê birîndar nixirî erdê. Sîyara hevra gule reşandine koma Xan û hicûm kirin. Hevalê Xan, serokê xweyî birîndar li wur ketî bêxweyî hîştin, xwe avitîne ser piştîn hespên xwe, revyan.

Sîyarê me ketine pey cerdevana. Qerebalix kete li nav cerdevana û gund... Dema cerdevana derheqa ketina serokê xwe da bihîstin, revîn . Talan û heywanê xelqê vgerandin. Heta nîvro her tişt edilî, seqirî... Laşê Xanî bêxweyî wê palê ma.

Begê Takorya enya pismamê xweyî gênc ramûsa:

-Şîrê te li te helal be, birazyâ. Ez bêyî mala Xetîv Axê nemim. Te navê mala Takorîya xilaz kir. Hesavkin îro lawê min nemirye.

Usa dest bi efseneya Changîr Axê, axayê êla Zuqurya, yê dewî, Changîr axayê Êzdi bû...

\*\*\*

Changîr Axa sala 1874-a li gundê Çibûxlîyê, qeza Bêrgiryê, wîlayêta Wanê ji dîya xwe bûye. Bavê wî: Xetiv Axa wê here-mê da serokeşîrekî pir zengîn û bi nav deng bûye. Derheqa zêr, milk û mal, hebûna wî da, heta niha jî, li nava Êzdîyên Ermenistanê da tiştê ecêv gilî dikin. Axa evdekkî aqil, edil û dûreşer bûye. Ewî dema xwe da êl dûrî şer-dewa û qezya xweyî kirye. Navbera wî, axa-begê eşîrê, zengîn û serokên Ermenya, Aşûrya pir xweş bûye. Saya hebûna pir, xeysetê milahîm, maqûltiyê, teva qedirê wî zanibûye, pê şêwirîne, ew xwe ra çawa mirovekî mezin, şîretkar, rîspî hesibandine. Dibêjin deynê wî li ser teva hebû. Wî tucar selef ji kesî nedistand. Êl û êşîrên wan der dora, teva ji wî nan dikirîn.

Wê qezayê da 5 gundê Kurdên êzdi hebûn: Çibûxlî, Heselû, Welecanî, Şemsedîn û Selîm Beg. Gund mezin bûne.

Mala Axê li Çibûxlyê bûye. Gelek malên Êzdîyê wê êlê jî li gundêndi Kurdên musulman, Ermenya û Aşûrya da jîtine.

Sala 1985-a kurapekî Changîr Axê, Evdoyê Miho, ku wê demê nêzkaya 90 salî bû, li gundê Hemzelûyê, nehya Masîsê, Ermenistanê da dima, min ra wa gilî kir: „Min ji pêşya bi-hîstîye, digotin kal-bavê me ji alyê Dîyarbekirê, Cizîrê hatine. Wê demê Êzdi li wur pir bûne. Wextekê şer çê dibe. Dewleta Osmanyê û Musulmanî davêjine ser Êzdîyan. Fermanê li Êzdîyan radikin. Ela meye Zuqurya jî tê qirê, yê mayîn jî, cî û warê kal bavan dihêlin, direvine li ser hidûdên Ecem, nêzkaya gola Wanê. Li wê deverê jî Êzdi hebûne. Navbera elâ me û malmezina Êzdîyê wur-mala Simê Çeto da mirovatî hebûye. Ewil direvine gundê Simê Çeto, paşê xwera ew gundê jorgotî ava dikin, dikevnê.“

Malmezina zuqurya mala Bişar bûye. Bişar mîrekî mîrxasî xurt bûye. Ew kalkê Xetiv Axayî helale. Bişar tevî çend hevalên

xwe ji dewleta Osmanyê direvne Îranê. Hukumata Şahê Îranê wana digirin û bi xwestina Osmanya darda dikan.

Bi texmîna Evdoyê Mihê, ew yek navbera salên 1820-1830 qewimye. Dibe şerê Erenzê yan yê dema Şêx Mîrza, yan jî pevçûneke din da ew êl revyane.

Ji pay Bişar ra lawê wî Cango pêşikêşya êla Zuqurya dike. Ew alyê Tirka va tevî şerê dijî Rûsa dibe. Bi mîrxwesya xwe berbiçev dikeve. Navê midûryê didinê, jêra dibêjin Midûr Axa. Ji Midûr Axa da jî dest bi axatya wê malê dibe.

Nav û dengê Midûr axayê Êzdî demeke kin da li nav leşkerên tirk û êlên Kurdan da bela dibe. Saya wî tifaq û yekîti li nav axa begên wê herêmê yê Kurd da xurt dibe. Altindatya wî şerî dikeve ser navê Kurdan. Ew yekîti û tifaqa Kurdan ji seroketya wîalêtê û sereklekşkerya Tirka xweş nayên. Gazî 15-20 zilamên Kurda yê tevî wî şerî bûbûn dikan, giva çîn û ritmên leşkeryê bidine wan. Midûr Axa jî nav wan da bûye. Dema nanxwerinê, bi nemamtî jerê dikine nav xwerina Midûr, dikujin. Dixwezin wê qetilê bikine ustîyê wan zilamên Kurd, ku dijmînatyê bikine navbera êlên kurdan. Lê Kurd nêta wan rind tê derdixin û ji nakokyên navxweyî dûr dimînin.

Ji pey Midûr Axê ra, lawê wîyî mezin Xetîv axa radibe. Mezinên Kurdên wê heremê seva xatirê bavê, gelekî qedrê Xetîv axê digrin û alîkarya wî dikan.

Rîspîya gîlî dikirin, ku berî Xetiv Axê halê Êzdîyê wî warî yê aborî tim xirav bûye, timê li nav destengîyê û hejaryê da bûne. Ew srekeşîrê êla xwe yê ewlin bû, ku pey çek-sîlih, şerdewa neçû.

Merivekî edil bû, dûreşer, guhdarya xwe dida li ser milk û mal. Rind zimanê xwelyê zanibû. Karê xwe li tev neyarê xwe jî bi edlayî derbaz dikir. Dinhîrî eşîrê Kurda guh nadine bêcerkirina xwelyê, çandinyê ,zivîstana tim dikevn halê nangiranyê, birçîbûnê.

Zevîke wî ya mezin hebûye. Li nav eşirêñ Kurda da gili-gutin bela dibin giva Xetîv Axa wur da xizneke zêra ya mezin dîtye. Loma jî demeke kin da usa zengîn bûye. Lê rastî ewe, seva avdana wê zevyê bendavekê çê dike. Avê berfhelê û kanya wê bendavê da top dike û havînê zevyê pê av dide. Sala ewlin ekinekî ecêv pir ji zevyê tê. Wê sale qulixayî bûye. Dibe nangiranî, xelayî. Bahê nêñ pir giran dibe. Xetîv Axa nanê xwe yekê bi deha difroşê, kareke pir mezin distîne, Pêra jî emrê bi hezara evdan ji xelayê xilaz dike, qencîya wî dikeve li ser axa, begê eşîrê, gelê heremê yê feqîr. Di nava çend sala da dibe zengînê wilayêta Wanê, yê herî dewlemend.

\*\*\*

Gili dikin, ku Xetîv axayî pir tima bûye, lê ku sirê hatîye, ew hebûn xwe daye ji bo xweyîkirina xîret-tifaqa kurdeyatîyê û xweyîkirina dînê êzdîyatîyê. Gor bîranîna, di dema wî da tifaqa eşirêñ wê heremê xurt bûye. Mîna malekê bûne. Ew tifaq û yekîti serokya heremê ya osmanyê xweş nehatye. Xwestine agirê cudetya dîn tev rakin, aramya nava êlên Kurdan da biteribînin, Kurdêñ musulman û êzdî rakin dijî hev. Fermanê li Êzdîya radikin. Dixwezin êşîrêñ Kurdêñ musulman jî bikşînin nav wê dewa qirêj. Gazî axa-begêñ êşîrê û giregirêñ Êzdîyan dikin, wê cawê didin wan.

Vê carê seva xatirê Xetîv axê bûye, yan ji bo tifaq û yekîtiya gel axa-begê êşîrê, dîndarêñ kurd nakevne li nav wê listika di-jmin. Ne qencîyê xeber didin, ne xiravyê. Êzdî û serokatyâ Wî-yalêtê disekekinin dijî hev. Hukumdarê heremê culet nake bi destê zorê, qirkirnê, Êzdîyan mecbûrî qulibandinê bikin, ditirsin Kur-dê musulman rabin pişta Êzdîyan. Ezdiya ra dibêjin giva Mîrê Şêxa tev Êzdîyêñ Lalişê û Şengalê qulibîne û bang li hemû Ê-zdîyan kirine biquilibin, Musulmanyê hildin. Êzdî bawar nakin

Serok dibêjin, eger hûn bawar nakin, sê mîra li nav xwe da kivşkin, emê kîsî dewletê wan bişînin cem Mîrê Şêxa, bira herin, bi çevê xwe bivînin, bi guhê xwe bibihîn, bêñ we ra bêjin. Êzdî sê mîrê serwext dibijêrin, dişînin. Nîvê rê da, li bajarê Sîvazê, wana digrin. Yek destê cenderma derdikeve direve, herdê din davêjine hebsê.

Dibêjne wan: „Yan hûnê musliman bin, vegerin, Êzdîyan bixapînin, yan emê we bikujin. Bi gotina gotya yek rû va musliman dibe, lê yê din: Pîr Hacî, dikin, nakin xwestina wan qebûl nake, musliman nabe. Go, şûr avîtine stûyê wî, serî ji cendek qetya bû, hele, hela wî bû, digot: “Hole, hola Sultan Êzdîyê sore...“

Ewê ji dest cenderma revya bûye hewarê dibe Êzdîyê Sengalê, evan têñ, laşê Pîr ji dîwanê distînin, dîbin cem xwe, goristana Êzdîyan da tesmîlî axê dikin.

Yê rûva muslimanî qebûl kiribye jî vedigere mala xwe. Ra-stîyê Êzdîyan ra dibêje, lê lawê wî bin hukumê Êzdîyan da, jerê dikine nav çayê, didine bavê xwe, dukujin.

Di wê navberê da Xetîv axa li mala xwe da rehet rûnanê. Li Wanê xêrxweza divîne. Rîya mala Welîyê qezayê li ber xwe dide vekirin. Radibe diçe mala Welî. Go. Axê zimanê tirkî rind zanibye. Go lawê Welî 4-5 salî bû. Zarokê dide li ser çoka xwe, jêra mijûl dibe. Fînøyê serê kurik hildide û ha lawik ra laqîrdîya dike, lê hiz dike, ha zêra dike fino. Usa heta fino tijt zêr dibe. Welî, pîreka xwe va ecêvmayî Axayê êzdî dinhêrin. Pîreka Welî dibêje Welîyê mîrê xwe: “Ji vir ha da Xetîv axa birayê mine. Gerekê qedrê Axê nekevî, xizmeta wî bikî...“

Go, li nava Zuqurya da şîn û girî bû. Hîvyê bûne çika kengê leşkerê Osmanyê wê bavêje li ser gundêñ wan, xelqê bibirin, qırkin. Gava ew cwamêrê rêva bi rûva qulibî bû, vedigere, her tiştî bi rastî Êzdîyan ra gîlî dike, lawê wî bavê xwe jerdadayî dikin, dikujin, Êzdî êdî gumana xwe dibirin.

Lê hema goristanê da, dema cînyazê ewê qulibî tesmîlî axê dîkin, qirara Welî çawa mizgînî, ji Wanê tê, ku dewleta Osman-ye li Êzdiyan hatye remê. Ferman betal kirine.

Şayî dikeve li nav xelqê...

Heta naha jî Êzdiyê wê êlê dibêjin: "Xetîv axê dîn bi zêra kîrî..."

\*\*\*

Şeş lawê Xetîv axê hebûne: Têmûr axa, Changîr axa, Reşîd axa, Huznî axa, Sihîd axa, Nûrî axa. Hê zarotyê da, li nava zarakên Axê da Changîr bi culet, hunur û zîrekya xwe berbiçev dikeve. Wê heremê da sîyar û nîşandarê şivêta wî tune bûne. Go,tirs, xof nizan bû. Zulm û zordestî, neheqî, koletî temûl nedikir. Xeyset va safî bû, derew nzanbû, rastgo bû, helal û rem bû. Şevêن zivistanê yê dirêj, dîwana bavê xwe da li nava çiro-kbêj û rîsipyêñ êlê da rûdinişt, ji wan derheqa mîrxwesî û qehremania kal-bavan da dibîhist, dixwest mîna wan be. Hevalhiz bû. Go, hevalen wî pir bûn, lê dijmin jî kêm nîbûn.

Rojên dijwar dihatin. Xetîv axayê rîspî texmîn dikir, ku he-wldanên dewletêye nû, li nava Kurda da demezirandina alayên Hemîdiye, qencîyê xwe ra naynin, wê jîyana êl-eşîran li hev xe, serekeşîrên dostê wîyê nikaribin tifaq û aramya nava herêmê xweyîkin. Halê Êzdiya wê xirav be. Difikirî, ku kulmeke zor pêwîste, ku êla wî ji wê zulmê biparêze. Ji bo mezinayê li êlê bike, li nav lawên xwe da hişê wî Changîr dibire.

Bîranîna da tê gotin, ku Xetîv axa êdî bethal nexwêş bû, li ber mirinê, bi destê Şekir Efendîyê Tirkî katibê xwe, 46 hezar zêr, bêhesab mal û milk tesmîlî lawê xwe: Changîr axê dike û temîyê wa didê: "Lawo, ez tê derdixim, ku rojne giran hîvya Êzdiya ne. Hebûn pire. Li ber nenihêre. Malê dinê qirêja destane. Çek-sîliha, hespa bikire, sîyarêñ xweye çekdar hazırke. Êla xwe pê xweyîke..."

Pey mirina bavê ra ( bi texmîna şedê wan bûyara, Xetîv Axa li navbera salê 1904-1906-a da çûye ser dilovanya xwe) Changîr axa diçe bajarê Wanê bi destê Ermenya ji nav dewleta Rûs çeka dide kirin û anîn. Kerî pez dişine bajarê Helebê, difroşin, ji wura hespê baş dikirin, tînin. Wê demê wî karibye 300-350 sîyarê rind sîlikirî, yê xurt derxe meydana şer.

Demezirandina alayên Hemîdyê yekîtî û tifaqa beglikên Kurdan wêran dike. Eşîr li hev dikevin. Kes kesî nas nake. Hukum ji destê serekeşîrên berê dertê. Qaçax, cerdevan û serhişk bi piştgirtn û hêlandayîna hukumdarên Osmanyê dibine xweyê çek, qewat, hukum û îradê. Şûrê wan çep-rast dibire.

Eşîreke li rex Êzdîyan, eşîra cînare dost, eşîra Cifer beg, ku berê ew û Êzdî mîna malekê bûn, hevra bira û tifaq bûn, xwe ser hev didane kuştin, hev dikeve. Dutîretî dikev nav xelqê. Berayê Begî biçûk: K.beg, wekî doşeka mezinatyâ êlê ji birayê xwe bistîne, dibe serokê alayîke Hemîdyan, kîna xwe dikute hin birê xwe, him jî Êzdîyan. Hema wê demê lawê Cefer beg ji xwendina bajarê Stembolê vedigere. K. beg li bajarê Wanê rastî birazyê xwe tê. Birazî haj nakokyên li nav êlê da nîbiye. Ap birazî dibe ku tev xwerinê buxun. Wura, çaxê xwerinê ap jerê dide lawê birê xwe û dikuje. Bav, dema cawa mirina lawê xwe dibihî, dilê wî diteqe, ew jî dimire. Îl dibe du para. Pîreka Cefer .beg û tiyê xwe dikevne pêşîra hev, du-sê sala xelqê wê êlê dibin dû para û hev qir dikln, koka hev tînin.

Zîyanike pir giran digîhîje Sedûn begê Dirbas Xanê Şemsikî û H.begê Takorî. Sadûn beg êla xwe va derbazî Iranê dibe. Van herd bega jî xwe ser Êzdîya dikuştin.

Alayên Hemîdyê dibin bela serê xelqên ne Musulman. Dem û qewimandin zû têñ guhestin. Changîr axa tê derdixe, ku li wur mayîn êdî Êzdîya ra dest nade. Pêşyê difikire êla xwe derbazî Iranê ke, lê paşê serwext dibe, ku Iran jî Êzdîya ra rîya xilazbû-nê nîne, berê xwe dide dewleta Rûs. Komên Ermenya yê sîyasî

û çekdar ra dibe nas, rastî serokêن wane naskirî tê. Hela sala 1904-a li gundê Ermenya yê Hezeranê rastî serokekî heja Ermenya ya azadaryê, yê bi nav û deng Andiranîk paşa tê. Wê demê Axa dergîstî bûye. Paşê Ermenî hazirya xwe elam dike, bive serdewatîyê Axê.

Ji wê demê da navbera wan herdu qerehmanêñ efseneyî da dostanîke bê qelpî û helal çê dibe.

Paşê ew dostanî û pismamtîa wan li nava êgir ra derbaz bû, li nav dew û dozen xûnrej da hate cêribandin û heta dewyê jî tu xumamê xwe navîte ser wê helalyê û biratyê.

Changîr axa wan sala pêwendîyan tev leşkerên Rûs jî çê dike. Timê qasida dişine cem wan û hazirya xwe ya alikaryê û amintiyê wan ra elam dike. Wekî amintî û bawarya wan qazancke, birayê xwe Reşit axê dizîva dişine, ku li nav leşkerê Rûs da qulixke.

Gilî dikan, ku Reşit axa bi mîranî û qehremanya xwe ji Changîr axê danedixist. Sala 1912-a, şerekî da tê kuştin.

\*\*\*

Nîvê şevê bû. Ji qalmeqalm û hêwarzê Changîr axa hisyar bû. Tê derxist, ku hicûmî li ser gund kirine.

Almasta pîreka wî jî êdî li ser pîya bû. Go Almast xatun him pir beew bû, him jî jineke jêhatye mîranî bû. Zarok digiryan. Axa cilê xwe zû avîte li ser milê xwe, da tivingê. Mala Axê ji derva va didane li ber gula. Bû xuşîna şûşê cema pencerê oda, ku Axa û Almast xatûn lê bûn, ji fişekêñ demançan şikestin, hûr xweş bûn, pekyane li nav odê. Mecal nedidan ne nêzîkî pencerê bin, ne jî derkekevin li derva. Dihate xanê, ku mala wî dorpeç kiribûn. "Nobedar kune? Çima elamî min nekirine,-Axa fikirî." Ew êdî demeke dirêj bû, ku Êzdîyan şev-roj gundê. xwe bi nobedarîyê diparastin.

-Cango, dora te hatye girtin, dewya te hatye, tesmîl be! Yan na emê gund wêran kin, te, mala te, te zarokên te va bişeyînin.

Axa dengê serokekî cerdbaşyêñ hemîdî: Xalit beg nas kir, lê tê negîhişt deng kî alî da hat.

-Tu tesmîl be, em destê xwe nadine gund, neferê te,-ew deng dubare bû.

-Çeka agir nekin, ezê cilê xwe xwekim, derkevîm, tesmîl bim,-ji hundur Axê cawa wî da.

-Çeka agir nekin, bira Axa işev ji kincê xwe xweke,-Xalit beg bi qerf û ken gote hevalêñ xwe...Dengê kenê wan bilind hat.

Axa êdî zanibû deng ji kî alî tê. Fesal nêzîkî pencerê bû, terya şevê da alyê deng nêhêrî. Li nav şevereşê, dûrva çend reş dihatin xanê. Bi destâ jin da femkirinê, ku ew jî nêzîkî pencerê bibe. Nişkêva ji tivingêñ Axê û Xatûna pîrka wî agir li ser ewê li nav şevereşê da dihatine xanê barîn... Bû qerebalix û qûje-qûja wan. Axê tê derxist, ku gîhîstine meremê xwe.

-Almast lêxe, em mecalê nedine wan li ser xweda bêñ.

Agir-alav bû herda li ser meznîn cerdevana da dibarandin.

Ser heta berbangê kişand. Berbangê, bêyî bigîhîjne tu encamî, talançîya laşê kuşfiyê xwe wê navê hîştin, revyan. Eyan bû, ku tevî alaya Hemîdîyan usan jî leşkerêñ Osmanyê yê qedîmî hicûmî li ser gundê Axê kirine. Nobedar hatibûn kuştin. Ji Êzdîyan 9-10 kuştî û birîndar hebûn, nav wan da kal-pîr û zarok jî hebûn. Kuştî ji Hemîdîyan û leşkera jî hindik nî bûn. Li nav laşan da laşê serokê alaya Hemîdîye Xalit Beg û zapitekî ordîya Osmanyê yê ritim bilind jî hebûn.

Gundîya nîşanên Begî Hemîdîye û çîn û nîşanê zapit, û kumê zapit yê Osmanyê hev va dirûtin, li serê rîya gund darekê va darda kirin, ku çûyî-hatî, tuyî li ser wan kin û carke din kes qesta talan û qirkirina Êzdîyan neke.

Sibetirê, serokeşîrên cînar: Sedûbn begê Şemsikî, Huseyn begê Takorî, Necîfe begê Muqîrî, Cefer begê Şêwî siarêne xwe va têne hewara Êzdîyan.

Heçar serekeşîr siyarêne xwe va pêşya Changîr axê û siyarê wî dikevin, diçine Sera Mexîna li wur serokê mexîna (Aşûrya) jî xwera hildidin û tev diçin cem Meznê qezayê: Cewze paşayê.osmanî şikyat.

Paşa qet naxweze şikyatê wan bibihî, bi ten dey li Changîr axê dike:

-Cango, ew tu xweyê xwe û çend serya yî, ku mezinekî Hemîdyê, qehermanekî qeza me û zapitekî dewleta Osmanyê biku-jî?

Axa bi culet cawa wî dide:

-Wan şev ser gundê me da girtin, wan xwestin gund gişkî qırkin, neferê me bikujin. Me jî xwe parast... Û bira paşa jî bizarne, sibê jî yên qesta gundêne Êzdîyan,talan û kuştinan bikin, sax venagerin. Her kes lawê bavê xwe ye.

Paşa gazî zapita dike, ku Axê bigrin. Axa demença xwe derdixe, ku xwe xweyîke. Heçar serekeşîr û serokê Aşûrya redibin pişta Changîr axê.

-Usane hûn xîreta Êzdîya dikşînin, we dîndijminatî bîra kirye? Hûn kafîra xweyî dikan?-paşa dey li wan dike,-êdî hûn ci Musulmain...

-Em eşîrin, kurê bavê hevin. Eşîr bavê eşîrê ye. Îro jî emê xîreta lawê Xetîv axê bikşînin, sibê jî, serê me û êlê me wê oxirê da ne.

Paşa dinhîre, ku dora quesra wî, komên siyarêne kurdaye sîlikî hîzir sekinîne, eger Axê Êzdî bigire, şerekî giranê li wura çêbe, dibe ew jî nikaribe serê xwe xilaz bike, ji xwesteka xwe paşda vedikse û bi rûvîtî wan ra dibêje:

-Vê carê ez didime xatirê we...

Ji pey wê bûyarê ra hukumata qezayê kîna xwe dikutine Êzdiyan. Qewatên beglikên cînar jî dişkên. Li nav wan da ewqas dijminatî, neyartî, nakokî çê dibin, ku hal li wan da namîne, nikarîn alîkarya Êzdiyan bikin, heremê da yekîtî û tifaqa berê xweyî kin. Sêwrê didine Changîr axê, ku êla xwe birevîne yan Îranê, yan Rûsyayê, heta dinya diedile...

Wî dema lihevketî ya aloz birayê Axê-Têmûr nexweş bûye, diçe ber rema Xwedê. Axa-begên eşirê, Ermenî, Aşûrî, Êzdiyêñ qeza Çuxuryê têne hewaryê. Hemîdyan û Cewze paşa jî pê dihesin. Dixwezin Changîr axê nuxsan bikin, navê wî li nav wê heremê da bavêjin, ji bo wê demê navê Changîr axê pir bilind bûbû. Leşkerêñ Osmanyê û Hemîdyan pir ji çekdarê wî ditir-syan.

Cinyazê birê digîhîne goristanê, ku veşerin, Hemîdî dora wan digirin. Dixwezin meyt ji wan bistînin. Axa, mecbûr cinya-zê birê hîvya hazira dihêle, Kafir Hirço (navê hespê wî) sîyar dibe, mîrxwesê xwe dide pey xwe, Hemîdya ra dikevne şêr. Şêr da çend mîrê Hemîdîyan têne kuştin, yê din jî dihêlin, direvin.

Vedigere, meytê birayê xwe tesmîlî axê dike û Êzdiyan ra dibêje:

-Êdî ev der me ra dest nade, barki em herin.

\*\*\*

Êla Zuqurya bar dike têñ qeza Çuxuryê. Wê demê li wura heyşt gundê Êzdiyan hebûn: Dêrcemedâ mezîn, Dêrcemedâ biçûk, Ûtê, Remqûle, Tûtek, Taçkastan, Yarim Ça, Qeleca. Malmezina wan mala Simê Çeto bûye.

Rîspîyê ji êla Simê Çeto, ku niha (sala 1989 an ez wan ra rûniştime) Ermenistanê da dijîn min ra gilî kirin, ku êla wan digîhîje mala Kok axa..

Gilî dikirin, go wextekê tek li deşta Ebexê da (ev herem dikeve hidûdê Îranê û Osmayê) 366 gundêñ Êzdiya hebûne. Kela

mala Kok axa ya kevirî hebûye. Êzdi him pir bûne, hm jî xurt bûne. Navbera wan û Sultanê Osmanyê xweş bûye. Osmanyê ew hesb kirine dergekî pola navbera xwe û Îranê da.

Wextekî yekî Musulman keçekte mala axê, (navê wê Zerîf xatûn bûye) direvînin. Seva wê di navbea Êzdiyan û Musulmanan da şerekî pir giranî xûnrêj diqewime. Ew şer heta niha jî li nava Êzdiyên Ermenistanê da tê gotin, û navkirin „Şerê Zerîf Xatûnê...“ Şerê ji bo revandina jinê dibe şerê seva dîn. Ji heçar alya Musulman radibin, li hev dicivin û têne li ser Êzdiyên wê êlê. Wura qira Êzdiya tê. Gelek, ji tırsa diqlibin, hinek direvne Îranê. Mala Kok axa jî direve Iranê. Dewleta Îranê jî li wan dixe, yê têñ kuştin, ewê mayîn jî direvine Ermenistanê, dewleta Rûs. Berpala çiyayê Elegezê, gundê Mîrekê yê vala didine wan... Ji wê êla rengîn ancax 30-40 meriv xilaz dibil. Gundê Mîrekê dikeve bakûrê çiyayê Elegezê, gundekî pir xweşî û bedewe. Heta niha ji peyhâtiyê wê malê wî gundî da hene. Xwe ra dibêjin qebîla Mehemedîya.

Dema şerê „Zerîf Xatûnê“ çend gndêñ wê êlê, bi serokatyâ Çeto derbazî Îranê dibil. Çeto jî mîrekî culefî xurt bûye. Ji pey demekê ra, dema ew şerê birakujuyê êdî dewî lê hatîbî, navbera Çeto û giregiê herema ew jê revya bûn dîsa xweş dibe, ji Îranê vedigerin, gundêñ jor gotî şen dikin. Pey Çeto ra lawê wî Simo serokatyê Êzdiyên herema xwe dike.

Simo evdeki pir aqil bûye. Pênc lawê wî hebûne: Xişam, Tefür, Cimşid, İdat û Emer. Gilî dikin, ku lawê Simo tev jî xwendî bûne û zapitya dewletê kirine. Gişka jî karne pir kîrhatî kirine ji bo tifaqa êl û eşîrên wê heremê û xweyîkirina Êzdiyâtya xwe. Qedirê wê malbetê li nav êşîrên heremê da mezin bûye.

Pey Simo ra Tefür axa dewsâ bavê digire. Changîr axa him zevê wê malê bûye, him xwerziyê wan. Dayka wî, jine Xetîv

axê, ya mezin: Gulî, keça mala Simê Çeto bûye. Almasta pîreka Changîr axê jî keça Tefür axê, yan nebya Simê Çeto bûye.

Mala Changîr axê gundê Dêrcemeda Mezin da cî dabin. Xelqê din jî li nava gundên Êzdîya da bela dabin.

Êla Changîr axa Zuqurî bûne, Mendika, Mendesora, Berava. Qeza Çuxuryê da jî ev berekê Êzdîya hebûne: Reşa, Bûdka, Mendika, Kurtika, Desinya, Divana, Mameresa, Çuxresa, Reefa, Mendesora, Qazana..

Pîrê wan Omerxana bûne, şêxê wan jî Şemsanî bûne.

Mêrên Çuxurê jî tevî çekdarên Axê dabin, hesavê siyarê wî zêde dibe. Nivîskarê Kurdî eyan Ahmedê Mîrazî jî diçe digihîje Changîr axê. Him katibê Axê bûye, him dengbêjê wî.

Li vira Axa tevgirêdanê xwe tev leşkerên Rûs û serokên Ermenya xurt dike, dîsa pismamîa xwe tev axa-begên eşîrê berdewam dike. Lê alayên hemîdîya, tevî çend beglikên wê heremê yê talançî, bi piştgirtina leşker û hukumdarên Osmanyê rehetyê nadine xelqên Êzdî, li ser gunda da digrin, talan dabin, mîra dikujin.

Vira dîsa rastî qehremaê Ermenyan Andiranîk paşa tê. Andiranîk topekê pêşkêşî alaya wî dike.

Topçî jî Tatosê Ermenî bûye, hevalê Axê yê zarotyê, lawê dostê wan.

Çend alayên Hemîdîyan, bi piştgiryâ leşkerên ordîya Osmanyê û hinek eşîrên Kurdan hicûmî li ser gundên Êzdîyên wê heremê dikan, dixwezin dewyê wê qewatê bînin û talanê wan xwe ra bivin. Ew şer eyane û tê navkirin : ŞERÊ DÊRCEME-DÊ. Hêzên Ermenya yê çekdar têne hewara Êdîyan. Dibe şerê mirin-jîyînê. Siyarê Axê yê cêribandî bi mîranî şer dikan. Di-jmin bi sosretî meydana şer dihêle direve. Gilî dikan, dibêjin Changîr axa timê li pêşyê bû, dibêñ gîva gule lê nediketin. Kafîr Hirço binda mîna teyra difîrya. Tîrsa wî ketibû li ser dijmin, gava navê wî dibîhistin, bê hemdî xwe radibûn, direvyan.

Nav û dengê Axê ji pey şerê Dêrcemedê ra mezintir bû... Kîlama li ser şerê Dêrcemedê heta niha jî li nava Êzdiyêr Ermenistanê da tê gotin.

Êzdî tê derdixin, ku dewleta Osmanyê berê şûrê xwe daye wan, musulmanî jî rakirye dijî wan, hazır dibin qira wan jî tevî Ermenya bînin, dîsa rîya revê didine ber xwe...

\*\*\*

Axlêve bû, rojeke şilî-şilope, berf û baren tev dibaryan, derdora şepê berfê bûn, avêne berfhelê dikişyan. Heryê û çamûrê davîte çokê mîriv. Sureke şile sar bû, ba dihat. Cilê şil canê mîriv va dizeliqîn. Karwanê hêşîrê Ermenyan û Êzdiyan rîya nava çîya ra dikşya. Hore-hora şivan-gavana bû, kerê pêz û garanên dêwêr dajotin. Erebê ga yê barkirî li pey hev ketibûn rîzê, dikşyan, ga, hesp, kerê barkirî jî pey ereba dimesyan. Li ser bara jîn, zar, kal, pîr, nexweş, berx û golikê virnik jî hebûn. Yêney peya diçûn jî yan zarok hemêz kiribûn, yan jî tiştek dabûne pişta xwe. Karwan mezin û dirêj bû. Ji wan bawarkî 15-20 hezar Êzdî bûn. Changîr axa sîyarênen xwe va, li dora karwan diçûndihatîn, alî xelqê westyayî dikirinû, erebênen diketin heryê lê dicivyan derdixistin, hêlan didane xelqê, ku bîlezînin.

Gîhîştine devê gelikî. Rê pala gîlîra dikişya. Rêke zirav bû. Mecala hatin-çûyînê kêm bû. Gotin ew gelyê Zîla ye. Ba gîlî ne digirt, telde bû. Hewa xeiqê xwîş dihat. Pêşya karvan ketibû gîlî, lê dewî hela dûr bû. Nîşkêva leşkerê Osmanyê û sîyarênen axayêne wê heremê li ser karvan da girtin.

Bû qerebalix û hêwarza xelqê li hev ketin. Rîya şerkirinê tûne bû. Xelq diketine dest-pîyê hev, birîndar dibûn, dihatin kuştin. Agir bû li ser xelqê belengaz da dibarya. Laşê kuşriya diketin ser hev, nale-nala birîndara bû. Zarok bêxweyî digiryan. Changîr axa li pêşya karvan diçû. Erebê, ku hebûn, zar û neferê wî barkirî bûn, li pey karvan dihatin. Ketibû cîkî hasê, mecal

tune bû xwe hema neferê xwe ra bigîhanda. Sîyarê wî jî tev ji hev bela bûbûn, neferên xwe va mijûl bûn. Kes hîvya hucûm-kirneke usa ya nişkêva nî bû.

Cengo, te digot kes min nikare, wele ezê iro talanê te bivim, sibê jî dora serê teye. Ez gerekê serê te jêkim û bivime Stembole.

Axê ew deng nas kir. Dengê Q.axayê wê heremê bû. Ew demek bû wî mecal Êzdîya birî bû. Changîr axê kir-nekir nikaribû jêra ziman bidîta.

Ser pir nekişand. Çekdarêñ Êzdîya û komên Ermenya li ber dijmiê pir teyax nekirin, vekşyane gêlî. Pez, dewar, erebe û heywanê barkirî, destê dijmin da man. Caw dane Changîr axê, ku Q. axê talanê wî, ga û erekê wî, heta pîrekê wî jî ji xwe ra birin. Axê da lingê hespê, ewî jî tê dernexist, çawa, li nava qeya zinarêñ hasê ra xwe gîhande kelê gêlî.

Xortekî Ermenî, navê wî Mîsak bûye, dinhêre Changîr axa tenê dajo pêşa eskrê giran, ew jî xwe digîhîne Axê. Herd xwe davêjne ber zinara û pêşya talan û talançîyan digirin. Êmekê şer dikan. Ew dudu, yê dijî wan pir, fişekê wan jî kêm.

Mîsak dibêje: „Axa, ew pirin, fişekê me xilaz bûne. Emê bêne kuştin. Ci bûye, bûye, were em vejerin.“

Axa dibê: „Lawo, cenima malê dinê. Ez ber malê dinê na-kevim. Ez ber serê xwe jî nakevim. Ew namûsa min dibin. Namûs nayê kirîn. Li vê rê da mirin heye paşda çûyîn tune. Yan ezê namûsa xwe ji wan bistînim, yan bêm kuştin.

Fişekê Axê xilaz dibin. Çar fişek cem Mîsak dimînin. Xortê ermenîşîr helal fişekê xwe dide Axê û dibêje: „Ez bêm kuştin, tişt nake, lê tu bêyî kuştin, wê bêjin Changîr axa hatye kuştin, xelqê bêguman be, dijminê devxûn be, qira hêşîrê meyê bê...“

Mîsak tê kuştin. Axa tenê dimîne. Bi sê fişeka sê leşkerê Osmanyê birîndar dike. Dinhêre birek sîyar berbi wî dajon.

Pêşyê sîyarekî leşkerê Osmanyeyî ritim bilind bûye. Bi fişeka dewyê Axa nîşana enya wî digire.

-Emrê xwe da, cara ewlin min nîşanê nexist,-Axa paşê bîr tîne, - kuştina wî xortê Ermenî yê şîrhalal pir li ser min hukum kiribû. Fşeka min dewsa enya sîyar keve, enya hespê ket. Sîyar û hesp tev nixirîn erdê. Sîyara hesp hîştin serokê xwe hildan û revîn.

Ereba jî tevî talên dajon, dibin. Axa , destevala dixweze xwe ereba ra bigîhîne, lê parava dengê pîreka xweye mezin: Almast xatûnê dibîhî. Dinhêre herd pîrekê wî û xûşka wî, xwe ji erebê avitîne, li nav zinarê nêzîkî wî da xwe veşartine.

Axa meytê Mîsak hildide, tev hersê pîreka, li nav zinara ra peyayî gêlî dibin.

Alayê Hemîdiyê û leşkerê Osmanyê dora gêlî digirin, na-hêlin kes ji gêlî derê. Hêşîr dikine şikefta, yê dstê wan dar digre, xwe davêjine ber zinarêna hasê û deh roja şerê mirin-jîyanê di-meşînin.

Hêşîr dikeve halê giran. Nan, xwerin, çek, cil, şewat, pez, dewar gişk talançîya biribûn. Xwerin xilaz dibe, fişek xilaz dibin, şewat tune. Nikarin hewarê leşkerê Rûs û çekdarê êrmenya jî daxin. Dijmin wê yekê tê derdixe, dixweze usa koka wan bînin .Go rojê bi seda evd dimirin, mecal tune bû cinyaz tesmîlî axê kirana.

Dinhêrin çare nemaye, hêşîrê dest wan da tev qirbe, çend zilamê xurt ji gêlî dertê, dixwezin nişkêva lêxin, dorpêça dijmin biqelêşin, hewarê çekdarê Ermenya û leşkerê Rûsa daxin. Navê wan mîrxasa ev bûne: Mihoyê Qaso, Egîte Sadiq, Reşîte Sadiq, Dedoyê Zuqurî, Morofê Ecem, Bavoyê Kirtikî û Tatosê Ermenî. (Çend Ermenyê din jî li nav komê da hebûne, navê wan hatye bîrkirin).

Navbera wan û leşkerên Osmanyê û Hemîdyan da şerekî berk dibe. Bavo tê kuştin. Yê din birîndar dobin, tek Mihoyê

Qaso dimîne. Ew jî dikeve cîkî hasê, şer dike, nahêle dijmin nêzîkî birîndara bin. Komek fidayê Ermenya wur ra derbaz dibin. Li wan dihisin. Caw digîhîje Andiranîk paşa. Evan tev leşkerê Rûsa têñ hewarê. Berî Hemîdyan û Osmanyan didin.

Gelyê Zîla bû goristana bi hezara evdên Ermenî û Êzdîyêñ bê sûc û gune...

\*\*\*

Êla halketî, talankirî xwe digîhîne Qersê, diçine nav Êzdîyêñ wura. Êla Sîpkan. Dikevne gundêñ Ûlîkendê, Soxtulyê û çend gundêñ valaye din. Zilamêñ Êzdîyêñ Qersê yê mîrxwes jî li dora xweşmîrê xweyî hizkirî dicivin. Hesavê sîyarê wî mezin dibe. Rastî serokêñ Ermenyan, serleşkerêñ Rûsan tê. Di gel Andiranîk paşa diçine gundê Eslanlûyê li navçeya Surmelyê mîvanya meznê temamya Kurdêñ Êzdî yêñ Rûsyayê Ûsiv begê Hesen Axa. Tifaqa xwe çê dikin, ku tev dijî Osmanyan şerkin û xelkêñ xwe biparêzin.

Wê demê qezyake biçûk da lingê Changîr axê dişkê. Çend meha dikeve nivînê. Êla wî ya ku gelyê Zîla da talan kiribûn dikeve halê aborîyî pir xirav, nava birçîbûn û xelayê. Halê Êzdîyê wura jî xweş nî bye. Xelayî, nexweşî derê Êzdîyan digirin. Ji pey cebirandina ling ra, Axa dinhêre xelqê wî wê ji xelayê qir bin, weke 50 sîyarî dide ser xwe û şevekê berê xwe dide wî Axayê eşirê, yê gelyê Zîla da talanê Êla wî biribû.

Ew Axa direve. Changîr axa jî dest nade neferê wî, lê mal, hebûn, pez, dewar, hesp, heta guhdirêjê wî jî tup dike, tîne, xelqê êlê bela dike.

Di demeke kin da dengê Axê li nav Êzdî û Ermenyê wê hemê da jî bela dibe. Heta ji Êzdîyêñ gundêñ berpala çiyayê Elegezê jî, ku rîya rojekê-duda jî wan dûr bûn, têñ, teví çekdarê wî dibin. Derheqa mîrxwesya wî da dengbêj kilama dihûnin.

Sîyarê wî, sîyarê Ûsiv begê ra tevayî, tev leşkerên Rûs û çekdarên Ermenyan şerê li ser kela Qersê û Sarîqamîşê da dijî Osmanyan mîranya nîbînayî dikin. Di derheqa mîranya Îzdîyan, ya wî şerî da Ermenya jî pir nîvîsyê.

Ji bo hunur, culet, şureta serlekeryê, mîrxwesiyê Changîr axa hêjayî rewa dewleta Rûsa ya here bilind dibe.

-Xeysetê Axê bû, Kafîr Hirço sîyar, li nava şerê gur da pêşya sîyara be, bi culet xwe bavêje li nav agirê herî gur,-çekdarên wî bîr tanîn,-em jî li pey wî diçûn, û cîyê lapî dijwar da jî altindarî ya me bû. Gule ji wî ditirsyan, gule lê nediketin

Tê bêjî felekê berê xwe ji Îzdîyan guhesti bû, wan ra nediketanya, rojêن xirav pey hev dihatin.

Şorişa karkir û gundiyyêن Rûs, sala 1917-an Împératorya Rûs jî ser û binî hev kir. Textê pasêyî (qaysîrî) dewrana hilweşya. Welat kete devê anarxiya, bêqanûnyê, şer û dêwa. Leşkerê Rûs ew herem terk kirin, kişyan, çûn welatê xwe.

Leşkerê Osmanyê ra dîsa mecal çê bû, bikevne wan şen û gundan, karê xweyî reş bikin. Xelqê heremê û leşkerê Osmanyê rû bi rû man. Sala 1918-an hêzêن Tirkân, tevî alayê hemîdêyan Qers zevt kirin, û bi leşkerên giran çar alya va ber bi Alêksandîrapolê (Gumurî), Serderabadê, Qerekilîsê û Baş Aparanê meşyan. Li ser rîya xwe qetil û zulm dikirin, gund talan dikirin, dişewitandin, mîr hêşîr digirtin, dişandine, kûraya wlatê xwe. Kîna wan û hemîdyan li ser Îzdîyan pirtir bû.

Îzdî jî tev hêşîrê Ermenyan gund û werê xwe terk dikirin, direvyan ku xwe bavêjine alyê Erezî din. Gilî dikin, ku wan rojan, li rûyê ava çemê Erez, bi laşen hêşîrê Ermenya û Îzdîya usa girtibû, ku av nedihate xanê. Dê ewledê xwe davît. Bira hewara biê nedîçû. Şûrê Roma reş çep-rast dibirî. Mal û hebûna xelqê gişk talan kirin, birin. Nakokyên dema şer da navbera kurdêن Musulman û Îzdîya da çêbûyî, halê Îzdîyan xiravtir kiribûn.

Pareke hêşîrê Ermenya û Êzdîyan ji Îdirê, di pira Qereqelê ra, bi alîkarya siyâren Ghangîr axê û Ûsiv begê derbazî alyê Erezî din bûn û bi topa Tatosê Ermenî, ku Andiranîk paşê, sal berê pêşkêşî Axê kiribû, wê pira li ser çemê Erez diteqînin. Wê heremê da ew pira ya tek tenê bû ku herd qeraxê çêm digîhande hev. Pirê diteqînin, ku tirk nikaebin wur ra qewatên xwe bigîhîne hev û alîkarye bidine leşkerê xwe yê wî qeraxê çêm.

Alayê Osmanyê jî alyê çemî din, li ber gundê Serderabê qewatê xwe gîhandibûn hev, dixwestin mecalâ hicûmkirinê bidîtana, ku carekê va ceperên qewatên çekdarê Ermenyan bîqelaştana û biketana bajarê Yêrêvanê.

Axa, qewatên Êzdîya va ça digîhîje wur, dinhêre çekdarê Ermenyan betal sekinîne. Dipirse: „Ev ci hewale, çima şer na-kin?“ Dibêjin: „Hukum tune. Serokiyê hê qirar nedaye!“ Axa xeysetê leşkerê Osmanyê û alyê wanî qels zanibû. Zanibû ku ew şevê şevereş nikarin şerkin. Sibe çawa hat ewê hicûm kin. Qewata wan pire, Ermenî dijwar karibin, pêşya wî leşkerê giran bigire.

Gumana wî li ser sîyarê wî hebûye. Çekdarê wî teva zanibûne şerê mirin-jîyînê ye, hêşîrê wan kete destê Osmanyan û Hemîdyan yek jê xilaz nabe. Bêy qirara qumandarya Ermenyan, Axa bi 300-350 sîyara va, wê şeva şevereş bi baran, nişkêva hicûmî li ser leşkerê dijminî giran dike. Dijmin nişkêva tê. Ji tîrsê çarçev dibin. Kes kesî nas nake, li hev asê dibin, hev qir dîkin. Wê şevê qira leşkerê Tîrkan tê, paşda direvin.

Niha li dewsa gundê Serderabê bajare. Dema Sovêtê jêra di-gotin Hoktêmbêryan. Ji bo bîranîna şerê Sardarabadê wura Mûzêyûm çê kirine. Navê wê: „Mûzêya şerê Serderabadê“ ye. Hema li sivdera ewlin da, ça mirov dikeve hundur, sûretekî mezin dîwarê pêjber va darda ye. Sûret yê Changîr axê û sîyarê wîne.



Leşkerê Osmanyê li ber Serderabê bi sosretî dişkên, lê ji mëremê xwe paşda venakşin. Armanca wan bû li ser Ermenistanê ra bigîhîjne bajarê Bekûyê, bivine xweyê wî wrê niftê (pêtrolê) yê dewlemend. Vê carê alyê Gumuryê-Alêksandirapolê ra êrîş dîkin, ku Baş-Aparanê va bikevne Yêrêvanê. Gundêñ Êzdîyan, yê berpala çiyayê Elegezê jî li ser wê rê ne. Qewatêñ Ermenya li ber êrîşen tîrkan teyax nakin. Leşkerêñ Tirk û Alayêñ hemîdîyan bê asteng têñ dikevne gundêñ Êzdîyan yê berpala çiyayê Elegezê. Êzdî bi nan û xwê derdikevin pêşya wan... Lê nan û xêya Êzdîyan bi xûna qasidêñ ew nan xwê bir bûn, sor dibe. Êzdîyan ku, devedevî qurnek berê, ji werêñ kal û bavêñ xwe, ji ber zulma wan revya bûne wura, dîsa rû bi rû ber neyarê berê disekinin. Gundîyan çend gundan, neferê xwe ji wur direvînin. Lê ji gundêñ din xelq nareve. Hêsîrêñ Êzdîyan yê ji gundêñ Qersê revyayî jî tevî xelqê cî dikevin destê zulmkarêñ „Roma reş“.

Leşkerên Tirkân û alayên Hemîdiya qewatêñ xwe gundêñ Êzdîyan da dicivînin, ku pêşda hukum kin. Çekdarêñ Ermenyan li navbera gundê Êzdîyayî Mîrekê û gundê Ermenya: Aparanê pêşya wan dibirin.

Şedê wan rojan bi saw bûyaran bîr tînîn.

Axlêve bûye. Li Elegezê jî axlêve dirêje, bi şilî û şilope, surserma, berf û barane. Go mirov kî alî dinhêrî li nav berf û heriyê da laşê evda bûn. Dijmin ber tu tişti nedinhêrî, zar, jin, kal, pîr tev davîtine devê şûr, namûsa xelqê ra dilîstîn. Mal û hebûna xelqê, erebêñ wan bar dikirin û berê wan didane kûraya Tirkîyayê. Bi seda mîrê wan gundan, bi erebêñ wan hebûna xelkê bar dikirin û berê wan didane kûraya Tirkîyayê. Ji wan kes venegerya. Ci hate serê wan ne eyane.

Tek ji gundê Camûşvana mezin (Elegeza niha) 60-70 mîr şevekê da serjê kirin. Newala navbera gundêñ Camûşvana biçûk û Pampa Kurdan bû goristana bi sedan mîrêñ Êzdîyan.

Kîna wan berbi Êzdîyan ewqas mezin bû, ku heta, kevir û kumeytêñ li ser goran jî şikêñandin, xirav kirin.

Niha li nav gundê Qundesazê ( Rîya Teze ) goristana kevne. Mirov kare li wur bivîne, ku Êzdîyêñ Serhedê sedsalêñ derbaz-bûyî da li ser gorê mirya ci çêkirine. Li ser mîrêñ navdar, kivş, rêvabir kumeyt çê kirine, li ser sîyara, mîrê mîrxas: hesp, ser kevanya, dergûşa: bêşik çê kirine. Leşkerêñ Romê hesp şkêñandîne, kumeyt xirav kirine, hilşandîne. Ew goristana gundê Qundesazê bûye bîranîna wan rojêñ zulm û qan.

Cawa wê qetlemê digîhîje Changîr axê jî. Wê demê hesavê sîyarê wî digîhîje 1500-î. Ji altindarya Serderebê ruhdarbûyî Axa berê çekdarê xwe dide Baş Aparanê, Elegezê. Di nav sîyarê wî da usan jî gelek Êzdîyêñ ji wan gundê Elegezê hebûn. Ew li wan deran rind beled bûne û li rîya kese ra, li ser girêñ Qezneferê ra dikevne gundê Ermenya Tanegermesê. Eva gunda li ber pêşenya şêr da bû.

Rast gotî, komên Êzdîyêñ wura jî, dema zulm û zora eskerê Romê dîtibûn, ew jî rabûbûn tevî hêzên Ermenya bûbûn û dijî Osmanyan ketibûn nav şêr. Bi serokya mérêñ wê êlê yê xurt Êmerîkê Şûmo, Celîlê Nado, Mehmedê Nado û hinekêñ din, komên mîna partîzana hatibûn çê kirin, şevê li ser dijmin da digirtin, ziyana mezin didanê. Osmanyêñ, ku bi hêsanî gîhîstibûn gundêñ Êzdîyan, li ber qewatêñ nee'yan sekînî bûn. Qewatêñ Ermenya jî bi serokatyâ Dro\* li navbera gundêñ Mîrekê û Aparanê pêşya wan girtibûn. Ermenî biçûk-mezin rabûbûn. Alyê Tirkava hildana gundê Baş- Aparanê Ermenya ra halê tunekirinê bû.

Qumandartîya Tirka, ku rind haj qewata Changîr axa hebûn, gava dibihîn derheqa hatina Axê da tirs û xof dikeve dilê wan, texmîn dikan, ku wê wura jî bidine der, dixwezin Dro bixapînin, şer bisekinînin heta qewatêñ mezine nû têñ digîhîjne wan. Qasidê xwe bi beyraqêñ spî dişînine cem Diro.

Wê demê li bajarê Batimê navbera Tirka û Ermenya da hevraxeberdanê li hev hatinê diçûn. Qasidê Tirkan Diro ra dibêjin, ku giva wan ji Batimê caw standîye herd alya hev kirine, hevra peymen qol kirine, pêwîstîya şêr û xûnrêtînê tune, (rastyê da tu lihevkirin tine bû). Diro wan ra qayîl dibe.

Ji gundêñ Êzdîyan cawê xirav digîhîjne Axê. Changîr axa û Diro radibine hev. Hinek çekdarêñ Ermenya radibin pişa Axê, Bêy hukumê Diro, nişkêva, hicûmî ser leşkerê Osmanyê dikan. Rev li dijmin dikeve. Çekêñ xweye giran, birîndarê xwe dihêlin, direvin.

Xelqê wan gundan bi şabûn mîrxwesê xwe qebûl dikan. Axa dinhêre hewa wur û qewlê jîyanê wek yê welatê wi Bêrkirye ne, xelqe êla xwe belayî wan gunda dike. Ew jî neferê xwe va li gundê Cercerîsê da cî dibe (niha wî gundî ra dibêjin Dêrik).

Dewleta Ermenya ya nû ava bûyî ji nakokyêñ der û hundir teyax nake. Bêtifaqî û dutîretî dikeve li nav serokatî û çekdarêñ

Ermenya. Komên talançî çê dlbin. Leşkerê Bolşevîkên Rûs jî bakûr va tê. Ermenistan dikeve halê aborî û sîyasîyî xirav. Gelek serok û çekdarêن Ermenya yê bi nav û deng ji Ermenista-nê direvin.

Şedê wan roja, lawê apê Axê Evdoyê Miho, ku wê demê piştîmîrê wî büye jî sala 1989-a wa min ra gilî kir: "Sala 1919 a em gundê Cercerîsê da cî bûbûn. Rojekê Axê gazî min kir got, ku em gerekê hazırbin, sibê zû, şev da emê herne bajarê Eçmîadzînê\*, Andiranîk paşê ew teglîfi bal xwe kirye." Neh-deh sîyara va em çûne wî bajarî. Andiranîk paşa, serok û keşeyên Ermenya yê mezin va, pêşya me da hatin. Axa gelekî rind qebûl kirin. Em li hewşa Dêrê da man. Pêşya Axê ketin, birine hundur. Hewşê da me ra nan, xwerin anîn. Axê ra qedirekî layîq kirin. Paşê Axa û Andiranîk paşa, demeke dirêj tek bûn axivîn. Deste cilê we demê yê here baş jî pêşkêş dane Axê. Em vegery-an. Rê da Axa medekirî bû, got, Andiranîk, çekdarêن xwe va dixwezin derbazî Tewrêzê bin, paşê jî wura herine yan weletekî Ewropayê, yan Emêrîkayê .Axê ra gotibû, werê em tev herin. Lê Axê gotibûyê tu cara ew êla xwe nahêle û tu cîyan da jî naçe."

Sala 1920-î Andieanîk paşa ji bajarê Nyû-Yorka Amêrîkayê katibê xwe yê berê Yêxîsê Kacnûnî ra nemê dinivîsyê, wur da fikireke wa hatye nivîsar: "Silavên germ Changîr axê û xezûrê wî ra. Wanra jî bêjin, ku ezê glekî kêrî wan bêm..." (Xezûr bi texmîna min gilî derheqa Ûsiv Begê da ne, ji bo keça kurapê Beg: Egît begê, Zadîne Xanm jîna Cangîr Axêye biçûk bû.E.B.).

Ew çi kêrhatine, ku Andiranîk paşayê kêri wan bê, gilî derheqa çi dane? Meva ne eyane.

Ermenistanê da qeydê Sovyêtê çê bûn, hukum kete destê karkir û gundiyan, piropandake tunekirinê dijî hukumdarêن berê

dest pê bû, ne,ku tenê Ermenistanê da lê temamya weletê Sovyêtê da dêr û mizgeft hildişyan, oldara newêribûn dîndarya xwe eyan kirana. Axa, beg, dewlemend wek dijiminê sinifê, gel dihatin hesibandin, gelek cîya hukum ketibû destê nezana, şil û zaha tev dişewitîn...

Lê hukumata Ermenistanê ya nû qedrê wî digirtin. Serokê Ermenistanê yê wê demê: Axasî Xancîyan bû. A. Xancîyan ji Wanê bû, lawê dostê Xetîv axê, zarotyê da Axasî û Changîr axê hev nas kiribûn, hevra hevaltî kiribûn, çûbûn malê hev, hatibûn. Gilî dikan, dibêjin Xancîyan kurmancî rind zanibû û gelekî qedîrê Kurdên Ermenistanê digirt, tu gundekî Kurda tinebûye, ku A.Xancîyan neçûbyê û alîkarya wan nekiribye.

Sala 1930-î, wekî bikaribe Ûsiv beg, Changîr axa û neferên wan ji neqencan, şikyat, şer û şiltaxên xêrnexwezan biparêze , bin navê sirgûnê da wan dişîne nehîke Ermenistanê, ya ber gola Sêvanê: Keverê (niha Kamo). Wan ra mecalên jîyanê yê baş hatibûn çêkirin. Pey çend sala ra ew dîsa vedigerin nava êlên xwe. Ûsiv beg diçe remetê.

Dibêjin kurmê darê ji darê nîbe zîyana darê tune. Sikyatêneheq û xêrnexazan dewî nabin.(Hîmlî ji Êzdîyan). Dest bi salên zulma Stalîn jî dixin. A.Xancîyan jî dibe şihîdekkî wê zulmê. Despêka sala 1938-an Changîr axê jî digrin, dixin, bê ser û berate unda dikan.

Sala 1959-an, çend sal ji pey mirina Stalîn ra, qewmên Axê ji dewleta Sovyêtê nemekê distînin. Nemê da nivîsare, ku tu sûcê Changîr axê tune bûye...

\*\*\*

Ew bûye efsene, bûye kilam, sond û duea dilê Kurdên Êzdî yên Rûsyayê da. Dijwar li nava wê civakê da mirvek hebe ku navê Changîr Axê nizanibe. Dijwar dewat, yan şayîk, yan şaynetîk bive, ku kilamên derheqa mîrxasya Changîr Axê da neyên

stran... Lê dîrok û rastî pir neheq bûne hindava wî da. Derhrqa mîranî, kar û barê wî da, li wê dewra tevliheve, aloz da, kirimê wî ji tunekirin, qir û birê xilazkirina Îzdiyan û gelê Ermenî da him alyê Ermenya da him jî alyê kurda da pir kêm hatîye nîvisar. Li nav civaka Kurda da jî ew nehatîye naskirin, û dîroka gelê xwe da jî nehatîye bîranîn. Eger dijî qewatêن hinek axabegêن eşîrê, yê libasê Hemîdyê xwe kiribûn, serê xelqêن bûbûn bela jî şer kirye, ew jî ji bo alyê wan da ji qirkirinê parastina kurdên Îzdî bûye.

Mexberê wî jî tune.

Çi jî hebe, heykelê herî mezin dilê gele. Navê wî, hizkirina wî, bîranîna wî dilê bi sedan hezara Kurdên Îzdiye Rûsyayê da dijî...

Eskerê BOYÎK, CHANGR AXA, bi zimanê ermenî, GIRAKAN TÊRT (Rojnema Edebî); N 9 (2361); 23-ê Sibatê, 1990.

### KILAMA CHANGÎR AXA –1

Lo lo lo lo lo bavo,  
Lo bavo şere,xweyo şere,şer girane,  
Changîr axa kela mîrane,  
Dîsa mîrê hewar û gazyane.

De lêxe kekê Fetla,de tu lêxe,  
Eskerê Roma reş girane,  
De berdê ji kela Wanê derxe.

Lo lo lo lo lo bavo,  
Lo bavo şerekê qewimîye Tewrêzê,  
Di devê vê Deleman, bonya rê da,

De Xweyo qanekê me qewimye  
Tewrêzê-Delîmanê binya rê da  
Andiranîk paşa xweşmêrane aza  
*Qayîşa maûzerê tev girêda,*  
Go: "Ezê di bextê we da me,  
Hûnê rabin, cawekê bidine Changîr axa,  
Bêjinê emê di bextê tedane,  
Tu di bextê Xwedê da,  
De rabe, nesekine, were,  
Hêsîrê me mane kela Wanê  
Bin berfê da."

*De lêxe kekê Fetla, de tu lêxe,  
Eskerê Roma reş girane,  
De berdê ji kela Wanê derxe.*

*Lo lo lo lo lo bavo,  
Lo bavo, dibê Fêrik paşa hate Wanê,  
Têlekê da bo Mûşê, Erzîcnê, Erzinganê  
Digo: "Mişîro, bextê te û Xwedê me,  
De rae çend topekan bişîne Wanê,  
De dibê hezar çarsid mîrê ce 'nfida derketye Rewanê,  
De tu werê lêxe bigelîne koka me temamyê.*

*De lêxê kekê Fetla, de tu lêxe,  
Eskerê Roma reş girane,  
De berdê ji kela Wanê derxe.*

*Lo lo lo lo lo bavo,  
Lo bavo şere, lo xweyo şere, şer girane,  
Şer girane, Changîr axa kela mîrane,  
Dîsa mîrê hewar û gazyane,*

*De lêxe kekê Fetla, de tu lêxe,  
Eskerê Roma reş girane,  
De berdê ji kela Wanê derxe....  
Ha hî hî hî...*

*( Ev kilama li Radyoya Yêrêvanê beşa axaftinê kurdi da  
dengbêj Şibilîyê Çaçan distirê).*

## *CHANGÍR AXA- II*

*Were lo bavo, lo bavo, lo bavo,  
Lo navo dilêm kobana sibêye,  
Lo xweyo dilêm kobana sibêye,  
Minê bala xwe dayê Changîr axa,  
Axayê êlê, kekê Fetla,  
De renga Remequlyana wêran da  
Kafir Hirçoki siyare, de kefeye bi ber baye  
Dewê da ketye berbi baye...*

*De tu berdê, kekê Fetla de tu berdê,  
Axayê êlê de tu berdê, qayışa maûzerê  
Berevke, bavêje zendê,  
De berî hezar hevsid mîrê hemîdyê de,  
Derbaske gelikêê Panosê,  
Derbaske ava Alîkendê.  
De derbaske ava Alîkendê,  
De bira bêbextê Romê  
Sere talanê Dêrcemedê  
Xulam û xizmetkare neşîne şerda...  
Lo lo bavo, lo lo bavo.*

*Were lo bavo,lo bavo,lo bavo,  
Bejna kekê Fetla zirave  
Mianî sipindara dev gelya,  
Lo xweyo,bejna mîrê min zirave,  
Minanî sipindara dev gelya,  
De dibê bihare,belekya berê xwe da çiya,  
De bihare belekya berê xwe da serê çiya,  
Changîr axa kire gazî,go:  
“Geli koma xweya û pismama,  
De rabin destê xwe bidine ser tetkê eynelûya,  
Hewar me tucar nayê,  
Hewara me maye Xwedê jorê,  
Dîsa Şemsê lo me Êzdîya.”*

*De tu berdê kekê Fetla,de tu berdê,  
Axayê êlê de tu berdê,qayîşa maûzerê,  
Berevke,bavêje zendê,  
De berî hezar hevsid mîrê Hemîdyê de  
De xarke girê Panosê,  
Derbaske ava Alîkendê.*

*Were lo bavo,lo bavo,lo bavo,  
Lo bavo sibeye,dilê min kîne-kîne,  
Lo xweyo sibeye,dilê min kîne-kîne,  
De dibê hewarekê ketibû nava Romê.  
Peya xwe peyê ra nagîhîne,  
De peya xwe peyê ra nagîhîne,  
Kamil Efendî kire gazî,go :  
«Kuro,lawo,minê we ra digot,  
Karê we bi talaê Êzdîya nîne,  
De karê we bi talanê Êzdîya nîne,  
De iro kubara sibê da,*

*Ser me da girtîye Changîr axa,  
Mîrê zirav,Xwedê zane ruhustîne.”*

*De tu berdê kekê Fetla,de tu berdê,  
Axayê êlê de tu berdê,qayîşa maûzerê  
Berevke,bavêje zendê,  
Berî hezar hevsid mîrê Hemîdyê de,  
De xarke gêdûka Panosê,  
Derbaske ava Alîkendê.*

*Were lo bavo,lo bavo,lo bavo,lo bavo,lo bavo  
Lo bavo meke,xweyo de tu meke,  
De tu li serê Şemsê xweke,  
Qasekê xwe di tetka maûzerê da egleke,  
Hetanî koma pismama,  
Hersê elekê navtenga hespê veke,  
Hersê elekê navtenga hespê veke  
Te go,kuro,lawo em tev bavêjine alyê malê,  
Gula barûdê fişeka lêkin ?  
Emê bajon pêşya bîmbâşyê Romê,  
De bira careke dinê qesta talanê Ézdiya nekin.*

*De tu berdê kekê Fetla,de tu berdê,  
Axayê êlê de tu berdê,qayîşa maûzerê  
Berevke,bavêje zendê,  
De berî hezar hevsid mîrê Hemîdyê de,  
De xarke gêdûka Panosê,  
Derbaske ava Alîkendê....*

*Ha hî, hî...*

## **ŞÊX MÎRZA YAN MÎRZIKÊ ZAZA . RASTÎYA DÎROKÊ**

Di destpêka sedsala 19-an da .Pişkavkaz (Gurcistan, Azerbeycan, Ermenistana rojava) kete li nav Împératoriya Rûsyayê. Hudûdên Rûsyayê nêzîkî Kurdistanê jî bûn. Nenihêrî wê yekê, ku Rûsyayê jî sîyaseta dagerkirinê û kolonalistîyê dimeşand, lê bi heqî, ji alyê kûltûrî, aboryê wusa jî di pirsên parastina hinek mafêن gelên bindest da pêş bû. Qirar û qanûnên wê ji yê dewleta Osmanyê û Îranê demokratiktir bûn.

Hela di nîvê sedsala derbazbûyî da hîmdarekî Markisîzmê: Firîdirîx Êngêls dinivise, ku Rûsyâ, bi heqî roleke pêşdaçûyînê li Rohilatê dilize.

Hîmdarê edebyeta Ermenya ya nû Xaçatûr Abovyan wê çaxê dinivise, ku du'a wê demê be, gava lingê Rûsayî bi rem li axa Ermenya ya pîroz ket, ew ji zulma Osmanyê û Ecema rizgar kirin.

Nêzîkbûna hidûdên Rûsyayê, di jîyana gelê kurd da jî roleke berbiçev lîst. Gelek êlên kurdan, xasna kurdên Êzdî bi serê Rûsyayê, xwe ra gumana rêya xilazbûnê didîtin.

Him zulma dewleta Osmanyê, him jî dîn dijminatyâ hinek axa, beg û dîndarên Kurdan, yên nezan û kevneperek jîyan li êlên kurdên Êzdî kiribûn doje. Êzdî welatên kal û bavêن xwe-Kurdistanê da, bê welat bûbûn, kî alî da direvyan ji wê qetil û antagonîzma olî xilaz nedibûn. Li dewleta Rûsa, kîderê seva dîn û hebandinê, kesî zordestî li kesî nedikir, fermanên kuştin, ta-

lankirin û qirkiriinê tune bûn, ew der bi rastî jî ji Êzdîyan ra xilazbûn bû.

Pelên dîrokê didine kivşê, ku hela nîvên qurna 18-an da hinêk eşîr û êlên Kurdan bi rîyêna cûda xwestine helaqetyêna dosstanîyê bi Rûsa ra çêkin. Di şerêna Rûs-Îranê yê salêna 1804-1813; 1826-1828 û usan jî şerê Rûs-Tirkan yê salêna 1828-1829 an hinêk êlên kurdan, ji wan usa jî Kurdenê êzdî piştgiryâ Rûsa kirine, li alyê Rûsa va dijî Osmanî û Eceman şer kirine.

Derheqa helaqetyêna Rûs-Kurdan yên wê dewrê da melûmetyêna giranbiha di xebatêna dîrokzan û Rohilatzañen eyan N. I. Avêryanov, V. K. Karsêv, N. N. Mûravyev, P. I. Lérx, V. F. Mînorskî, V. Nîkîtîn, V. A. Gardîyêvskî, M. C. Lazarêv, H. A. Xalfîn, Celîlê Celîl, Xalit Çetoyev û gelekêna din da hene.

Gerekê bê gotin, ku ev goveka dîrokê, boy safikirina gelek pirsgirêkên dîroka gelê me pir hewaskare û gelek lêkolînêna kûr û bi qîmet ji vî alî da hatine kirin.

Meremê min nîne bi kûrayî derheqa qewimandinêna wan salan da lêkolîna bikim, daxweza min ewe, ku rastîkê bikime li navâ belgekî dîroka wan dewrênu buhurî. Bi texmîna min lêkolînvan, ulmdar nivîskara, ew jî goveka Kurdenê Sovyêtîye berê da ŞAŞYEK çêkirine, ew şasya bê sûcê wan heta niha jî tê wekilandin.

Arşîva Gurcistanê ya dewletê, ya dîrokê da dokûmîntek (N 11 66) tê xweyîkirin, serecema kîjanê wa ye: „Daxweza mamostayê Ridiwanê Pêtrôs Xazarov-di navê da nema Mîrza Axayê Êzdî seva şandina dermanê çeva. “ Li ser wê dokûmîntê hatîye nivîsin: Destpêk 2-ê heyva Çileyê Paşin a sala 1831; axrî 30-ê heyva Çileyê Paşin sala 1831-ê. Wan da çar dokûmînt têne xweyîkirinê:

-Daxweza mamostayê bajarê Ridiwanê Pêtrôs Xazarov ji serleskerê ordîya Rûsa yê Kavkazeyî sereke, Gênerâl-

Fêldmarşal Koms Paskêvîç ra, bi zimanê Rûsî, 22-ê Çileya Pêşin, sala 1830-î.

-Nema Mîrza Axa Koms Paskêvîç ra, bi zimanê Ermenî, 22-ê Gulanê sala 1830-î.

-Tercema nemê bi zimanê Rûsî.

.-Şedenema Pêtros Xazarov, ku danê, wekî ew bikaribe bê rewestandin, wê herema Rûsyayê bigere. Bi zimanê Rûsî.

Profêstor Celîlê Celîl di miqala xwe ya “Rûpelek ji helaqe-tyên dostanya Ermenya-Kurdaye dîrokîyê-çandîyê”-da dinivîse: “Me ra li hev hat arşîva Lênîngiradê ya dîrokê da doklada Gê-nêral Pankiratyêve 12-ê heyva Çileye Pêşin, sala 1829-a, Gê-nêral Paskêvîç ra peyda kin derheqa rasthatina xwe tevî qasidê Şêx Mîrzayê (Mîrza Axa) (Mîrzkê ZaZa E.B.) Gê-nêral dokladê da dinivîse: Van roja binelyê kela Ridiwanê Gîrakos hate cem min. Ridiwan dikeve başûrê Sêrtê Ji nehya Hezoyê rêya denekî dûre, ewqas jî ji çemê Diclê dûre. Wî min ra nema Mîrza Axayê Ridiwanê û Keşlş Hovhanêş tanî, kîjan tirkân li Bitlisê jê stan-dibûn. Evî Gîrakosî min ra ev got: Mîrza Axa, usan jî temamya Êzdî û Ermenî pir kêfxweşin, ku leşkerê Rûsa padşatya Bazîdê hildane û eger pêşdahatina xwe berdewamkin, ewê bi xurtî qu-lixî Rûsa bikin. Di bin hukumê Mîrza Axa da du hezarî zêdetir malê Êzdî û ewqaz jî Ermenî hene. Ew dikaren sê hezar peya û hevsid siyara derxe meydana şêr. Serokatya bajare Sêrtê Taxî Axa dike, kîjan di gura Mîrza Axa da ne. Dû sal berê hukumata Tirka Padşayê Dîyarbekirê guhestine û wê demê da temamya beglikên Dîyarbekirê hukumdarya kesî nas nakin”.

Ev dokûmêntên dîrokî ji alyê lêkolînvan û dîrokzana da bi hewaskarîke mezin hêjayî lênihêrandinê bûne. Hela destpêka vê sedsalyê da di pirtûkên cude-cude da hatine çapkîrin.

Vira pirsa hîmlî ew e: Kê ye Mîrza Axa, Mîrza Axayê Ê-zdî...

Menîke din jî heye, ku rind dide xweyakirin, wekî xweyê nemê Şêx Mîrza nîne. Mîrza ne ku axayê êla Anqosîya bûye lê şêxê wan. Axê wan yekî din bûye, Û ku em hildin şertên hu-khmdarya axatyê yê wê demê, emê tê derxin, ku Şêx Mîrzayê tu wexta nikaribû bi navê axatyê pêşdabihata, bi serê xwe , bi navê xwe neme dewleta Rûs ra bişanda, hela serda jî tu gilî derheqa axê êla xwe da nenivîsyâ.

Stiranekê gelêriye kevn da, ku heta niha jî li nava gel da tê stiran, derheqa wan qewimandina da wa tê gotin:

*Dayê, lê dayê, lê dayê, lê dayê,  
Erenza şêxa dara mezî,  
Erenza şêxa dara mezî,  
Ridiwana bavê Temo, Mîrzikê ZaZa  
Dive hewar û qûrîn û gazî,  
Heçê kesê Ridiwana bavê Temo derdikeve  
Şûrê wî ser milê wî, rûtî, tezî,  
Dukuştin xal û xwerzî, ap û birazî...*

*Dayê, lê dayê, lê dayê, lê dayê...*

*Yan:*

*Huseyn Axa rabû bi giranî,  
Huseyn Axa rabû bi giranî,  
Esker ji Mezûtê, ji Mezerê, ji...  
Çiyayê jorin xwe ra anî,  
Avîte ser Ridiwana bavê Temo, Mîrzikê Zaza,  
Ne wele dîsa...*

Usa ne tu şık tune, ku xweyê kela Ridiwanê, xweyê nema, yên Paskêvîç ra şandî û ew Mîrza Axayê, derheqa kîjanî da X.Abovyan, Layard nivîsîne û li nava zargotina Ermenyaye nivîsar da hatye xweyîkirin MÎRZIKÊ ZAZA ye.

## Kê ye Mîrzikê Zaza?

Mîrzikê Zaza serokê qeza Ridiwanê bûye, girêdayî senceqa Sêrtê. Binelîyê gund û bajarê kîjanê hîmlî Kurdên êzdî bûne, eşîra Qizilya. Wê heremê da usan jî Ermenî û Aşûrî pir bûne. Hukumdarya Mîrzikê Zaza, bawarkî li ser temamya Êzdî, Ermenî û Fileyên (Xaçparêzên) senceqa Sêrtê hebûye. Ji nema wî, ye Paskêvîç ra şandî tê xanê, ku heta Taxî axayê serokê senceqa Sêrtê jî di gura wî da bûye.

Qewimandin demeke dîrokîye pir hewaskar da qewimîne, dema Împêratorîya Osmanî sist bûye û tev dewleta Rûsa li nava şer-dewa da bûye. Beglikên kurda yên serbixwe jî, yê mîna Sorana, Cizîra Bota quwet bûne û şerkariya xwe kirine, ku ji bin nîrê Osmaniyê derên, bigîhîjne serxwebûnê.

Beglikên biçûk jî Ridiwana Êzdîya û der dorê wê bûne. Ji melûmetîyên gîhîştine me tê xanê, wekî xweyê Kela Ridiwanê Mîrzikê Zaza jî xweyê qewateke mezin bûye, ku karibûye sê hezar peya û hevsid siyârî derxe deşta şêr, û karibûye dijî sî hezar leşkerê Osmanî û Musulmana şerke û serkeve...

Eva dîroka Kurda da demeke pir tevlihev û pir bi fersend bûye û egrr, tifaqa kurda hebûya, ez guman im, wê demê Kurdê bikaribûna bigîhîştana serxwebûna xwe.

Wê demê li navbera Kurda da dutfretî, bêtifaqî, xiyanet û dîndijminatî jî xurt bûye.

Hukumata Osmanî jî ew nakokyên li nava Kurda da, boy kara xwe, bi hostatî, dijî Kurdan daye kêranînê û gîhîştiye mere-mên xwe. Şerên Kurda yên navbixweyî, birakujîyê gur û geş kirine.

Hema wan salan çend fermanê xûnrêj li Kurdên Êzdî rakinine, ji wan dudu, pir mezin û bi jan bûne.

Sala 1831-ê bi destê Mîr Mehmed, Mîrê Rêwandûzê (Mîrê Soran) ferмана here mezin li Êzdîyan hate rakirin. (Wextekî usan da, gava bi xwe, boy serxwebûna Kurdistanê şer dikir). Li

wê fermanê da çend hezar Êzdî hatine kuştin. Sed hezar kes jî, piranya wan jin, zarok, extîyar dîl kirin û ajotine Rêwandûzê.

Elî Begê Mîrê Êzdîya jî dîl digrin divin. Êzdî jî wê fermana dîndarê fanatîk bi hêsayî qebûl nakin. Dibêjin, pîreka Elî Begê Mîrê Êzdîyan, Êzdîya xwe top dike, dajo li ser Kela Şengalê. Mirovên Kelê da , hemû bi destê Êzdîyan têne kuştin. Leşkerê Mîr Mehmed êrîşê dîbin li ser Êzdîyên Şengalê, gund û warêwan wêran dikin...2000-a zêdetir keç û pîrekên cîwan bi destê zorê dîbin, didin beg û axayên Mûsil û Êrbîlê yê Ereb û Musulman. Tenê gundekî da 500 evdê Êzdî dikujin û dîkin gorekê.

Elî Begê Mîrê Êzdîyan li ser pira Rêwandûzê darda dikin, laşê wî sê roja dardakirî dihêlin.

Êzdîyên Ermenistanê, yê êla Elegezê (12 gund) hema wê demê ji warêna kal û bavêna xwe koçber bûne, revyane wura.. Li her gundekî da bawarkî çend qebîl hene, ew ji warêna Kurdistanê yê cude-cude revyane... Bîranîna da, ku ji pêşya mane, tê gotin, ku ji qir û birê, birakujuyê, dîndijminatîyê, neheqî û zordestîya axa, beg û dîndarêna birêna xwe yên Kurdêna Musulman revyane. Usa ne wê demê bi destê dewleta Osmanî navbera êl û eşîrên Kurda da qir û bire çawa bûye?

Wê demê fermaneke mezine xûnrêj, serokê Ridiwanê Mîrzikê Zaza û êla wî jî tê rakirin.

Navbera Mîrzikê Zaza û malbeta Dewrêş Nebîyê şêxê Kurdêna musulman da dijminatî çê dibe. Şêzekî ji we malê: Şêx Qasim ra li hev tê ji mirîdêna xwe yên Mûsilê, Rêwandûzê girtî heta deşta Bişêryê sî hezar Musulmanen fanatîk dora xwe topke, bi alîkarî û hêlan dayîna hukumata Osmanîyê bê li ser Ridiwanê. Dibêjin li nav wan da leşkerê Osmanî, Ereb, Tirk jî hebûne, hela hinek ji wan jî zirîkirî bûne.

Li rex gundê Êzdîya Erenzê, navbera qewatêna Şêx Qasimê û Mîrzikê Zaza da şerekî xûnrêj çê dibe. Bi gotina gotya qewatêna

Mîrzikê Zaza 10 hezar Kurdên êzdî, Ermenî û Aşûrî bûne, yên Şêx jî 30 hezar bûne.

Mîrzik vê carê ser dikeve. Di bîranîna da tê gotin, ku evdênu kuşî, ji herd alya ewqas pir bûne, ku nedihatine hesavkirin. Dibêjin ji xûna Kurda ava çemê Ridiwanê sor bûbû, aş bi xûnê dixebeitîn. Xûnê davît çokêñ hespan. Laşen evdan usan di çêm da li ser hev kom bûbûn, ku pêşya avê hatibû girtin. Dibêjin ji xûna evdênu Kurd li ser wê axê 7 sala hêşnayî dîner diket...

Kê bû Şêx Qasim? Derheqa wî da rêuwyê Înglis Layard wa dinivîse: "Li ser rêya me gundekî Kurda yê mezin hebû, Gonya. Ew gundê Şêx Qasim bû. Şêx ji wan dîndara bû yê bi dijminatîya xwe, hindava Êzdiya da eyan bû. Gund û warênu wan wêran dikir, kê diket dêst dikuşt. Cerda wî, ya axrîyê serketin jê ra neanî, ew paşa vekişa ü gelek peyhatîyên xwe unda kir."

Derheqa van qetla da, ku gelê me ji cahiltîya xwe anye serê hev, derheqa van zulm û zordesîya, ferman, qir û bira da destê mirov jî nagire binivîse. Hinek dibe gazina ji min bikin, ku ez çima wan demênu bi xûn, wan deqênu reşe dîrokê tînime bîr?

Bi texmîna min pêwîste wê derheqê da gelê Kurdi sade rind bizanbe, paşwextîya xwe da dersa jê hilde, kar û zirara xwe, ya miletyê bizanbe, boy yekîti, tifaq û azadîya xwe. Ez li ser wê bawaryê me, ku payê gelê meyî pirê derhrqa van demênu dîroka gelê xwe yê reş da rastîyê kêm zane. Bira min rast femkin. Ez dijî tu olê Kurdistanî nînim. Ol bawariya evdane, hurmeta min wan ra heye. Lî pêwîst e ew bawarî gelê sade ra rast bê şurovekirin û ji boy kara gel bê kéränîn.

Lî, wekî hema wê demê dewsâ şerê navbixwe, wa gotî seva "axret-îmanê", qewata xwe bikirana yek, derketana dijî dagerkir, gelo wê ser neketana? Ez bawarim wê demê dikaribûn Kurdistanike serbixwe xwe û ewleda ra çê kirana. İcar navê wanê him di dilê me da, him jî dîrokê da wê bi herfîn zêrfîn bihatana

nivîsar... Niha dikaribûn li ser gorêن wan zîyaret jî çêkirana, camî jî çêkirana.

Melûmetyên gîhîstine me didine kivşê, ku Mîrzikê Zaza dema xwe da axakî Kurda yê navdar bûye û ji alyê binelyê Kurdê Êzdî, Ermenî û Fileyên qeza Ridiwanê û der-dorê wê da hizkirî bûye. Di derheqa mîranî, rem, qencî, merdanî û camêrya wî da li nava zargotina Ermenîya ya nivîskî û ji nivîsarê A.Layard da hatine xweyikirin... Mîrzik bi kîsî xwe, li rex quesra xwe ji Ermenya ra dêrê çê dike. Ewî qedir û rûmeta xwendin û pêşdaçûyînê jî zanibû.Ronakbirê Ermenya yê mezin X.Abovyan, miqala xwe ya bi sernivîsa ÊZDÎ da dinivîse, ku keşîsekî Ermeniyayi ji Ridiwanê hatî, gotîye: "...Wî bi mehan zarokê Mîrza Axa hînî xwendin nivîsara Ermenî kirye..."

Çawa li jorê jî hate gotin ew dewa wextê şerê Tirk-Rûsa da bûye. Mîrzik tê derdixe, ku xeleqa neyartîyê li dora wî çiqas diçe teng dibe, fermanê dîsa êla wî bêñ rakirin, gumana parastina êla xwe alîkarîya Rûsa va girê dide. Mecbûr dibe dizîva, bi destê Ermenîya sê cara nema serleskerê ordîya Rûsa, Koms Paskêvîç ra bişîne. Nema ewil nagîhîje cî. Ya duda digîhîje cî, Rûs cawa wî didin. Telebext ra êla wî da kesekî xwendî, yê bikaribûya Rûsi bixîne peyda nabe. Neme usan jî bê xwendin dimîne... Nema sisya wê demê dişîne, gava şer idî dewî dibe...

Meremê Mîrzikê usan jî mîaser nabin.

Ji pey şerê Rûs-Tirkan ra leşkerekî Osmanî yê giran berê xwe dide Kurdistanê, idî pirs nakin kê ye Êzdî, kîye Musulman, kê ye Xaçparêz qir dikin, welatê Kurda dişewitînin, wêran dikin, dikin gola xwînê, cîyê xelayê û nexweşya... Hukumata Sultan qirar dike bi ci cûreyî dibe, bira bibe, meremê xwe yê dewrana bîne sêri, kutasyê li wan beglikên Kurdan, yê serbixwe bîne. Bi serokaşa Reşîd Paşa 40 hezar leşkerê Osmanî, sala 1836-an, serhildana Kurda, ya here mezin ya Mîr Mehmedê Sorana, bi alîkarîya xiyanetê dişkêne, dixweze li ser rîya xwe ji

heqê Mîrzikê jî bê der... Mîrzik mecbûr dimîne, hukumdarîya Osmanîya qebûl ke. Dewlwta Osmanîyê jî serokatîya wî ya Ridiwanê nas dike.

Lê pir nakşîne Mîrzik tê kuştin. Derheqa kustina wî da, li nava bîranîna da du çîrok hatine xweyîkirin. Çirokekê da tê gotin, ku Mîrzik diçe hewarîya Welîyê Dîyarbekirê. (Yê ji xolore mirî.E.B.). Wura wî digrin, divine hebsê, paşê dikujin. Çîroka din da jî tê gotin, ku Mîrzik ji hebsê direve, qaçax dibe, dikeve çiyê. Şikeftekê da leşkerê Tirka dorê digrin, dikujin.

Qewm û pismam cinyazê wî tînin li Ridiwanê cîkî bilind, nava goristana malbeta Zaza da vedişerîn. Vê demê jî , li nava Kurdên Êzdi yê wê heremê, rîspî hene, ku quba li ser tirba Mîrzik dîtine.

Rojnema HÊVÎ;Sibat,1999;N113;114.

## DÎSA LI SER MÎRZA AXAYÊ ÊZDÎ

Dema min rojnema HÊVÎ stend û wur da wîtara (gotara) Prof. Celilê Celil: “li ser Mirza Axayê Êzdi” dît (HÊVÎ; hej. 119; sal 1999), rast bêjim kêfxweş bûm. Min gotara xwe ya “Şex Mîrza yan Mîrzikê Zaza? Rastîya Dîrokê” (HÊVÎ; hej. 113; 114) da rastkirneke biçûk kiribû li nava pirsgirêkên dîrokî, derheqa kîjana da li nava zanabûna nivîskar û zanyarêni Kurdê Sovyêtê yê berê, usan jî xebatêni Celilê Celil da wê derheqê da şasî û tevlihevî hene. Bi heqî gerekê bê gotin, ku lêkolînên C. Celil li ser van bûyaran bi qîmetin, lê mixabin wan da jî ew şasî û tevlihevî hatîye berdan. Fikirîm, ku dibe ulmdar gotara min xwendîye, li cem wî melûmetyê nû hene derheqa wê “rastkirna” min da ewî zû da zanibûye, hela mecal neketiyê rastkirinê bike, yan jî xebateke xwe da ew rastkirin kirîyê, ez haj pê nînim û ew

dixweze cawa xwe da van binivîse. Lê dema min wîtar (cawa) wî xwend rojneme ji destê min ket, ji bo ulmdar bi hinek peyvîn xwe yê hişk û sar dixweze fikira xwe ya berê pêşda bive û bide serwextkirin, ku çawa yek kare rabe û rastkirinê bike nava “rastîya ulmdarê bê şâşî...”

Hucet li ser çi ye? Salên 1829-1831-ê Mîrza Axayê Êzdi, Mîrê kela Ridiwanê, bi destê qasidêن xwe, yê Ermenî sê cara nema fermandarê dewleta Rûs yê Kavkazê gêneral Paskêvîç ra dişîne û dixweze tevî qewatêن Rûsa pêwendîyan dayne. Kê ye Mîrza Axa?

Gelek zanyar, nivîskar, rojnemevanê Kurd yê Sovyêta berê, li nav wan da min bi xwe jî, nivîsarêن xwe da, derheqa wan bûyara da bes kirine, lê ew şâşî tevlihevî berdane ( Gotara min bi zimanê Ermenî “CHANGÎR AXA”; rojnema “GRAKAN TÊRT” (Rojnema Edebî); sal 1990 ).

Teva jî bi şâşî tirê Mîrza Axayê Êzdi: Şêx Mîrzaye, ew neme û bûyarêن dîrokî yê dora Mîrza Axayê Mîrê Ridiwanê Şêx Mîrza va girê didan.

Celîlê Celîl miqala xwe ya zanyaryê: ”Pêwendîyêن Ermenyan û Kurdan yêن dîrokî û çandî” da wa dinivîse: “Wek tê gotin, karkirina Mîrza Axa, bi tebyetî şerê wî yê azadariyêye pêşberî Tirka, mîla (sîyasî) wî berbi Rûsa ye, usan jî hisa wî ya dostanyê himberî gelê cînar Ermenya, balkêşa van pirsa bi xwe gelek mezine. Lêkolîna kar û jîyans Mîrza Axa balkêşe usa jî bi wê, ku heta îro perçakî gelê Kurd-Kurdêñ Êzdi-di xezna zargotina xwe ya zengîn da hê bi dilovanî û dildarîke mezin sitriana sitiranê li ser Şêx Mîrza (her ew Mîrza Axa bi xwe ye), hevkarê wî Keşîş Polo (Keşîş Polo bi xwe ye) û li ser Şêx Miço hatine sêwirandin diparêzin.”

Usa ne Prof. Celîlê Celîl hinek stiranêن gelêrî û bîranînêñ Êzdiyêن Sovyêta berê derheqa Şêx Mîrza da lêkolîna xwe ra

kirye hîm û hatye wê bawaryê, ku Şêx Mîrza bi xwe Mîrza Axayê Êzdî ye.

Ulmdar gotara (cawa) xwe da jî li ser wê bawarya xwe ya berê sekinîye û dinivîse: “Angorî lêkolinê min, yên berê û nû, ji berhevdanîna kar û jîyana Mîrzikê Zaza (Mîrza Axa) û Şêx Mîrza, em dibînin, ku ew herdu nav jî navê mirovekî ne û şêxtiyê ku Êzdiyêñ Ermenistanê nav lê kirine ne şâse, şâşa dîrokê tê da tune û zanyarêñ Sovyêtê jî şâş nebûne”.

Rastî jî, kî ye Mîrza Axa, yê xwneyê nema û mîrê Kela Ridewanê, çâ C.Celîl dinivîse ew bi xwe Şêx Mîrza ye, yan ew şexsyetekî dîrokî yê din e?

Gotara xwe da pir sade û safî min zelal kiribû şexsiyeta Mîrza Axayê Êzdî û ez li ser wê bawaryê bûm, ku dijwar, yek hebe dijî wê rastiyê derê. Bo wê jî min gotara xwe bi gelek melûmetî, çîrök û stiranê wê derheqê da giran nekiri bû û hîvyê jî nîbûm ku huceteke wa wê pêşda bê.

Celîlê Celîl ,wekî gotina xwe pêşda bibe û “Rastîya bê xêlibûna” xwe nîşan bide dinivîse, gîva zanebûnê min derheqa wê pirsgirêkê da çêbûne li ser naveroka miqala wî û pirsyarên devkî ji Kurden Êzdî, yên ku li vê paşwextiyê ji Tirkîyayê koçber bûne, hatine Almanyayê dijîn. ” Texmîn dike, ku min ew gotar nivîsiye bê kûr bûna li nava pirobilêm û pirsgirêkê da.

Hê dema zarotyê da ez çîrok û stiranê derheqa bûyarêñ Şêx Mîrzayê, Şêx qebîla Anqosîya va girêdayî me ,nas im. Oda me hebû. Salêñ li pey şêr ra bûn. Camêrên gund şevêñ payîzê û zivistanê yê dorêj li oda me da dicivyan û şevbihêrya xwe dikirin. Çîrokbêjê gundê me xurt bûn.. Wan tim çîroka Şêx Mîrza û stirana derheqa wî da digotin (Gilyê zarotyê jî bîra mirov da dimînin). Çîrok û stiranê, ku wana digotin, tê da ne navê Şêx Miço hebû, ne navê Keşîş Polo, ne jî navê Delanê. Paşê min miqalêñ X.Abovyan “Kurd”, “Êzdî” û kilamêñ cimeta kurda, yê alyê wî va berevkirî xwend, pê ra jî ew qinyatêñ zargotina Er-

menya derheqa Keşîş Polo da, ku cilda efrandinê nivîskare 8-a da neşir bûbûn. Wana da tu cîya mavê Şêx Mîrza û bûyarên hebsa Dîyarbekirê da nehatîye bes kirin.

Qinyatê zargotina Ermenya yê nivîskî da jî raste rast hatîye gotin: "Mîrê Sixêrdê (Sêrtê) û Ridiwanê bû MÎRZIKÊ EZDÎ, kîjan xaçparêza ra heyf bû".

Ew miqalên X. Aboyan û qinyatê zargotina Ermenya yê nivîskîye jorgotî, alyê nivîskarê Kurdi bi şuret Wezîrê Eşo da ji Ermenî hatine tercemekirin û sala 1986-a bi pirtûkekê neşir bûye. Ji bo mecalên rojnemêye teng ez nikarim ji wan hinek perça bînim, kîjana da rast bi rast navê wan cî û şexsyeta hatîye dayîn, kîjan çîrok û stiranê derheqa Mîrzikê Zaza, Mîrê Ridiwanê da têne bîranîn. ( Dewrêş Nebî, Şêx Qasim, Şêx Miço, Keşîş Polo, Ridiwan, Delan û hwd.) Gerekê bê gotin, ku pismamê min Wezîrê Eşo jî pêşxeber, bi nivîsar û serzêdeyê wê pirtûkê da bûyara tevî dîsa bi şâşî Şêx Mîrza va girê dide.

Sala 1963-a romana ronakbirê mezin Hecîyê Cindî HEWAR derket. Ulmdarê mezin romana xwe da besa nema gênerâlê Rûs Paskêvîç ra şandî dike û ew jî dinivîse Mîrza Axa, navê şêxtîyê nayne navê. Min wê derheqê da carekê ji wî pirsî. Ewî min ra caweke kurt da: "Ew pirseke terî ye..."

Stirana Şêx Miçoyê Şêx Îsa da jî tu cîya navê Şêx Mîrza nayê gotin.

Lê ci bû sebeb ez ketime pey vê çîrokê? Min sala 1963-an ji devê çîrokbêjê gundê me Elîyê Fetî ev çîroka û kilam nivîsi bû û min dixwest tiştekî bedewetyê binivîsyâ (poyêm, roman...)

Min tê derdixist, ku bêbextîya gelê me, bindestîya wî, ji bêti-faqyê, nakokyên li nava qebîl û teyfan, şerê oldaryê tê. Dijmin nakokî, "dîn dijminatiyê" li nava gel da dijî gel dide kêranînê. Bi destê axa, beg û dîndarêna qafseqete nezan welêt xirab dike û li bin nîrê xwe da dihêle... Min dixwest bi nivîsara wan bûyara, derheqa sedemên bêbextî û bindestîya gelê xwe da jêra biaxi-

vim. Lê ji bo qinyat pir kêm û terî bûn, cîyê bûyara min nedîti-bû, rê şevereş bû, min ha dest pê dikir, dinivîsî, ha nîvcî da dihişt, ha nivîsara xwe qayîl nedibûm, diqelaşt davît, ha carke din dest pê dikir.

Rast gerekê bê gotin, ku lêkolînên C. Celîl wê derecê da zengîntir û balkêş bûn .Dîrokzan li ser bûyarêñ dîrokî yê wê demê, çîrok bi kûrayî şiro dikir, nivîsara arkiyologê İnglîz Layerd danî navê . Lê çîma şik ji diulê min der nediket û min çîroka çîrokbejê gundê me apê Elî bawer dikir?

Vê dawiyê ketme nava kaniya bîranîn û stranêñ li ser wan buyeran. Rastî peyhatî, nebiçirk û mirîdê wan şêxa hatim, ji devê bi dehan rûsîpiyan (yê ji qebîl û berekê Ezidî yên cûda) ev stran û çîrok bihîstîn û her tişt zelal bu. Pey wan hemiyan ra ez hatim li ser wê fîkrê ku çîrokêñ sê buyerêñ dîrokî hatine tev lî hev kirin û bi nezanî şexsiyeta Şêx Mîrza va hatine girêdan.

Buyera ewlin: Komkuji yan qetliyama gundêñ Ezidiyan ya Delanê.

Buyera dûduyan: Şerê Erenzê û Ridwanê (Mîrzîkê Zaza bi Mîrê Kela Ridwanê ve girêda ye).

Buyera sisêyan: Qewmandinêñ bi Şêx Mîrza yê ve grisdayine.

Li ber destêñ min niha çend şaxê çîropk û stranê şerê Erenzê , Ridwanê û wisa jî çend şaxêñ stranan li ser şerêñ Şêx Mîrza yê hene. Ev çîrok û stran baweriya tam derheqa cûdetiya wan buyeran didin û rind tê xwanê Mîrze Axayê Ezdî, Mîrê Kela Ridwanê, xweyêñ namêñ ku generalê Russ re şandî kîye ? Şêx Mîrza Kîye ? Jiyan û karkirana wan tê ber çavan.

Sifetê buyera Delanê û şerê ser Erenzê-Ridwanê hîmê straneke û di çîrokekê da têñ gotin. Naverok waye: Bi serokatiyan Dewrêşê mala Dewrêş nebî (Şêxê Terîqetê) Kurdêñ musilman davêjine ser gundêñ Ezidiyêñ Delanê û neferêñ gund teva qirdi-

kin sebeb çibuye nayê bîr anîn. Dibêjên giva li ser pirsên cûde-  
tiya dîn bûne. Payê wê deverê Êzdi bune: Éla Mîrzikê Zaza  
Mîrê Ridwanê, êla mala Zoro, êla mala Çelikê . Lê ji wan kes bi  
hawara Delanê ve naçe. Di Stranê da tê gotin:” gazî gaziya dû  
guran ne, minê hawar kiriye Hamidê Çelikê, minê hawar kiriye  
mala Mîrzayê Zoro Axa, eskerê mala Dewrêşê Dewrêş Nebî  
girane û xayînin, nizam çima xal di hawara xwarziyan nayên,  
dayê wî êê”

Çend heyva pey qetliyama Delanê ra nangiranî dikeve nava  
êla Dewrêşê mala Dewrêş Nebî. Eva çend qantir û guhdirêjan  
didine ber dû Feqiya, dişînine cem Mirzikê Zaza, ku wan ra nêñ  
bişîne. Mala Mirzikê û Dewrêş nebî kirîvên heve xwînê bune.

Mîrzik barê wan tije genim dike û dişîne. Rêda herd Feqiyan  
dikujin, meytêñ wan davêjine ser guhdirêja, Mala Dewrêş nebî  
ra dişînin. Kuştina Feqiyan davê jine ser Êzdiyan. Dewrêşê  
mala Dewrêş Nebî ferманa êla Mîrzikê Zaza radke. Stranê de tê  
gotin: “ Ezê bi Erenza Şêxan diketim bi ker kûre, Hesabê Cibo  
li Kela Rimêlê, Musilê koma Şêxen Ereban aniye bi xwera. Bi  
tevî eskerê Eynîkê, Eyndarê, Eynkafê, Eynberanê bi heciyê  
Xerza ve bi sofiyêñ Xiya û Bekira va hemî anîne bi xwera.”

Bi serokatiya Dewrêşê mala Dewrêş nebî û Hesabê Cibo  
leşkerekî giran ji Ereba ,Tırka , leşkerê Osmaniye û Kurdêñ  
dîndare fanatîk ser Êzdiyêñ Erenzê û Ridwanê digrin. Êzidî jî bi  
serokatiya Mîrzikê Zaza, mîrxasê wî Êganê Meyro, Keleşê  
Çilo, Miçoyê Şêx Îsayê, Geçhenê Giro radibin xwe xweyi kin.  
Çirokê da tê gotin, ku wura şerekî usa qetil dibe “aş bi xûnê  
digeriyan”, ji meyta û xûnê çemê Ridwanê sor bûbû, ji qeraxa  
derketibû, ji xûna kuştıya meydana şêr heft sala çêre heşin ne-  
bûbû...“

Hesabê Cibo, ku cilê zirî kirî xwe kiribû û mîrekî pir merxas  
bû, şer da tê kuştin. Qewatêñ Dewrêş Nebî dişkêñ û direvin.

Paşê, wexta Kurd Kurda dişkênin, qewat û yekitiya wan namîne, hev ra dibin dijmin û neyar. Dewleta Osmaniye davêje ser wan (Êzidî ji Musulman ji). Îlê rengîn ji hev bela dibin. Mîrzi-kê Zaza direve çiya û wur jî tê kuştin.

Şaxekî vê çîrokê û stranê Hozan Aydin Ronak ji devê Xelîlê Berfê yê 80 salî nivisiye û kovara Roj da (Hej. 3, 1997) çap kîriye.

Usa ne Mîrê Kela Ridwanê, xweyê nama Peskêvîç ra şandî û ew Mîrzik e ku behsa wî nava zargotina Ermeniya da tê kirinê ne ku Şêx Mîrza ye, lê Mîrzikê Zaza ye.

Ki ye Şêx Mîrza ?

Şêx Mîrza Şêxê êla Kurdê Êzidî Anqosyan e. Mîrekî xurt, bi nav û deng buye. Dewleta Osmaniya wî digre û davêje hebsa Diyarbekirê. Deheqa sebebê girtina wî çîrokên cûda hene.

Şaxekê da, ku alîyê nivîskar Amer Çelîk da, ji devê kalemêran hatye nivîsar û li kovara ROJ da (Hej. 6; 1999) hatye çapkirin tê gotin, ku navbera du malbetên Kurdên eşîrên: Mala Mehmedê Osmêni Reşoyê Ebedo neyartî hebûye. Paşê ew li hev tê, bext didine hev, ku zîyanê nedine hev. Salekê debara heywanê Mehmedê Osmêni kêm dibe. Lawêni wî diçine li nav eşîra Reşoyê Ebedo kayê bikirin. Kayê ji Xaçîkê file dikirin, bar dîkin, êdî wê herin. Xaçik pê dihise, ku xort lawêni Mehmedê Osê ne, devê xwe ji wan diguhere, ne perê wan paşda didê, ne jî kayê. Pêra jî hewarê li mala Reşo dadixe, dibê gîva lawêni Mehmed, zorê li ser wî da girtine û kaya wî dibin. Birayê Reşoyê Ebedo lê dixe herd bira dikuje.

Kuştina herd xorta eşîrên kurda dihejîne. Lê ji bo Reşo "zilamê" dewleta Osmany bû, kesî newêribû li ser sîya wî keve.

Pîrekê Mehmedê Osmêni, Nûrê û Gozê reşê xwe hildidin, li nav giregirê eşîrên Kurdan digerînin. Lê kes reşê wan hilnade. Kê hilde gerekê heyfê hilde. Axryê da tê mala Şêx Mîrza. Şêx dikeve halekî dijwar, lê reşê hildide.

Reşoyê Ebedo him lawê Mehmedê Osê kuştibû, him zordestî êla wî dikir, him jî Osmania ra bûbû yek û nedihîş koçerên Kurda derên zozana.

Şêx cawê Reşo ra dişîne, ku bi edlaye, wê bêtifaqîyê navbera eşîrê da safîkin, paşê jî rê bide koçeran derkevin zozana.

Reşoyê Ebedo diqehire, çâ mirovekî Êzdî dikare caweke usa jê ra bişîne. Dixweze Şêx bikuje, lê bi xwe şêr da tê kuştin. Osmanî jî Şêx digirin, dibin diken hebsa Dîyarbekirê.

Paşayêن Osmanyê Reşîd û Emîn dixwezin girtina Şêx bikine mene, Kurdên êzdî û nusulman rakine rûyê hev... Qewlê datînine ber Şêx Mîrza yan dînê xwe berde bive, yan wê wî dardakin.

Şêx cawê dişîne mala xwe. Xençera wî diken nav mast jêra dişînin. Çaxê paşa gazî Şêx dikan û qewlê xwe dibêjinê, Şêx xweçerê derdixe û li nav wan dikeve. Geleka dikuje, lê çimkî destûyê xençerê dêstda dişkê, dimîne û destevala tê kuştin.

Pey ra leşkerê Osmanyê davêje li ser Anqosya. Koka xelqê tê. Yê direvin alyê Şengalê, yê direvine Rûsyayê, yê diqulibe...

Mecbûr, me naveroka herdu çîroka jî anî û bi wan texmîna min zelal bû, ku herd Mîrza şexsîyetine cuda ne. Mîrza Axay Êzdî, Mîrê Kela Ridiwanê, xweyê nama, ewê arkîologê İnglis sevê nivîsiye, ewê X.Aboyan besê dike Mîrzikê Zaza ye.

Ez axryê da dixwezim şêwrekê bidime zanyarên me. Kurdzanî erdekî xipanî bê kenere, karê, ku heta niha hatine kirin gavê nû ne. Kêmasyê jî hebin, şaşiyê jî hebin... û dema yek rastkinekê dike nava pirsgirêkekê, lêkolînekê, lêkolînvan kê be jî gerekê neqehire, xwe neêşîne... Çimkî lêkolînvanê esil ra ya sereke gîhîştina rastiyê ye... Ci bikin rastî rehet nayê dîtin, dîtin na wê carna jî tehle.

## ÇIROKA ŞÊX MÎRZA

Di nav Kurdêñ êzdî da eva nava navekî pir belabûyî, hizkirî û pîroz e. Tu êleke Êzdiya tune, ku navê Şêx Mîrza nizanbin û stiranên derheqa wî da neyên gotin. Li nav civaka Êzdiyan da ew bûye efsene, simvola mîranyê, culetyê, bêqelpyê û parastina bawarya êzdîtayê. Lê çiqas jî ew navekî hizkirî û belabûyîye payê vê civakêyî pirê derheqa şexsyeta Şêx Mîrza, jîyana wî û bûyarêñ dîrokî yên dora qetlyama êla wî da qewimî kêm zanin. Ël ji hev bela bûye, bûyar nehatine nivîsar, ji wan qewimandina çend bavik derbaz bûne û xêncî hinek sitiranan bîranînên zarkî kêm tişt mane û kêm kes jî rind wan bûyarêñ rojêñ buhurî zanin. Çirokêñ ku têne gotin da pir kurt û sade ne, gelek tişt ji çirokêñ din ketye li nav wan. Gelek tişt bawarya mîriv naynin.

Tê bîra min, dewya salêñ pênciyî, wextê hê ez şagirt mektebê bûm, gundda oda me hebû. Ne têlêvîzyon bû, ne radyo, tiştê mijûlbûnê kêm bûn û payîzê destpkirî heta axlêvê gundda karê gundiyyê jî tune bû, mîrên gund yên navsere him sibê heta nîvro, him jî êvara oda me da top dibûn. Ode dibû wek mekteba

zargotinê: çîrok, serpihatî, kilam, henek... Her tişt dihate gotin û pir baş dihate gotin.

Wê demê pir cara çîrok û sitirana Şêx Mîrza jî digotin. Derheqa bûyarên navê wîva girêdayî bîr tanîn..Şêxê gundê me Şêxûbekirî bûn. Digotin mala Şêx Hemze. Mala wan mala a'lima bû. Derheqa şêx Hemze, zanebûn û kiryametê wî da gundaya tiştê ecêv gîlî dikirin. Şêx zûda çûbû rema Xwedê, lawê wî êdî camêrne navsere bûn. Pênc bira bûn. Şêx Elî, Şêx Efendî, Şêx Sihîd, Şêx Îsmayîl û Şêx Kamil. Sê birayêne mezin, ji nazarên xwe va li bajarê Tilbîsê da dijîtin, lê kekê Îsmayîl û kekê Kamil gundda bûn. Bira tev jî ( yen Tilbîsê jî dema dihatin gund) li oda me dibûn mîvan. Nexwendî bûn, lê ber dilê min da her yek ji wan pirofêsolekî folklorê û ulmê bawarya Êzdîtyê bû... Meriv bi roja rex wan rûnişa îciz nedibû. Mijulbûna wane nava civakê pir xweş bû û qedrê wan jî di nav Êzdyênen wê here-mê da mezin bû.

Min pêşyê him çîrok, him jî kilama Şêx Mîrza ji wan bihîst. Paşê çîrokbêjê gundê me Elyê Fetî, ku rastî jî xizna zargotinê bû, dema min li zanîngehê dixwend û min gavêne nivîskarya xwe ya ewlin davît ewî çîrok û kilama Şêx Mîrza min ra got û min nivîsî. Bêtifaqya li nava gelê Kurd, dîrok û qederan Kurdêñ Êzdî, bindestî û perçebûna Kurdistanê, rast gotî rehetî nedida min. Min dixwest roman binivîsyâ. Ev çîrok dikaribû bibya firêta wê romanê... Min ji devê hineke din jî ew çîrok û kilam nivîsîn. Melûmetî berev kirin. Lê nivîsar nedihat stendin. Ji bo matêryalê dest min da gelekî kêm bûn, pir bûyaran li hev nedigirt, kilam jî ne weke hev bûn, bûyar tevlihev bûn, cîyê bûyaran, jîyana wê civakê ra nenas bûm, cêribandina min tunebû, gelek erf-edetê gelê kurd ji min ra terî bûn... Ez bi heftya rûdi-niştim, min dinivîsî, dinivîsî lê nivîsa min li min xweş nedihat û min terk dida, dîsa demek dikete navê dîsa min dest pê dikir... Wedek hat, ku ez xwe ji wê fikirê û wê belê xilaz kim ci nivîsar

û matêryalê mine li ser Şêx Mîrza hebûn min qelaşt û avît. (Xwezi min ew yek nekira).

Naveroka çiroka, ku apê Elî min ra gotibû bi kurtayî wa bû (tê bîra min). Şêx Mîrza serokê êla Anqosa bûye. Digotin ser keceke Êzdî, navê kîjanê Şîrin bûye, kîjanê musulman bi zorê dixwezin xwera bivin, navbera Êzdiyan û Musulmana da şer çê dibe. Mêr têne kuştin. Dewleta Romê Şêx Mîrzayê, serokê wê êla Êzdiyan digrin û davêjne zindana Dîyarbekirê. Welyê Diyarbekirê Reşit paşa qewlê datîne ber Şêx yan musulmanbûn yan dardakirin. Şêx texmîn dike, ku xilasbûna wî ji welyê zalim tune, cawê dişîne pîreka xwe ra dibê xencera min bike nav şîr, bimeyîne bike mast û minra bîne, usa ku kes tê dernexe. Jina wî usa jî dike. Xencer zindanê da digihîje Şêx. Lê ji bo nava şîr da kelya bû qevza xencerê qels dibe... Roja din Reşit paşa, giregirê dora xwe va gazî Şêx dike bal xwe, Serayê. Serayê da ew û gelek wezîfedarên dewletêye bilind rûniştî bûne... Paşa dixweze qerfê xwe Şêx Êzdiya bike, usa bike ku Şêx xwe bavêje lingê wî... Lê Şêx nişkêva mîna şêrekî ji cî banz dide, hukumî li ser hazira dike û wan dide ber xencera... Lê ji bo nav şîr da xencere kelandî bûye, qevza xencerê dêst da dişkê. Şêx tê kuştin.

Apê Elî sond dixwer, digot camêrekî Ermenî jêra gîli kirye, gotye: „Dema Şêx Mîrza Serayê da teva dide ber xencera yên dimirin, yên birîndar dikevin, Şêx dêrîra direve derva. Dibêن Şêxê xilaz bûya ... Lê gîva yekî Ermenî, dostê Şêx, ku li wur ber dêrî serayê sekinî bûye. Ew wê hêwarza hundur Serayê da dibîhî, difikire dibê: „Şêx kuştin.“ Ku ber dêrî wî nebînin, dide kevirekî jora dêrî disekine... Ewî tirê Şêx Mîrza hatye kuştin, dêrî ra yekî din dertê. Û kevirê destê xwe da davêje ser serê yê dêrîra dertê. Kevir serê Şêx dikeve. Şêx ji derba kêvir ber derê se-ryâê dikeve erdê. Dinhêre dostê wî ew birîndar kir. Difikire, dibê: „Duste min jî pij minva qelpe, dibêjê, filankes ez naxwezim cinyazê min bikeve destê cindirmê osmanya, werê bikeve

bin milê min, em ji vira birevin. Dostê wî nêzîk dibe. Eva beris-tya cilê dost digre û bi xencerê pişta ustyê wî dixe.“ Paşê cindirmê Şêxê birîndar bi rima dikujin. Giva dostê wî qenc dibe, lê ji derbê kûz dimîne û heta kalbûna xwe jî dijî. Giva ew Ermenyê ev çîrok apê Elî ra gilî kirye ewî bi xwe jî ew dostê Şêx Mîrzayê dîtye û dost bi devê xwe jî derheqa wê bûyarê da jêra gotye.

Paşê min hinek tişt ji çevkanyêن zargotina Ermenya da xwendin. Navê Mîrza, Mîrzik di wan ra derbaz dibû, derheqa Keşîş Polo da dihate gotin, derheqa şerekî giran da dinivîsîn. Lê çi ku min oda me da ji devê çîrokbêja bihîstibû, ne navê Keşîş Polo hebû, ne jî Şêx Miço... Paşê wê derheqê da gotara dîrokzan Celîl Celîl ya pir giranbiha derket. ( „Belgek ji pêwendyêن Ermenya-Kurda yê dîrokî çandî“; Berevoka xebatên Înstîtûta Rohilatzanyê ya Akadêmya Ermenistanê; Cilda XIII; Kurdzanî; 1985; rû. 105).

Peyra êdî ez bi dewî hatime ser wê bawaryê, ku rastîya bûyara tek li cem Êzdyêن wê heremê kîderê bûyar qewimîne meriv kare bizanbe.

Vê dewyê ez bi rastî ketime nava civaka Êzdyêن Kurdistana Tirkîyê, kîderê ew bûyar qewimî bûn û Êzdiyêن Şengalê, bal kîjana bîranîn rind mane... Ez hûr gilî wan bûyaran hisyam, di serê min da her yekê cîyê xwe girt.

Ev çîroka ji Êzdyêن Bişêryê (Êla Xaltyan) Hemzoyê Xalit, Elyê Fariz (Qecer), Sebrî Tagay û gelekên din min ra gilî kirine. Hinek melûmetî pirtûka Kemal Tolan da hene: ( Hebûn û Tine-bûna Êzîdiyan; Oldênbûrg-2000; rû. 65). Lê bi fikira min di vê derheqê da çevkanya here hêja û tam xebata nivîskar, hevalê minî hêja Emer Çelîk e. ( „Çîroka Şêx Mîrzayê Anqosî“; Kova-ra ROJ N 6; rû. 50-58)

Şêx Mîrza şêxê êla Anqosya bûye... Heremê da xweşmerekî kivşî bi nav û deng bûye. Êva êla raste çend gundê wan hebûn e, merkeza wan koçka Gûmêrd bûye lê hîmlî koçer bûne. Warê Anqosyan ji rîya Aviskê, Qurtelanê girtî heta çûye Sêrtê û gelyê Bitlisê. Bi gotina gotya hesavê wan digihîste 1700 konî. Malmezina Anqosya malbeta Salihê Sedo bûye.

Di navbera du Axê Kurd: Mehmedê Osman û Reşoyê Ebedo da dijminatî çê dibe. Reşoyê Ebedo ku peyayê dewleta Osmanyê bûye, gelek neheqyê êlên Kurda dike. Du lawên Mehmedê Osmêni bi gotina wî têne kuştin... Dewsa bi qewl-qanûn, erfedetên eşîrê here xwe bavêje bavê lawika bi alîkarya qewatêne dewletê neheqyên din dike.

Herd jinê Mehmedê Osmêni: Nûrê û Gozê cilê reş xwe dikin li nava Axa û Begêñ eşîrên Kurdan digerin. Di nava Kurda da edete kê reşa wan hilda gerekê here heyfa herd lawên wan ji Reşoyê Ebedo hilde. Kesekî xwe nade ber: „Reşoyê Ebedo zilamê Osmanyê ye, em nikarin herne şerê ordya Osmanyê.“

Dewyê da diçine mala Şêx Mîrza. Ew reşa wan hildide û qasida dişîne bal Reşoyê Ebedo, pêşnyaz û hêvî dike, ku xiravî çê nebe, bê xwe bavêje mala Mehmedê Osman seva lihevhatinê û tifaqa eşîrê. Rêşoyê Ebedo qasidê wî bêhurmet verê dike û rikanî Şêx ra rîya koçera jî digre. Nahêle koçerê kurda derkevin zozana. Sê cara Şêx meriva dişîne cem... Lê hersê cara jî çare bi Axa nabe, gefa li Şêxê Ezdya duxwe û caweke wa ser da dişîne: „...tu ji bavê xwe da bêminetî, tu neêyî ser min, ezê werim ser te. Fermana we kafiran bi alîkarya Osmanyâ min ji îro pêva rakir.“

Şêx çawa wê cawê distîne 300 syarê Anqosya yên xurt dide ser xwe diçe cem Reşoyê Ebedo... Evê te cawê dide leşkerê Osmanyê. Heta qewatêne Osmanyê têne hewarê, şerê navbera herd êla da Reşoyê Ebedo tê kuştin. Rîya koçera vedibe. Gelek

êlên Kurde musliman dora Şêx Mîrza kom dixin. Qewatêñ Osmanyê dema tifaqa Kurda dibînin turuş nakin hicûmî ser wan bikin, û dibêjin: „Hûn Kurd xwe bi xwe şerê hev dikin, tiştekî me vê meselê da tune.“

Şêx jî deng li sîyarê xwe dike ku dijî osmanya şer nekin. Bi wê bêbextyê leşkerê osmanyê Şêx Mîrza herd lawê wî: Hesen û Melova digrin û dixin dikine hebsa Dîyarbekirê.

Welî texmîn dike, ku kurdêñ musliman jî ser Şêxê Ezdiyan qayîl nabin, nakokyê dînî dike navê... Dibê Şêx û lawêñ xwe kafirin, ezê roja e'ya Remezana muslimana bikime qurban, serjêkim...

Ev gîlî digihîje mala Mehmedê Osman. Di bin hukumê herd jinê xwe da, Mehmedê Osmêñ 500 syarê dicivîna û 500 hogeçî hildide, diçin şev dora koçka Welî digrin. Mehmed diçe cem Welî, dibêjê: „Paşa min 500 hogeç seva xurekê eskerê te anye, hatime reca Şêx Mîrzayê Anqosî:“

Welî hogeça hildide û herd lawê Şêx: Hesen û Melo aza dike. Dibê, çend rojê dinê ezê Şêx jî bişînime mala wî.

Usa Welî wan dixapîne û Şêx zindana Dîyarbekirê da xweyî dike.

Şêx dînhêre ne ku wî bernadin, lê zorê lê dikin ku bîqulibe, dînê xwe biguhere. Şêx caw dike ku xencera wî bigîhîninê. Xencer di nav mast da digihîje Şêx. Dema dîsa Reşit paşa û Emin paşa gazî dikinê cem xwe û ber gelek wezîfedarêñ Osmanyê zorê lê dikin bikifire, dînê xwe înkárke, eva nişkêva xencera xwe dikşîne û dikeve nav wan. Heta ew xwe dihesin Şêx geleka dikuje û birîndar dike. Heta xwe bigîhîne dêrî ku bireve qevza xençerê wî dişkê, destevala dimîne û tê kuştin.

Peyra ferмана li êla Anqosya radibe. Gelek têne qirê, hinek direvin berbe Rûsyayê, hinek diçine Sengalê û Şêxan... Yêñ ku dimînin jî xwe didine bin perê êlên Kurdaye din.

## Kilama Şêx Mîrza

Serayê ha li min ,Serayê  
Sera Dîyarbekirê dinhêrim - kevirê more,  
Reşid paşayê qolanê milê bavê Melo, Şêx Mîrzayê girt,  
Kişande pîyê dîwanêyî jore,  
Go: „Şêx ez ji te ra dibêjim, minra were rayê.“  
Şêx Mîrzayê got: „ Ez bavê Melome, kuştina min heye,  
serike rîya mindane, ez tucar tera nayêm rayê.“

Serayê, ha li min Serayê,  
Sera Dîyarbekirê sed yazix, çawa têda nayê dengê bavê Melo,  
Xalî bûye, Şêxê Êzdî, Şêx Mîrzayê.

Serayê, ha li min Serayê,  
Ezê li Sera Dîyarbekirê dinhêrim ji êvarda,  
Têda xalî nabe dengê tetera û qasida,  
Şêx Mîrza, Şêxê Êzdî, gote Reşîd paşaye,  
Go: „ Reşîdo, wekî te ewil nêta xwe bigota, min bizambya,  
Minê şûrê xwe şîn, mertala xweye pola, bi tivdîr ji mal banya,  
Yeqin tu bizanbe, minê koka qazî, melle, miftî û te banya,  
Eseyî tu bizanbî, minê serê te jêkira li serda danya.“

Serayê, ha li min Serayê,  
Sed yazix bira çevê serê min kor bûya,  
Çawa li Sera Dîyarbekirê da xalî bûye,  
nayê dengê bavê Melo, Şêxê Êzdî, Şêx Mîrzayê.

Serayê, ha li min Serayê,  
Serê Dîyarbekirê dinhêrim kevirê kore,  
Minê hîjde mîrê te bi van destâ, derheqa dînê xwe da  
Da li ber xencera,  
Serîke, riya dînê min da be, Êzîdê Sore.

Serayê, ha li min Serayê,  
Çawa têda xalî bûye, nayê dengê bavê Melo,  
Şêxê Êzdî, Şêx Mîrzayê.

Serayê, ha li min Serayê,  
Ez li serê Dîyarbekirê dinhêrim, devê rîye,  
Hatin-çûyîna cimetê û alayê tevî lêye,  
Bira bavê min kiribe, Miçoyê Şêx Îsaye,  
Welle bi navê Xwedê, go destê xwe hilda heyfa bavê Melo  
Şêxê Êzdî, Şêx Mîrzaye.

Serayê, ha li min Serayê,  
Sera Dîyarbekirê dinhêrim sed yazix,  
Bira çevê serê mun kor û kotî bin,  
Têda nayê deng û sedayê Miçoyê Şêx Îsayê,  
Borîna bavê Melo Şêx Mîrzayê.

Serayê, ha lo min Serayê.

Ordîxan û Celîlê Celîl; Zargotina Kurda;  
Para I, Moskva 1978, rû.257.

## *Şêx Mîrzo*

Serka serê Diyarbekirê kevirê more,  
Emîn Paşa we ez xapandim, gîzma hilkişandim dîwana jore,  
Ez Şêx Mîrzame, şêxê Êzdîxanême  
Ezê roja îroyîn lêxim heta milê min bixebite,  
Hîvya min yekê jorîn Êzdiyê Sore.

Reşid paşa, Emîn paşa go:  
„Şêx Mîrzo me se kirye êla te revya  
Berê xwe daye çayayê Şengalê şerqya û mîlya“.

Şêx Mîrza go: „De min bîst pênc mîrê we  
Sûka serê Dîyarbekirê bi xencerê kuşt,  
Mala hostayê qevza xencera min xiravbe  
Bi lekê pêva danî bû, xûnê da germ bû helya“.

Wezîro, te kir, xazî min bizanbya,  
Minê çar syarê Anqosya, kosê misrî û şûrê dev xar ji mal  
banya,  
Emîn paşa, Reşid paşa minê serê we iro jêkira,  
Yê qaymeqaym, milazimê dora we, li ser daniya.

Wezîro te kir, Emîn paşa te kir,  
Kesî paşî kekê Hesen, bavê Melo sûka serê Dîyarbekirê  
Destê zorê bi xûn nekir.

Sûka serê Dîyarbekirê kevirê mayî,  
Xencera destê Şêx Mîrzayê şilfa wê almaste,  
Qevza dêstda hestûyê filaye,  
Heyfa min nayê kuştina min  
Cinyazê minê bimîne nava dîn-dijminda erdê mayî.

Herê nayê, Wezîro nayê,  
Sûka serê Dîyarbekirê da nayê dengê kekê Melo, bavê He-  
sen,

welle borîna Şêx Mîrzayê.

Emîn paşa, Reşîd paşa ezê mineta çenge xûn ji we hilnadim,  
Tême kuştin, tucar wera nayêm rayê.

Ordîxan û Celîlê celîl; Zargotina Kurda;  
Para I; Moskva 1978; rû. 258-259

### Şêx Mîrzo

Şêx Mîrzo qebîla xwe va anqosî bû. Reşîd paşa axayê Kurdi-  
stanê bû. Reşîd Paşa hiş Şêx Mîrzo nedikir. Rojekê merî  
şandine pey Şêx, go: „Bira nesekine heta bal min bê! „, Mîrzo  
dişurmîş bû, go: „Çira gerekê Reşîd paşa gazî min bike? De, go  
ezê herim, ci dibe bira be“. Ew çû selam dayê. Paşa gotê: „  
Kerem ke Şêx Mîrza, tu rûnê ezê ji tera xeber bînim, tu gerekê  
guhdarya min bikî, bibî surman, çimkî, ji bona wêderê, êzdiya  
miletikî biçûke, hindike“. Şêx Mîrza go: „Çira gerekê ez wera  
bêm surman bim, min ci qulix kir ji dînê xwera, wekî dînê sur-  
manara bikim“. Kutasya xeberê sozê wan li hev negirt, eva  
mîrika sekinî go: „tu gerekê surman bî!“ Mîrza go: „Na, xêr.  
Ez tucar Surman nabim, ez têm kuştinê, surman nabim“.  
Wêderê zar girtine hev. Xencera Şêx Mîrzayê bal bû, xencera  
xwe ji bin kincê xwe kişand, destê xwe avît belgyê pîyê odê  
girte xwe, da ber dêrî, kir şer. Mêrxasêd Reşîd paşa gelek li  
hundurê dîwanxanêda hebûn, wêderê kirine şer. Şêx Mîrza lê  
xist hîjdeh mîr bi destê xwe da ber xencera. Wêderê hewara

wan qalim bû, Şêx Mîrza hate kuştin. Poevket şerê Ezdiya U Tirka.

Miço kurapê Şêx Mîrza bû, jêra digotin Miçoyê Şêx Îsa. Ew mirivekî xebatçiyê nav malê bû. Çû nava malê, ji kevaniya malê nan xwest. Kevanya malê go: „Tu kulê buxwî, bira rasta serê Dîyarbekirê cahil û xort bêne qirê û kuştinê, tu jî vira nan bixwi?“ Miço kilda gote kevanya malê, go: „Wele ez nizanim, hevkî nan bide, buxum, hişê min bê serê min, ezê herim şer bikim“. Wî nan xar, darê xwe girte destê xwe, kîderê dikin şer, ew jî berê xwe da wêderê, cû.

Ji tirka yekî bi şûr û mertal hate pêşyê: „Wey,- gotê,- hestûyê heram, tu ci vandera digerî, ezê naka serê te jêkim“. Nemerdî nekir, ewî sîyarî şürek anî, serê Miço bifîrîne, ewî serê xwe da alîkî, şûr jê negirt. Darek wî sîyarî xist, serê wî gêj bû, ji ser hespê ket. Miço nemerdî nekir, rabû, hespê wî sîyar bû, şûr-mertalê wî hilda, girte xwe û hêja tevî şer bû. Miço wêderê şerekî bi navî, namûsî kir. Miço dû xort şande gund, cabê şand: „Bira bar kin! Evana qalimin, wê zorê bidine me“.

El bar kir. Miço şerda hate kuştinê. Lawik Miço hildan bi zinarva girê dan. Türk hat, Miço sekinye, tirsyan hicûm kin. El kişiya.

Ordîxan û Celîlê Celîl; Zargotina Kurda;  
Para I; Moskva 1978; rû. 256.

### *Miçoê şêx Îsa*

Dê Delane, delane,  
Delana şewitî berê bendê,  
Mertala Miçoyê Îsa, biçûke donzde bira,  
Girane vêspê daketye seri zendê,  
Şerê wî usane mîna reqasa govendê.

Hewar dikim, hewar nayê,  
hewara Keşîş Polo dûre, gazî nayê.

Delana şewitî dinhêrim bi kimkore,  
Hespê Miçoyê Şêxan biçûke donzde bire,  
Herafê meydanê nore-nore,  
Lêxin gelî lawkê Anqosya, de lêxin  
Minê jêkirye serê sesid qazyê ser bi pore.  
Hewar dikim, hewar nayê,  
Gazî dikim, gazî dûre, gazî nayê.

Delana şewitî dinhêrim bi gezgezke,  
Herafê meydanê Miçoyê Îsa kir gaze-gaze,  
De lêxin, gelî lawkê anqosya lêxin,  
Minê herafê meydanê jêkirye serê sêsid qazyê bermiraze.  
Hewar dikim, hewar nayê,  
Gazî dikim, gazî dûre, gazî nayê  
Hewara Keşîş Polo dûre, gazî nayê.

Delane,  
Miçoyê Îsa rakin li pêye,  
Pişa wî bidin darêye,  
kose Misrî bidin ser zendêye,  
Bira kafir bigre jê sawêye,  
Heta pêşya hêsîrê êzdîxanê derbaz dibe  
Çemê ji Mêrdînêye.  
Hewar dikim, hewar nayê,  
Gazî dikim, gazî dûre, gazî nayê,  
Hewara Keşîş Polo dûre, gazî nayê.

Ordîxan û Celîlê Celîl; Zargotina Kurda;  
Para I, Moskva 1978, rû. 259

## Şêx Mîrza

*Şêx Mîrzayo, teyrê mala bavê min tu bî  
Min gote te: bi raya Romê nere  
Tu bi raya Romê nizanî  
Şêx Mîrza dibêje:  
Şêrinê lê dakê, bila Şêxûbekir qewata te nede  
Petarê ji çevê te ra bîne  
Çima xencera xerzanî, şûrê şawîzî  
Ji lawê xwe re nanî  
Xencera xerzanî tehlîma sibê  
Ji bavê Hesen, bavê Melo re tanî  
Ji beyana sibê  
Dest avête xencera xerzanî  
Serî bi Emîn paşa, Reşîd paşa de tanî  
Reşîd paşa, Emîn paşa weke berxê deloheliye  
De lê lê dakê,  
Qewîşê de, min birin û anîn  
Lo, lo şêxo, dîno, wezîro.*

*Ezê bi holîcana bajarê Dîyarbekirê ketim  
Bnhêre seran-sera  
Min dit baş çawîşa, qumandarê-milazimê dewletê  
Bazdabûn û meşyane serê  
Qutikî li bejna bavê Hesen, bavê Melo ye  
Ji kula dilê min re, keşmîrê zere  
Şêx Mîrza dibêje:  
Şîrinê, lê dakê  
Min dest avête xencera xerzanî  
Heta ez gîhîştim Reşîd paşa, Emîn paşa*

*Min kuştin  
Bîst çar çawîş û çar nefere  
Lê ez çi bikim, xopana xencerê  
Na zîlan kêşbû  
Xopana xencerê bê zîl hate dere  
Lo, lo şêxo, dîno, weziro.*

*Şêx Mîza dibêje:  
Şerînê dakê  
Navê te bi şêranî Edlanê,  
Qırka te bi hilo û morî  
Mircan û kehrebanê,  
Ez nakevim xema wê xemê  
Nakevim xema vê lêdanê, qewîşê  
Vê hepis xanê  
Heyfa min tê wê heyfê  
Hilm xeber ji bavê Hesen, bavê Melo re  
Hete qewîşê, vê qewîş xanê  
Birek malên Etmanka bi kotekî  
Dadane ser gundê mey Bahzanê  
Lo, lo şêxo, dîno, wezîro.*

*Şêx Mîrzayo teyrê mala bavê min tu bî  
Tiştê te kir, li dînyayê kesekî nekir  
Ji dewra Elî û Emer, welî û pêxemberan  
Û vîrda  
Ji dewra Êzîdê minî sor  
Mermerê sera Dîyarbekir, ji xûnê rengîn nekir  
Ji xêyînî Şêx Mîrza  
Bavê Hesen, bavê Melo  
Micêwrê Şêxûbekir  
Lo, lo şêxo, dîno, wezîro.*

*Reşîd paşa, Emîn paşa  
Sê denga gazî bavê Hesen, bavê Melo dikirin  
Were hedeyetê emê toqê (nîşan) ewletê  
Bi te va kin.  
Şêx Mîrza dibêje:  
Gotinê xerab layîqê we û bav û bapîrên we ne  
Têma kuştin,  
Tu caran bi dewleta Romê re nayême rayê  
Li beyanê sibê, min derbek lê da  
Heresa pêşî  
Qumandarê dewletê: dewleta Romê  
Bi sê ciha taq tê de vekir,  
Lo, lo şêxo, dîno, wezîro...*

ROJ N 6 rû 50-58

## ŞÊX MÎRZA

*Axao, me derketye pele ewrê vê nîsanê,  
Wê girtîye ser kekê Melo, bavê Hesen,  
Şêx Mîrzayê, koma Îzdixanê.  
Reşîd paşa caw şandîye pey kekê Melo, dibê:  
«Were jor dîwanê»  
Şêx Mîrzayê: kekê Melo, bavê Hesen,  
Siyarê Holê, şêxê Îzdîya,  
Extyarê mergê kire gazi:  
“Reşîd paşaşo min goveka ..... te rezîl kiro,  
Ezê iro yeqîn serê xwe bidme oxiea vê îmanê”.*

*Weîro, wezîro,  
Wezîro, şêxî dine.  
Sera Dîyarbekirê dînhêrim kevirê more,  
Eskerê Reşîd paşa, Nefî-Emê girane kişiya dore,  
Şêx Mîrzayê kire gazî, go: "Reşîd paşa te ez  
Xapandim, gîzma hilkişandime dîwana here jore,  
Ez Şêx Mîrza me, şêxê Êzdîxanê me,  
Ezê roja îroyîn lêxim heta milê min dixebite,  
Hêvya min yekê jorîn, Êzîdê sore...*

*Wezîro, wezîro,  
Şêxî dine.  
Axao, qesra bavê Melo, kekê Hesen, sîyarê Holê  
Dînhêrim kevirê more,  
Eskerê Reşîd paşa, Nefî-Emê girane kişiya dore,  
Reşîd paşa cab şandîye pey Şêx Mîrzayê, dibê:  
"Keremke, were dîwana here jore".  
Şêx Mîrza kire gazî, go: "Reşîd paşa min .... te  
Wa-wa kiro, hewarya te bê Roma reşe derewîne,  
Hewara min bê serê çiyayê Şengalê  
Sîyarê rohilatê Êzîdê sore...*

*Wezîro, wezîro,  
Şêxî dine.  
Sera Dîyarbekirê dînhêrim kevirê sore,  
Reşîd paşa kire gazî, go:  
"Şêxo tê surman bî zora şûre".  
Şêx Mîrza go: "Reşîd paşao, min nîveka ..... te  
Wa-wa kiro, te çîma min ra û negot, min kose-misri  
Şûrê hêşîn malda nekire bîre,  
Minê usa bikira, iro çît û mertalê te û mala te  
Bida sere".*

*Wezîro, wezîro,*

*Şêxî dîne.*

*Axao, sera Diyarbekirê dinhêrim li vî destî*

*Xençera Şêx Mîrzayê, Extyarê mergê,*

*Kekê Melo, bavê Hesen, sîyarê Holê*

*Nerize, qevze hestî,*

*Şêx Mîrzayê kire gazî, go: „Reşîd paşa*

*Min ..... te rezîl kiro,*

*Minê h'ivde mérê te kuştine li vî destî,*

*Xwedê mala xençer cêkira xirabke,*

*Mérê hîjda da xençera min şikesti.*

*Wezîro, wezîro*

*Şêxî dîne.*

*Sera Diyarbekirê dinhêrim devî rêye,*

*Çûyîn-hatina cimetê û alimê hemû lêye,*

*Bira bavê min korbe Miçoyê Şêx Îsayê*

*Wele bi navê Xwdê,*

*Destê xwe hilda heyfa bavê Melo,*

*Şêxê Êzdî, Şêx Mîrzayê.*

*Wezîro, wezîro,*

*Şêxî dîne.*

*Axao, sera Dîyarbekirê dinhêrim ax, sed heyfe,*

*Bira çevê serê min kore-kotîbin,*

*Têda nayê deng û sedayê Miçoyê Şêx Îsayê,*

*,Şêxê Êzdîya, Extyarê mergê,*

*Şêx Mîrzayê...*

*Na, wele qûrîna bavê Melo, kekê Hesen,*

*Sîyarê Holê*

*Wezîro, wezîro,  
Şêxî dîne...*

( X.Abovyan, KURD, ÊZDÎ, Hazirkirji ermenî tercime  
kir,pêşxeber nivîsî Wezîrê Eşo. Yêrêvan, 1986.)

Ev kilam ji devê Hesenê Memûd hatye nivîsar, ewî jî ji bavê  
xwe Mehmûdê Elî, binelyê gundê Armavîrê, nehya Hok-  
têmberyanê, Ermenistanê, hildaye.)

## **ŞERÊ ŞEX MÎRZA**

*Wezîro, wezîro, oyo,  
Lo, lo şêxê mino,  
Tiştê te kir, kesî li darê dinê da nekir,  
Kesekî pere bavê Hesen û Melo,  
Şêxê Anqosya, şêxê Doqatê,  
Berxê koza wezîr,  
Derê Sera Dîyarbekirê bi xwînê nekir.*

*Lo wezîro, wezîro oyo,  
Xwezî ji mala xwezyan re,  
Min bizanbiya ku tê di hepsê da weha bikî,  
Minê hingê Kolincîya mezin ji mal anîbya,  
Wele minê tovê kumsora  
Ji devê derê sera Dîyarbekir hêlanî buya.*

*Wezîro, wezîro oyo,  
Erê wezîrêm rabe, îro li Doqatê fermane,  
Rabe li Stembolê Cumeatê xwe ji bext avîtin  
Xwe ber rêzê xwendekarê dînê Islamê oy, oy.*

*Lo wezîro, wezîro oyo,  
Wele ezê çi bikim,*

*Kolêcîya destê bavê Hesen û bavê Melo,  
Şêxê Anqosya, şêxê Doqatê,  
Berxê koza wezîr,  
Xwe iro jî nava xwûna kûçikê  
Kumsora lez berdaye.*

*Ax wezîr, wezîro oyo,  
lo lo şêxê mino, şade û şûdê  
Bavê Hesen û bavê Melo,  
Şêxê Anqosya, berxê koza Wezîr,  
Xortê nû hatî, li dinyayê gelek hene,  
Ax wezîr, wezîro oyo,  
Kevirê sera Diyarbekir bi şewite bi mermere  
Xencera destê bavê Hesen û Melo,  
Şêxê Anqosîya, şêxê Doqatê,  
Berxê koza wezîr,  
De belê şede û şûdê bavê Hesen û Melo,  
Gelek hene li dinyayê,  
Wele ewî li devê sera Diyarbekirê,  
Pêşîra Qomîsera dida ber xencera.*

*De wezîr, wezîr oyo,  
De rabe wezîrê min ji Doqatê,  
Îro serê sê-çar roja ferмана me  
Derketye ji Stembolê  
Li ber destê xwendekarê dînê Islamê*

*Lo lo wezîr, wezîro oyo,  
Xopana kela sera Diyarbekir  
Bişewite du kanîne,  
Ezê ne ketime ber kuştina  
Bavê Hesen û bavê Melo,  
Şêxê Anqosya, berxê koza Ezdi,  
Xortê nû hatî,*

*Ezê ketime ber wê yekê  
Kûçkên koçerên van Medîyan û Keçkoryan  
Îro sê rojin li zozanê jorîn, li ser pez û  
Berxê me danîne,  
Ax wezîro....*

*De rabe wezîrê min ji Doqaê  
Îro serê sê-çar roja ne ferмана me,  
Derletye ji Stembolê,  
Ji ber destê xwendekarê dînê Îlamê.*

*Lo wezîro,  
Kevîrê sera Dîyarbekirê bişewite kevirê reşe,  
Kevirê sera Dîyarbekirê bişewite kevirê reşe,  
Bê şede û şûdê bavê Hesen û Melo,  
Şêxê Anqosya, berx koza wezîr,  
Xortê nû hatî gelek hene li dinyayê,  
Sê denga li Emîn paşa dike gazi,  
Paşayê dewletê,  
Heta niha min pênc kuştine,  
Min te jî bikuşta dibû şeşe.*

*Ax wezîro, ax wezîro,  
De rabe wezîrêm ji Doqatê,  
De rabe wezîrêm ji Doqatê,  
Îro serê sê-çar roja ferмана me,  
Derketye ji Stembolê,  
Ji ber destê xwendekarê dînê Islamê.*

( Ev stirana ji ber dengê Xelîlê Berfê, ji kasêtekê hatye nivîsar. Kemal.Tolan, Hebûn û tunebûna Êzdîyan, 2000, rû.66-68)

## **NAVNİŞANA SERKANYAN**

### **KURTAYÎK LI SER ÊZDÎYAN Û EZDÎYATYÊ**

1. Dr. Xelîl CINDÎ, „Mîrgeha Şêxan û Şingal û Kilîs“, Kovara ROJ N 6, 1998, r. 9.
2. Xidirê SILÊMAN, Xelîl CINDÎ, „Êzidiyatî li ber ronahiya hinek têkstên ola êzidiyan“ 1995; r.....
- 2-a. Xidirê SILÊMAN, „Milyaket di bawarya Êzdîyan da „Kovara DENGÊ ÊZÎDIYAN, N 8-9.
- 2.-b. Serkanya 2-an , rû. 51–52.
3. Kovara DENGÊ ÊZÎDIYAN, N 6-7. 1997, rû. 26.
4. Serkanya 2-an, rû 167-174.
5. Heypîvîyan tev Pîr Xidir SILÊMAN, Rojnema .HÊVÎ; !0-!6 ê meha yekê,1998 s.
6. Dîsa li wur.
- 6-a. Bedelê Feqîr HECÎ, Bawarî û mêtologîya Êzdîyan, Di-hok, 2002, rû. 255.
- 6-b. A. H. Layard, Nînova vê Kalintiları..., bi zimanê tirkî, 2000, AVÊSTA, rû 169-205.
7. Serkanya 1-ê, rû . 12.
8. Xaçatûr Abovyan, KURD, ÊZDÎ, bi werger û pêşnivîsara Wezîrê Eşo, Yêrêvan 1986, rû. 98.

9. A. P. Poladyan, "Belakirina Îslamê li nav Kurdan sedsalên VII-X," Berevoka xebatên Însitîta Rojhilatzanyê ya Akadêmya Ermenîstanê, Cilda 8-a, Welat û gelên Rojhilata navîn û nêzîk, Kurdzanî, 1985, rû. 164.

10. E. Î. Vasîlîyêva, "Pirtûka wenda ya dîroka Kurdistanê", Ji pirtûka ALMANAXA KURDÎ, Weşana Roja Nû, 1997, rû. 84-85.

11. Dîsa li wur.

11-a. Serkanya 6-b.

12. Eskerê BOYÎK ,Rojnema DEMA NÛ, 2002.

13. Sadiq El Demelûçî; El-Yêzidîye; bi zimanê Erebî; Mûsil, 1949.

14. Dîsa li wur.

15. Dîsa li wur.

16. Dema xwe da FITWÊ wa dane û bûne xwedanê qirarnivîen kumkujuyên dijî evdên Êzdî usa jî Mele Xatî, Mele Yêhya Hemzûrî, Mele Ebdûla Rebatkî û gelekên din.

16-a. Serkanya 6-b.

17. Serkanya 1-ê, rû. 13; Zûher Kazim Ebûd, Limehat ên Al-yêzidiyê, bi zimanê erebî, Bexda, 1994, rû.66; Îdo Babaşêx, "Çend leperek ji dîroka Êzdîyan" Kovara ROJ N 11-12, rû. 46.

18. Dîsa li wur.

19. Serkanya 9-a.

20. M.S.Lazarêv, Ş.X.Mhoyî,... "Istorîya Kûrdîstana" "Dîroka Kurdistanê", bi zimanê rûsî, Moskva 1999, rû. 135 -195.

20-a. Serkanya 6-b.

28-b. Dîsa li wur.

21. Serkanya 1-ê, rû. 13.

22. Johanes Dûchtîng; Dîroka Kurdên êzdi; kovara LALIŞ N 11; 12. 2000.

23. Serkanya 6-b.

24. Şerefxanê Bedlêsê, ŞEREFNEME, Wergera kurmancî ya Zîya Avcî, Weşena APEC, 1998, rû. 65.
25. Dîsa li wur, rû 156-157.
26. Dîsa li wur, rû. 157.
27. Serkanya 10-a, rû. 84-85.
28. Serkanya 10- a, rû. 84-85.
29. Ahmet Aras, "Evdalê Zeynikê", Weşena DENG, 1996, rû. 215.
30. Dîsa li wur, rû. 201–202; Ahmet Cevdet Paşa, « Tezakîr 27 », rû. 107-187.
31. H.Cindî, HEWARÎ, Roman. Weşena Roja Nû, Stokholm, 1999.
32. S. K. Poxosyan, "Kurd û pirsa Ermenya" Lêkolîn, bi zimanê Ermenî , Yêrêvan, 1991, r. 36;. "Azgagirakan handêş" Kovara Êtnogirafî, bi zimanê ermenî, N 150, Tilbîs, 1901.
34. Serkanya 20-î.
35. Hêlmût von Motkê, Brîfe über Zustande und Begebenheiten in der Türkei aus den Jahren 1835-1839, Berlin 1841; S.K.Poxosyan, „Kurd û pirsa Ermenya“, Yêrêvan, 1991, rû.33.
36. Serkanya 20-î.
37. Osvobojdenie Bolgarî ot Tûrêskogo îga“ T. 1, bi zimanê rûsî, Moskva 1961;
- Kovara PORZ, bi zimanê Ermenî, 1879, N 9.
- 37-a. Serkanya 17-a.
38. Helmut von Motkê, Unter dem Halbmond 1835-1839. rû. 258-265.
39. Dîsa li wur, rû. 264.
40. Dîsa li wur, rû. 265.
41. Celîlê Celil, "Belgek ji pêwendîyên Ermenya-Kurda yê dîrokî-çandî", Berevoka xebatê İnstîtûta Rohilatzanyê ya Aka-

dêmya Ermenistanê, Cilda XIII, Kurdzanî, 1985, r.105; Kovaa KAVKAZ, bi zimanê rûsî, N 8, 21. 2. 1848, rû. 31.

42. Eskerê BOYÎK, Cêrga gundên kurdên Ermenistanê, rojnema RÎYA TEZE, Yêrêvan, 30. 7. 1989; 25. 10. 1989; 06. 01. 1990; 31. 03. 1990; 18. 04. 1990; 31. 10. 1990; 02. 01. 1991; 23. 02. 1991.

43. Kitêba Avdalbêkyan "Pirsa xwelye li Ermenistana Rojava da" hatye nivîsar, ku sala 1852-a kurd hatine Ermenistana Rojava, gudê Qundesazê şen kirine.

## PÊWENDYÊN KURDÊN ÊZDÎ DI DEWLETA RÛSRA

1. K. Markx, F. Îngêls, Soç. 2-e, Îzd. T . 27, st. 241, bi zimanê Rûsî..

2. X. Abovyan, Vêrk Hayastanî, Birîna Ermenistanê, roman, bi zimanê Ermenî.

3 .V. Maçaradzê, Grûzînskiyê dokûmêntî prê hîstorî girû-zîno-kûrdsko, assîrîysko-rûskîx vzaîmootnoşenîy, 60–70-x gg. XVIII vêka, Îzd. Sabçota Sakarîvêlo, Tbîlîs. 1989. Bi zimanê Rûsî.

Tosinê Reşîd, Rûpelek ji dîroka Kurdên êzdî, rojnema Roja Teze, 13 Çirya pêşin, N 64; 65., 2000.

Wezîrê Eşo, Dîroka Kordên Sovyêta Kevn, NÛDEM, kov. N 31. 1999, rû.6.

4. X. M. Çetoêv, Îz îstorîî Rûssko-Kûrdskîx şvyazeî, (Ji pêwendiyê Rûs-Kurdan, berevoka gotara ya Akadêmya Ermenistanê, Înstîtûta Rojhilatzanyê, Welat û gelên Rojhilata navîn û nêzîk, Kurdzanî, cild 13, bi zimanê Rûsî, Yêrêvan 1985. rû. 70,

5. Dîsa li wur.

6. Dîsa li wur.

7. Dîsa li wur. Dîroka gelê Ermenî, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan 1951, rû.261.

Heypîvîna Mecîdê Heso tev L.Paşayêva, Hevpîvyan di kovara LALIŞ N 12; 2000 s.

8. Serkanîya 3-a

9. Dîsa li wur.

10. Dîsa li wur.

11\*. Dîsa li wur. (Bi bawaya Maçaradzê pirs derheqa Êzdîyên bin destêن Mehmedyan, ango Musulmana da ye. Lê bi te-xmîna min mala Kok axa ji qebîla MEHEMDÎYA NE, peyva "mehemedî" hatye lihevxitin û şas hatye nivîsar. E. B. )

12. Serkanya 4-a.

13. Dîsa li wur.

14. Dîsa li wur.

## MÎRÊ RIDIWANÊ MÎRZIKÊ ZAZA

1. Celîlê Celîl, Rûpelek ji pêwendîyên Ermenya-Kurda yê dîrokî - çandî, Berevoka gotara ya Akadêmya Ermenistanê, Înstîtûta Rojhilatzanyê, Gel û welatêن Rojhilata navîn û nêzîk, Kurdzanî, cild 13, bi zimanê Ermenî, Yêrêvan 1985. rû. 93.

2. Dîsa li wur. Rû. 99.

3. Avêryanov P.Î. Kûrdî v voynax Rossii î Pêrsiêî î Tûrsiêy v têcêniê XIX stolêtîya, Tiflis, 1900, s.10-12. bi zimanê Rûsî.

4. H. Cindî, HEWARÎ; X. Çetoêv, serkanya 4-a, rû 74, (Pêwendîyên Kurdên êzdî di dewleta Rûs ra); K. Çaçanî, Ji helaqetyên Ermenya-Kurdaye çandî; serkanya 4-a, (Pêwendîyên Kurdên êzdî...) rû. 110-114, Wezîrê Eşo, Dost û xêrxwezê cimeta Kurdayî Mezin, X.Aboyan, Kurd, Êzdî, bi zimanê kurdî, Yêrêvan 1986, rû 105-113; Casimê Celîl, Şêx Mîrza, destan, almanaxa BAHAR 199.

5. Serkanya 1-ê.
6. E.Boyîk, Şêx Mîrza yan Mîrzikê Zaza,rastîy dîrokê, Rojnema HÊVÎ, Sibat, 1999.N 113; 114. Dîsa li ser Mîrza axayê Êzdî,Rojnema ROJA TEZE,1999.
7. Serkanya 1-ê. CGÎA GSSR, F.11 d. 66, lîs.2.
8. Dîsali wur, rû. 98.
9. Dîsa li wur, rû. 98.
10. Dîsa li wur, rû 99.
11. Dîsa li wur, rû 99.
12. X.Abovyan. Kurd, Êzdî, Hazir kir, ji Ermenî tercime kir, pêşxeber nivîsî Wezîrê Eşo, Yêrêvan 1986, rû. 88, 109-111..
13. Dîsa li wur, rû. 105.
14. Dîsa li wur, rû.24-25.
15. Srvanstyans G. V., Hnos-noros, rû. 166-184.
16. Serkanya 12-a, rû. 109-111.
17. Sekanya 6-b (Kurtayîk li ser Êzdîyan û Êzdîyatîye).
18. Dîsa li wur.
19. H. Cindî, Hewarî, Roman. W. Eşo, Dîroka kurdên Sovyêta kevn, NÜDEM, Kovar, N 31; 1999, rû. 9.
20. Hêlmut von Motkê, Untêr dem Holbmond, siete 258-265, bi zimanê Almanî.
21. Rûs.....
22. Serkanya 17-a.
23. Layard A.H.discoveries in the ruins of Ninoveh. 1 p. 45.
24. Serkanya 1-ê, rû 95.
25. layard A.H. Discoveries in the ruins of Ninoveh. 1 p.45.
26. Dîsa li wur.

## NAVEROKA BÜYARAN

- 1.K.Tolan, Hebûn û tunebûna Ézdiyan, 2000, Oldênbûrg, Almanya.
- 2.Serkanya 23-a. ( Mîrê Ridiwanê Mîrzikê Zaza).
- 3.Dîsa li eur, Serkanya 1-ê (Mîrê Ridiwanê....); Cuinet Vital, La Turquie Dasiê..., Parîs, 1891, t 2, p 606.
- 4.Serkanya 1-ê, rû 95. ( Mîrê Ridiwanê....)
- 5.Dîsa li wur; serkanya 23-an. ( Mîrê Ridiwanê...)
- 6.Dîsa li wur. G. V. Sirvanzyan, Hinos yêv noros; K. Polis. 1874. rû. 171-174.bi zimanê Ermenî.
- 7.X. Abovyan, Cilda 8-a, Yêrêvan 1958, rû 267.
- 8.Serkanya 12-an, rû 109. ( Mîrê Ridiwanê....)
- 9.Dîsa li wur.
- 10.Dîsa li wur.
- 11.Ş. X. Mgoî.... İstorîya Kûrdîstana, Moskiva, 1999, rû. 121 –127; Serkanya 1-ê (Mîrê Ridiwanê....)
- 12.M. V. Lazarev, Pirsa Kurdan ( 1891–1917 ), Weşena Roja Nû, 1999, rû 34.
- 13.Serkanya 11-an.
- 14.erkanya 12-an.
- 15.A. H. Layard. Discoveries in the ruins of Nineveh.
- 16.Dîsa li wur.

**Çîrokbêj û nivîskarên bîranîn û nivîsarên wan pirtîkê da  
hatine kêranîn**

\* **Hemzoyê Xalit** sala 1932 li gundê Dûşayê, qeza....., Kurdistan Bakûr ji dayka xwe bûye. Kurdê êzdiye, mirîde. Ji êla **Qizilya**, bereka **Metinka**. Xwe bi xwe hînî xwendina kurdî

bûye û dixûne. Zanekî zargotin gelêrî ye. Gelek sitiranê kevn zane.

Serokê malbetekê mezine.

Naha li Almanyayê, bajarê Oldêmbûrgê dijî.

\*\* **Elyê Fariz ( Qecer).** Dema gotina vê bîranînê emrê wî ji 60 salî derbaztir bû. Li gundê Dûşayê, girêdayî Sêrtê ji dayka xwe bûye. Nexwendî ye. Ev gilî ji bavê xwe: Fariz bihîstye. Ji êla **Qizilya ne.** Peyhayîtik ji mala Mîrzikê Zazaye. Sala 1985 an da hatye Almanyayê û niha li bajarê Oldênbûrgê dijî.

\*\*\* **Gêncoyê Temo** sala 1948 an li gunde, Dera Qere, gire-dayi Biserye (Qubine) ji dayka xwe buye. Xwe bi xwe hini xwendine buye. Sala 1990 i hatye Almanyaye. Niha li bajare Kalkar dimine. Gelek cirok, kilam zane. Dibeje ji bave xwe : Birahime Temo u mezinen gunde xwe hin buye.

\*\*\*\* **Şalihê Kevirbirî** di sala 1973 an li Batmanê hatye dinê. Bi eslê xwe ji Misircê ( Kurtalan) ya Xerzan e Bakûrê Kurdistanê. Nivîskar-lêkolînvane. Xudanê çend pirtûkên rojnemevanî, zargotinî û edebî ye.

\*\*\*\*\* **Aydîn Ronak :** sala 1957 an li gundê Hemdûna girêdayî Gurdila ( Kutanan) ji dayîk bûye. Çêlkî ye, Şivqta. Sala 1978 an hatya Almanyayê. Niha Almanyayê li bajarê Cellê dijî. Hunermende, dengbêje. Du kasêtê wîye kilaman hene.

Ev gilî-gotin ji remetyê bavê xwe Koçoyê Elî bihîstye.



Despêka sedsala 19an li dor Êzdiyên Xaltan gelek  
bûyarên xûnrêj qewimîn. Serokê wê êla giran Mîrê bajarê  
Ridiwanê Mîrzikê Zaza bû. Derheqa wî û berxwedana  
wî da gelek delîlên nivîskî, belge, çîrok, bîranîn û sitiranêن  
gelêrî hatine xweyîkirin.

Ser hîmê wan delîlan pirtûkê da ronayîk hatye avîtin  
li ser fermanek ji fermanêن xûnrêj ê li ser Êzdyan:  
Fermana Êzdiyên Xalta - komkuuya herd gundê Dela,  
şerê Erenzê, pêwendyên Mîrzikê Zaza tev dewleta  
Rûs û dewî anîna desthiletdarya Mîrê Ridiwanê.

Berevokê da usa jî li ser koçberya êlên Hesinya, Sîpka,  
Zuqurya, Mehemda berbi dewleta Rûs hatye rawestandin.  
Ji pêwîstya şirokirina hinek pirsgirêkan, çîroka Şêx Mîrza  
û komkuuya êla Anqosya jî pirtûkê da cîyê xwe girtye.

Pirtûk kesera nivîskar e ji bo birîneke gelê Kurd, ya bi  
dewrana, ku heta îro jî jêra derman nayê dîtin û dilê her  
kurdekî welatparêz pê dêše.